

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



KULTUR DI ROMANA KURDÎ DA



TEZA LÎSANS A BİLİND

XWENDEKAR

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

VAN – 2021

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



TEZİN ADI
KÜRTÇE ROMANDA KÜLTÜR



YÜKSEK LİSANS TEZİ

Danışman

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

ÖĞRENCİ

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

VAN – 2021

NAVEROK

Kurte	IV
Özet	VI
Abstract	VIII
PÊŞGOTIN	X
DESTPÊK	1
.1 TÊGEH, DÎROK Û ZARAWEYA KULTURÊ	6
1.1. Li warê zaraweyî de	6
1.2. Li warê têgeh û ferasetê ve	7
1.3. Li warê dîrokî de	13
1.4. Têkiliyên navbera kultur û wêjeyê	15
2. Kultura Kurdî û Pêwendiya Wê Bi Wêjeya Kurdî Re	25
2.1. Taybetmendî û sîmaya kultura kurdî	25
2.2. Kultura Kurdî Li Gundan	26
2.2.1. Karên Rojane	28
2.2.2. Şivanetî û Çandinî	29
2.2.3. Nêçîrvanî	30
2.2.4. Rêzgirtin	31
2.2.5. Leyîz (Lîstik)	32
2.2.6. Zibare	34
2.2.7. Axa û Dîwanxane	34
2.2.8. Rengvedana Efsane û Bîr û Baweriyên Kevn	36
2.3. Kultura Kurdî Li Bajar	37
2.3.1. Hejarî û Dewlemendî	41

2.3.2.	Bazar.....	45
2.3.3.	Kar û barên Rojane	47
2.3.4.	Bêkarî û kirêçîtî.....	49
2.4.	Kultura kurdî ya hevpar di navbera gund û bajar de	50
2.4.1.	Rê û Resma Bûkveguhastinê	51
2.4.2.	Rê û Resma Tazî û Behîdariyê.....	53
2.4.3.	Rola Jinan	55
2.4.4.	Mezargehên Olî	56
2.4.5.	Kesatiyên Olî.....	57
2.4.6.	Cejn.....	59
2.5.	Rengvedana kultura kurdî di nav wêjeya kurdî de.....	60
2.5.1.	Yekem- Li wêjeya fulkilora kurdî de	61
2.5.2.	Di wêjeya nivîskî a kurdî	78
3.	RENGVEDANA KULTURA KURDÎ LI ROMANÊ DE.....	84
3.1.	Kultura kurdî li gund û bajaran û rengvedana wan li romanê de	84
3.1.1.	Çanda kurdî li gundan de.....	84
3.1.2.	Nêçîrvanî.....	88
3.1.3.	Rêzgirtin.....	92
3.1.4.	Lîstik.....	96
3.1.5.	Zibare	98
3.1.6.	Axa û Dîwanxane.....	99
3.1.7.	Rengvedana efsane û bîr û baweriyên kevn	101
3.2.	Çanda kurdî li bajar de.....	105
3.2.1.	Jiyana rojane ya bajar	105

3.2.2.	Hejarî û Dewlemendî	108
3.2.3.	Bazar.....	113
3.2.4.	Bêkarî û kirêçîtî.....	114
3.3.	Çanda kurdî ya hevpar di navbera gund û bajar de.....	118
3.3.1.	Rê û resma jinvegahastinê.....	118
3.3.2.	Rê û resma Taziyê	130
3.3.3.	Rola Jinan	131
3.3.4.	Mezargehên Olî	135
3.3.5.	Kesatiyên olî.....	139
3.3.6.	Cejn.....	143
3.4.	Rengvedana Çanda Kurdî Di Nav Wêjeya Kurdî De	146
3.4.1.	Rengvedana kultura kurdî li wêjeya nivîskî de	146
3.4.2.	Rengvedana kulturê di wêjeya fûlkilora kurdî de	147
	ENCAM.....	154
	ÇAVKANÎ.....	156

(Lîsansa Bilind)

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Van- 2021

KULTUR DI ROMANA KURDÎ DA

Kurte

Kultur weke mijarek girîng di nav dunyaya zanista civakî û edebî de, ji aliyê civaknas û wêjevanan ve pêname û nasandinên curbicur û cuda jêre hatine kirin. Her yek ji wan pênameyan jî, tekezî li ser girîngiya kulturê di jiyana mirov û şewaza cihanbînî û arasteya hizrînê dikin. Ji ber wê jî ye ku wêjevan bi giştî û romannivîs bi taybetî wek kesatîyên civakê, ku haydarê kultur û deb û edetên civaka xwe ne, bi pêzanîn ve li nav deqên romanên xwe de nexş û rolê bi kulturê didin, û ji riya karakterên serekî û lawekî ên nav romanê de, bûyer û urf û edetên nav civakê di romanê de praktîze dikin û cih ji wan re vedîqetînin.

Ew, ji riya romanên xwe ve pûte û girîngiyê bi kultur û deb û edetên civaka xwe didin û tesîr û karîgeriya wê jî nîşan didin. Carna armancdar beşdarî bi wan tê kirin, û renga hin caran jî bê merem be. Herweha romannivîs bi sedema bizav û berketina rojane bi jiyana, xelk û civakê, hest bi girîngî û buhagiraniya kultur û deb û edetan dikin û dixwazin di romanên xwe de, diyardeyên kulturî di nav romanên de rola xwe bibînin û deqên edebî ên xwe jî, pê dewlemend bikin. Ew herweha dixwazin kesatîyên nav civaka xwe bidin diyarkirin û ciyawaziyên kulturî ên xwe bi civakên din re (ku ew jî xwedî taybetmendiyên kulturî ên xwe ne) nîşan bidin, vêca çî baş bin yan xirab, ku

bihevire beşek in ji civakê. Lewre roldîtina kesatîyên nava romanana de, bi ew metod û awayê ku nîşan didin yan dilîzin, dibe bi beşek ji kultur û deb û edetên ew gelê ku romannivîs basa wan dike, tomar û herweha di bûyerên nav romanê de jî, beşdar û xwedî rol dike.

Romannivîs wek kesatîyek rewşenbîr di nava ew civaka ku têde dijît, wêneyek rastîn yê van kultur û deb û edetan li nav romana xwe de dikişîne û pişkek zaf ji wan taybetmendîyan bas dike ku di nava civakê de hene yan pêştir bawerî pê hebûne, û yan jî roman bi xwe çîrokek dirêj e û beşek e ji wê jiyana rojane ya xelkê ku cihê hemû diyardeyên civakî, bîr û bawerî, nerît û hwd dibe û yek bi yeke wan di romanê de rola xwe dilîzin. Lewre romannivîs bas ji çawaniya pêbendbûna civakê bi kultur û deb û edetan dike û hemû bûyer û diyardeyên kulturî li jêr yek sîvanê de kom dike, ku ew jî, sîvana romanê ye û hemû aliyên wê têde tîr baskirin.

Peyvên Sereke : Kultur, folklor, deb û edet, civak, roman.

Hejmara Rûpelê : 161

Şêwirmend : Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Yüksek Lisans)

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Van-2021

KÜRTÇE ROMANDA KÜLTÜR

Özet

Kültür, uluslararası bilim, sosyal ve edebi önemli bir konu gibi, sosyolojiler ve edipler her kes kendine ait başka tanım yapmışlardır. Tanımlardan her biri kültürün önemi insan hayatında göstermiştir, evreni görme yönü ve düşünce şekli gösterirler. Bu yüzden genellikle edipler özellikle roman yazarlar toplumun arasında bir karakter gibi romanda toplumun geleneksel ve kültürü önemli bir rol gösterir, ve buda başrol tarafından yada herhangi bir karakter tarafından romandaki olayları kültürü ve gelenekseli pıratığını yaparak onlara önemli bir yer açarlar ve romanların yoluyla toplumdaki kültürü ve gelenekselin önemsemesini gösterirler. Bazende kasıtlı kültürü ve geleneği romanın içine sokarlar yada kasıtsız sokurlar, roman yazarları günlük yaşamı ile veya hareketi, toplumu yada halkın yaşamı geleneksel ve kültürün öneminin ağırlığı romanların arasında kültürün gösterişi romanda rol görsün diye ve edebiyatlarını onunla zenginleştirmesi ile keşfetmiş ve toplumun arasındaki kişiliği gösterirler ve kendi kültürleri başkasının arasındaki farkı gösterebilirler diye onlar kendine ait hasiyet ve kültüre sahip olduğunu göstermek istiyorlar bu kültür iyise yada kötü, demek hepsi toplumun bir parçasıdır. Bunun için romandaki rol gören karakterler oyuncu şeklinde oyunu yaparlar ve bu oyuncu milletin kültürü ve geleneğin bir parçası diye romancılar üstüne konuşup ve kaydederler ve romanların içinde onlara rol verirler. Romancılarda kültürlü bir karakter diye yaşayacaklar bu kültürün ve romanların içinde geleneği gerçek resmini çizer ve bu hasiyetin en büyük bölümü varlığı diye açıklar yada öncesinde inanmış var yada roman kendisi uzun bir hikayedir insan günlük hayatının

bir parçası bütün sosyal inanç geleneksel... gibi roman içinde birer birer rol görürler bu yüzden romancılar toplumun taahüdünü kültürü ile geleneği ve bütün olay gösterisi bir çadır altında toplanır oda romanın çadırı her tür konuyu anlatır.

Anahtar Kelimeler : Kültür, gelenek ve görenek, folklor, toplum ve roman

Sayfa Sayısı :161

Tez Danışmanı :Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

(M.Sc. Thesis)

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

Van-2021

CULTURE IN KURDISH NOVEL

Abstract

Culture, as an essential topic in social and literary sciences, has been defined and introduced differently by sociologists and literati. However, each definition confirms the significance of culture in human life and the mentality of people. Therefore, literati and especially novelists, as individuals in society and having knowledge about the norms and customs of their various societies, give special importance to culture in their literary works via major and minor characters and incidents inside of their novels. They include their societies' norms and customs and implement them in their novels, as well as they give importance to them and demonstrate their influences. Such inclusion happens deliberately or unintentionally. Besides, due to their involvement and contribution in the society, novelists comprehend the significance and value of culture and customs. They involve cultural phenomena in their works and want to enrich their literary works. In addition, they attempt to identify characters of their society, and demonstrate their culture and its features that is different from others (no matter whether their cultural customs and traditions are good or deficient). Therefore, the contribution of characters and the different roles they adopt in novels practise the cultural traditions and customs, hence they represent the culture of the novelist s/he discusses. Novelists, as an intellectual individual in the society they live in, portrait an authentic general picture of customs and traditions in his novels. They try to show most of the features that exist/existed in his/her society. In fact, novel is usually described as a long story where

all social and cultural phenomena can contribute. Thus, novelists discuss that how societies bound to their cultural customs and traditions, and they try to collect all these cultural aspects under the umbrella of novel.

Keywords : Culture, folklore, customs and traditions, society, novel

Quantity of page :161

Supervissor : Assoc. Prof. Dr. Nesim Sönmez



PÊŞGOTIN

Kultur bi hemû biyav û aliyên xwe re, bi giştî bandorek mezin li ser edebê û bi taybetî li ser janrên edebê heye. Bêguman nivîskar, helbestvan, romannivîs, çîroknivîs û rewşenbîr di nav jîngeha civakên xwe de jiyanê dikin û li kûrahiya jîna civakên xwe de pêdigihîjin, lewre nabe rehendên wê tesîr û bandora ku hemû alî û biyavên civakê li ser çê dikin, werin ji bîr kirin. Bi heman rê û arasteyê ve jî, nivîskar, helbestvan, romannivîs, çîroknivîs û rewşenbîr bi rola xwe li riya berhem û hizrên geş ên xwe, bandorê li ser civaka xwe dikin û ber bi rasteriya jîyan û mirovahiyê ve araste dikin. Lewre ew duyane (kultur û edeb), cemik û duwaneyek bihevre girêdayî ne û hertim bihevre ne.

Kanal û pira vê pêwendiyê jî, mirov e, çûnkî edeb, berhema mirov e û mirov jî, takek civakê ye. Bi vî awayî jî, mirov xala bihevghandîn û bihevre girêdana edeb û civakê ye. Helbet ew pêgeha ku mirov çî wek tak û çî jî wek kom di nav civakê de heye, motor û bizvênera hemû alî û biyavên jîyanê ye, yek ji wan alî û warên girîng jî, kultur e.

Girîngiya vê lêkolînê li vir de ye ku heya niha li edeba kurdî de, lêkolînek serbixwe li ser diyarîkirina cî û pêgeha kultura civakê li romana kurdî de nehatiye kirin, û herweha geşekirin û nexşandina wêneyên kultura civakê di romanê de, û tev rehend û aliyên wê jî bi hûrî di çarçoveya basek akademîk de neketiye ber bas.

Sedemên hilbijartina navnîşan û lêkolînek bi vî awayî, vedigere ser wê ku janra romanê ji jiyana rastîn a civakê ve nîzîk e, çûnkî helwest û kiryara civakî û dîrokî ji xwe digre, û berevajiya helbestê ye ku pitir bo hundur şor dibe û zêde li cîhana takekesî de ye. Eve jî tê wateya wê ku deqa romanê di şeweya herî sade ya xwe de, berhemhênerê rastiya civakî a civakê ye. Bi vî awayî jî, roman li serdema îro de, arasteya hemû tex û temenekê tê kirin. Bi vê wateyê ku, her du alî ên tak û rastî, ya din tewaw dike û xala hevpar jî ku wan kom dike, temsîl û wênakirina cîhanê ye.

Roman li gor janrên din ên edebî, fezayek vekirî ye û cihek e ku hemû kes dikare ji riya xwe ve bas û pêşkeş bike. Her ji ber vê ye ku li dîroka rêbazên edebî de, rêbaza riyalîzmê li hemberî helbestê de, pitir girîngî bi romanê daye, çûnkî piraniya

armanc û hêviyên xwe di romanê de didîtin û cîbecî dibûn. Her ji ber wê ye ku roman bi berhema civakî hatiye hesibandin. Çûnkî dahênerê sereke ê gişt berhemên edebî, civaka mirovahiyê ye, lewre baskirin ji kultura civakê bi dirêjîya jiyânê, pêgeha jiyar û şaristaniya civaka kurdî, asta têgihîştin û pêgihîştinê di bizava dîrokî a cîhanê de rohn dike. Rûmalkirina vê kulturê, pêşketin, çêkirin, bijartin û rexnekirina wê, pêwendî bi hemû takên civakê ve heye. Helbet romannivîs jî, yek ji takên rewşenbîr ên civakê ye ku li nav wê sîstema kulturî de jiyânê dike, bandor û tesîra xwe dike û herweha tesîrê jî werdigre. Lewre rengvedana raman û boçûnên kesek bijarte ê civakê ku romannivîs e, li berheman de terzek ji kultura pêşketî û modern nîşan dide, û ji wê riyê ve jî, dîroka wê kulturê û vegeşîna wê jî tomar dike. Xuya ye ku ew sedem, ji me re bûn hander ku lêkolînek bi vî awayî li ser vê mijarê dest pê bikim.

Ev çavkanî bûne bingeh ji vê lêkolîna me re: Mela Mehmûdê Bayezîdî: Adat û Risûmatnamey Ekradiye- D. Marif Xeznedar: Mêjûy edebî kurdî: Berga yekem- Eladîn Secadî: Kurdewarî- Menûçêhr Muhsinî: Derwazekanî Komelnasî- Mensûr Wusoqî – Elî Ekber Nîk Xulq: Binemakanî Komelnasî- Xusro Caf: Romana Kordere, min ji bo têzê van çavkanî sûd wergirtîne.

Sipas û pêzanîn ji Doç. D. Nesim SÖNMEZ mamosta û şêwermenda min, ku bi dilek mezin û vekirî ve serperistiya vê nameya min kir û herdem alîkarê min bûye, û rênimayiyên hewce ên zanistî pêşkeşî min kirine. Sipasya serokayetita zanîngeha polî teknîka hewlêr (epu) dikem ku moleta min dayî ku ez biwînim. Sipasya birêz mamosta soran denûn dikîm ku harîker bû ji bo ku az bixwînim. Sipas ji mamostayê hêja û rêzdar D. Ebdula Rehman Ewla ku di qedandina vê nameyê de, zaf alîkariya min kir. Sipasiya dayk û bab û xûşk û birayên xwe dikim ku hertim piştevanê min bûne. Sipasiya hevjinê xwe “Beyda” û keça xwe “Bane” dikim ku di bidavîkirina masternameya min de, alîkarî û herweha hevseferiya min bo Tirkiyê kirin. Sipasiya hemû ew kesan dikim ku alîkariya min kirine, nemaze di yek peyv de.

Muhammad Khaleel Rahman RAHMAN

Van-2021

DESTPÊK

Çand yan kultur, aliyek girînge civakê pêk tîne, û bûna civakê, girêdayî hebûna kulturê ye. Kultur, nasname û pênaseya reng û rûyê civakê ye û xala cudaker ya civakek diyarîkirî ji civakên din e. Sîma û taybetmendiyên çandî ên her civakekê bi ya din re ferq heye, û ew cudahî jî bûne sedema nasîn û vegeşiyana civakê. Eva jî tê wateya wê ku, mirovahî xwediyê çandek diyarîkirî nebûye, belkî li gor pileya têgihîştin, zanist û herweha bi sedema pêgeha erdnîgarî, dîrokî, civakî û gurûpî ya mirovan ve, kulturên cuda cuda berhem hatine ku koma wan çandên cîyawaz, jiyar û şaristaniyeta mirovahiyê bi dirêjahiya jiyanê pêk anîne. Ev cîyawaziyên kulturî wusa kirine ku çand destpeyvek çespaw û diyarîkirî nebe, belkî li gor guhertina rewş û jiyar û reftarên mirovan, guhertin bi ser de tê. Bi vê wateyê ku kultur jî weke hemû aliyên din ên jiyanê, guhertin bi ser de tê û tûşî piroseya nûbûn û hevçerxbûnê dibin. Kuwusan bû, her kulturek xwediyê ristek şêwazên hizrî û reftarî ên taybet bi xwe ye ku li civakê de bûne baw. Metodên han, li gor sistemek taybetî a pile û payeyan di nav civakê de hene û piştî guhertinek rêjeyî, ji neviyekê ve bo neviyek fin tînen veguhastin.

Ew şêwaz jî hertim dikevîne ber pêşhatên rewşa jiyanê û rû ji nûbûn û guherîna dikin. Kuwusan e kultur ew alav e ku derfeta berdeambûna jiyanê û hebûna xweşbijîvî û tenahiyê bo mirovan diafirîne. Herweha kultur hêz û şiyana berhemanîna keresteyan û afirandina erziş û buhayan ji mirov re misoger dike, lewma kulturê him aliyên alavî û him jî wezîfî hene.

Wekî xuya, bîr û hizrên cuda li ser kulturê di hemû astan de hene ku lêkolîn û axaftin li ser de hatine kirin û cihê pûte û girîngiya hemû serdem û zurûfekê bûye. Em dikarin bibêjin ku bi giştî, tenê komek rêzbûyî a deb û edet û metodên cuda yê jiyanê ninin, belkî sistemek rêxistinî ye ji reftarên wê, bi awayekî giştî jiyanê gurûpek yan çend gurûp ji xelkê, regezên kulturî weke deb û edet û bîr û bawerî û herweha buha û baweriyên hevpar, mirovan bihevre girê dide û nasnameya civakî dide wan. Kultur, beşek e ji kesatî û pênaseyek ku civak bi giştî, û mirov bi taybetî, xwe ji yê din cuda dikin. Kuwusan bû, kultur çiqas sedem ya hokara xwenasîna be, dikare ewqas jî, sedema cudakirinê be.

Renge wêje qada herî baş ya nasîn, derxistin û eşkerekirina çanda neteweyan be. Çûnkî wêje cuda ji wê ku aliyê cuwanînasî û hestnazikiya takan tîne ziman, li heman demê de guzarîşt ji aliyên civakê dike û ji wê riyê ve hewil dide ku civakê ber bi nûbûn, vegeşiyên û pêşketinê bibe. Helbet eva jî ji riya rûkirin, baskirin û ravekirina kultura neteweyê dibe li nav deqan de. Çûnkî kultur ruha civakê pêk tîne û bi guherînkariyên li kulturê de, civak jî guhertin bi ser de tê. Bi vî awayî, pêwendiyek qahîm li navbera wêje û civak û di nav de jî, edeb û kulturê de heye û nivîskar û wêjevan jî weke takek vê civatgehê, beşdariyê di wê tîkiliya qahîm a navbera edeb û kulturê de dikin. Ji ber ku, materyala sereke ya edeb, helbestvan, romannivîs û nivîskaran, kultura civatgeha xwe û ji wir ve jî, ya civatgeha mirovahiyê ye. Şaîr, romannivîs û nivîskar, takên nav civatgeha xwe û ya mirovahiyê ne, û ew civatgeh bi xwe jî, xwediyê kulturek diyarîkirî ya xwe ye. Lewre wê kulturê, desthilatek piralî li ser jiyên, hizrîn û guzerana helbestvan û nivîskaran heye.

Demekê de jî ku ew berhemek edebî diafirîne, bi terzek ji terzan, regez û edgarên wê kultura ku di nav de dijît, vediguhêze bo nav peyv û hevokên deqê û çinîna bîr û hizr û bûyerên deqê dike. Nêrîna jorîn me digehîne vê baweriyê ku edebê, pêwendiyek kûr û berfireh bi civakê re heye. Lewre dema ku basa tîkiliya navbera edeb û kulturê dikin, dibe ku em bo wêneya mezin a wê pêwendiyê vegerin ku ew jî, pêwendiya navbera edeb û civakê, û di vê çarçoveyê de jî îşare bi pêgeha kultur li nav edebê û rengvedana wê li nav kulturê de bikin.

Ger em ji dîtingeha janrên edebî ji mijarê binêrin, roman yek ji wan janran e ku bi sedema wê rûbera berfireh û ew çîroka ku pêwendiyek rasterast bi jiyânê ve heye, pitir gunçaw û berhevtir e ji bo baskirin û ravekirina kulturê. Girîngiya romanê weke janrek edebî, ku libar û gunçawtir be bo rengvedana kulturê û baskirina pişk û pêkhatiyên wê, zêde ji bo surûştî romanê vedigere. Çûnkî roman ji komek tixm û teknîkan pêk hatiye ku alîkarek girîng dibin bona wê ku deqa romanê bikine bi deqek kulturî. Eşkere ye ku roman ji komek tixmên weke (dem, cih, karakter û buyer)an pêk tê. Ew tixm û teknîk jî rêxweşker in ku kultur bi hêsani li nav çarçoveya romanê de cihê

xwe veke û herweha destê romannivîs vekirî dikin daku reftarek jêhatî bi kulturê re bike û li nav deqê de binirxîne.

Di vê lêkolîna me de, awir ji kultura kurdî hatiye vedan û li çarçoveya edeba kurdî de, cehd hatiye kirin ku reng û rûyê vê çand û kulturê were xuyandin û taybetmendiyên wê jî werin ravekirin. Bi taybetî li romana kurdî de, ku li heyamê serhildana vê janrê de, kultur madeyek girîng ya pêkanîna bûyeran bûye û ji wir ve, romannivîsan hewil dane ku bîr û hizrên xwe bigehînin û kultura kurdî şirove û rave bikin û dest li ser aliyên xirab deynin û rexne bikin.

Sînorê xebata me, başûra Kurdistanê ye û romanên wî serdemî û rengvedana kultura kurdî di nav romanên de bûne bi keresteyên sereke ên karkirina me. Armanca me li wir de xwe dibîne ku em dihewilînin reng û rûyê kultura kurdî nas bikin û ast û pêgeha wê kultrê li nav edebiyat û bi taybetî jî li nav romanê de destnîşan bikin û pêgeha edeba kurdî li destnîşankirin û guherînkariyên kulturî de, rohn bikin. Li heman demê de, em dixebitin ku ji bîr û hizr û nêrîna romannivîsên kurd mifahê bistînin û rola wan di pêşxistin û û geşandina kultur û romana kurdî de binirxînin.

Navnîşan û Biyava Lêkolîne

Navnîşana nameyê (Kultur di romana kurdî de), lêkolînek e di çarçoveya zanista civaknasiya edebê de, ku wêneya kultura civaka kurdî bi hemû alî, biyav û rehendan ve di romana kurdî de dixebere ber lêkolîn û şirovekirinê. Ewe jî li encama wê de hatiye holê ku lêkolîn li ser kultur di çarçoveya pêwendiyên navbera civatgeh û edebê li romana kurdî de nehatiye kirin û hewce ye ew aliye jî bikeve ber tîrojken lêkolîne û bingeh û rehendên wê werin rohnkirin. Nameya han, cehdek e bo wê armancê û dixwazim ji riya vê lêkolîne, ronahiyê bixim ser rehendên ev aliyê edeba kurdî.

Sînorê Lêkolîne

Lêkolîna han, taybet e bi pêşketin û geşekirina kultura civakê di romana kurdî de. Sînorê cuxrafî û erdnîgarî ê lêkolîna me li Kurdistana Îraqê de ye min van heşt(8) roman weke bingeh bikar anîye (xusrew caf, kordere, D.hîmdad husên, malawa gûlî xem, esmahîl rojbeyanî, nazê, azîzî meley reş, kwêxa sêwê, abdula serac, helkişan berew

lûtke, heme kerîm harîf, koçî sûr, mihemed mûkrî, tole, ebrahîm ahmed, janî gel) Dixwazim ku bi berfirehî hemû aliyên wê zelal bikin û zemîneyek guncaw û baş ji lêkolînê re pêk bînin.

Astengî û Pirsgirêkên Lêkolînê

Li rastî de pirsgirêk û astengiyên ser riya lêkolînê, ewqas mezin û berbiçav nebûn ku hêjayî baskirinê bin. Tenê eva nebe ku çavkaniyên taybet bi civaknasiya edeb û kulturê û bi taybetî jî civaknasiya romanê bi zimanê kurdî pir kêr bûn. Bi xasmanî ku niha şahkarên teorîsiyênê ve biyavê bo ser zimanê kurdî nehatine wergerandin. Lewre ji riya jêderên zimanê erebî ve, pirsgirêka han hate çareserkin.

Herweha belavbûna nesaxiya Korona, pirsgirêk ji me re afirandin. Çûnkî bi vê sedemê ve, dem û dezgeh û fermangehên hikûmetî, pirtûkxane û zanîngeh heya midehekê hatin daxistin û qedexeya hatin û çûnê hebû. Ew yek di çarçoveya bidestxistina pirtûk û çavkaniyên hewce li pêşiya me de bûye asteng û demek zêde ji me kuşt. Lê bi hevkarîya mamostayan, rewşenbîr û hevalan di vê midehê de, me jêderên hewce bidest xistin û me ew tengasî jî derbas kir.

Rêbaza Lêkolînê

Metoda sereke ya lêkolîna me ku li navnîşana wê de jî xuya ye, metoda rexneya civakî ye ku di çarçoveya civaknasiya romanê de ye. Herweha bo xistine rojeva aliyê teorî ê lêkolînê, me sûd û mifah ji metoda wesfî wergirtiye û li pêxem şirovekirin û xebitîn li ser deqa romanê de, em ji boy metoda şîkarî vegeyriyan, daku li daviyê de aliyê teorî di nav deqan de piraktîze bikin.

Pêkhatiya Lêkolînê

Ev lêkolîna ji pêşekî, derwaze û sê beşên sereke pêk tê. Li derwazeyê de, emê ronahiyê bixine ser ew lêkolîn, nivîs û mijarên ku pêştir ji dîtingeha vê mijarê ve hatine nivîsandin. Çûnkî, renga nerasterast û virde wir, beş bi beş û pirtî pirtî hatibine baskirin. Her bo mînak, nameya akademîk (wêneyê rewşenbîr di romanên Bextiyar Elî de) bi awayekî nerasterast, mijara han bas kiriye; herçend ku tenê li ser yek tex û qat, ku ew jî

rewşenbîrî ye, bas hatiye kirin. Wate koma ew mijarên ku dikevîne tayê teraziya şirovekirin, rexnelêgirtin û nîşandana aliyên baş ên wan û nirxandina wan.

Li beşa yekem de ku bi navnîşana (bingehên kulturê û pêwendiya wê bi edebê re) ye, bas ji têgeh, pênase û destpêka dîrokî ya kulturê tê kirin. Ev beş ji du teweran pêk tê:

Tewera yekem: Li warê zimanewanî, zarawe, dîrok û têgeh ve, emê ji kulturê vekolin.

Tewera duyem: Pêwendiya edeb û kulturê li warê bandor, kartêkirin û rengvedana bingehên kulturê di romanê de.

Li beşa duyem de; ku bi navnîşana (kultura kurdî û pêwendiya wê bi edeba kurdî) re ye, emê bas ji sîma û taybetmendiyan kultura kurdî û rengvedana wê di wêjeya kurdî de bikin ku ew jî, ji du teweran pêk hatiye:

Tewera yekem: Taybetmendî û sîmayên kultura kurdî

Tewera duyem: Rengvedana kultura kurdî li edeba kurdî de

Li beşa sêyemîn de, bi navnîşana (Aliyên kultura civakê û rengvedana wan di romana kurdî de), emê basa naverok, pêkhatiya wêneya kultura civaka kurdî di romana kurdî de bikin. Ev beşe jî, ji du teweran pêk tê:

Tewera yekem: Kultura kurdî li gor parvebûna erdnîgariyê.

Tewera duyem: Pêkhatiyên kulturê.

1. TÊGEH, DÎROK Û ZARAWEYA KULTURÊ

Kultur yek ji peyvên herî girîng, berfireh û aloz di nav kayeyên civakî de ye ku pêwendiyek rasterast bi mirov re heye. Bi vê wateyê ku mirov, hest bi hebûna xwe dike. Kuwusan bû hest bi hebûna kulturek diyarîkirî û taybetmend dike ku ji hemû rihliberên din ên ser dinê cuda dike. Eva jî tê vê wateyê ku kultur, nasnameyek e ji bo mirovbûna mirov, û parek girîng ya hebûn û jiyana mirov pêk tîne ((Mirov tenê ji riya kultur û hînbûna kulturek taybet û hebûna di nav civatgehê de dikare bimîne, bi yê dîr û nizîk re têkiliyê ava bike, hîn bibe û geşe bike)) (Soma Rehmanî, 2020: 4).

Eva jî tê vê wateyê ku kultur girêdayî hebûna mirov e û bandor û tesîra hertimî li ser mirov heye, û herweha wan fakteran jî pêk tîne ku hebûna me, wek mirov diyarî dîkin.

1.1.Li warê zarawayî de

Zaraweya “kultur” bi awayek rasterast ji zaraweya îngilîzî “Culture” hatiye wergirtin. Li bingeh de, zaraweya îngilîzî jî ji zaraweya Latînî “Cultura” hatiye wergirtin. Bingeha wê jî “Colara” ye bi wateya geşekirinê. Di latîn de bi armanca kêlandina zewî zaran bikar hatiye. (Mihemed Şuwanî, 2016, : 160).

Li zimanê erebî de, li hember zaraweya kulturê, çend zarawayên din jî hatine: weke “Seqafe” bi wateya rewşenbîrî, ku wateya wê li hember kulturê de sînordar e û pitir girêdayî edeb û hunerê ye û pêk tê ji ((Geşeya bîr û hizrên mirov ji wêje, huner û pêşketina şaristaniyetê)) (Mecdî Wehbe, 1984, : 129).

Herweha zaf carî, zaraweya (Elturas) wateya kelepûr digehîne, hevterîb li gel zaraweya kulturê tê kirin û li şûna wê tê bikarbirin.

Herçiqas ku zaraweya han pitir vedigere bo rabihorî, û pitir paşmaya wê derbasbûyê li warê madî û menewî ji xwe digre. Her li vê çarçoveyê de zaraweya (Elhiçare) li cihê kulturê tê bikaranîn. Zaraweya han jî bi wateya (jiyar û şaristaniyê) tê. Her çend ku zaraweya (Seqafe) berfirehtir e û cuda ji wêje û hunerê, jiyana madî jî ji xwe digre. Lê, pitir zarawayek e ku girêdayî ye bi jiyana bajar û li dijî jiyara gundiyan e. Tevî wê jî, dema ku diçe çarçoveya netewe û desthilatê, wateyek berfirehtir ji xwe

digre û dibe bi nasnameya qewareyek diyarîkirî û terzek ji desthilatdariyê û renge çend netewe jî bihevve vê desthilatdariyê birêve bibin.

Kuwusa bû, zaraweya (Elhiçare) di zimanê Erebi de, li hember zaraweya kulturê hatiye bikarbirin û nizîktir e ji hemî zaraweyên din ji wateya zaraweya kulturê.

Di zimanê farsî de li hember zaraweya kulturê, zaraweya (Feheng) hatiye. Di rastî de li zimanê farsî de jî têkeliyek ji her du zaraweyên kultur û rewşenbîrî tê dîtin û ew ji her du zaraweyan re, peyva feheng bikar tînin.

Di zimanê kurdî de jî cudahî di navbera zaraweya kultur û rewşenbîrî de hatiye kirin. Zaraweya rewşenbîrî, pitir wêje û hunerê bi hemû şeweyên xwe ve digre, li halekê de ku kultur, manayek berfirehtir heye û biyavên şaristanî, kultur, civaknasî, piskolojîkî û ... ji xwe digre.

Her çiqas ku li zimanê kurdî de, manayên curbicur peyda kirine û di fêhengokan de îşare pê hatiye kirin. Di fêhengoka Xal de, peyva kultur bi wateya “Tûrikek biçûk e ku Kil a hêrayî têde dikin” (Şêx Mihemed Xal, 2005, :361).

Lêjneya edebî jî li Kora Zaniyarî a Kurdistanê li hember peyva (Culture)a îngilîzî de, peyvên “ kultur, rewşenbîrî, çandî” bikar anîne (Koma Zaniyarî a Kurdistan, 2006: 77).

Di fêhengoka Gulî de, Feheng bi wateya (zanist, perwerde û elimandin, kultur, fulkilor, qamûs, ...) bikar hatine. (Mesûd xalid Gulî, 2002, R 293). Li fêhengoka Kawe de, bi wateya (pîrheng, çand, çande, xwendewarî, rewşenbîrî, fêheng, Kultur, qamûs û ...) bi kar hatine (Fehenga Kawe, 2007, : 435).

1.2.Li warê têgeh û ferasetê ve

Hemû civatên ser dinê, ji kevnar ve xwedî taybetmendiyan xwe bûne û xalên cudakirinê bi civakên din re hebûne. Eva jî, ji ber wan edet û rewş û tîtalan bûye ku ji bav û kalan ve jêre mane. Kultur û edetên civakan (madî yan menewî), pişt bi pişt ji wan re mane û bikar tînin ku pêk tînin ji: biyavên perwerdehî, ayîn, abûrî, zanist, zaniyarî û aliyên civakî û ...hwd.

Lê çê dibe ku rojek ji rojan guhertin bi ser de bê û kêr û zêde bibin. Lewre likolînan bi giştî buha û girîngiyek zêde bi vê biyavê didin û bîr û hizrên cuda li ser anîne ziman, û pêase û şirove kirine. Li warê civaknasî de bi vî awayî qala kultur û civakê dike ku ((civatgeh bi komek ji takekesan tê gotin ku bo midehek dût û dirêj bihevre jiyan kiribin, bihevre zewî yan erdek dagîr kiribin û di encam de karîbin xwe weke yekeyek civakî a ciyawaz ji civakên din birêkxistin bikin, kultur û civak nikarin cuda ji hev bijîn, tu civakek bi bê kultura taybet, namîne)) (Biros Kohîn, 2010: 42).

Herweha kultur bi awayek sîstematîk mirovan li nav civatgehekê de bihevdu re girê dide. Lewre ((kultur (Culture), bi tenê komek edet , nerît û metodên cuda yên jiyane ninin, belkî sîstemek rêkxistî ye ji reftaran, yan şeweyek giştî ya jiyana komek yan çend koman ji xelkê ye. Bingeh û regezên kulturî weke edet, rewş û tîtal, bîr û bawerî, buha û bîr û baweriyên hevbeş mirovan bi hevdu re girê dide û nasnameya civakî ji wan re dibexşîne)) (Menûçêhr Muhsin, 2002, : 103).

Lê pênaseya herî bav û berbelav li ser kulturê ku heya qasekê giştî e, ji aliyê (Taylor, 1871, E.B) (Taylor ferheng yan şaristanî... Meirîfe, ol, huner, yasa, exlaq, rewş û tîtal û hemû terzên şiyar û rewîştê ji xwe digre ku mirov weke endamek ji civakê bidest dixê)). (Daryûş Aşûrî, 2013 : 41).

Ku wusa bû, mirov li vê jîngeh û civakên derdorê ku tede dijî û geşe dike, jê hîn wan rewşt û tîtalan dibe ku hene, û jêre tîn veguhastin û dibin bi parek ji mirov û bi xwe re hildigre. Herweha li pênaseyek din ji kulturê re, ‘Wîslêr’ dibêje: ((Hemû çalakîyên civakî bi watayên berfireh ên xwe, weke ziman, jiyana hevbeş, sîstema xwedîtiyê, wêje, tiştên destçêkirî, huner û ... bi parek ji kulturê tîne hesabandin)). (Mensûr Wusûqî, Elî Ekber Nîkxelq, 2013 : 126).

Helbet eva jî bi awayek wusa hatiye rêkxistin û maf pê hatiye dayîn ku bi awayek fermî li Netewên Yekgirtî de îtiraf bi wî mafî hatiye kirin û her kes azad e kultura xwe, ku ji bav û kalan ve jêre maye yan ji civatgehên din ve hîn bûye, bikar bîne û mifah û sûdê jê bistîne. Mafên kulturî, daxwazek mirovî ye ku bo cara yekemîn, weke mafek bingehîn ji mafên mirovan di carnameya cîhanî a mafên mirovan di sala 1948’an (li beşa A ya madeya 27’an) de bas jê hatiye kirin bi vî awayî: Hemû kesan mafê

beşdarîkirina azad di jiyana çandî ya civakê û mafê tamdîtî û sûdwergirtin ji huner û hevkarî û beşdarbûn li pêşketina zanistî de heye. (Semîr Îbrahîm Hesên, 2011: 7).

Civaknasê Birîtanî ê binav û deng (Antonî Gîdînz) di pênaseya kulturê de dibêje: ‘‘pêk tê ji koma wan buha û erzişên ku endamên civakekê hene. Pêk tê ji yasa û rêsayên ku peyrewiyê lê dikin û ew kelûpel û alavên madî ku çê dikin, buha xweyî ne, li demekê de ku yasa û rêsa li bendê ne ku peyrewiyê jê bikin û endamên civatê hîn dibin û’’ (D. Mihemed Şuwani, 2016: 1-2).

Li vir de aliyê madî û menewî li çarçoveya kulturê de hatine komkirin û bi heman awayê (Taylor 1871) ku ew jî her du aliyên ku di pênaseyê de ‘‘Culture’’ û ‘‘Civilization’’ ji hevdu cuda nekiriye. Wate li zimanê îngilîzî bi xwe û li çavkaniya herî girîng a wê de hêj têkeliyek heye ku bo cara yekemîn, Ereb û piştre jî me Kurdan, ew têgehên jor jê wergirtine.

Hinek li ser vê baweriyê ne ku medeniyet pêk tê ji hejmarek taybetmendî û edetên girêdayî aliyên madî û piratîkî ên jiyana şaristanî. Lewre ‘‘Culture’’ aliyên rewşenbîrî û menewî ji xwe digre. Her eva ku li marksîzizmê de ‘‘Serxan’’jêre tê gotin. Anku taybetmendiyên şaristanîyetê li biyavên madî û alavî, û taybetmendiyên kulturî bi biyavên zanistî û rewşenbîrî bûne sedema nizîkbûna peyva kultur ji rewşenbîrî li bîr û hizra beşeke zaf ji xelkê de.

Kultur diyarokek mirovî ye ku girêdayî jiyana mirovahiyê ye. Ji riya kulturê ve, nirx û buha bona herman û parêzgarîkirin ji jiyana mirovahiyê tê dayîn û cehd tê kirin ku xweşbijîvî û astek bilind ya rewşenbîrî û şaristanîyetê ji wê riyê ve bidest bixe. Kuwusan bû, mirov ji riya kultura taybet bi xwe ve, jiyana xwe rengrêj dike û hewil dide ji riya sîstemek ji norm û edetan ve, hebûna xwe biparêze û jiyana xwe bidomîne. Helbet ajalên din jî cehda man û domandina jiyane didin, ku wan jî curek ji norm û edetên taybet bi xwe hene daku man û hebûna xwe misoger bikin. Lê tevî wê jî, hêj ew nikarin zal bibin bi ser wan norm û edet û yasayan de ku jiyana xwe pê bidomînin. Ji ber ku eql û mejiyê wan tune û hest bi wan kar û kiryanan nakin. Anku hişyariya wê ninin ku xwe û derdora xwe nas bikin, piştre jî wan norm, yasa û rêsayan jî binasin,

lewre tu tişteke li vê derheqê de nizanin û kulturê jî, nas nakin, lewma eva hêzek biyolojîkî ye ku wan birêve dibe û dijîne.

Di nava rihliberan de, bi tenê mirov e ku hez û viyana wê heye ku xwe û derdora xwe binase, û norm, yasa, edet û rêsayên jîyan û hermnê nas bike û binirxîne û ceħda pêşdebirina wan bide. Lewre ji kevna ve, lêkolîn ji kulturê hatiye kirin û hewil hatiye dayîn ku şiroveyek zanistî li vê derheqê de bihê kirin. Yek ji wan ceħd û xebatan jî, karê ‘‘Rîmond Wîlyamz’’e ku amaje bi wê dike ku peyva kultur bi çar şewazan bi kar tê:

Yekem: Îşare bi kultura bedev, binav û deng dike ku pêwendî bi destpeyva şaristaniyet yan medeniyetê ve heye.

Duyem: Bo kultura takekesî a pir ciwan û baş vedigere, wek tê gotin ku kesek bi exlaq û akar ciwan, xwediyê kulturek bilind û dewlemend e, û berevaj, kesên xirab û nebaş, bê kultur in.

Sêyem: Ji bo îşarekirin bi berhem û mijarên rewşenbîrî weke film, pirtûk, hunerên ciwan û ...htd bi kar tê. Bi giştî, kultur tevî berhemên helbest, roman, muzîk, wênekêşan û ...htd kom dibe.

Çarem: Kultur bi wateya şewazek giştî a gurûpek taybetî ji xelkê digehîne. (Soma rehmanî, 2020: 4-5).

Herçend ku xalên jorîn, beşek girîng û berfireh ji destpeyva kulturê ji xwe digrin, lê hêj destewajeya han, seqa û qebareyk berfirehtir heye û aliyê zêdetir ji xwe digre. Bi vê watayê ku kulturê, zarawayek kûrtir heye û reh û rîşalên dîroka mirovahiyê bûye û jiyê wê, yeksan e bi temenê mirov re.

Ji aliyê xwe ve ‘‘Wîlyam Giraham Samnêr’’ li pirtûka xwe de (Şewazên millî, 1906) tekez li ser vê yekê dike ku ((her kulturek yan çend beşên wê yan tixmên her kulturekê, divê tenê bi pîvanên erdnîgarî, dîrokî û civakî ên wê kulturê ve bihên nirxandin)) (Pîter Mordak, 2005: 185).

Li wir de tekezî li ser wê hatiye kirin ku mirovahî xwediyê yek kultura diyarîkirî nebûye. Belkî li gor asta têgihîştin, zanist û zaniyariyê û herweha bi sedema pêgeha

cuxraffî, dîrokî, civakî, gurûpî ya mirovan ve, kulturên cuda cuda berhem hatine ku ew kulturên cuda, jiyana û şaristaniyeta mirovahiyê bi dirêjahiya dîrokê pêk anîne. Ev pênameya “Wîlyam Giraham Samnêr” ji aliyê din ve, tekez li ser vê yekê dike ku kultur zarawayek zeliqiyayî û diyarîkirî nine, belkî li gor guhertina rewşê, jiyana, akar û reftarên mirov, guhertin bi ser de tê. Bi vê watayê ku kultur, weke hemû aliyên din ên jiyana tê guhertin û tûşî piroseya nûkirin û hevçerxbûnê dibe.

Lewre her kulturek xwedî rîstek şêwazên hizrî û reftarî ên taybet bi xwe ye ku li civakê de bûne edet û bav. Ev şêwaz li gor sîstemek taybetî a pile û payeyan, hebûna wan li nav civakê de heye, piştî guhertinek rêjeyî ji nîfş û neviyekê ve bo neviyek din tê veguhastin. Şêwazên han jî pitir dikevîne ber pêşhatên rewşa jiyana û rû ji nûbûn û guherîna dikin. Ew guhertin û nûbûn jî, li gorî çend pirosesên kulturî tên encamdayîn ku ew in:

1: Nûkarî: Anîne rojeva şêwazên dijkiyarên nû ji aliyê hin ji endamên civatê ve.

2: Xwastin û bilavkirin: Wergirtina şêwazên nû ji riya bîzarvekirin ji endamên wan civatan ku şêwazên nawhatî têde hene.

3: Belavkirina li hundur de: Belavkirina şêwazên nû ji kesên nûkar yan xwazraw ji bo endamên din ên civatê, wate pesinkirina civakî.

4: Tewawkarî: Bidestxistina şêwazên nû û tevlikirina bi kakil û naveroka kulturekê û encamdana guherînkariyên hewce li tixm û regezên kevna tevî tixmên nû de.

5: Wêdedana dilxwazane: Jidestdana şêwaz û metodên kulturî ên bav yê derbasbûyî ji ber cihguherîna wan bi metodên nû, yan jî neçarmana wan ji anîne rojeva rezamendiya hewce.

6: Pêgihandina civakî, perwerde û hînkirin: Veguhastina şêwazên kulturî ji nîfş û neviyên pêşerojê li civakê de ji riya piroseya perwerde û hînkirinê, bona wê ku nîfşek nû li ser were elimandin û li warê civakî de werin pêgihandin. (Pîter Mordak, 2005: 188-189).

Bi vî awayî, kultur piroseyek e ku berdewam li halê nûbûn û guherînkariyan de ye û mirovahiyê ber bi pêş dibe û şêwazên nû ên jiyane hîn dike. Her di vê çarçoveyê de, zanayê Entropolojiyaya Amerîkî ‘Marşal Sarînz’ bi vî awayî mêzeyî kulturê dike, her wek şêwazek giştî û tevalî û cuda ya jiyane be, cîhan ji komêk giravên zaf pêk hatibe, ku bi giravên kulturî dinasîne û li navxwe de, xwedî taybetmendî û edetên xasmanî bi xwe ne û bihevê jî, bandor û kartêkirinê çê dikin û têkilî hevdu dibin bona avakirina kulturek nû ya din. (D. Ehmed Ebû Zeyd, 2013: 5).

Eva eyankerê wê ye ku kulturê resîdek rohî û madî heye û rih û cewhera şaristaniyetan pêk tîne, lewre ((Kelepûr û vejena nûbûna wê ye bona domandin û dahênanê. Hêza berbirûbûn û manê ye. Wate kultur eql û wijdana neteweyê çê dike)). (Ebdulrehman Munif, 2011: 204). Yek ji wan pîvanan e ku nasnameyê bo kultura neteweyekê çê dikin û ji kultura netewên din re cuda dike. Bi vî awayî jî, kultur dibe bi ew nîşan û sembola ku pişikdariyê di çêkirina nasnameya neteweyê de dikin. Nasnameya han, sebeba sereke ya herman û qurbanîdanê ye bona bilindragirtin, berdewamî û hermana wê.

Ku wusa bû bîr û hizrên zaf li ser kulturê hene ku di hemû astên cuda ên wê de lêkolîn û axaftin li ser hatine kirin û cihê girîngî û pûtedayîna hemû serdemekê bûye. Em dikarin bibêjin ku tenê komêk dab û nerît û metodên cuda ên jiyane ninin, belkî sistemek rêxistinî ye ji reftarên wê. Bi awayek giştî jiyana gurûpekê yan çend gurûp ji xelkê, regezên kulturî weke edet û tîtal, bîr û bawerî, herwusa buha û baweriyên hevpar, mirovan bihevdu re girê dide û nasnameyek civakî bi wan dibexşîne. Kultur parek e ji kesayetiyê, û pênaseyek e ku ji wê riyê ve civak bi giştî, mirov bi taybetî xwe ji yê din cuda dikin. Ku wabû, kultur bi qasê ku sedema xwenasîne be, ewqas jî sedema cudakirinê ye. (Erxewan Mihemed Ubeyd, 2014: 8).

Em dikarin bibêjin ku kultur, nasname ye û zimanek taybet bi xwe heye ji bo xwenasandin, xwederxistin û xalên cuda ji yê din.

1.3.Li warê dîrokî de

Her feraset, peyv yan zarawayek nû derkeve rojevê, (vêca li her dem û cihekê de be) cihê girîngpêdan û pûteya zimanzan, lêkolînan û dîroknivîsan bûye û li ser axaftine, lêkolîn kirine û kok û binetara wê derxistine. Lewre çemk yan têgeha kulturê jî, bêpar nebûye ji wan terze lêkolînan, û zaf vekolerên ziman, dîrok, wêje û civaknas bi xwe re mijûl û herweha gotin û lêkolînen curbicur li ser kirine.

Kultur ji civaknasî û mirovnasiyê ve hatiye wergirtin. Peyva kultur “Culture” a Firansî û “Kalçêr” a îngilîzî ye. Peyva han ku ji jêderên latînî hatiye wergirtin, li bingeh de, tê wateya avedanî, kêlan û çandina zewî zar û berhemanîna wan, û li wêje û zanistek din de jî bikar hat. Li sedsala 18’an de, nivîskaran bi wateya perwerdekirina derûnî û menewî bikar dianîn. ((Li bingeh de kultur, peyvek zanistî a surûştî bûye bo çandiniyê. Li sedsala 16’în ya zayînî de, çemk û têgeha han, bo zanista civakî hatiye veguhastin û bo amajekirin bi vegeşîna lojîk û hizrê bi kar hatiye. Li destpêka sedsala 19’an de, peyva han, watayek berfirehtir û pêşdeçûnek şaristanî bi xwe ve girt)) (Soma Rehmanî, 2020: 4).

Bi vî awayî, çemka kulturê, guhertin bi ser manaya wê de hatiye û ji bo geşeya bîr û hizrê bikar hatiye. Guhertina han, piştî wê hat ku teknolojiya pêş ket û mirovahî vegeşîya û bajar berfireh bûn, lewre peyva kulturê jî, li wateya xwe de berfirehtir bû.

Herweha di sala 1789’an de, çemk û têgeha kultur li Firansayê de pitir geşe dike û berfireh dibe. (Nivîskarên Firansî bi taybetî rewşenbîrên serdema şoreşa sala 1789’an de, çemkên han bona geşekirina eql (Mejî) û jîriyê bi kar anîne kultur weke nîşan û hêmaya hizra nû ya hevdem li dijî derebegatiyê bikar dihat) (Mihemed Şuwani, 2016: 160).

Piştî wê ku têgeha kultur li Firansayê de rehendek berfirehtir wergirt û çî din ji bo çandiyê bikar nehat, belkî weke şoreşek hizrî ji vebûna eql û mejî ve bo vegeşîna bîr û hizrên mirov bikar hat û ji niha de, kultur bi wataya rewşenbîrî û şaristaniyê bikar tînin.

Ji wê dema ku kultur li ser bingeha pênasêya Firansî (bi wateya perwerdekirina roh û cism) hatiye bikaranîn, hêdî hêdî derbasî nav zimanê Almanî bûye û hin guhertin jî bi ser de hatine, û weke pêşveçûna hizrî, civakî a mirov û civak û mirovahiyê hatiye hesabandin.

Piştî Firensiyî, çemk û têgeha kultur gihaye bal zanayên Almanî ku bi armanca geşekirina bîr û hizran bikar anîn. ‘‘Adlong’’ û ‘‘Hêrdêr’’ li Almaniyayê de pêşengê bikarbirina çemka kulturê li cihê edet û kevneşopiyê bûn.

Serhildan yan avabûna her çemk û têgehek wusa, weke kulturê ku reh û rîşalek dîrokî heye yan çîrokek taybet bi xwe heye, bêguman dema rûdan û çêbûna wê, asayî nebûye ku ew qonaxên dîrokî bihorandibin.

Li rastî de çemk û peyva kulturê, heya dawîya sedsala 19’în, di edebiyat û hizrê de derneket. Li Firansayê û li doza bi nav û deng a (Dirîfos)de, dema ku romannivîsê navdar (Emîl Zola) gotarek li jêr navê (Ene Etehom) ‘‘Ez pirotesto dikim’’ di sala 1898’an de nivîsî. Wî li vê nivîsa xwe de, berevanî ji efserek Firensî yê bi regez Cihû bi navê ‘‘Dirîfos’’ kir ku bi sîxorîkirinê hatibû tometbar kirin. Lê piştî bêtawan derçû. Piştî wê ku hezar kes ji bîrmend û mamostayên zanîngeh û nawendiyên, wajo jêre kom kirin. Wê demê, wate piştî (Komkirina wajoyên rewşenbîran) ew di edebiyatê de bi manîfesta (Daxuyaniya rewşenbîran) hat naskirin, êdî ji wir ve, çemka rewşenbîr bo cara yekemîn derket. Çemka kultur, weke ku îro di zanistên civakî de tê bikaranîn, têgehek nû ye û li sedsala 18’în de derbas nabe û çavkanî, û pêgeha serhildana wê jî, hizra hevçerx ya rojavayê ye. (Semîr Îbrahîm Hesên, 2011: 10).

Kuwusa e, em dikarin sedsala 18’an di wê mîdehê de bibînin ku ji Firansayê ve, wataya nû a kulturî pêk hatiye. Bi wê wateyê ku ji sala 1700 a zayînî ve, manaya kevn a wê nema ku berê di sedsala 13’în de derketibû ji (Culture a latînî ve hatibû, bi wateya kêlana zewiyan li sedsala 16’în de, çî din wê peyvê hilgirê kêlana zewiyan nedikir. Ew manaya mecazî jî heya naverasta sedsala 16’în bi awayek berfireh bikar nehat û heya dawîya sedsala 17’în neçûye nav kayeyên akademîkî. Ji kêlana zewiyê ve bo kêlana hizrî, kuwusa e li sedsala 18’în de, wateya mecazî a kulturî ya xwe seband. (Nadiye Umer Kakesor, 2012: 6).

Bi giştî, kultur diyardeyek civakî ye. Her çiqas ku li destpêkê de kultur bi wateya amadekirina xakê ji çandiniyê re bikar hatiye, lê çemka kulturê, bi çemkên bingehîn ên zanista civakî tê danîn û bi awayek taybet di biyava entropolojîyayê de bikar tê. Kultur bi tenê komek xirvebûyî ji edet, tîtal û şêwazên cuda nine, belkî sistemek rêxistî ya reftaran e, yan metodek giştî ya jiyana gurûpek yan çend gurûpan e ku ji xelkê, regezên kulturî, mijarên weke şêwazên meirîfe, huner, dab û nerît, bîr û bawerî, buha û bîr û hizrên hevbeş e. Wate, hemû ew tişt in ku mirov di jiyana xwe de berhem tîne.

Wate, kultur pêk tê ji sistemek ji bîr û bawerî, nirx û buha, edet, nerît û reftarên ku endamên her civatgehekê cîbecî dikin û sedema xweguncandinê ye bi jîngeha derdorê û bi sebeba hînbûnê ji nevî û nîşekê ve bo nevî û nîşên din tê veguhastin. Herweha kultur, wate şêwaza jiyânê. Her neteweyekê metodek xasmanî a jiyana xwe heye ku cuda ye ji metodên jiyana neteweyên din. Kultur hertim netewî ye û nîşane û sermîyanek girîng ya netewî ye.

1.4. Têkiliyên navbera kultur û wêjeyê

Peywendiya navbera kultur û edebiyatê, têkiliyek bihêz e û her du jî sûtê digehînin hevdu. Serbarê wê jî, pêwendiya han, koka deqên edebî dadirêje, û em dikarin bibêjin ku tu deqek edebî, bêy hebûna kulturek diyarîkirî tune. Bi vê wateyê ku mirov di serdemên zû de ku peyvên cuwan û nihêrîna ciwannasî li hember jiyana, surûşt û mirov bi xwe hebû, hawara xwe bo kulturek diyarîkirî biriye, bona wê ku li deqek ciwanînasane de, temsîla wan bîr û hizran bike ku di mejiyê wî de bûne. Lewre hemî deqên edebî li hundurê xwe de hilgirê tovê kulturek diyarîkirî ye. Eva jî me digehîne vê baweriyê ku wêje û kultur, du rûyê yek diraw in û cemikek jihev neveqetyayî ne.

Matiryala sereke ya wêje, helbestvan, romannivîs û nivîskaran, kultura civaka wan û ji wir ve jî, civaka mirovahiyê ye. Ji ber ku helbestvan, romannivîs û nivîskar takên civaka xwe, wate civaka mirovahiyê ne, ku ew civatgeh bi xwe jî, xwedî kulturek diyarîkirî û destnîşankirî ya xasmanî ye. Lewre ev kulture jî, desthilatek pir alî li ser jiyana, hizrîna û guzerana şair û nivîskaran heye. Dema ku berhemek edebî jî diafirîne, bi

terzek ji terzan, regez û edgarên wê kultura ku têde dijît, vediguhêze bo nav peyv û hevokên deq (nivîs)ê û durûna bîr û hizr û bûyerên deqê dikin.

Ramana jorîn, me digehîne vê encamê ku, wêjeyê pêwendiyek kûr û berfireh bi civakê re heye. Lewre dema ku basa têkiliya navbera wêje û kulturê dikin, dibe ku vegerin bo ew wêneya mezin ya pêwendiyê, ku ew jî têkiliya navbera wêje û civakê ye û li vê çarçoveyê de jî, îşare bi pêgeha kultur li nav wêje û rengvedana wêjeyê di kulturê de bikin.

Xuya ye ku pêwendiya navbera wêje û civakê jî, têkiliyek dêrîn e, helbet tevlihev û aloz e jî. Ji kevnar ve, dema ku mirov jiyanek sade dest pêkiriye, cehd kiriye ku ji nepeniyên hebûna xwe, gerdûn û jiyanê tê bigihîje. Lewre xebatên xwe bi nirxandina mijarên derdora xwe daye destpêkirin. Ew destpêkirine, dikare weke çalakiyek edebî û hunerî were hesabandin. Çûnkî jiyana rojane a xwe ku pêkhatiyê ji nêçîr û vedîtina xorakê, weke wêne û vegêranan li ser dîwarê şikewtan kulandin e. ((Nemaze li qonaxa herî destpêkîn a jiyana mirovahiyê de, tekoşîn kiriye ku ji riya hunerê ve ji rastiyan tê bigihîje. Ji ber ku hewildan bona têgihîştina ji realîteyê, pêngava yekemîn e bona kuntirolkirinê)) (Mecîd Mehmûd, 2008: 5).

Helbet eva jî destpêkek girîng ji pêwendiya navbera wêje û civakê dest pêdike. Bi vê watayê ku mirov kariye di wê destpêkê de, kulturek taybet bi xwe re ava bike û wê kulturê jî bike bi nasnameyek, ku ji riya wêjeyê ve temsîla xwe bike. Xuya ye ku ew terze ji çalakiyên edebî û hunerî ye ku bûye sedema nasandina kultura wê serdemê û ji wê riyê ve jî, niha pile û asta şaristaniyetê tê destnîşankirin.

Yek ji rastiyan wêjeyê bi hemû form û janrên xwe, eva ye ku rengvedana pêşketina berdewam a jiyana û civakê ye. Ji ber ku jiyana mirov û hizr û serdema wê, hertim li piroseyek guherînkariyê de ye û ji serdemekê ve bo serdemek din, û li gor cudahiyan rewşenbîrî, bûyer û jîngeha derdorê ve, ciyawazî û pirrengiyê bi xwe re dibînin. Herweha çiqas wêje rengvedana hez û xwasta tak be û her çiqas soz û wijdana xwe di astek bilind de nîşan bide, ku ezmûnek pak a jiyana nivîskar bi xwe be, eva tucar nikare îzole û goşegîr bibe û dûrî jiyanê bisekine, û ji buhayên serdema xwe veqete. (Mihemed Zekî Elişmawî, 2009: 3).

Bi vê çendê jî, wêje di pêwendî tevî civakê de ji riya kar û çalakiyên wêjeyî ve dikare pişkdariyek ektîv li guherînkariyan de bike û arasteya bizava pêşdeçûn û pêşketinê bigre dest xwe. ((Peywendiya navbera wêje û civakê, têkiliyek lêkalayî ye û her yek ji wan, bandor û karîgeriyê li ser ya din dike. Tesîrkirina han li navbera wan de jî, wusa kiriye ku ji hêlekê ve, wêje rengvedana alî û biyavên civakê be û ji hêla din ve jî, civak yasa û rêsa û binemayên xwe li ser çalakiyên edebî de bisepîne.

Ew karîgerî û kartêkeriya navbera wêje û civatgehê li du arasteyan de xwe derdixe holê. Ji aliyekê ve berhemek bi komî tîne rojevê ku temsîla armancên civakê dike. Ji aliyê din ve jî, ji ber wê ku wêje hevsengî û balansê di navbera xeyal û realîteyê de diafirîne, lewre di berhemana deqê de, têkilî diçe çarçoveya têkiliyên tak bi civakê re)) (Ebdula Rehman, 2020: 14 – 15).

Kuwusan e têkiliya wêjeyê bi sîstema civakî re, zêdebarê wê ku pêwendiyek dêrîn e, li heman demê de, têkiliyek piralî û pir rehendî ye, çûnkî ji hêlekê ve girêdayî ye bi aliyê edebî ku nivîskar, çî wek takek asayî û çî jî weke dahênerekê li jêr tesîr û karîgeriya jîngeha civakî de, berhemên edebî ên xwe arasteyî xwendevan û wergirên civaka xwe dike, û hewil dide ji riya karîgerî û kartêkirinê ve, pişkdariyê di sîstema civakî û guhertin û pêşketinê wê de bike. Ji aliyek din ve, peywest dibe bi civaknasiyê, weke zanistekê ku pêşketinek berbiçav bi xwe re dîtiye û hemû aliyên jîyanê vegirtiye, û di lêkolînê xwe de hewil daye ku çareseriyek jêhatî ji pirsgirêk û giriftên civakê re bibîne.

Ya ku li vir de girîng e ((ew pevçûn hevaliyana navbera wêjeyê ku nikare pêk were, ger civak berhem nehîne, civaknasî ku vekolînê ji pêkhate û armancên civakî di wêjeyê de dike. Bi wateya wê ku lêkolînê ji wan trajîdî û cinayetên dike ku civakê di wêjeyê de bi cî hiştine, nemaze wê jî derbas dike û lêkolînê ji nîşaneyên civakî jî dike û li gor ew nihêrîna ku deqa edebî hilgirê wê ye, mana û watayên wê diyarî dike)) (D. Rûdan Esmer Merî: 61).

Eva jî tê wê wateyê ku, sîstemên civakî û di nava wan de jî, kultur di nava civakan bi xwe de çê dibin û dibine sebebek bona cudabûna civakê ji hemû civakên din û maka taybet bi xwe hildigrin. Bi vê çendê jî, kulturek diyarîkirî dibe bingeh bona

jidayîkbûna deqa edebî û tan û poya nav deqa edebî de dikin. Li heman demê de jî, wêje bi xwe dibe hilgirê wê kulturê û hûrdekarî û taybetmendiyên li nav deqê de cî dike û li nav hemû deqên berhemhatî ên wêjeya cîhanî de tê naskirin. Bi vî rengî jî, têkiliya civakê bi wêjeyê re, pêwendiyek bihêz û rasterast e, bi awayekê ku em dikarin bibêjin, tu wêjeyek bêy hebûna civakê nahê, û tu civakek jî bi bê wêjeyê, nabe.

Xuya ye ku kultura civatgehê di rewşek taybet û rawestayî de namîne. Bi derbasbûna demê û guhertina rewşa civakî, siyasî, aborî û ...htd, ew jî weke her aliyek dinê yê civatê guhertin bi ser de tê. Û renga ew kultura ku di serdema îro de heye, li serdemek din de nemîne. Kuwusan bû, kultur ji serdemekê ve bo serdemek din û ji civakekê ve bo civakek din, diguhere. Bi heman awayî, wêje jî girêdayî van guherînkariyan e ku bi ser civakê re tîn û ew jî li gorî guhertina rewş û zurûfan diguhere. Xala girîng li vir de, ew e ku helbestvan, romannivîs û nivîskar di her rewş û zurûfekê de bikarin hûrdekariyên vê kulturê şirove, tomar û parêzvaniyê jê bikin heya ku bo nifş û neviyên pêşerojê veguhêzin. Bi vî rengî, wêje di arşîvkirina kulturê û parastina wê kulturê de jî rola xwe dilîze ((Lewre ger em pêwendiya wêjeyê bi kulturê re zelal bikin, tê dîtîn ku kulturê pêwendiyek rasterast bi wêjeyê re heye. jiberku tu gel û netewek, ser dinê nine ku xwedî xizîneyek kulturî û mîratek taybet bi xwe nebe. Bêguman kultura han, bûye bi hêvênê pîvanên pêşketinê û nîşandana metoda jiyana wê netewê û herweha asta pêşketina aliyên kulturî û jiyariyê ve)) (Keyfî Ehmed Ebdulqadir û yên dinê, 2018: 127).

Van sedeman, wusa kiriye ku samana kulturî ya netewî parêzgarî jê bihê kirin û ji neman û jinavçûnê werin rizgarkirin. Ji ber wê ye ku têkiliya kulturî ya wêjeyê, pêwendiyek jihev neveqetiyayî ye û bi bê hevdu, nikarin bijîn ((Têkiliya wêje û kulturê, têkiliyek tevalî û bihevre girêdayî ye, cemikek in ku cudakirina wan zehmet û dijwar e. Çûnkî em dikarin vê têkiliyê, weke têkiliya beş û kom (Elkul û ElCuzw) bibînin.

Kultur rûberek pir berfirehtir ji wêjeyê dagîr dike û her du jî, li bin sîvana civak û karîgeriyên civakê, rûbera wan, biçûk û mezin dibe)) (Ebdula Silêman Meşxel, 2013: 8).

Ji vê dîtingehê ve, edebiyat cehdê dide ku kulturê tomar bike û beşek girîng ji jiyana rojane ya civatgehê biparêze. Her eva jî bûye sedem ku wêjeya nivîskî serî hilbide. Ger em hinekê paşde vegerin, dibînin ku wêje bi awayê zarekî bûye û ji zar ve hatiye veguhastin, ew wêje jî, bi edeba folkilorî û millî tê naskirin. Xuya ye ku girêdayî jiyana rojane ya xelkê bûye, bi awayekê ku, ger em edeba millî û folkilorî ya her neteweyekê werbigrin, dibînin ku hemû helbest, stran, çîrok, dastan û efsaneyên wan girêdayî bi jiyana rojane ne ku têde bas ji tex û qatên civakê, hejar, dewlemend, axa, mîr, beg û ... hatiye kirin û li çarçoveya wê wêjeyê de, kultura civakê bi hûrî hatiye tomarkirin, û bona parastina wêjeyê, hiştin û gihandina wê bi nifş û neviyên pêşerojê, hewce kiriye ku bê nivîsandin heya ku ji metirsiya jibîrkirinê bê rizgarkirin, her ji ber wê ye ku wêjeya nivîskî, derket rojevê.

Ger ji dîtingeha janrên edebî ve mêzeyî vê mijarê bikin, xuya dibe ku helbest weke yekem janra herî kevn a edebî, berketinek bihêz bi kulturê re hebûye. Helbestvanan weke kesên bîrmend, rewşenbîr, êlît û bijardeyên civakê, berdewam deqên şêî'rî ên xwe bona çareserkirina pirsgirêk û arîşeyan û şiyarkirina takên civakê bikar anîne. Helbet di vê yekê de jî, kultura neteweya xwe bi piştevan û strokçera sereke ya deqên xwe danîne. Lewre helbestvan bi piştgirêdan bi kultura civaka xwe, karîne beşek berbiçav ji kultura civakê tomar bikin û rexneyê ji kultura kevn bigrin û norm û kulturek nû ava bikin û takên civakê ber bi kulturek nû ve bibin. Lewre kultur û çand li helbestên şairan de weke zaf ji lêkoler, rewşenbîr û kulturnasan, reng vedaye û li ser axivîne û hesta xwe pê anîne ziman. Helbestavanê mezin ê fars li dêre helbestekê de weha li ser ferhengê dibêje:

Goher bî huner zar est û sust

Bi ferheng başî huner tendurust

Watayê helbestê: Zêr û zîw bi bê huner, jarî û lawazî ye, çûnkî li bin siya ferheng (kultur)ê de, hunera silamet û tendurust ji dayîk dibe. (Daryûş Aşûrî, 2013: 28).

Serbarê wê ku helbest weke janreke girîng û dewlemend li tore û wêjeya cîhanê de xuya ye, lê ji ber sînordarbûna rûbera wê û kurtbûna hevok û peyvan û tejîbûna

wateya wan, ew derfet û fersenda hewce ji helbestvanan re neafiriye heya ku bi azadane, taybetmendiyên kultura civaka xwe şirove bikin û rexneyê jê bigrin. Bi vê wateyê ku, helbestvan destvekirî ninin li nav deqa xwe de fukûsê bixine ser pirsgirêk û arîşeyên kultura civaka xwe, û ya ku bas dike li çarçoveya parçe helbestekê de, weke amaje hiş û hizra xwendevanan ber bi aliyê diyardeyek ji diyardeyên kulturê ve dibe. Vêca ew diyarde çî erênî be yan nerênî.

Tevî wê jî, ew karê helbestvan, buha, pûte û pêgehek mezin di parastin û tomarkirina kultur û rexnegirtin ji aliyên nerênî de heye, lê neşiyên di ravekirin û şirovekirina hemû aliyên vê diyardeyê, dibe sedem ku kar ji bo vê yekê bê kirin heya ku kultur bi awayek berfirehtir ji deqê bikeve ber lêkolînan, eva jî pitir di vegêranê de xwe dibîne.

Vegêran weke zanistek serdem, ku reh û bingehêk dêrîn li dîroka mirovahiyê de heye, karîgerî û bandorek mezin li ser rewşa jiyanê çêkiriye. Yek ji wan janrên ku bingeha sereke û cewherî ya vegêrandinê pêk tîne, roman e. Roman ji ber ew rûbera berfireh û ew çîroka ku têkiliyek rasterast bi jiyanê ve heye, pitir guncaw û berhev e bona baskirin û ravekirina kulturê ((Roman jî weke metodek girîng ji wêjeyê, ji vê diyardeyê bêpar nine û pişkek mezin ber dikeve. Wate rengvedana kultura netewî di nav bûyer û tixmên din ên Romanê de, pişkek mezin ber dikeve. Ne her eva, belkî curek taybet û xweser a romanê heye ku jêre tê gotin “Romana Dîrokî”, ku pitir xwe ji bûyerên dîrokî ên mirovahiyê dide û weke beşeke kultura mirovahiyê pêre tevdigere û tomar dike)) (Keyfî Ehmed Ebdulqadir û yên din, 2008, R 127).

Helbet ev şewaze ji romanê ku bûyerên dîrokî ên mezin tomar dikin, beşek girîng ya kultura gelan jî dinivîsin û tomar dikin, û bi nifş û neviyên nû digehînin. Eva jî li cihê xwe de dibe sedema wê ku, ders û peyamên mezin jê bidest bixin û jiyana pêşeroja xwe pê ronahî bikin. Bi vî awayî jî hûrdekariyên jiyana xelkê ji riya baskirina karakterên nav roman û bûyeran tên rojevê. Eva jî li cihê xwe de beşek girîng ji kulturê pêk tîne. Ji riya wê metod ji romanê jî ku bûyerên dîrokî li serdemên kevnar de vedigêrin, em nasiyarê şewaza jiyana, hizrîn û kelûpelên wê serdemê dibin, ku sûd û mifaha wê jî, tenê ji edeb û mirovahiyê re ninin, belkî sûd ji dîrokê re jî hene. Çûnkî

((xincî wê ku roman dikare bi sedema wan hûrdekariyên ku li vegêrandina çîrok û biserhatên taybet û veşartî de radixe berçavan, ew valahî û şeqarên ku dîrokê bi cih hiştine, teji bike. Herweha dikare û şiyana wê heye ku bibe bi jêder yan çavkaniyek baş û bisûd bona têgihîştin û vekolîn ji hin edet û nerît û taybetmendiyan takekesan û di encam de jî, civak û neteweyê)) (Mîran Celal Mihemed, 2009: 55).

Girîngiya Romanê wek janrek edebî ku kêrhatî û libartir be, di rengvedana kultur û baskirina beş û pêkhateyên wê de, pitir vedigere ser surûsta romanê bi xwe. Ji ber ku roman ji komek tixm û teknîkan pêk hatiye ku alîkarek girîng dibin di guhertina deqa romanê bi deqek kulturî. Eşkere ye ku roman ji komek tixm û regezên weke (Dem, Cih, Karakter, Bûyer) pêk hatiye. Ew tixm û teknîk jî, rêxweşker dibin ku kultur bi hêsanî li hemû pêkhateya romanê de cihê xwe veke û destê nivîskar jî vekirî dikin ji reftarek jêhatî û kêrhatî bi kulturê re bike û li nav deqa xwe de binirxîne.

Romannivîs dema ku bûyereke siyasî yan civakî yan ayînî werdigere, li cihê xwe de beşek girîng a kultura neteweya xwe dixê ber bas û lêkolînan. Jiberku, ew cure bûyer, li derweyî kultura civakê ninin û li dawiyê de, bûyerên nav romanê, rengvedana wê kultura taybetî û diyarîkirî ne ku li jîngeha romannivîs de hene. Çûnkî romannivîs, takek ji takên civakê ye û tesîr û kartêkirin li ser de dibe û li nav kûrahiya kultura civaka xwe de hatiye. Lewre haydar be yan na, rasterast be yan nerasterast, temsîl û guzarîst ji wê kulturê dike ku jîngeh û sîstema siyasî û civakî ya wê pêk tînin. Jiberku romannivîs ((çûnkî endamê civakê ye û wek rewşenbîr ji riya helwest û bîr û baweriyên xwe li hember pirsgerêk, arîşe, edet û tîtalên ku ji riya berhemên edebî ve tîne ziman, tesîr û bandor di pêvajoya guhertinên civakî de heye)) (Ebdula Rehman, 2020: 19).

Lewre romannivîs ji riya bûyerên nav romanê de, kultura civaka xwe jî tîne rojevê. Helbet bûyer jî, bi bêy hebûna demek diyarîkirî, tu manayek nîne. Lewre dem (zeman) jî karîgerî li ser destnîşankirina kulturê û bikaranîna şewazên kulturî di romanê de heye. Dem li rewşek cihgir û asayî de nîne û hertim li hereketê de ye û pêngavan ber bi paş û pêşiya xwe davêje. Lewre ew dem ((Demek rêjeyî ye ku çawaniya vegêrandina bûyeran û tevgerên kesî li derbasbûyî, niha û pêşerojê de li gorî şewazên vegêrandina tekstê rêk dixê û bi şeweyek herî guncaw, temsîla warê aborî, civakî, derûnî û hizrî a

wan di helwestên cuda de dike û felsefeya jiyana wan ji destpêkê ve heya dawiya bûyeran, nîşan dide)) (Necm Xalid Elwenî, 2004: 54).

Vir de, dem peywest dibe bi kulturê ve. Çûnkî her bûyereke li demek diyarîkirî de rû dide û her dem û serdemek diyarîkirî jî, kulturek taybet bi xwe heye ku renga li demek din de, ew kulture guhertin bi ser de hatibe yan her nemabe. Bo mînak, romanên dîrokî li warê (Demê) di serdemên kevnar de qewimîne û li warê kulturî ve cudahiyeke zêde bi dema nivîsîna romanê re hene û bi sedema wê jî, beşek mezin ji hûrdekariyên kulturê eyan dibin.

Bi heman awayê Demê, Cih jî rola xwe heye li vegêrandina deqê û me tu bûyereke romanê nine ku cihek diyarîkirî nebe. Jiberku Cih ((xwedî nasname, hilgîrê delalet û desthilat, sîstem, seqa, rehend û surûştê xwe ye)) (Sebah Îsmâil, 2009: 24).

Kuwusa bû her cihekê kulturek taybet û resen a xwe heye û romannivîs dema ku mifahê ji cihekê werdigre û dike bi qada romana xwe, eva parek zaf ji kultura wî cihî jî derbasî nav deqê dibin û çarçoveya wê pêk tînin. Xwendevan jî bi hêsanî nasyariyê bi kultura wî cihî peyda dikin û dibe bi sedema tomarîkirin û parêzgarîkirin ji wê kulturê ku li ‘‘Cih’’de hebûne. Li heman demê de jî edgarên wî cihî, dibin bi beşek ji pêkanîna binyata romanê û bi vî awayî jî romannivîs bi sîdwergirtin ji teknîka wesfê, basa pêkhatiya wî cihî, şûnwar û şewazên xanî û rê û piran, seqam û park û cihên giştî û taybetî ên din dike, û ji jinavçûnê, rizgar dike. Helbet her neteweyekê kulturek diyarîkirî û taybet di awayê çêkirina xanî, rê û seqam û ...htd heye û bi vî awayî jî roman dibe bi ew rûber ku, hemû hûrdekariyên wê kulturê tomar dike. Eva jî bi taybetî li wan romanên de tê dîtin ku li ser bajarekê, gundek yan deverê diyarîkirî de hatine nivîsîn û hemû pêkhatiya ‘‘cih’’an, ji riya wesf û pesnê ve ketine ber bas.

Yek ji wan tixmên ku romannivîs weke beşek kulturî reftarê pêre dike, karakter e ku ew jî, ((bi hemû ew taybetmendî û sîfatan tê gotin ku nîşanderê reftar û hêlûkewtên kesekê ne)) (Birûs Kuhîn, 2010: 81).

Ew reftarên karakter jî, rasterast pêwendî bi edet û nerî û perwerdehiya civakê ve heye. Helbet reftarên karakteran jî li gor dem û cih tînin guherîn û wek xwe namînin.

Bo mînak, ger ku karakterek li gund be, reftar û dab û nerîtên wî/ê pir ciyawaz in ji karakterekê ku li serdema niha de be. Bi vî awayî romannivîs ji riya teknîka wesf û pesnê ve, bas ji şewaza qisekirin, kinc, reng û şiklê karakter dike û reftarên wî dixê ber neştergeriya qelema xwe, û rexneyê ji reftarên nerênî digre û hewil dide ku hişyariyekê li vê derheqê de biafirîne.

Bi vî rengî, em dibînin ku romanê rûberek berfireh bo baskirina kultura civakê heye û ji riya wê jî, roman weke nasnameyek bo kultura neteweyê tê destnîşan kirin. Bi vê çendê, em digihîjin vê baweriyê ku roman, peywest e bi kulturê re, û tu romanek li cîhanê de nine ku xwedî kulturek taybet û diyarîkirî nebe. Ji ber wan sedeman jî, roman dibe bi ew janra ku karîgerî û kartêkirinek mezin li ser kulturê heye û ji wê riyê ve jî, hişyariyek giştî bona berbirûbûna bi dab û nerîtên kirêt û genî durust dike û têdikoşe ku takên civakê bi kulturek nûxwaz û pêşketî re perwerde bike. Kuwusan e, roman bi yek ji wan pîvanan tê danîn ku kulturê ber bi pêşde dibe û hertim nû dike.

Bi watayekî din, roman dibe bi ew alava ku cardin kultur têde tê çêkirin. Ji aliyekê ve kulturên erênî diparêze û ji nifş û newiyek din re vediguhêze, ji aliyê din ve jî, dibe bi sedema berbirûbûna bi kulturên xirab û cehda jinavbirina wan dide.

Bi vî awayî jî, roman gotarekê berhem tîne ku li ser bingeha kulturî hatiye avakirin û derfetê diafirîne heya ku ji wê riyê ve, nasnameyek diyarîkirî ji romanê re çê bike)) (Gotara Romanê dikare weke alav yan keresteyek bawerpêkirî be bona lêkolîn ji aliyên cuda yên jiyana takekesî û civakî ên civakek diyarîkirî li serdemek diyarîkirî de)) (D. Haşim Ehmedzade, 2009: 23).

Bi vî awayî, roman jî dikare weke alavek taybet bi lêkolîn ji biyavên kulturî û civatgehî bê wergirtin û cihê baweriyê be. Çûnkî zaf caran, bona xwendina dîrok û civaknasiya civakekê, ya ku li romanekê de bi dest dikeve, renga li wê lêkolîna taybet li wê derheqê de bidest nekeve. Jiberwê ku romannivîs bi awayek rastgoyane, kultura netewe û civaka xwe pir bi hûrî bi hemû aliyên erênî û nerênî ve nîşan didin, bêtir wê ku ji tu tiştî bitirse. Her eva ye ku derfetê ji vekoler û lêkolînvanan re diafirîne ku pişt bi edeb û bi taybetî jî, janra romanê girê bidin bona gihîştin bi van encamên ku xwaziyarê wê ne.

Bi vî rengî, eyan dibe ku têkiliya wêje û kulturê, peywendiyek çiqas bihêz e û her du jî karîgerî û kartêkeriyê li ser hevdu dikin û her yek ji wan, ya din tewaw dike û sûdê digehînin hevdu. ((Karîgerî û bandora kultur û wêjeyê bi ser hevdu re xuya ye, wêje parek e ji kulturê û eva kultur e ku araseteya wêjeyê diyarî dike. Li heman demê de jî, wêje kar li ser şikandin û parçe parçekirina cismê kulturê dike)) (Ebdula Silêman Meşxel, 2013 :8). Lewre em dikarin bibêjin ku têkiliya han, bi pêwendiyek dualî ya navbera wêje û kulturê hejmar bikin, bi awayekê ku wêje û kultur, du rûyê yek dirawî bin.



2. Kultura Kurdî û Pêwendiya Wê Bi Wêjeya Kurdî Re

2.1. Taybetmendî û sîmaya kultura kurdî

Gelê Kurd jî weke her neteweyeke ser dinê, xwedî kulturek taybet bi xwe ye. Ev kulture, li jîngeh û jiyana civakî ya civata kurdî de derketiye û ji wir ve li nav tak, kom û malbatên Kurdistanê de belav bûye. Ew kultura ku berhem hatiye, reng û rûçikê mirovê kurd ji xwe girtiye. Yê ku ji riya kultura xwe ve tîn nasîn û bi sedema hilkevta erdnîgarî a xwe, taybetmendiyê diyarîkirî ya xwe wergirtiye û ji kultûra neteweyên din cuda kiriye.

Her civakek ji riya kultura taybet bi xwe tê nasîn. Civaka kurdî jî xwedî kulturek taybet û diyarîkirî a xwe ye û ji vê riyê ve, nasnameyek cuda ji netewên din ji xwe re ava kiriye.

Kultura kurdî, berhema hebûna civaka kurdî ye. Bi vê watayê ku li destpêkê de gurûpek ji mirovan ku xwe bi kurd zanîne û civakek diyarîkirî li ser xak û nîştimanekê ava kirine ku bi civaka kurdî tê naskirin. Wê civakê jî, kulturek taybet li hemû biyavên karkirin, xwarin, nêçîr, biserhat, çîrok, cil û berg û ...htd berhem anîne. Kultura han bûye sedem ku xak, nîştiman û takê kurd pê bihê naskirin û reng û rûçikê taybet bi xwe hilbigre û li hemû kultura neteweyên din, nîşaneyekê ji xwe re ava bike û nasnameyek taybet biafirîne û bê naskirin.

Helbet kultura kurdî, ji zaf çiq û hûrgiliyên diyarîkirî pêk hatiye û ketiye jêr bandor û kartêkeriya zaf tiştan, ji wan: Cuxrafîya yan xak, av û hewa, ziman, karkirin, kinc û ...htd. Bi awayek giştî em dikarin du cur ji wan ciyawaziyên berçav di nav kultura kurdî de destnîşan bikin ku bi sedema hilkevta cih, erdnîgarî, edet û nerît ve ji hevdu cuda ne ku ew jî, gundnişînî û şarnişînî ne. Xuya ye ku ev du cure jî, kulturek taybet bi xwe li çarçoveya kultura giştî ya neteweyê de pêk tînin û ger li yek yan du xalan de hevpar bin, lê li zaf xal û biyavên din de ji hev cuda ne. Ciyawaziya han jî, mak bi ser aliyê derûnî, civakî û siyasî ya civaka kurdî de hebûye. Li vir de, emê bi hûrî sîma û taybetmendiyan her yek ji wan du curan, destnîşan bikin.

2.2.Kultura Kurdî Li Gundan

Gund li gorî bajar, rûberek biçûk heye. Li curê karkirin û pîşeyê jî kêmtir e. Hejmara rûniştîyên wê jî li gorî bajar, kêmtir e. Piştî derketina çandinî û xwedîkirina ajel û malatan, êdî karê mirovan bi hevdu re zêdetir bû. Ji ber ku çandiniyê, hewcehî bi komelbûn û hevkarîyê heye, bi vî awayî, peywendiyên civakî hatin rojevê û ji derkevtin ji şikeftan û avabûna gundan dest pêkir. Bi vî awayî jî civatgeh û gundnişînî çêbûn.

Lewre em dikarin bibêjin ku gund pêk tê ji ((Kombûna hejmarek ji xelkê ku li herêmek cuxrafiyayî a diyarîkirî de dijîn, xwediyê jiyana û kulturek hevbeş in, herweha xwediyê awayek ji hevgirtinê ne ku dikarin bi metodek giştî û komî, li dû armancên xwe bikevin.

Civaka gundnişînî bi çalakiyên çandiniyê û herweha pêwendiya nizîk a xêzanî tê diyarkirin (tê cudakirin yan tê naskirin). Pêwendiyên navbera endamên vê civatê pir bihêz in û nimûneyên reftarî ên nerîtî bi Kûçîkr vê pêwendiyê de zal dibin. Metodên jiyana xelkê li civatgehek gundî de bi giştî nefermî ye û guherîna urf û edetan li vê civatgehê de bi kêmtir rû didin)).(Biros Kuhîn, 2010: 215).

Li pênaseyek din de, gund bi vî awayî tê nasîn ((Ji komek malan pêk tê ku, yekeyek xwecihî pêk tînin û navberek diyarîkirî ji gund cuda dikin. jiyana û bijîva wan ji çandinî û zewiyên derdora wan e, qebare û rûbera wan biçûk e, lewre rûniştîyên wê jî, pitir yekeyek aborî ne. Bi awayekê ku bo berhemana zewiyên xwe, hertim alîkariya hevdu dikin)). (Ebdulrezaq Mihemed Mistefa, 2012: 29). Wate hevkarî û bihêziya civakî li nav gund de, pir bandor û karîgerî li ser jiyana gund hebûye û bûye beşek ji kultûra gundan û nikarin xwe jê bidin alî, û li hin dem û haletan de, cihê yasa û rêsayê girtine. Hemû bihev re ruha hevkarîyê diparêzin û berevaniyê ji mafên giştî dikin.

Peywendiyên civakî li gundan de, bihêz û bihev re girêdayî ne; eva jî vedigere Kûçîkr cîgirbûna asta pêwendiyên endamên civaka gundî û piştgirêdan bi buha û normên xwecihî. Lewre têkiliyan, hevpeywendiyek bihêz û tewaw ya civakî hene. Bihêziya pêwendiyên jî dibe Sedema piştevaniyê bo binyata civakî ya civata gundî. Bingeha civakî kar li Kûçîkr diyarîkirina pêgehên civakî ên endamên vê civakê dike û

xortên xwe araste dike, û reftar û bizavên rojane rêk dixîne, herwek wê ku binyata civakî, maf û erkên takan li hemberî hevdu de diyarî dike. Bi vî awayî, erkê herî bingehîn ê civakî li civatgeha gundî de, pêk tê ji piştevanîkirina ji ruha hevahengî û civakî li navbera endamên wê û parastina hevsengî û cihgiriya pêwendiyên û dûrxistina regezên dijhevî û nakokî û dubendî li jiyana hevpare wan.

Ji ber bihêziya serdestiya binyatên civakî dikevîne pêş berjewendiyên takekesan û ew edet û nerîtên ku li civaka gundî de pêre girêdayî ne, berjewendiyên civakî dikevîne pêşiya berjewendiyên takeksan. Eva jî tê wateya wê ku endamên civaka gund, erkên xwe dixin pêşiya mafên xwe û sûd û berjewendiyên xwe naxin pêşiya berjewendiyên wê gurûpa ku girêdayî wê ne û pêre dijîn. Kûçikrbarê wê jî, ew cure gurûpane li xema jiyana hemû endamên xwe de ne û hewil didin ku mafên wan biparêzin û ji her terze zirar û ziyaneke, dûr bixin.

Zêderewî nine ger em bibêjin ku civatgeha gundî, rêz ji endamên xwe digre û dema ku berbirûyê metirsiyan dibin, parêzvanîyê ji wan dike û li dema hewce û lêqewmanê de, hevkariyên curbicur pêşkeşî wan dike. (D. Îhsan Mihemed Elhesen, 2012: 430 – 431).

Qonaxa xurtbûn û geşekirina jiyana civakî û gundnişîniyê li Kurdistanê de, dîrokek dêrîn û dûr û dirêj heye. Li gor vekolînên mirovnasî û arkiyolojî û ji bo vedîtina paşmayên mirovek destpêkî, nîzik bi yek milyon sal berî jidayîkbûna Hezretê Mesîh (silavên Xwedê li Kûçikr bin) peyda bûye. Bêguman deverên hênîk, bi pît û bereket, Kûçikqaya libar û çavkaniyên avî li Kûçikr rûyê erdî, yekem cihê akincîbûna mirovan bûne, weke navbera du rûbarên Dicle û Firat û dola Nîl û başûra Hind û Çîn û hin cihên din weke şikevtên Kurdistanê. Vedîtîyên arkiyolojî ên paşmayên mirovan, eyankerê vê rastîyê ne. Herweha bi akincîbûna mirovan, nêçîr bi dawî nehatiye, belkî li rex nêçîr û girtina ajelan de, çandinî jî kirine nek berevaj, herwekî wê ku li paşmayên gundê Çermû de derketine ku hestiyên çend cure ajelan weke Bizin, Mambiz, Çêlek, Ker, Kûçik û Beraz li nav paşmayan de ye, tevî wê ku Çermû li gor belgeyên şunwarnasî, yekem gundê çandiniyê di dîroka mirovahiyê de ye.

Li gundan de pir bi kêmi guhertin bi ser reftar û edetan de tê û kêmi dem hene ku şaristaniyet bikare bi tewahî bandor û karîgeriya xwe bi ser wan de bisepîne. Yek ji taybetmendiyên parvebûna rûniştîyan di Kurdistanê de bi giştî, jiyana gundî û zorbûna gundakincîtiyê bûye. Her li destpêka peydabûna çandinî û akincîbûna mirov li vê deverê de, ji ber zaf sedemên surûştî û çalakiyên aborî û siyasî û mirovî, ew gundane nekarîne mezin bibin û şeweya şarnişîniyê werbigrin. Her çend ku dûriya wan ji dagîkariyê, yek ji sedemên hermana ziman û edet û nerîtan, û bi giştî kultura kurdî bûye. Lê her ewa bi xwe jî, sedemek bûye di pêşneketina ziman, eqlê bajar, şaristanî, pênegihîştin û kamilnebûna kultura neteweyî yan berdewamiya curbicuriyê li şewaz û edet ciyawziyên civakê li Kurdistanê de. (D. Mihemed Şuwani, 2013: 183).

Kuwusan bû gundnişîni li Kurdistanê de ji ber dûriya ji jiyana rojane û mijûlbûna bi çandinî, ajeldarî, karê giran û zibare û çend sedemên din ên xizmatî û pabendbûna wan bi hinek edet û nerîtan ve, civaka taybet bi xwe hene û li warê edet û nerît û kulturê ve ji şarnişîniyê cuda ne. Em dikarin wan cudahiyan, li van xalên jêrîn de kurt bikin ku sîma û taybetmendiyên kultura kurdî li gundan de nîşan didin.

2.2.1. Karên Rojane

Gund, karek rojane ya dijwar û giran heye û endamên gund, dibe rojane karûbarên xwe raserî û cîbecî bikin. Li vê yekê de jî, pitir pişt bi xwe û alavên sade ku bi xwe çêkirine, girê didin û bi van alavên kêmi û hunera destê xwe, karên rojane ên xwe weke cotkarî, çandinî û ajeldariyê cîbecî dikin û nahêlin ku astengî li hember karê rojane ên wan de derkevin. Wate dibe hemû lêzanî û cehda xwe bidin şuxulandin, daku bikarin karên rojane ên xwe bi vî awayî ku dixwazin, encam bidin û ji karên xwe parve nemînin. Çûnkî piraniya karên wan, av û hewa û xak rola serekî têde dibînin. Lewre ger hin kar li dema xwe de nehên encamdayîn, renga zirarek zêde bikin. Bo nimûne; dibe li dema xwe de, pez û sewalan av bidin yan bibin bo çêrîngehan. Yan li dema xwe de cotkar, cotê xwe bikin, û baxevan jî berhema rezên xwe rakin û ..., Ji ber ku ew kar, sitûnên aboriya gundan pêk tînin û bandor û karîgeriyek mezin li jiyana malbat û takan de hene. Vêca ji ber wê, xelkê gund dibe pir bi hişyarî ve bi dem û zeman re tevbigerin û karê rojane ên xwe rêk bixin.

Helbet ew kar û xebatên gund ku li gor werz û demsalên salê guhertin bi ser de tî, ciyawaz in, û hin ji wan bi awayê zibare birêve diçin. Di wan karan de, jin û mêr bi hev re kar dikin. Bi vê wateyê ku, karkirina jin û mêran bi hev re asayî ye û ne eyb û şerm e. Herweha berevajî, jin cuda ji karê malê, mijûlê bêrîvaniyê dibin û Pez û malatan didoşin, yan bi hev jî xwe re kar û barên bax û bostan, rezdarî û xwedîkirina ajel û sewalan birêve dibin. Wate jin him karê malê dikin û him jî hevkarîya hev jî xwe di karên derwe de dikin.

Karê gundiyan li rojê de zêde ye û berdewam mijûl in, herweha şevan li hin demsalên salê de, li dîwnxane yan mala axa de kom dibin û xwe bi leyîz, heyran, lawik, çîrok û vegêrandina hekeytan re mijûl dikin. Bi vî awayî, tîtal û edet li gundan de neguher in û guherînkari, pir bi sistî û liserxwe dimeşin û kar jî piraniya deman, guhertinek wusa bi ser de nahê û her wekî xwe birêve diçin.

2.2.2. Şivanetî û Çandinî

Mêjdem e ku gelê kurd bi taybetî rûniştvanên gund, karê şivanetî û çandiniyê dikin û girîngî û pûteyê pê didin, û di jiyana û bijîva rojane ya xwe de sîd û mifahek zêde jê distînin, bi taybetî bi sedema mişetiy av û rûbar û bilind û nizmiya xaka wê. Herweha piştî pûtedayîna hikûmetê bi kerta av, zewî û lêdana bîrên zaf û çêkirina bendavên curbicur û komkirina ava çiya û rûbaran, eva jî li gor qonaxên jiyana xwe bingeha man û aboriyê bûye û hertim pêre hatiye û bûye beşek girîng ji jiyana rojane, aborî û nemaze civakî jî. Lewre berdewam piştî bi karê şivankarî û çandiniyê girêdaye.

Caran jiyana û qetandina xelkê gund, pîranî bi alav û kel û pelên xwemalî bû, tenê hinek şekir, ciluberg û çav dikişin, yê din hemû li gund û li malên wan de bidest diketin.

Ji aliyek din ve, berhemên ajeldariyê pir binirx in û çavkaniyek girîng ya hewcedariyên weke Goşt, Rûn û Penîr bûne. (Kemal Borkay, 2008, R 44). Her ji ber wê yekê ye ku nirx û buhaya ajelan li ba gundiyan zêde ye. Herweha ji bilî wan ajelên ku bo bijîva jiyana wan berhemdar in, li gundan pitir girîngî bi hin ajel û malatên din dane

ku di birêveçûna kar û barên rojane ên xwe de sûd jê standine. Em dikarin bibêjin bi sedema ezmûn û ceribînên xwe, lêzanî û şehrezayiyek baş têde peyda kirine.

Ew deverên ku bi çandiniyê re mijûl in, zaf û curbicur in. Hin ji wan pitir mijûlê rez û baxdariyê ne, hin jî bi bostan (bi awayê dêmî û avî) yan çandina Genim û Ceh. Bi vî awayî curbicurî pêre xuya ye. Her çiqas ku ava hewce ji avdaniyê re kêm e û şewaza çandiniyê pir paremayî ye, bi vî halî jî, çandinî cuda ji deşt û dolan, li beroj û quntara çiyayan de jî tê kirinê. (Kemal Borkay, 2008: 44).

Li encama karê çandinî û şivanetiya li gundan de, ji ber sadetiya alavên çandinî û xwedîkirina ajelan û kêmiya rûniştvanan, û xizmatî û cînaretî û komek edet û nerîtên xasmanî hene ku li bajar de nahên dîtin, weke zibare û hevkarîyên bi hevdu re û guherandina tiştan û hin ji listikên taybet ku piştî davîhatina karên xwe encam didin.

2.2.3. Nêçîrvanî

Nêçîrvanî, çalakiyek herî dêrîn ya mirovan e û hemû gelên cîhanê bi dirêjahiya qonaxên dîrokê, bona dabînkirina beşek ji hewcehiyên jiyana rojane ya xwe, encam didin. Desthilatdar û hakim jî bona derbaskirina demên xweş û weke şewazek ji spor yan rikeberiyê encam didan. Yek ji karên herî xuya û berçav ên xelkê gundên Kurdistanê, nêçîrvanî bûye. Bo vê armancê jî kêmal li gundan de hebûn ku alavên nêçîrê nebin û hin ji rûniştvanên gund, şehrezayiyek kêmwêne di hin ji metodên nêçîrê de peyda kiribûn û pê navdeng bûne. (P. D. Zurar Sidîq Tofîq, 2014: 297).

Li piraniya deman de, nêçîrvanî weke seyran, hez û xwast û werzişkirinê dihat dîtin û xelkê demên zêde ên xwe pê derbas dikirin û xweşî û tam jê didîtin. Demên nêçîrvaniyê jî, li gor cih, demsal û metoda nêçîrê bûn. Bi awayekê ku diviya her cure nêçîrek li dema xwe de were encamdayîn.

Nêçîrvanî mêjdem e ku li kurdewariyê de weke hêviyek werzişî yan curek ji behre û suwarçakiyê hatiye peyrewkirin. Nêçîrkirina ajelên kovî û balindeyan, beşek e ji kultor yan edetên kurdewarî ya berê di çarçoveya spor, hez û vîna xelkê de. Ji her kesê/î re nêçîrvan nedihat gotin. Hunera han ji kesên bivêr û çeleng re, şanaziyek mezin bû. (Nîzam Feysel, 2019:246).

Ji ber çiyayên bilind, deşta pan û berîn, rûbar, av û kaniyên zaf, gol û behr û hebûna çar demsalên salê, ajelên zaf û curbicur hebûn, û diviya terzek ji şehrezabûnê peyda bikin. Lewre curbicurî di cure û alavên nêçîrvaniyê de hebû. Wate ji kevnar ve, kurd nêçîrvaniyê weke hez û hêvî encam didin nek pîşe û bona bijîva jiyane. (Hadî Reşîd Elcawuşlî, 1970, R 104- 105). Bi giştî di nava xelkê de, nêçîrvanî edetek bav, berçav û cihê girîngîdanê bûye. Ji ber ku ji bav û kalan ve ew edet ji wan re maye û herweha bûye beşek ji jiyana wan ku nedikarîn dev jê berdin. Ewane tevde karek wusa kiribûn ku li hin deman de, hin ji ajal û balindeyan ewqas hatibûn nêçîrkin ku hinde nemabû ku ji nav biçin yan ji jinavçûnê nîzîk bibin.

2.2.4. Rêzgirtin

Edet û nerîtên rêzgirtinê li nav gundan de, urf û tîtalek kevn e û ji bav û kalan ve ji wan re maye û nikarin xwe jê bidin alî û herweha şanaziyê jî pê dikan. Urf û edetên rêzgirtinê li gundan de weke yasayê lê hatine, yan li hin deman de, cihê yasayê jî girtine. Malbat li gundan de zarokên xwe hîn dikan ku çawa rêz û rûmetê ji kesên bi temen yan dan'emr, cîran, xizm û kes, xelkê gund, mêvan û nemaze biyaniyan jî bigrin. Wate bûye bi urf û edet, û vê yekê jî hev kêşeyek afirandiye ku rêzgirtin li gund de bêberanber e, mezin rêz ji biçûk, biçûk jî rêz ji mezinan digrin û heta li hin deman de, ciwan bi bê beramber, alîkariya dan'emr û temendaran dikan. Herweha pir carî kalemêr û dan'emr, ciwanan rênimayî dikan û ew ji bi soz û dilovanî ve guhdariya wan dikan û ji gotina wan dernakevin. Bi heman awayî, li nav jinan de jî eynî tişt e û rêzek zêde ji hevdu re digrin. Herweha li gundan de rêzek zêde ji mamosta, mela, şêx, seyîd, axa û mêmraqûlên gund re tê girtin. Bi taybet, ger ji kesekê biqewime û hawara xwe ji wan re bibe, tevde bi hawarê re diçin û hevakriyê dikan û rêzê jê digrin.

Rêzgirtina ji mêvan di gundan de, yek ji taybetmendiyan herî berçav ên gundên kurdewarî ye ku pûte û girîngiyek zaf jêre tê dayîn. Xelkê gundan bi mêvanperwer hatine naskirin. Xelkek dilpak û dilvekirî ne. Hertim xelk bona mêvandariyê rû ji gundan dikan û kes bêhêvî nabe ji mêvandariya wan. Sifreya wan hertim vekirî û xemlandî ye, û bi xulkek geş ve pêşwaziya mêvanan dikan. Mêvan û mêvandarî li dema xwe de, girîngiyek taybet û zêde li gundan de hebû. Xelkê xizmetkirina mêvanan bi ser

û rûyekî geş ve, bi erk û hesaba mêraniya xwe dizanîn û li benda tu padaşt û diyariyek madî nebûn (Nîzam Feysel, 2019: 34- 35).

Ew rêzgirtin û mêvanperwerî, tenê bo xelkê navxwe nine, belkî bala wan kesan jî bo aliyê xwe kişandine ku bi her niyetekê ve seredana Kurdistanê kirine, yan pêre derbas bûne û bi çavên xwe ew rêzgirtina germ û gur dîtine. Hin ji nivîs û bernivîsên wan, amaje bi wê rêz û hurmeta zaf kirine ku ji wan hatiye girtin û pê heyrî mane. Rojhilatnasê îngilîzî “Rîç” di vekolînek xwe de basa wê dike ku çawa pêşwazî û mêvandariya wan hatiye kirin û parêzvanî jê kirine (Hadî Reşîd Elcawuşlî, 1970: 34).

Kuwusa bû di kultur û urf û edetên xelkê gund de, pir rêz û hurmet ji mêvan, xizm, mezin, eşîret, jin û hin edetan hatiye girtin û ji kevnar ve bûye cihê baldarî û basa xelkê gund û herweha bajar û xelkê din û nemaze welatên biyanî jî. Herçiqas ku renga hin ji wan edetan ji ber hin sedeman, li gundan de kêmbibin, lê hêj parêzvanî ji hinek edetan kirine û heya niha jî şanaziyê pê dikin.

2.2.5. Leyîz (Lîstik)

Leyîz şiyaneke xwerisk a zikmakî ye û li gel bingeh û binyatên pêkhatin û durustbûna gel ve hebûye. Her çiqas ku şiyana û hêza leyîstîne li mirovan di yek ast û qiyas de ye, lê di derbirîne de li gorî xak, baw û cih tê guherîn û perdeyek taybet bi xwe ava dike. Ji ber wê ku her neteweyek li gorî xak, yasaya giştî, ayîn û edetên civakê, lîstikên taybet bi xwe hene. Bi heman awayî her dever yan herêm li welatekê de cure leyîzên xwecihî ên taybet bi xwe hene, lewre netewe nine ku samana xomalî li vê derheqê de nebe (Heme Kerîm Remezan Hewramî, 1970: 5).

Çend teorî li dor leyîzan hene û her yek ji wan bi terzekê bas û rave kirine. Ji wan jî, teoriya vejena paşekewtê, yan teoriya vejena zêde. Li vê teoriyê de, lîstin deriyek e ji bo bikaranîna vê vejenê ku heye, lê di kar de bikar nehate.

Herweha teoriya hînkirinê. Xwediyê vê teoriyê, zanayek bayolojî ê Swîsrî ye bi navê (Karêl Giruz). Ew zana li wê baweriyê de ye ku, sûd û mifaha lîstikê, tiştêk biyolojî ya xwerisk e. Sedema herî girîng e ji bo amadekirin û elimandina rihliberên serketî ji bo pêşerojê û jiyaneke surûştî. Teoriya puxtaya dîrokî. Xwediyê vê teoriyê,

zanayê binav û deng ê Amerîkî (Sitanlî Hok) e, ew di vê baweriyê de ye ku lîstin, raz û niyazên puxteya dîroka mirovahiyê ye ji berbanga vejîyanê heya niha. Bona wê ku li hember surûştê de çalakane bisekine, hewcehî bi perwerdehî û piroveyê bûye. (Hewramî, 1970: 5,6,7).

Di nava kurdan de, girîngiyek zêde bi leyîzê hatiye dayîn û hin ji lîstikan weke kultur û urf û edetan lêhatine. Ew lîstikên ku di gundan de zêde tîn hezkirin û pêşbirkêyê li ser xelatan dikin, lîstika helatin (xardan) (Nîşananê) û hin ên din weke şetrenc, Dame û Gustîr (Mistîle) in. Ew jî li gor vê mirazê ye ku dixwazin û eşkere nine.

Ew kesê/a ku xelatê dibe, daxwza çî bike, jêre didin, weke Hespê ciwan yan tiştêk ku kêr dest bikeve. Pir carî girew li ser keçan tê kirin û kesê girewbir, xûşk yan keçê werdigre û mare dike, êdî poşmanî ji girewbirinê de nine. (Mela Mehmûd Bayezîdî, 2015: 67-68).

Herweha li gundan de zaf lîstikên din hene ku bi şevan li dîwanxanan de birêve diçin û civatên şevan di zistanê de pê germ dikin.

Lîstikên şevan pir cur in. Ew leyîz zaf xomalî û li navxwe de dihatin kirin, weke lîstika Gustîlanê, Dame, Fîncan, Balgî, Tawle û ew lîstikên ku ji kevnar ve di nav kurdan de hene. (Hadî Reşîd Elcawuşlî, 1970, R 107). Li gundan de gorî demsalên salê, guhertin bi ser leyîzan de dihat. Li Payîzan de heya befranbarê, ciwanên gundan çend leyîz dikirin, weke (Qaşoyane, Mastav xwarin, Cuxz, Kêlwêlanê, Kelayane, Berd germokanê, Merî zimzimî ... htd) (Mihemed Cemal Tûtmeşî, 2012: 24).

Li pirtûka kurdewarî (mamosta Eladîn Secadî) de bi dûr û dirêjî bas ji çendîn lîstikan kiriyê weke (Keşek, Cixzên, Ciltên, Gozîn, Fincanê, Qelemirdarî ...htd). Kuwusan e li gundên kurdewarî de, leyîzên zaf û curbicur hene û ji hemû tex û qatan re, lîstikên taybet hebûne. Wate lîstikên taybet bi keçan , yan xortan, yan zarokan. Lîstikên wusa jî hebûne ku giştî bûne û hemûyan têde beşdarî kirine. Bi vî awayî, leyîza wusa jî hebûye ku li gor surûştê wê tex û qatê hatiye diyarîkirin, yan li gorî şiyana cismî û ya takekesan bûye. Herweha zaf leyîzên din hebûne bo leşcuwanî û rêkçûnê, ku rikeberiyek pir tund jî di navbera lîstikvanan de hebûye.

2.2.6. Zibare

Yek ji kulturên herî diyar û xuya ên rûniştvanên gund, zibare ye. Ji ber wê ku li gundan de kar zor e û alav û keresteyên sade hene, bi tena serê xwe nikarin hemû karan li dema xwe de encam bidin. Lewre neçar dibin ku hin karan ku li derweyî şîyan û karîna xwedîkar in, bi alîkariya xelkê din bike. Ew hevkarîya xelkê gund ku navê wê zibare ye, bûye bi urf û edetek ku hemû kes têde pişikdar in û hin caran jî, dibe bi dor, û her carê ji malekê re ew zibare tê encam dayîn.

Zibare tê vê manayê ku, ew kesê xwedî kar e, daxwaza alîkariyê ji kesên gund dike û xelk jî bi alavên xwe re diçin alîkariyê û karê wî jêre dikin. Xwedîkar, xwarin û vexwarinê ji wan re amade dike û ew jî bi dilsojî ve kar jêre dikin. Eger kesek xizan û nedar be, yan jinebî (bîjin) be, xelk nan û çayê jî bi xwe re dibin û zaf caran, jin jî li van zibareyan de beşdar dibin. (Eladîn Secadî, 1974: 216, 2017).

Zibare karek belaş û xwerayî bû û hemû xelkê gund dikir û tu pereyek li hemberî wê hevkarîya de nebû weke Suwax, Xişt û Kerpûç birrîn û ... htd. (Nizam Feysel, 2019: 181).

Li gundan de çend cure Zibare hebûn, wate tenê li karekê de nedihat kurtkirin. Zaf carî li dema Zibareyê de, lawjegotin, govend û dîlan çê dibûn ku xweşî û şadî bi xwe re dianî. Bi xasmanî keç jî têde beşdar dibûn, ew yek dibû sedem ku coş û kelecana bikeve nav kar, yan jî dibûn çend kom û pêşbirkê çê dibûn. Ew, him bo xweşiyê bû û him jî, bona zû xilaskirina kar bû, lewre mandîbûn û şeqyatî ji bîr diçû. Herweha li karê zibareyê de, kur û keçan hevdu didîtin û zaf carî dildarî di navbera wan de ava dibû, û di wan karan de, har û dîn (şê û û şeyda)ê hevdu dibûn û ji ber dîlber û evîna xwe, hay ji mandîbûn û şeqyatiyê nediman û kar zû bi dawî dihat.

2.2.7. Axa û Dîwanxane

Axa û dîwanxanan li gundan de rolek berbiçav û bibandor hebûn. Lewre dema ku bas ji kultura gund yan taybetmendiya gundan tê kirin, nabe rol û bandora axa û dîwanxanan nehê berçavgirtin. Ji ber ku ew parek sereke ji kultur û urf û edetên gundan pêk tînin. Di kurdewarî de, her deverê ya kesekê bû. Kê bihêz bibûya, hêdî hêdî

desthilata wî zêde û xurt dibû û deverên din jî dagîr kirine. Vêca, ger wî kesî li destpêkê de ew cih kirrîbin û piştre desthilata wî zêde bibe û deverên din jî dagîr kiribin, yan cihên din jî bi mîrat jêre mabin, yan weke biramezin rûniştibe û desthilat peyda kiribe. Bi giştî her yek ji wan terzan be, li destpêkê bi wî awayî bûye bi axa. (Eladîn Secadî, 1974: 136).

Herweha li gundan de ((Texa jor (wate serdest), malbatên axa, mîr û began bûn û texa piştî wan jî, mêrên ayînî bûn ku her wekî axayan, rêz ji wan dihat girtin. Dûre pişekar, cotkar, û pezdar û ajeldar dihatin. Li dema cotkariyê de, axatî û sepanî hebûye, pirsgirêkên civakî li ser destê mîr, axa û melayan li dîwanxanan de dihatin çareser kirin. Her kesek pabendî rêkar û çareseriya dîwanxanê nebûya, ji aliyê axa ve dihat cezadan)). (Nadir Rostî, 2007: 60- 61).

Axa li gundan de xwedî desthilatek zêde ne û çî bixwazin, bê dudilî encam didin û tu kesek nine ku rêgiriye ji wan bike. Ji ber ku, ew xwe bi xwediyê gund, zewî û zar û xêr û bereketa wê dizanin ((Bi giştî li warê teorî ve, axa xwedî zewî û zarên gund in û yê ku kar li ser dikan, weke kirêgirtî ne û pêncî ji sedî ya berhemên wan, ji axa re ye. Axa mafdar e ku her re'iyetek gor dilê wî nebe, der bike. Bi heman awayî jî, re'iyet serbest e her dema ku bixwaze, mala xwe ji gund bar bike û biçê. Ya ku milk û mafê re'iyetê be, pêk tê ji kelupelên nav malê, stun û karîteyên malê, pez, malat û ajelên xwe)). (D. Mihemed Şuwanî, 2012: 315).

Axayan li gundan de kesên zaf hebûn ku kar û barên wan jêre encam bidan. Kes û mêrê herî xuya û berçav yê axa, Mîrza bû. Mîrza li ser ténûsê hesaba milkane li ser karên wan werdigirt û karên nivîsînê jêre dikirin. Li piraniya gundan de, axayan dîwanxane çêkiribûn û bi xwe jî birêve dibirin. Ew cihê pêşwaziya mêvanan, civînên şevan û hatin çûyîna xelkê gund bûn. Wate, ji her aliyekê ve rû jê dikirin û cihê vemana mêvanan, nanxwarin û demqedandin û îdarekirina gund bû û hin pirsgirêk li wir çareser dibûn (Mela Mehmûd Bayezîdî, 2015: 82).

Herweha Axa li piraniya serxoşî ên gund de pişikdar dibû, diviya li ser hemû pirs û meseleyan, şêvr û ravêj bi axa re bihatiba kirin û jê haydar bibûya. Bi taybet karê jin û jinxwaziye li sînorên desthilata wî de bû, û bi bê pirs û şêvra bi Axa re nahê kirin.

Divê bo vê meselê, Mahîn yan Tifeng (yan jî herdu) ji axa re biriban. (Eladîn Secadî, 1974: 139). Kuwusan bû axa û dîwanxane û gund, sê çemkên ji hevdu neveqetiyayî ne û bihevre wêneya gund dixemilîn in û bandor û karîgerî li ser xelkê hene û urf û edetên gund dixulqînin û dibin bi parek ji kultura wan.

2.2.8. Rengvedana Efsane û Bîr û Baweriyên Kevn

Li nav gundan de zaf efsane û bîr û baweriyên kevn hene ku bala xelkê gund bo aliyê xwe rakişandiye, û baweriyek tewaw pê anîne û bûye bi beşek ji kultura wan, yan weke urf û edet wergirtine. Nemaze hin caran bi çavê pîroz ve mêzeyî dikin û weke beşek ji ayîne dibînin. Ew bîr û bawerî û efsane bi awayekê di nava wan de reh û rîşal dakutane ku zehmet e bikarin li gel ayîna wan ji hevdu cuda bikin. Helbet zaf sedem hene bo vê baweriyê; ku yên herî girîng, nezanî, nexwendewarî û xweşbawerî in. Ji ber wê ku bazdan yan bihorîn ji hinek ji wan efsaneyan, bi guneh dizanin û hinek ji wan bîr û baweriyên bûne bi beşek ji jiyana wan û bi hûrî di jiyana xwe de peyrewiyê lê dikin û mezin û biçûk jî dizanin ku ji bav û kalan ve ji wan re maye.

Nimûneyên zaf li ser wan bîr û hizr û efsaneyên kevnar hene ku wan bawerî pê hene, weke; diyardeya mehgartin (Meh xeyirîn) ku bi zaf tiştên seyr û semere re girê didin. Tenîke û Mencil dikutan û bangbêj diketine sella û duayan. Xelkê bi giryan ve mijûlî lahî û dalahiyan ji Xweda dibûn. Li ser vê baweriyê bûn ku ev tişt ji ber guneh û xirabekariya wan bi xwe ye lewre heyv (meh) tê girtin. Ji ber wê jî diketine tobekirin û lêborîn xwastin ji xweda. (Eladîn Secadî, 1975: 242).

Herweha dema ku zaroka sawa ji dayîk dibû, her ji rojbûnê ve heya 40 rojan, Şûr yan xencer li bin cihê zarok de didanîn, bi vê baweriyê ku, eger mezin bibe xîret û bivêriyê ji xwe nîşan dide û rihliberên hov, jê dûr dikevin)).(Yasîn Hesên Goran, 2009: 52-53).

Eva û çendîn nirxandin û baweriyên bêbingeh ên dûr ji zanistê li nav kurdan de hene û heya qasek zaf, bawerî pê hene û pişt bi pişt ji wan re mane û wusa bi hêsanî, ji nav naçin. Ewane bûne bi kul û derd û sedemek bo pêşneketin û têngihîştina wan ji dunya, diyanet û zanistê.

2.3.Kultura Kurdî Li Bajar

Bajar, senter yan navendek e ji bo komkirina hemû mirov, kultur û yekeyên kargêrî, pîşesazî, bazerganî û pîşeyên din. Bajar rûberek mezin û berfireh pêk tîne ku parek zaf ji rûniştîyan li xwe de akincî dike. Destpêkê de ger em bixwazin ronahiyê bixin ser rûpela dîroka avabûna bajar, renga hinek zehmet be, lê hin ji lêkolîn êşkere dikin ku destpêka avabûna bajar bo kengê vedigere.

Bi awayek giştî, belgeyên dîrokî nîşan didin ku li deverên Hind û Çîn, Rojhilata Nizîk û Rojhilata Navîn de, civatgeha bajarnîşîniyê derketiye.

Zaf ji dîroknivîs, peydabûna kakilên yekem ên bajarnîşîniyê vedigerînin bo Misr a kevn û li derdora 3400 sal berî zayînê. Tevî avabûna hikûmeta nawendî di wî welatî, bajarê (Memfîs) weke serbajar hate destnîşan kirin. Di heyama 28 sedsalên desthilatdariya Fîr'ewnan di Misrê de, bajarnîşînî (bajarakincîtî) di wî welatî de geşeyek berbiçav bi xwe re dît.

Her li vê çarçoveyê de, rûniştîyên bajarî ên Rojhilata Nizîk, yekem navenda peydabûna dahênanan û durustkirina guherînkariyan di kultura kevn de bûn. Li vê derheqê de hemû şahid û gewahyarê çêbûna guhertinên curbicur bûn. Pêşketinên han û pêşketinên hevşêwe li Hind û Çînê de, nîşaneya deriyekê ye bo bihorîn ji kultura Dewarnîşînî (Bedewî)iyê ve ber bi jiyarek mezin; wate pirek e di navbera berî dîrokê û dîrokê de.

Li gorî belgeyên dîrokî, yekemîn netewe ku nizîkî pênc hezar salan berî jidayîbûna Mesîh, li devera dîroka Mizopotamiya yan Kilde (Îraqa niha), jiyana bajarî anîne rojevê, (Somerî) bûn û bajarên weke (Lagaş, Babil, Uruk) li ser destê wan hatine çêkirin. Di vê qonaxa bajarî de, Xetê Bizmarî hat danîn û derfetên geşeya zanistên bîrkarî (matmatîk) û stêrknasî hate rojevê. Li Îranê de jî, jiyara şaristanî ji aliyê Îlamîyan û akincîbûna di bajarê “Şûş” li derdora 5 hezar sal berî zayînê dest pê dike. Bajarê Şûş li derdora Dizfûl a niha ye ku piştîre bû bi navenda ‘îlam. (Menûçêhr Muhsinî, 2002: 324).

Pênaseyên curbicur ji aliyê vekoleran ve bo bajar hatine kirin û her yek ji wan aliyek yan mercek kiriye pîvan bo çêbûna bajar, yan ji dîtingeha pisporî û şehrezayî a xwe mêzeyî bajar kiriye. Lewre, em hewil didin parek ji wan mijar û pênaseyan raxînin ber çavan, daku em pitir ji taybetmendî û pêkhatiya bajar bigehin. Pênaseya herî baw bo bajar (ku bi cihê akincîbûna gurûpek ji mirovan û cihê çalakîyên wan, dayne nasîn, bi baweriya wan kesan, bajar bi tenê xanîbere yan awahî nine, belkî cihê mirovan, rêkxistinên civakî, tex û qatan, malbatan û htd ...). (Dr. Resûl Rebanî, 2013: 19).

Herweha bajar ((Pêk tê ji navendên hemû beşên îdarî, weke parêzgeh, qeza, dever, bi bê liberçavgirtina hejmara rûniştiyan, cure çalakîyên civatên xelkê (Pîşesazî yan çandinî), metoda jiyanê weke xanîbere, surûştî xizmetguzarî û kulturî û tendurustî, peywendiyên civakî)) (Dr. Ebdula Xefûr, 2006 : 63).

Hin carî ji welatekê ve bo welatek din cudahî li cura bajaran de heye. Li hin ji welatên paremayî de, ji ber pêşketina biyava pizîşkî li bajaran de, pêlên koçberiyê ji gundan ve bo bajaran dest pê kiriye û bi vê çendê jî zirar bi jiyar û şaristaniyetê gihaye û bajar jî nekariye xwe ji ber ewqas xelkê bigre û hewcehiyên wan dabîn bike.

Şarnişînî bi terzek pile bi pile û hevdem tevî pêşdeçûna bazerganî û pîşesaziyê geşe kiriye û niha nizîkî %70 ya rûniştiyên welatên pêşketî, akinciyên bajar in, lê di welatên paşketî de, xwasta han ji bo şarnişînî a asayî nebûye, belkî ji ber pêşketina warê pizîşkî û daketina asta mirinê û êrîşa rûniştiyên zêde ên gundan bo bajaran, bi şêwazek ji nişkîveyî derketiye, bêy wê ku pîşesaziya nû ya bajar, bikare wan rûniştiyan ji xwe bigre. Pêşketina bajarakincîtî (şarnişînî) di van welatan de, aliyek nexweş bi xwe girtiye û pirsgirêkên civakî û aborî ên metirsîdar ji wan welatan re li pey xwe aniye. (Biros Kuhîn, 2010: 217).

Li pênaseyek din de ku basa bajar dike û bajar, bi diyardeyek surûştî a xasmanî bi xwe dizane û taybetmend dike, wate ((Bajar diyardeyek şaristanî û civakî ye û cuda ye ji surûştî diyardeyên din, ji ber ku piraniya rûniştiyên wê mijûlî karê pîşesazî, bazirganî xizmetguzariyan in)) (Sasan Hikmet Elî, 2008: 28).

Ji vê dîtingehê ve, bilindbûna şarnîşîniyê li hemû civakan de, nîşaneyê pêşketin û sivîlbûn û cihê şanaziya civakan bûye, pir carî rayedar û ew aliyên siyasî ku hikûmet pêk anîne, şanazî bi vê yekê kirine ku li serdema wan de, rêjeya şarnîşînî (bajar akincîtiyê) bilind bûye yan weke propagandeyên hilbijartinê bikar anîne. Bo mînak, ger li vê derheqê de em mêzeyî rûniştîyên Îraqê bikin, tê dîtin ku ji nivîya sedsala derbasbûyî ve heya serhejmariya sala 1975'an, rûniştîyên gundan rêjeyek bilind û zortirîn pêkhatiya rûniştîyên welat pêk dianîn, piştî pêşketinên aborî û civakî hêdî hêdî rêjeya rûniştvanên gundan kêr kir û ber bi daketinê hat. Tevî wê jî heya dawiya 60'an rêjeya van du pêkhatayan beranber nebû. Her çiqas ku rêjeya şarnîşîniyê li heyamê pêncî salên derbasbûyî li jordeçûnê de bûye. (D. Mihemed Şuwani, 2013: 176 – 17).

Hin ji vekoleran, civatgeha şarnîşîniyê bi vê cuda dikin ku dibe rêjeya rûniştvanên wê zêde be. Wate hejmarek destnîşan kirine heta ku cihek weke bajar were nasîn. Wate pîvana bajarbûnê, bi hejmara zêde ya rûniştvanên bajar ji gundan cuda bike.

Lê, Elî Werdî rayek din li dor bajar heye û dibêje ((pîvanên din bikar bînin baştir e, ku ew jî pîvana civakî ye. Merema min, radeya belavbûna pîşeyên jiyar û şaristanniyetê ye li navbera rûniştvanan de. Ger hemû rûniştvan bi çandîniyê ve mijûl bûn, li çarçoveya gundiyan de dabinên. Lê eger bi bazirganî û pîşesazî û kedkariyên curbicur ve mijûl bûn, eve wan bi bajarî bihesibînin)). (D. Elî Werdî: 367).

Hewcehiya hebûna bajar wusa ji gelê kurd jî kiriye ku hewil bide bi xwe bajarên mezin mezin ava bike û karubarên xwe bi metodek nû encam biden. Mîr û desthilatdarên kurd ji bo raperandina erkên xwe, hewcehî bi bargehên cihgîr û xelkê cihgîr hebûn. Herweha damezrandina arteş û danîna kesên şehreza li pile û payeyên curbicur weke dadvan, pêşnimêj, nivîskar, dergevan, razgir û fermanber di biyavên curbicur ...htd.

Ew guhertinên bi ser kurdan de hatin, bûne Sedema wê ku rêjeya rûniştvanên bajar û akincîyan bi giştî jor de biçê. Eva bû ku hevdem li gel derketina mîrnişînan, hejmarek bajarok û bajarên din ava bûn û bo cara yekemîn ji çavkaniyên îslamî ve hat tomarkirin. Ger pêştir jî hebûbe, ewqas mezin nebûne û nav û dengê wusa nebûne.

‘‘Mîr Nesrudole Ehmed Merwanî’’ (401 -543K/1010-1060 Z) xawendî Diyarbekir li warê avedanî, bînasazî ku li xizmetgihandina bi millet, destvekirî bû, xemsarî nedikir û pêlek berfireh ya avedanî û binyatnanê li Miyafarqîn a paytext de anî rojevê ku pşk dihat ji: Dehan telar û balexaneyên endazyarî, zanistî û xizmetguzarî ji pir, mizgeft û koşk, germav, nexoşxane, bazar, xan û karwanseraya avedaniyê weke mizgefta mezin a bajar û nexweşxane û du germav û yekî din li pêdešta Şorcan û weqfkirina dahata wê li ser şevra Miyafarqîn û kişandina sê cogehên avê û çêkirina demjimêra Bengam û danîna wê li ser mizgefta mezin û weqfkirina hejmarek gund, rez û baxan li ser van damezrawan. Li siyawê girîngîpêdanê de, Miyafarqîn vegeşiya û derbasî refa bajarên avedan û zîndî bû û xelk û bazerganan ji her çar aliyên ve rû jê kirin.

Mîr Hezbanî Keleha kevnar a Hewlêrê ji kelehek nenas û piştguhîstî ve kire bi bajarek naskirî û navend û paytexta kiyan û qewareyekê. Hewlêr jî ji bajarek xaw û bêdeng ve hêdî hêdî pêş ket û vegeşiya û bûye bi bajarek avedan û navendeke zanistî, rewşenbîrî û bazirganî ya zîndî. Zana û fêrxwaz, turîst û gerîde ji her alî ve seredan dikirin û bo midehekê têde diheviyan. Îbn Elmistofî jînameya komek ji zana, wêjevan û helbestvanan tomar kiriye ku li serdema Mîr Hezbanî de serî ji Hewlêrê xistine û bi nivîs û lêdwanan, yadgariyên nivîskî bi cih hiştine. Herweha wê deverê bizavek zanistî û rewşenbîrî bi xwe girtibû û bi dehan feqî, qutabî û fêrxwazên kurd ji Şino û welatê Kerxî – Kerkûk û deverên din rû ji hewlêrê kirin û li mizgeft û malên zanistî ên bajar de asta zanistî û xwendewariya xwe pêş xistin û hin ji wan, wek fîqhî û fermûdenasî û şehreza derketin.

Piştî Hewlêr weke bajarê herî zîndî û ektîv derket û bûye bi bajêrek navdar û çî ji bajarên din ên cîhana îslamî kêmtir nebû. Hemû dîwan û dem û dezgeh li wir hebûn; Yê ku li wê demê de bo her bajarekê girîng û hewce bûn, weke dîwanên: Ewqaf, darayî û bacdarî, cebilxane, xizîne û embar, dîwana milkdariyê, pirtûkxane û nexweşxane, bazar, bazar taybet bi pîşeweran weke bazara parçefiroşan û bazara zêringiran û Bazara beytaran û bazara Asingiran û ...htd. (P. D. Zurar Sidîq Tofîq, 2014: 72 – 73 – 74 -75).

Herweha yek ji nîşan û simbolên bajarên di wî serdemî de ku piraniya bajarên hebû, keleh û qulgeh bûye. ((zaf ji kewnebajarên Kurdistanê ji ber êrîş û gefan, şûre hebûn. Nimûneya ew bajarên ku şûre hebûn ew in: Amed (Diyarbakir), Kosar (Koye), Xurmal (Gul'enber), Biyare, Botan, Hewlêr, Arabxa, Farqîn ...htd)). (Fuad Tahir Sadiq, 2004: 215). Kuwusan bû, bajar ew nav e ku komvekerê hemû beşan e û rûberek berfireh heye ji hemî curên pêşketin, bazirganî, bazar û rêkxistin û birêvebirin û dezgehên dewletê û rêkxistinên curbicur û ..htd. Lewre eva wusa dike ku li warê kulturî ve, kulturek taybet bi bi xwe ava bike û sîma û taybetmendiya xwe hebe ku ji gund cuda bike. Serbarê wê jî, bajar pir curên wê hene ku hinek bajarên pîşesazî ne yan bajarên rewşenbîrî, bazirganî, yan dêrîn û xwedî şûnwar in ...htd. Her yek ji vana, kulturek cuda ji xwe re hilgirtine. Wata li gor bajarên, kultura wan jî cuda dibe. Li vir de emê çend taybetmendiya kultura bajarê bidin berçav.

2.3.1. Hejarî û Dewlemendî

Yek ji diyardeyên ku li bajarên mezin de heye, hejarî û dewlemendî ye. Diyardeyek ku bi hêsanî li bajarên de tê dîtin û em dikarin ji hev cuda bikin. Berî wê ku em basa hejarî û dewlemendiyê bikin, dibe li destpêkê de berçavroniyek me li ser tex û qatên civatgeha bajarê hebe û hin zaniyarî li ser çawaniya avabûna tex û qatan bidest bixin, çûnkî her yek ji wan du texan, kultura taybet bi xwe li bajarên de çê kirine.

Texên civatê her li zû de, li gundan û li dema koçeriyê de jî hebûn, û axa, derebeg û xwedî milk texa jorîn a civakê bûn û kedkar, şivan, bê milk û zewî jî texa jêrîn a wê demê bûn. Kuwusan bû, her ji kevnar ve, çîneyetî hebûye û reh û rîşalek dîrokî hebûye. Li wê demê de xwedî zewî û axa li deverên xwe de xwedî selahiyet û desthilat bûne û çî xwastiban, encam didan û xelk jî guhdar û stûxwarê desthilata wan bûne. Li wê demê de jî, pile û payeya bilind ya desthilatdaran cuda bûye û kultura taybet bi xwe durust kiribûn.

Piştî serhildana şoreşa pîşesazî û anîne rojeva bajarên mezin û avakirina kargehên mezin li bajarên û koçbarbûna xelkê gundan bo bajarên mezin û xwedî milk û zewiyan, desthilatdaran wê demê bi heman awayî koçberî bajarên bûn û bûne xwediyê hin karên pîşesazî û nîzîkbûna ji desthilatê bi armanca xwe dewlemednkirin û girtine

dest a karên zor û hejmarkirina tevî qata jorîn. Wate li bajaran de çend texên nû jî peyda bûn ku cuda bû ji gundan, û bajar mezin bûn û kar û pîşeyên curbicur lê peyda bûn.

Bêguman hemû evane, tesîr û karîgerî li ser çêbûna texa nû kir û tex û qat zêdetir bûn ji ya ku li berê de hebûn ((Li warê çîneyetî ve, rûniştîyên bajarên mezin bi awayekî serekî parveyî ser texa taybet a desthilatdar û texa giştî bûn.

Texa giştî pêk dihat ji pîşewer bi hemû curên xwe ji dukandar, çercî (destgêrr), kasibkar, delal, kolber, pirtûkfirûş, mamosta, dartaşî û beytarî û hosta û mîmarê xanîbereyan û htd..) (P.D. Zurar Sidîq, Tofîq, 2014: 75). Herweha li warê çîneyetî ve li hinek welatan de arasteyek destûrî û yasayî wergirtibû û li gor yasaya wî welatî, refdar bi tex û qatan re dihat kirin, her texekê jî taybetmendiya xwe hebûye.

Pir carî, çîneyetî li ser bingeha pîşeyî û karkirinê bûye. Em dibînin ku ji wir ve, parvebûna çîneyetî bi awayek rohn û zelaltir derdikeve û bingehek yasayî, abûrî û civakî wergirtiye. Li destpêkê de li gorî pîşeyê bûye. Piştî araste û rehendek yasayî wergirtiye. Maf û erkê wê xuya bûye heya wê dema ku bi tewahî tex û qat ji hev cuda bûne. (D. Mihemed Şuwani, 2002: 192 – 193).

Her yek ji wan tex û qatan jî li gorî pîvanekê hatin diyarîkirin. Renge zaf şewazên pîvanan hebin, lê ya ku li vir de armanca me ye, pîvana aborî ye. Li gorî vê pîvanê jî li bajaran de du tex û qat tên dîtin. Ew jî texên hejarî û dewlemend in. Lewre dibe ku em Sedema serhildana van du Texan bizanin û pênaseya wan bikin. Ji vê dîtingehê ve, destpêkê de dibe ku em bizanin hejar kê/î ne û bi kê/î dikarin bibêjin hejar. ((Renge em bikarin pênaseya (Horton) pesind bikin ku hejarî, rewş û kavdanek e ku têde kesan ewqas pere ninin ku bo aliyê kê/î standarda silametiye û mana xwe bi qiyasa ku li civatgeh û ji aliyê zorahiya xelkê ve bi şert û mercên asayî bi hesab tê.

Horton bi nihêrînek taybetî ve mêzeyî civakê dike û digihîje vê encamê ku hejar, ew kes in ku li perawêza civakê de dijîn û zorahiya wan tûşî çendîn pirsgerêk û giriftên civakî yan cismî dibin)) (Menûçêhr Muhsinî, 2002: 239).

Zaf sedem bo nasîna hejaran hene ku em bi hêsanî dikarin ji dewlemendan cuda bikin. Bi taybetî li welatên nûpêgihîştî de, hejar bi ew kes tên naskirin ku zarokên zêde

hebin û kêmiya heqdest û dahatê dibe Sedema wê ku nekarin hewcehiyên tewaw ji malbat û zarokên xwe re dabîn bikin. Di wî halê de, renga zarokên wan, bê cil û berg bin û sir û seqem tesîr ji wan bike û şiyana û karîna çareserîya nexweşxaneyê jî nebin. Her bi van sedeman, zaf carî zarokên wan hevrişê karesat û mirinê dibin. Herweha li hin deman de, ji ber nedariyê tûşî bêxwarinê û xirabxwarinîyê tên û tesîr û karîgeriyek xirab li ser jiyana wan bi cih dihêle.

Serbarê wê jî bi sedema nebûnê û belengaziyê, dest didin zaf karan ku renga nekare wan derbaz bike, lê di wê demê de neçar e û encam dide. ((Sedemên curbicur hene ku ew bi vî awayî li bajar de dijîn, taze hatine bo bajar û sedemên aborî, kulturî û ... Li warê hêza karî ya bajar dibe sedema serhildana rêxistinên nû li bajaran de. Ji ber nebûna pisporiyê, koçber dest didine hin kiryanan ku li warê civakî û pîşeyî ve, pêgehek astnizm hene)) (D. Resûl Rebanî, 2013: 59).

Helbet bajar ji ber pêşketin, qerebalixî û derketina zaf kereste û alavên nû ên cuda cuda û berçav li karê pîşesaziya nû û kargehan, hewcehî bi lêzanî û şehrezayiya taybet dibe. Lê eva jî dibe sedemek bo destneketina karek baş ji hejaran re. Ji ber neşehrezatiya wan di van karên nû de ((Li bingehe de beşek zaf ji sedemên hejarî, nezanî û nexwendewarî û nebûna pisporî û neşiyana di bikaranîna amêr û teknolojiyên pêşketî, ger kar li ser pêdana van şiyanan bihê kirin, rasterast dibe sedema kêmkirina hejarî û piştgirêdana takekesan bi xwe ji bo başkirina bijîv û jiyana xwe û malbatên xwe)) (D. Mihemed Şuwanî, 2013: 374 – 375).

Herweha hejar ji ber kêmdahatî û destkurtiyê, bi kêmî ber bi aliyê zanist û xwendinê ve diçin û zarok jî nexwendewar dimînin, renga eva jî bibe bi kulturek bo hejaran û bi wan re berdewam be.

Hejar metoda jiyana xwe bo zarokên xwe vediguhêzin ku reh û rîşala wê jî bo kultura şikewtnişînî vedigere. Tevî wê jî zarok tên handan bona wê ku bixwînin heya ku ji zext û givaşên hejariyê derbas bibin. Lê di rewşek wusa de mezin dibin ku tu nîşane bo eql û şehrezayiya civakî di rojevê de nîne. Bi qasekkê ku civakê bo serketinê hewcehî pê heye. Bi bawerîya (Oskar Loys) di jiyana kesên hejar de, hêvî û umîd tune û jiyana wan li ser qetandina rojane ye û dibe ku hewlên zêde ji manê re bidin. Ji zaf

aliyan ve kesên hejar ji civakê veqetiyane. Dibe em vê yekê jî bêjin ku bo cara yekem, zaraweya kultura hejarî ji bo wesfkirina wan hejaran bikar hat ku li xaniyên kavi û çoleme ên deverên pir hejar de dijîn. (Loys) kultura hejarî bi vê haletê dizane ku kêma û zor li hin rewş û kavdanên taybet, li wan civakan de tê rojevê ku bajarî ne, yan teze derbasî nav pirosesa pêşesaziyê dibin. (Menûçêhr Muhsinî, 2002: R 250- 251). Kuwusan e hejar li bajar di jiyaneke asayî de najîn û li hin deman de, bûye bi kultur û dev ji wan bernade û karîgerî ji zarokên wan jî dike. berevaj, dewlemendên bajar li jiyaneke pir xweş de dijîn.

Li warê dîrokê de, destpêka cudahî di xwedîtî û şiyaneke aborî de, derbasbûyek dîr di dîroka mirovahiye de heye û ji bo destpêka hilweşandina komona destpêkî vedigere. Destbiserdagirtina zewî û çavkaniyên av û daristan û çêrîngeh û rîya bazerganî û cihên stratejî ji aliyê her gurûp, êl û civatekê ve, sedemk bûye heya ku hêza aborî û bidesthilatbûna wê gurûpê. piştê jî bi derketina texek bişiyantir li nav gurûpê bi xwe ji ber nîzîkatiya wan ji navenda desthilatê û mifahstandin ji şiyaneke aborî ji aliyê hikûmetê pile û post ji wan re hatiye dayîn. Bi vê sedemê jî xwe bi guhertinên civakî û siyasî re guncandine û samana xwe parastine, heta ku bûne bi texek bihêz û mezintir. Weke em dibînin li destpêkê de şiyana aborî, piştê jî pêdana desthilat, rêz û pêgeha civakî li pey xwe re aniye. Bêguman hemî ew sedemane jî, pêwendî bi hevdu re hene û em dikarin bibêjin ku di berencama hemûyan de, parvebûna çînayetî çê bûye. (D. Mihemed Şuwani, 2002: 190).

Li bajaran de hemû cehd û tekoşîn bona komkirina pere û samana zaf û xwenizîkkirin ji navenda desthilatê û peydakirina kanalên pêwendiyên curbicur bi armanca cihvekirina xwe tê dayîn. Wate li bajar de pare kom dikin, çûnkî pereyê zaf, mirov bi zaf ji hêviyan digehîne û xelk bo vê meremê, zaf dixebitin û dixwazin dewlemend bibin.

Pareperestî yan eva ku hin carî jêre dibêjin “xewn û xwasta madiyatê”, ji girîngtirîn taybetmendiyên rûniştvanên bajaran in. Wan cudahiyeke berbiçav bi koçeriyên re heye, çûnkî dema ku koçerî hez yan keyf bi pere dikin, bo xwe ninin, belkî bona wê ye ku bi xelkê bibexşin û ji wê riyê ve, navdengê baş û pêgehek bilind di nava

wan de bidest bixin. Dewlemendan di nava bajar de hertim xwe ji texa jêrîn cuda kirine û xwe bi beşek bilindtir zanîne û kulturek taybet bi xwe çê kirine ku cuda be ji hejaran.

Ew xwecihêkirina dewlemendên bajar, li biyavên xanîbere û taxan de jî reng vedaye.

Têkiliyên civakî li nava bajar li gorî gundan cuda ne. Ji aliyekê ve peywendiya cuda li nav hejar û dewlemendan de heye û ji aliyek din ve jî, peywendiya cuda li nav dewlemendan bi xwe de jî heye.

Civaknasê Amerîkî (Wêrs) li vê baweriyê de ye ku peywendiya li navbera takekesan di bajar de, peywendiyek fermî û serpeyî ye. Rûniştvanên bajar (bajarî) tevî zaf kesên ku têkiliyê pêre dikin, palnerek sûdxwaz hene û li vê derheqê de (Wêrs) derdixe ku bajarî li hewla sûdwergirtin ji xelkê din in û bajar wan cure çalakiyan bihêz dike. Peywendiyên bajariyan, rûyekî û nazik in, ji ber wê jî di bajaran de nesaxiyên derûnî, xwekuştin, tawan, dizî, gendelî û terzên ji hev belavbûn û hiloşînên civakî zêdetir in heta di gundan de. (Menûçêhr Muhsinî, 2002: 339).

Pêwendiya navbera texên dewlemend jî, pitir pêwendiya navbera axa û beşek ji mêrên ayînî û bazerganên stûr vedigre û peywendiya navbera wan qahîm bûye. Em dikarin bibêjin ku berjewendiyên aborî rolek mezin têde lîstine, bi taybetî li her du sîstemên (kiştûkal û pêşesazî)iyê de. Ev têkiliya jî di biyavên din ên jiyana civakî de reng vedaye. Bi taybetî hevkar û alîkariya hevdu li boneyên giştî û taybetî de bûne û jin û jinxwazî jî di navbera wan de hebûye.

2.3.2. Bazar

Tevî berfirehbûna bajaran, kar û pêşeyên zaf peyda bûn û pêşesazî bi terzekê zêde kir ku xelkê karîna berhemana kel û pelên zaf hebûn. Bi awayekê ku hewcehiyên navxweyî pê teji dikirin, yan hin carî zêdetir jî dibûn. Li vê derheqê de, bona wê ku ew kel û pelên zêde sax bikin, hewcehî bi cihekê bo saxkirinê hebûn, yan jî guhertina ew kel û pelên zêde bi wan kel û pelên ku hewcehî pê hene. Bo vê yekê jî, hewce bû cihek were diyarkirin. Lewre bazar weke hewcehiyek bajar derket holê.

Em dikarin bibêjin ku bazar bû bi şademara bajar ji dabînkirina hewcehiyan re, çûnkî hevdem li gel berfirehbûna bajar, xulyaqet û hejmarê xelkê jî zêde bû û asta hewcehiyan jî jorde çû û xelkê pitir hewcehî bi bazarê hebûn. Lewre bazar û bazarkirin bû bi beşek girîng ji bajar û çavkaniya dahata rojane ya wan. Kuwusan e bazar bû bi navendek bona komkirina xelkê bajar û nemaze derdor û gundan û xelkê bîhanî jî ((Bazar, damezraweya herî nawend ya bajar e, bajar cihê e ku xelk têde xwarinên xwe, bi xwe berhev nakin, belkî bi berhemana kel û pel û xizmetguzariyan mijûl dibin û bi xwarinan vediguherin. Lewre hewce ye her bajarek, bazarek pêxwarinê hebe, heya ku gundên derdorê bikarin pêxwarinên xwe weke kalayek ji bo guhertina bi kalayên nav bajêr raxin berçav)). (Menûçêhr Muhsinî, 2002: 319).

Bi vî awayî bazar weke hewcehiyek bajar hate rojevê û bi pêşketina bajar re, diviya bazar jî pitir pêş bikeve, berfirh bibe û rêxistinê jêre were kirin. Lewre hikûmetê jî yasa û rêsayên taybet ji bazarê re danîn û ji wê riyê ve çavdêriya pîvanên kirîn û firotinê dikin. Bi vî çendê jî, bazar pitir berfireh bû û bazarên mezin di qazanc û berjewendiya hemû aliyekê de hatin çêkirin.

Bazar bû bi navendek girîng di bajaran û hemû cure danustandinek di bazaran de dihat kirin. Li heman demê de bazar bûye sebaba kombûna zaf ol, netewe û zimanên cuda û xelkek zaf di bazaran de hînî zimanên cuda û kulturên cuda bûn û hin deman, xizmatî, jin û jinxwazî di navbera dukandar, bazergan, senetkar û pîşesazan de çêdibû. Ji ber ku berdewam bi hev re mijûlî danûstandin û kirîn û firotinê bûn û weke nasiyar û xizman lê hatibûn û bi başî hevdu dinasîn. Herweha zaf ji dukanan, ji bab ve bo kur (xort) dima û wan jî hevdu dinasîn û têkiliyên civakî berdewam dibûn.

Bazar cihê tevgeriyana berdewam a xelkê ye ku heya qasekê kulturek taybet bi xwe çê kiriye. Bazar di bajaran de ne tenê li rojê de, belkî di şevan de jî zîndî û pir kar e û bûye bi çavkaniya dahat û bijîva jiyanê bo hin kesên ku li şevan de kar dikin. Li serdema nû de bazar pir girîngtir ji wê derket ku pêştir siyasî û dewletan bi çavek aborî a bihêz lê dimeyzandin û hewla pêşketina wê didin û bi bingeha dewletê dizanin. Xincî wê jî, bazar bûye sedema avabûna zaf cihên din bo demborandin, nanxwarin, lîstin, avabûna çayxane, sînema, qumarxane, semaxane, xwaringeh û ...htd.

Bazar zîndîbûna bajar nîşan dide. Wate çiqas bazarên mezin û geştiyarî ên zaf hebin, bajar jî bi bajarek zîndî tê hejmartin. Berevaj, bazar çiqas biçûk û xaw û kême geştiyar be, ew bajar jî bi bajarek perawêxketî tê hesibandin. Li vê derheqê de, li bajarên geştiyarî ku bazarên mezin in, pêşbirkê li navbera dukandar, bazirgan û pîşeweran de çê dibe heya ku tiştên baş bi armanca rakişandina turîst û geştiyar û kirryaran pêşkeş bikin û bala wan û xelkê bikişînin aliyê xwe, eva jî dibe sedema dahênana nû.

2.3.3. Kar û barên Rojane

Berê me basa jiyana rojane ya gundan kir ku xelk bigiştî û jin û mêr jî bi taybetî mijûlî kar û xebatê ne, lê di bajar de ew yek ciyawaz e. Bajar tu car ji bizav û hereketê nasekine. Şev û roj kar dikin û hin kes jî bi şevan karê xwe dest pê dikin. Weke hin ji nobedar ya pasevanên şevan û "meyxane" û semaxane û hin ji çayxane, nanxane û kedkarî û hin ji kargeh û hinek ji kêşik û nobedarên Mîrî û htd.

Wate bajar ji ber qerebalixî û guherîna bazarê û pêşketina pîşesazî û telarsaziyê, tesîrê ji karkirin û biyavên karkirin û ciyawazî li dema karkirinê de dike. Eva jî li pêxem zêdebûna berhem û pêşbirkêkirin û pêşketina bajar. Bi awayekî giştî, ger em mêzeyî karê rojane li bajar de bikin, her ji berbanga sibê ve hereket û bizava bajar dest pê dike. Lê hin kar bi dirêjîya şevê jî berdewam dibin. Serbarê wê ku li bajar de, hejmareke zaf ji qutabxane û dem û dezgehên dewletî û zanîngeh ...htd li xwe de cih dane, lewre xelkek zaf rojane di wan cihan de kar dikin.

Tevî wê jî bi sedema pêşketin û pêşdebirina rewşa jinan di bajaran de, jin jî di zaf biyavan de mil bi milê mêran kar dikin û li dem û dezgehên Mîrî de, pisporî û bawerînameya baş bi dest xistine. Di wan deman de, jin jî li kar û barên derve û malê de jî rola xwe dilîzin. Wate, ew li wan deman de, du erkan birêve dibin: ((Ji ber xwendin û damezrandina jinên kurd û karkirina di biyavên cuda cuda de, bi pêşketina warê aborî, civakî, rewşenbîrî, ramiyarî, rewşa civatgeha kurdî li vê serdemê de guherî ye û pêngavên baş ber bi pêşde avêtine.

Jina kurd girovera mal û navmalbatî a xwe bihorandiye, li nîviya sed sala 20'an de bûye fêrkar, perestar, yasakar, kiştûkal, şirovekar, polîs, efser, parêzer, endazyar, perlemantar, wezîr, birêveberê giştî, mamostaya zanîngehê, htd...)(Fuadî Tahir Sadiq, 2008: 170).

Hemû evane jî bûne bi piştevan bo aliyê aborî yê malê ku li bajaran de aborî rolek girîng dilîze. Ji ber ku hewcehiyên jiyanê di bajar de, zaf zêdetir in ji ya ku li gundan de hewcehî pê hene. Bi vî awayî jî, jin serbarê wê ku zarokan perwerde dikin û wan dikin bi kesek şaristanî û li ser bîngehek rast û durust dielîmînin. Li heman demê de, dibin bi piştevanek aborî û civakî û rolek mezin di nav bajaran de dilîzin. Ji ber wê ye ku zaf caran jin li bajaran de him karê malê dikin û him jî kar û barên derve. Eva jî him bi qazanca dewlet û him jî di berjewendiya malbatan de ye. Herweha mêr û ciwan jî di bajaran de erkê curbicur hene û kar dikin.

Tevî wê jî, hin ji wan bêkar in û li felaket û jiyaneke xirab de dijîn. Li rex wana jî, li bajar de zaf cih hene ku bûne bi kultur û rojane xelk rû lê dikin weke pirtûkxane, sînema, çayxane, qawexane, xwaringeh, semaxane, qumarxane û ...htd. Wate di bajar de zaf cî hene ku xelk piştî kar, dema xwe têde biser dibin. Her çiqas ku cihê herî xuya ku xelkek zaf bera xwe didê û bûye bi kultur li bajaran, çayxane ne ku bûne bi cihê baldariya xelkê û pitir bo demborandin û encamdana lîstikên Domîne, Tawle, Dame û ...htd lê kom dibin. Yan li wan cihan basa karûbarên rojane ên xwe û werezî û bêtaqetiya xwe dikin. Yan li hin serdeman de çîrok, dastan û helbest têde dixwendin.

Eva jî bûye sedem ku çayxane taybetmendiya xwe bistînin û her çayxaneyek li gorî kesên ku seredan dikin, navdenga wan belav dibe weke çayxaneya Rewşenbîr û nivîskaran, çayxaneya Kedkaran, çayxaneya Gencan, çayxaneya Bazirgan û ...htd. Helbet evê jî dîrokek dûr û dirêj heye û bi yek ji diyardeyên herî baw ên bajar tê hejmartin.

Xincî evane, hin cihên din hatin vekirin daku xelk rû jê bikin û bi malbat û zarokên xwe re dema xwe têde bibihorînin. Herweha zaf sendîka û rêkxistin ji bo parastina mafê texên civakê hatin avakirin, wate li bajaran de curbucuriya karan hebû û xelk mijûlê pişeyên curbicur bûne û li dema bêkarî û bêhnvedanê de rû ji zaf cihan

dikirin ku ji rûniştvanên bajar (bajariyan)re afirîbû û hinekan, rest û demên bêhnvedana xwe kiribûne kulturek ku diviya li wan rojan de, rû ji xwaringeh, sînema, şano ...htd bikin. ((Kultur û bajar du diyardeyên tewawker ên hevdu ne û her yek ji wan, ya din tewaw dike û bi bê ya din watayek ninin. Bi watayek din, her du jî hemû diyardeyên mirovî ên bajar tewaw dikin. Her bi vî terzê ku me amaje pê kir bajar, rûçik û ruxsar e, kultur jî kakil û naveroka wê ye, em dikarin bibêjin ku bajar cism e û rih jî cewher û naveroka wê ye, yek ji wan aliyê derekî û ya din jî aliyê navxweyî û hundirîn e)). (Dr. Resûl Rebanî, 2013: 58).

Bajar kultur û ezmûna taybet bi xwe heye û renga bajarek ji bo bajarek din di yek welat de, kulturek cuda hebe û li zaf babetên kulturî, ji hev cuda bin, lewre kultura bajaran dibe bi nasname û xelk û bajarê wan jî pê tèn nasîn.

2.3.4. Bêkarî û kirêçîtî

Bêkarî û kirêçîtî derd û azarek in ku pêşîra zaf kesan di bajarên mezin de girtiye û roj li pey rojê jî zêdetir û xurt dibe. Tevî danîna pîlanên curbicur bona nehiştina bêkarî û kirêçîtîyê ku bûye bi nesaxî û diyardeyek xurt li bajaran de, lê her berdewam e û nemaze li hin bajaran de bûye bi kulturek. Helbet ji bo nasîna xelkê hejar û bêkar û kirêçî, hin pîvan û taybetmendiyên xasmanî bi xwe hene û lêkolîn li ser wan hatiye kirin.

Gurûpên kêmdahat ên bajar pêk tèn ji hinek pîşesaz, kedkar, meaşxor û bêkaran. Li welatên cîhana sêyem de, endamên wan gurûpan, pîraniya rûniştîyan pêk tînin û komek giriftên weke rêjeya zaf a mirinê û zayîna zêde di gurûpên civakî ên din û dijwariya durustbûna aborî a zêdetir û nizimbûna asta xwendewarî û dahatê li navbera wan de hevbeş e. Pîraniya ew kesên ku li bingeh de gundî ne û nifşa yekem yan duyem a van koçberên gundî ne ku rû ji bajaran kirine, gurûpên kêmdahat in, yan bêkar in ku di bin navê hejarî û nebûniyê de tèn polîn û pênasekirin. (D. Resûl Rebanî, 2013: 326).

Hin ji rûniştvanên bajar ku bo midehek dirêj e rû ji bajêran kirine, lê ji ber bêkarî û belengaziyê nikarin li navenda bajar de xaniyê kirê ji xwe re bigrin û têde bijîn, ew jî ji ber nepisporî di karkirin û kêmiya dahatê de, yan ji ber bêkariyê. Lewre neçar in li

perawêza bajar de cihekê ji xwe re rêk bixin û têde bijîn. Ew perawêziye jî karîgerî û bandor li ser jiyana wan kiriye û nemaze aliyê kulturî û civakî ê wan jî guheriye.

Pirsgirêka akincîbûnê di bajar de ji xelkê bêkar re, karîger e û xelkê bêkar bona xwerizgarkirinê, zaf riyana digrin ber xwe û hewl û xebatên cuda cuda didin û hin carî jî bona destketina penagehekê rû ji bilindahî, ser girikan, ber avan û zewiyên bêxwedî û li hin deman de zewiyên hikûmetê jî dagîr dikin û bi neyasayî, xanî yan kelaweyan têde ava dikin. Ew cih jî, bi tu awayî cihên gunca ji jiyane re ninin û komek pirsgirêk û giriftên cur bi cur ên tendurustî, perwerdehî û hînbûna kultura xirab û hin karên neyasayî têde diqewimin. (Dr. Resûl Rebanî, 2013: 347).

Ew cure ji cih, kelawe û cihên perawêzistî, pirsgirêkên zaf ji xelkê û dewletê re durust dikin, karîgerî li ser nifş û neviyên pêşerojê jî dibe û ev kultura xirab li nav zaf ji wan de cî digre. Jiyana li bêkarî û kirêçîtiyê de, jiyane nemir nejt ye û xelk bi neçarî taba wê dikin. Hin ji xelkê ku fermanber in yan li kargehan de kar dikin, ji ber nebûna pereyek baş û nebûna xanîbereyan, li kirê de dijîn û xwedî mal û zarok in û mijûlî jiyana xwe ne, û zarokên wan li qutabxane û zanîngehan de dixwînin, lê ji ber pirsgirêkên zaf ên wan, rege li warê civakî de malbatên wan tûşî hilweşiyên û dûrketinê bibin. Bo nimûne, ew fermanberên ku heqdestê wan dûre dimîne yan bi her egerekê tê kêmkirin, yan hin ji wan ji kar tîr derxistin û karê xwe ji dest didin, yan ji ber nesaxî û êş û nexweşiyên demdirêj nikarin kar bikin û bêkar dibin, kirêya xanî bi wan nahê dabînkirin, ew ji ber zorbûna hewcehiyên xwe, karî û şiyana tab û bergegirtinê ji dest didin ku encamek xirab lê dikeve; weke rûkirin ji cihên perawêzistî ên bajar û kavlikan û hin carî jî goristan û yan jî jiyankirina bi kom. Carna jî dibe sedema cudabûna jin û mêran ji hevdu û di wê haletê de zarok jî sergerdan û derbider dibin. Wate pirsgirêkên xelkê li bajar de, pitir bêkarî û akincîbûn e û mêjdem e dewlet ji bo çareserkirina pirsgirêka bêkarî û akincîbûnê, dixebitin, lê nekarîne vê pirsgirêkê çareser bikin û niha jî di zaf ji welatan de ji dest kêşeya akincîbûn û betaliyê dinalînin.

2.4.Kultura kurdî ya hevpar di navbera gund û bajar de

Merem ji wan kulturana e ku li her du civakên gund û bajar de hene. Parek ji kultura kurdî, hevbeş e di navbera gund û bajêr de. Bi vê wateyê ku kultur him li gund û

him jî li bajar de heye. Helbet renga metod û hûrgiliyên ciyawaz hebin, lê heye, eva jî eyankerê wê ye ku ew kulturên hevpar, taybet ninin bi gund û bajêr. Wate kulturên din xeslet û taybetmendiyên gund yan bajar pêk dianîn û taybet bûn bi gundnişînî yan bajêrnişîniyê. Lê ew kultura hevbeş li her du civatgehên gund û bajêr de heye û rêûresma xwe hene.

2.4.1. Rê û Resma Bûkveguhastinê

Urf û edeta jinmarekirin û jinveguhastinê di nav gund û bajarên kurdan de, rê û cihên taybet bi xwe hene. Jinhînan, pêwendiyek pîroz û rewa ye li navbera jin û mêran de. Armanç ji jinhînanê, avakirina yekeyek biçûk ya civakê ye. Zorbeya kurdan bisilman in. Jinxwastin û marekirina wan jî li ser pêrew û rêsayên ola pîroz a îslamê birêve diçin û mêr dikarin heya çar jinan ji xwe re bînin. Lê zorbeya mêrên kurd, tenê yek jinê tînin, urf û edetên xwazgînî û veguhastinê, li deverên cur bi cur ên Kurdistanê de bi awayek giştî wekî hev in, tenê li hin tiştên biçûk de cuda ne. (Yasîn Hesên Goran, 2009: 29).

Jinveguhastinê pîroz bû û rê û resmên taybet jêre hatine danîn ku xelk bi giştî peyrewiyê jê dikin û bi tu awayî xwe jê nadin alî û bi beşek ji kultura xwe dizanin. ((xwazgînî û bûkveguhastinê li ser xwe û hêdî diçe pêş, zaf hizir jê tê kirin û lez jê nahê kirin. Nîşankirin, xenê û bûkveguhastinê li gorî destûrek civakî birêve diçe. Hemû endamên malbatê, xizim û kes nasiyar û heval têde beşdar dibin)). (D. Marif Xeznedar, 2010: 74, B yekem).

Herwek dizanin li gundan de, hemû endamên malbatê bi şev û roj li bizav û xebatê de ne bo cîbicîkirina erkên rojane ên xwe, weke karê çandinî, yan coxîn û xwedîkirina sewalan, Destar hêran û sawar kutan, avakirina xanî û siwaxa banan, ristîn û vehûnandin, nexş û nîgar ...htd. Hemû ewane jî derfet in ku xort ku çavên xxwe bigerînin û yeka dilê xwe desnîşan û bike bi hevsera jiyana xwe (Yasîn Hesên Goran, 2009, R 29).

Cuda ji vana, li gundan de bi awayên din jî hevdu dibînin û dil didin hev. Li gundan de pitir li ser kaniyan yan li dema kar û xebatê li zewiyan de ciwan digihin

hev, yan li dema davet û ahengan de, bi bê şerm dîlan û semayê dikin û hevdu dibînin, yan li dema koç û barkirinê de, keç bi dengê bisoze xwe stranan dibêjin û xortan dîn û sermest dikin. (D. Umer Îbrahîm Ezîz, 2004:20).

Bi giştî merasîma bûkveguhastinê li gundan de bi awayek asayî birêve diçe û piştî xwazgînî, kîrîna zêr û cilûbergan ... htd, rojek dihat diyarîkirin bo bûkveguhastinê. Eger bûk li gundekî din de bibûya, ew bi Hesp vediguhaştin. Wate, bûk suwarî çarpê dikirin û tor yan tara dixistin ser serê wê. Yek ji edetên gund li dema veguhastina bûkê de, ji bo xwarinê, xwarinên curbicur amade nakin, tenê Birinc û Goşt amade dikin û eva jî bûye bi urf û edet.

Li bajar de jinxwastin û jinhînan, bi awayekê ye ku biyava bihev gihîştin û nasîna li nav keç û kuran di nav civaka bajarî (akinciyên bajar) de, pitir li çarçoveya pêwendiyên xizmatî de bûye. Bi pileyek din jî, bi sedema cîranetî û eşîretî ve bûye. Li astek nizimtir de jî, ji riya qutabîbûn li zanîngeh û fermanber û mamostatî li dem û dezgehan de bûye. Ji van riyan ve di bajaran de, peywendiya zewacê pêk hatiye. Li bajar de, cejna taybet bo roja zewacê hatiye lidarxistin. Helbet piştî marekirin û kel û pel kirîna, cejn û davet li mala zava de bûye û piştî nanxwarinê, bûk anîne û davet û merasîm heya derengiya şevê berdewam bûye, lê niha pitir di hola bone û cejnan de, ew aheng di bajaran de birêve diçin.

Çend curên jinxwastin û jinhînanê li nav kurdan de hene, yek ji wan (mezin bi biçûk) e. Wate malbatek daxwaza kiçekê dikin bo xortê biçûk ê xwe û renge ew her du zarok hêj di nav landikê de bin, lê ji hevdu mare dikin û piştî 15 – 20 salan, evcar dema veguhastina wan tê. Ev terse ji jinhînanê, cihwarek nerênî heye û zaf caran jî pirsgirêk û arîşe jê çêbûye û bi telaqê dawî pê hatiye. Nemaze wusa jê hatiye ku li pirsra mezin bi biçûkê de, dujmindarî û xwîndarî ketiye navbera malbatan. Piştî midehekê, jina telaqdayî bi neçarî dibe bizewice û dest ji mal û zarokên berê ên xwe hilbigre. Wate ev cure jinhînanê, encamek zaf xirab piştî xwe bi cih dihêle. (Edalet Talebanî, 2002: 65).

Şêwazek din ya jinhînanê, jin bi jinî ye. Anku du malbat kur û keçên wan dibine hevjinên hevdu. Wate jin li hemberî jinê. Berê ev terse ji jinveguhastinê, pir edet û baw bûye. “Jin bi jinî”yê pirsgirêkên zaf hebûn. Çûnkî li tu demekê de çar kes, çar dil

bihevire razî nedibûn û pêkve nediguncan. Yek ji wan çar kesan razî nebûya, yan pirsgirêkek hebûya, ji her çaran têk diçû û encamek zaf xirab li dû xwe re dianî.

Herweha ‘‘Bedelxwîn’’ (jin li cihê xwînê) yekî din bû ji curên jinveguhastinê, ku jina gundî weke beşek ji qerebûkirina di rêketinên eşîrî yan li pirsgirêkên namûsî de dihat pêşkeşkirin. Her du eşîr yan malbatên dijî hev, bi pêşkeşkirina çend jin, yan ajel û sewalan, yan hinek pere pêk dihatin (D. Elî Werdî: 300 -301). Wate li berdêla xwînê, yên ku xwîn dikeve navbera wan, bi jinan pêk tên. Ev cure jinhînane (Bedlxwîn) dibe bi dozeh (cehenem)ek ji jinê re, ku zaf carî bi karesatan dawî pê tê û pirsgirêk jî çareser nabin û nemaze hin caran kêşe aloztir û mezintir jî dibin.

2.4.2. Rê û Resma Tazî û Behîdariyê

Merasîma tazî û behîdariyê li gund û bajarên Kurdistanê de rê û cihên taybet bi xwe hene ku li civakê de bi bûyerek girîng tê zanîn û hemû beşdariyê têde dikin û hevbeşê xema malbata mirî(koçkirî) dikin.

Dema ku kesek li gund de dimre, hemû xelkê gund ji pîr û cihêl, jin û mêr diçine mala kesê/a mirî û xwe bi xwedî mirî dizanin û li merasîma behî û tazîdariyê de jî beşdar dibin, her ji dema şuştin veşuştin û birina bo nav goristanê û veşartinê heya dawiya taziyê. ((ku kesek mir, piştî şuştin û kifinkirinê, çi li mal yan mizgevtê de be, jin şînî û giriyê jêre dikin û xwe li nav herî û tozê werdidin û piştîre dibin bo goristanê. Herweha tiştên weke Helwa û ... dixin nav sênî (meiecmeyan) û li pêş mirî didanên û dibene ser ziyaretan û dibexşînin beşdaran. Ger kesê/a mirî, mezinê gund, axa yan kesek pêgehdar yê malê be, bi taybetî ger mêr be, kes û karên mirî xwe di nav qur û heriyê de werdidin)) (Eladîn Secadî, 1974: 31).

Reşik û şînî û bendgotin bo mirî li zaf gundan de hebûye û jinan cil û bergên mirî li nav koma xwe didanên, jinên taybet hebûn ku li ser cilûbergan dirûniştin û li ser mirî de distirin, cil û bergan radike û didanê û bi dengê xemnak û bisoz ve dengê xwe bilind dike. Zaf caran dayk û xûşkên mirî, parçeyek ji kincên mirî heya midehek dûr û dirêj hildigrin. Hin caran dema ku dilê wan teji dibe, ew cil û bergan der tînin û hor hor digrîn û bîranînên berê û yên dema saxîtiya tînin berçavê xwe û têr têr digrîn. (Eladîn

Secadî, 1974, R 33). Herweha xelkê gund li roja taziyê de xwe bi xwedî taziyê dizanin û bi hemû awayekê bi hawar û alîkariya xwedî mirî ve diçin û hevkarîyê dikin. Herweha li gundan de urf û edetên din jî hebûn li taziyê de. Dema ku xelk bi armanca taziyê seredan dikin, alîkariyan bi xwe re tînin û pêşkeş dikin heya ku barê ser milê wan di taziyê de kêmtir û siviktir bikin. (Nadir Rostî, 2007: 169- 170).

Dema ku kesek bi her sedemekê ve li bajar de koça dawiyê dike, cuda ji der û cîran û hevalan, hemû xizm û kes û nasyaran jî haydar dikin û tevde li mala koçkirî bo hevxiyê û pişikdariya di taziyê de kom dibin. Piştî wê ku hemûyan beşdarî di veşartina koçkirî di goristanê de dikin, êdî mêr rû ji mizgevtê dikin û li wir tazî birêve diçe. jin jî li mala mirî de rêûresma taziyê birêve dibin. Her çiqas ku niha weke berê nemaye û li nav mizgevtan de hola cuda ji taziyê re hatiye çêkirin û bo jinan jî bi heman awayî birêve diçe.

Dema taziyê û rojên taziyê jî li gor dem û cih bû. Hinek hebûn ku zêde vedikêşan û hinek jî zû bi dawî dibûn. Hemû xelkê, xwe bi xwedî tazî dizanîn û xembar dibûn ((Li gund heya midehek zaf hemû xelkê gund tazîdar dibûn, dengê radyonê ji tu malekê nedihat bihîstin. Tu malekê kel (karê şuştin û veşuştinê) nedikir û xwe nedîşûst heya wê dema ku xwediyê mirî bi xwe diçû û agir hildikir û mencela avê li ser didanî. Li hinek cihan de, tenê sê rojan tazî dihat danîn, lê li hinek cihên din de, hefteyek pê diçû yan zêdetir. Bi giştî 3 roj li mizgevt û 4 rojan jî li malê de dirûniştin)). (Mihemed Cemal Tutmeyî, 2012: 44).

Piştî kesên nîzîkî mirî (koçkirî) heya tazî xilas nebiba, dernediketî derve û mêvaniyê heya şeş mehan, yan heya salekê kincên reş, ji ber kes û karên mirî li xwe dikirin. Piştî hingê axayê gund yan cîran û xizman bo her yek ji kesên koçkirî, kirasek yan pere tînin û cilkên reş li ber derdixin û tazîya wan radikin. Lê ger kesên mirî, begzade yan axa yan kesek naskirî ba, eva 15 rojan xwediyê gund diyariyekê amade dike û ji kes û karên mirî re dişîne. (Mela Mehmûd Bayezîdî, 2015: 39 – 40).

Bi vî awayî merasîma taziyê birêve diçe ku weke kultur û rewîşt û tîtalekê lê hatiye û li gundan de peyrewiyê lê dikin. Renge li hinek cihan de, ciyawazî hebe, lê bi giştî bi vî awayî birêve diçe.

2.4.3. Rola Jinan

Jinan rolek bibandor û karîger li nav civakê de hene û li zaf biyavên jiyânê de cîdestê wan xuya û diyar e. Jin li gundan de hilsûrê jiyânê ye û bi giştî li hemû bizavên nav gund de beşdariyê dike. Wate, jin cuda ji hinek karûbaran ku taybet bi xwe ye û divê bi tenê encam bide, bo zaf karan li rex mêrên xwe disekin, lewre erkê wan giran e, her çiqas ku karîne bi awayek serkevtiyane encam bidin.

Jin cil û bergên taybet bi xwe li xwe dikin ku bûye beşek ji kultur û edetên wan, û bi wan tînan naskirin. Çûnkî her netewe û deverêk şêwazên kinc û cil û bergên wan cuda ji netewe û deverên din in. Li kurdewarî de, jin li mal û derwe di lixwekirina cur û şêwaza cilkan de azad in û li gund de bê pêçe ne û kêma eba hildigrin. Eva jî bi sedema surûştê de vera wan ji dol û çiya, zinar, razeber û qelem. Herweha ji ber hilgirtina şîr û Meşk bi piştê xwe û Cerê avê li ser milê xwe, veguhastina çîlke û berhemên çandiniyê wusa ji jina kurd kiriye ku pêçe û eba li xwe nekin. ((Yasîn Hesên Goran, 2009: 14). Herweha li hinek karûbarên xwe de serbixwe ne û xwediyê saman, pere û karê xwe ne û mêrên wan, ew serbest hiştine di van karan de û rêgiriye ji wan nakin. Yan hin caran, mêrê wan dimre, jin êdî nazewice û bi xwe erkê serperistiya zarokan hildigre û wan mezin dike.

Wate jinan jî maf hene ku pere hebin û pereyê xwe jî xerc bikin. ((Jin di malê de xwedî samana xwe ne, bo mînak pez, reşmal û pere ji mala bavê xwe re yan ji mêr vedigre û tîne mala xwe û dibe bi ya wê. Mêrê wan, nizîkî nextê xwe nabin û xwe têkilî aliyê madî yê hevjinê xwe nakin. Jin jî bi xwerayî pere xerc nakin, belkî bi wan pereyan, cil û berg û hewcehiyan dikrrin û bi wan tiştên ku difroşin û herweha zorbeya jinan mîrat ji mala bavê xwe wernagrin, belkî bi bira û kurmam (pismam)ê xwe dibexşin)). (Mela Mehmûd Bayezîdî, 2015: 78).

Li civaka kurdî de, hin edetên xirab li hemberî jinan hene ku li vê derheqê de mafê wan hatiye xwarin û nekarîne azadane, ew mafên taybet bi xwe misoger bikin; weke Jin bi jinê, mezin bi biçûkê, yan marekirina bi zarokatî. Serbarê wê jî jinên kurd bi taybetî li gundan de beşdar in li hemû bizav û xebatên gund. Yanî nabe em basa gundan

bikin, lê rola mezin ya jinan piştguh bixin. Jin hemû kar û erkên gund dizivirînin û kesên herî çalak in.

Jin li bajaran de vekirîtir in û sînorê karê wan berfirehtir e. Herçiqa ku bi awayek giştî di Rojhilata Navîn de, midehê reftarên wan sînordar e, lê jinên bajarî bi sedema pêşketina warê aborî û civakî û hebûna alavên şaristanî, vekirîtir in û derfeta wê ji wan re pêk hatiye ku heya qasekê pişt bi xwe girê bidin. Jinên bajar jî herwek jinên gund, girêdayî malbatên xwe ne û erkê wan maldarî û xwedîkirina zarokan e, lê tevî wê, ev mafe jî hene ku bixwîn in. Domandina xwendinê û tewawkirina wê, derfeta wê ji wan re afirandiye ku li dem û dezgehên fermî ên hikûmetê weke fermanber, pizîşk, mamosta û ...htd mil bi milê mêran bixebitin.

Ew yek bûye sedem ku dahatek baş ya aborî hebin û heya qasekê li vê derheqê de xweser û pişt bi xwe qahîm bikin. Kuwusan e jinên gundî, serbarê karkirina di malê de, karê derve jî dikin û alîkariya mêmên xwe jî didin. Jinên bajarî jî, serbarê karê malê, karê derve jî dikin, lê cudahî di wê de ye ku karê jinên bajar pitir fermanberî ye û bi mêran re di dem û dezgehan de kar dikin. Tevî wê jî, jin bi tenê li dem û dezgehên hikûmetî de kar nakin, belkî li kerta taybetî, kompaniyên nehikûmî û hin bazar û molan de jî kar dikin û nemaze hin ji wan, karê bazerganî jî dikin. Bi awayekî giştî, rewşa jiyana jinên bajarî li gor jinên gundî baştir û dabîntir e. herçiqa ku pirsgerêkên wan jî zaf in, lê arîşeyên wan, pitir civakî û kulturî ne û tenê ji bo wan nine, belkî bo mêran û giştî ye.

2.4.4. Mezargehên Olî

Bîr û baweriya xelkê bi mezar û cihên olî ji kevna ve heya niha her maye û zaf bawerî bi wan mezargehan hene û li ser vê baweriyê ne ku ew, çareseriya zaf êş û azar û nexweşiyên dikin. Herweha piştî çareseriya pizîşkî ji nexweşiyên xwe re, mezargehan bi çaresera nexweşî û derd û belayên xwe dizanin. Xelk zêde pişt bi xwe bi pîr, mêmçak, qebr, goristan, şêx û ewliya û efsaneyên curbicur girê didin. Tiştên seyr û semere li ser wan vedigêrin û bi beşek ji bicîhatina miraz û xewnên xwe dizanin. Mezargeh û cihên pîroz bi awayên cur bi cur li zaf cihan de hene û bi xwe ava kiribûn û ji hemî aliyekê ve rû jê dikirin.

Li dema xwe de, mêrxasek mirî ye û li cihekê de bi axê hatiye spartin, wan derdora qebra wî bi kewiran şûre danîne û kelek hildane ku jêre dibêjin (Qisin). Xelk bo ziyareta ew Qisinî, alayê li ser hildidin. Ew ala, pêk tê ji darek dirêj, parçe peroyek kesk yan sipî bi qasê du buhostan pan û du buhostan jî dirêj bi serê dar re girê didin. Ew ala yan beydax, ji wê re hatine ku hinekan nezir kirine ku şeweya pîroziyê werdigrin û kesên ji ber nesaxiyê seredana wan Qisnan dikin. Parçeyek biçûk ji parçe pero jêve dikin û bi armanca çareseriyê bi zenda nesax re girê didin. Yên wusa jî hene ku parçeya alayê bi xwe re nabe, belkî peroyekê tîne û bi dara beydaxê re girê dide. Her yek ji wan Qisnan, tiştek bi xwe girtine. Wate yên wusa hene ku taw û lerz bi xwe girtiye, ya wusa jî heye ku sipl bi xwe ve girtiye. Bi kurtî her yek ji wan nesaxiyek girtiye xwe. Ew kesê ku ew nesaxî heye, diçe ser wê mezarê û hinekê dimîne û piştê ji nesaxiyê rizgar dibe.

Jin diçine ser gora kesatiyê binav û deng û hûreberên (kevir) biçûk li ser gora kesatî hildigrin û niyet û miraza dilê xwe tînin û bi keviran, kêla qebr dihingivin. Ger kevir bi kêliyê zeliqî, eva miraz qebûl bûye, lê eger negirt û kete xwar, eva niyet qebûl nebûye û misoger nabe. (Eladîn Secadî, 1974: 243 – 244).

Li hemû gundan çendîn merqed û mêrxas hene ku ji bo çareseriyê zaf nesaxiyan, xelk diçine ser gora wan (bo lerzetaw, pişt û çok êşan, nezokî) û bo parastina ji bela û ...htd û li ser gora wan, hawar û gaziya xwe bo dibin. (Mihemed Cemal Tutmeyî, 2012: 49).

Herweha ji bilî mezargehên ola îslamê, Dêr û kilîse jî hene ku hejmara wan bi dehan û sedan bû li Kurdistanê de. Herdem cihê baldariya kurd û netewên din ên kurdistanê bûn û ji niza, dua û lahî û dalahiyan, yan nezirgirtin û niyazgirtin, her Dêrek taybet bi nexweşekê bû. Diyardeya bawerbûn bi mezargehan zaf berbelav bûye û heya îro jî her berdewam e û xelkek zaf bawerî pê hene û rê û rêkarên dûr û dirêj diborînin heya ku digehin wan.

2.4.5. Kesatiyên Olî

Kesatiyên Olî di nav kurdan de rolek sereke dilîzin û destê wan di zaf karûbarên civakê de diçe û xelk di jêr rênimayî ên wan de tevdigerin û ji gotin û axaftinên wan

dernamekin. Mela, şêx, seyîd, Hecî û ...htd, kesên payebilind in di nav xelk û civakê de, û xelk bi hemû terzekê ve pabendî wan in û bi dû wan ketine.

Şêx ku herçiqas peyvek erebî ye, lê di nav kurdewarî de heman naznavê erebî nagehîne ku bi wateya serok êl yan serok eşîret, belkî manaya pêşewayê ayînî û terîqeta sofîgerî digehîne. Ew texek in ku pêgeha civakî ya taybet hene û li gor pirrehendiya rêbazên ayînî jî, fire rehendî li curê şêxan de jî heye.

Mela jî kesatiyê ayînî û pêşnimêjê mizgevtê ye, yan Quranxwînek e ku şehrezayekî warê ayînê ye.

Hecî jî naznavê ayînî ye û pêgehek civakî heye û serdana mala Xweda kiriye û piştî vegera ji bajarê ‘‘Meke’’yê, naznavê ‘‘Hecî’’ji wan re bi kar tê. Ji wan re heye ku weke hêma û regezek kulturî, parçe qumaşeke sipî yan zer, ku nimûneyek naskirî li nav bisilmanan de ye, li serê xwe bialînin. Êdî qîsekirin, reftar û tevgeriyana wan di nav civak û jîngeha civakî de şêwe guhertinek bi ser de tê û pitir dibe cihê bawerî û hitbara xelkê.

Seyîd jî curek din e ji kesatiyên olî, ku ji neviyên pêxember re (D. X) bikar tê. Yên ku ev naznave hebin, dikarin cemedaniya kesk li ser û şûtika kesk jî li piştta xwe bialînin, eva jî nîşaneyê cuda, û pêgehek civakî û ayînî ye.(D. Mihemed Şuwani, 2012: 237- 238).

Wate, ew kesatiyên olî, ji aliyê xelkê ve tên naskirin û her yek ji wan, pêgehek taybetî heye û li biyavekê de, rênimayî a xelkê dike û cihê baweriyaya xelkê gund e.

Mêrên olî rolek baş di civakê de hene, bi taybet li warê civakî de. Zaf carî li dema nexweşî û şer de dibine sebaba aştkirina xelkê û xelk jî ji gotina wan dernamekin. Herweha ji bo avakirina pêwendiyên xizmatiyê rolê dilîzin, weke jinmarekirin, yan jin telaqdan. Xelkê baweriyek zaf bi şêx hene û li zaf biyavan de penayê bo şêxan dibin û tişt û pere û xwarin û diyariyên binirx pêşkeşî wan dikin. Lê hin ji wan mêrên oldar, ev pêgeha ayînî ku hene, ji bo berjewendiyaya xwe û malbata xwe bi kar dianî û fêl ji xelkê dikirin bo bidesthînanana pere û samana zaf û pêgihandina zarokên xwe û pile wergirtin ji kesên nizîkî xwe re.

2.4.6. Cejn

Di nav hemû neteweyan de, boneyên xweş û nexweş hene û li wan deman de hesta xwe tînin ziman. Cejn jî yek ji wan boneyên xweş e ku zaf ji gelan hene û li wan cejnên de xweşiyên xwe nîşan didin. Her yek ji wan cejnên, çîroka çêbûna taybet bi xwe heye. Zorîneya kurdan jî bi sedema wê ku bisilman in, pişikdar in di wan cejnên îslamî de û xweşiya xwe nîşan didin. ((li kurdewarî de du cejnên olî ên Remezan û cejna Qurban û meha Remezan, Rojî, Parşîv, nimêj, terawêh, nimêja Înê, cemaet, nimêja cejnê, tehlîle, Yahû, hal û elqeya derwêşan dîmenek taybetî heye.

Xincî wê, jidayîkbûna pêxember, Mewlûda nav malan û mizgevtan, midehê kombûnê, jihev nizîkbûna kes û kar û dost û hevalan, nemaze Mewlûda pêxember (d.x) li bajarê Hewlêrê de, ahenga taybet bi xwe heye. Ji wir ve jî ew urf û edet li serdema desthilatdariya Sultan Mizefer de (1154 M – 1233 M) li hemî welatên îslamî de belav bû. Herweha cejna mesebî ya Êzîdî û Yarsanan Ehlî Heq, beşek girîng ji edet û nerîta neteweya kurd e. Rast e hin wêne û naveroka mesebî ya taybetî têde heye ku ji bisilmanên Şîe û Sunne cuda dibe. Lê zortir edet û nerîtên neteweyî ên giştî ne û ji hemû aliyekê ve bi xweşî tînen wergirtin, bi taybetî seyran, geryan û ahenga davet û dîlan, Duhol û Tepl û zurna)). (D. Marif Xeznedar, 2010: 73- 74 •B. yekem).

Li rex wan cejnên de, gelê kurd pûte û girîngiyek zêde bi cejna Newrozê dide. Di wê rojê de, komek merasîm û edetan jêre pêk tînin. Komek bîr û hizr li dor dîroka wê rojê hene ku her yek ji wan bas ji efsaneyekê dikin, lê piraniya wan li ser vê yekê hevdeng in ku ew roj bi serê sala nû dizanin û bi dawîya Zivistanê û hatina buharê dizanin. Ev cejne li ba gelê kurd, girîngiyek taybetî heye û di wê rojê de, piştî wê ku agir hat teyîsandin, bo roja din, xelk xwarinên zaf û curbicur amade dikin, xwe diguherînin û bi kincên cuwan, nû û rengîn rû ji deşt û dol û xwezayê dikin û heya êwarî, mijûlî listin, govend û dîlana reşbelek a keç û xortan û çendîn çalakiyên din dibin û rojek xweş di wê rojê de derbas dikin û heya dereng venagerin gund. Xincî vana, cejna taybet bi xwe jî heye, weke cejna Newroz. Hin cejnên olî ên din, weke Êzîdî, Yarsanên Ehlî Heq û di van rojan de aheng û xweşiyên taybet tînen lidarxistin.

2.5.Rengvedana kultura kurdî di nav wêjeya kurdî de

Rengvedana kultura kurdî di nav wêjeya kurdî de, pêwendiyek qahîm, neveqetiyayî û xwedî dîrokek dêrîn heye. Em dikarin bibêjin ku li gel peydabûna wêje û edeba kurdî, ew pêwendî jî ava bûye û roj li pey rojê geşe kiriye û li nav hemû janrên wêjeyê de reng vedaye û bûye bi cihê pûte û girîngiya wêjevan û nivîskaran bi giştî ku nekarîne xwe jê bidin alî yan piştguh bixin.

Kultur di nav edeba kurdî de cihek pir girîng heye û bi kûrî çûye nava janrên wêjeyê, vêca çî edeba fulkilorî yan millî ya edeba nivîskî be.

Dab û nerîta kurdî bi hemû beşên xwe ve cihê girîngî û pûtedana wêjeyê bûye. Ji wê riyê ve, zaf ji dab û nerîtên kurdî mêjdem in ku ji aliyê wêjevanan ve hatine tomarkirin û li ser axivîne, û matiryala mijarên edebî ên wan bûye û weke dîroka wêjeyê lêkolîn li ser kirine. Gelê kurd jî girîngiyek zêde bi wêjeya xwe daye, bi taybet ku zaniye bas ji kultura wan dike, û tê veguhastin ku derbirê hizr û wijdana civakê û hilgirê paşmayên rewşenbîriya gel bûye. Serbarê wê jî, xebat û tekoşîna van du zanayê Almanî (Yakob Girîm 1775 – 1863) û (Wîlhîlm Girîm 1786 – 1859) bi destpêka zanista lêkolîn û fulkilorê tê danîn.

Lêkolîn ji mijarên fulkilorê, destpêkê bi vekolînên dîrokî û girîngîdan bi bermayên kevnan ên deb û nerîtên pêşînan ve girêdayî bû))(D. Şukiriye Resûl, 1997: 3). Piştî hêdî hêdî ev zaraweya li cîhanê de ji aliyê Ewropî, Ereb û Farsan belav bû. Gelê kurd beşa zêde ya jiyana xwe bi pûtedn bi edeb û wêjeyê ve mijûl kiriye. Vêca armancdar be yan bêarmanc. Wate cara wusa hebûye ku bi armanca hînbûnê, wêje bikar aniye weke (Nûbuhara Ehmedê Xanî) ku bi merema hînbûna zimanê erebî bi helbest nivîsandiye, yan bi merema karkirin û xwebihêzkirin li dema dirûn û sawarkutanê, stran û helbest xwendine, yan bi merema handan û xemlandina meclîs û dîwnxanan, lawje, heyran û lawik strîne û helbestên şoreşvanî û bi hest bi armanca berevanî û berbirûbûna bi dujmin re gotine.

Hemû evane eyankerê wê ne ku gelê kurd û wêjeya wê bi berdewamî li xizmeta kultur û ferhenga netewa xwe de bûye. Lewre cehd kirine ji riya wêjeyê ve, kultur û

zimanê kurdî bê parastin. Kuwusa bû wêje û kultura kurdî, pêwendiyek dîrokî û dêrîn heye û ji hev neveqetiyane û cihê girîngî pêdana wêjevanan bi giştî bûye û gel jî nekariye li rex kultura xwe, ji edeba xwe bêhay bimîne û hertim haydarê wêjeyê bûye û xwe di wêjeya kurdî de dîtiye.

Li vê çarçoveyê de, ji dîtingeha fulkilora kurdî û edeba nivîskî de, emê hewil bidin pêgeha kulturê li wêjeya kurdî de destnîşan bikin.

2.5.1. Yekem- Li wêjeya fulkilora kurdî de

Fulkilora kurdî pêwendiyek rasterast bi kulturê re heye û cemikek jihevneqetiyayî ne û her bi hev re bûne û berdewam kar û karvedan bi hevdu re hebûne. Dema ku mêzeyî berhemên fulkilorê dikin, bi hêsanî xuya dibe ku kultur û edet û nerîtên gelê kurd têde reng vedane, bûne bi beşek ji berhemên fulkilor û dewlemendkirina wê.

Edeba fulkilorê dîrokek kevna heye, lê vekoleran midehek dirêj piştî peydabûna edeba fulkilorê, lêkolîn û piştî jî tomar kirine û beşên wê ji hevdu cuda kirine û nîrx jêre dane ((Edeba devkî ji wê rojê ve ku mirov hest bi cuwaniya xwe û jiyan û surûştê kiriye, heya roja tomarkirina ew gotinên cuwan, tenê yek wêje li rojevê de bûye. Wate edeba millî, edeba komê mirovên kevna ji nevî û piştê ve ji nevî yan piştê din bi mîrat maye û li nav mejjîyê wan de parastî maye û bi dew û jiberkirinê hatiye vegêrandin)) (D. Marif Xeznedar, 2010: 179,B, yekem).

Bi vê wateyê ku wêjeya zarekî dîrokek kevna heye û bi peydabûna mirov re serî hildaye. Lê zaraweya fulkilor, zaraweyek e ku dîrokek dûr û dirêj nine û nû ye û ((şûnwarnasê Birîtanî (Sîr Wilyam Con Tomas 1803 – 1885) ew zaraweya fulkilor li 22.08.1988'an de ji mijara fulkilor û kelepûrê re danî ku li ser zar dijîn û zîndî bi çav tînin, bi kar anî. Ev zaraweya roj li pey rojê li xurtbûnê de bû bona wê ku keresteyên dahênana gel bigehîne ku regezên wê bi dev û ji riya nîfş û neviyan ve bi kar hatiye û kurdan jî bi kar aniye û tu kesê arîşe yan pîrsgirêkek pêre nebûye.

Corc Hirtsoc li dor fulkilorê dibêje: ((Edeba fulkilor bi wateya taybet û giştî ya xwe, diyardeyek edebî, fikrî û rewşenbîrî ye ku berdewam bûye. Li bingehe de

karîgeriya paşmaya nenivîskî ye ku armanc jê, diyarde, efsane, hekayêt û stranên millî û cureyên din ên wêjeya nenivîskî ne)) (Şehle Kerîm Hisên, 2015: 4).

Kuwusan e ((Fulkilor peyvek lêkdayî ye ku ji her du peyvên (Fulk) û (Lor) pêk hatiye û tê wateya pend yan jî çîroka xelkê digehîne. Edeba fulkilor bi hemî kelepûr û samana kevn tê gotin ku bi dirêjahiya dîrokê hatine afirandin û berhema xelkê ne û mane)) (P.Y.D Ebdulwahîd Muşîr Dizeyy, 2001: 126).

Herweha ((beşek ji kultura millet ku (zarekî) ye, fulkilor e, ku gotinên Pêşiyân, gotinên nesteq, meselok, qerf û henek û tirane, hozan, awaz û stran û lawik û heyran, çîrok, dastan, efsane û ...htd ji xwe digre. Beşek din jî ku Entografiya jêre tê gotin, tiştên madî û nezarekî ne (hunera millî) weke: Davet û govend, nexş û nîgar û diramayên netewî û urf û edetên weke: Jin xemlandin, xwazgînî, bûkveguhastin, mirî veşartin, çêkirina xwarinên millî û tiştên weke: çît û darçît, Tewn û ristin, şal û şepik, Gore û Kilaş raçandin, cil û berg, kala, dirûne, Destar hêran, Coxîn kutan, Sawar kutan û ...htd vedigre)) (Sedredîn Nûredîn, 2005: 10- 11).

Berhemên edebî ên fulkilorê bi hêsanî di nava xelkê de belav dibin û xelk bi hêsanî wan ji ber dike ku bi zimanê sade û sakar ên xelkê hatine baskirin. Zaf ji berhemên fulkilorê bi sedema wê ku temsîla êş û azarên mirov dikin, hunerek resen û girêdayî civakek diyarîkirî ne, berhema xelkê ne û xwediyê wê jî nexuya ne û gel xwediyê wê ne; ku pişt bi pişt ji bab ve bo kur û nifş û neviyên dû wan re mane û bi awayek zarekî hatine vegêrandin.

Gelê Kurd li warê fulkilorê de zaf dewlemend e û li zaf waran de karîne cîdestê xwe nîşan bidin û têde kultur û edet û tîtalên xwe biselimînin. Kêm kes ji kurdan hene ku şehrezayê kultur û fulkilorê kurdî nebe ((rojhilatnas û bîrmendê mezin ê ermenî ‘‘Ebovîyan’’ ku li sedsala 19’în de bi yek ji rewşenbîrên pêşketinxwaz û mezin ê Røjhilatê tê naskirin, nivîsandîye: Hemû kurd, nemaze pîrek û kalemêrên nexwendewar jî, rih û taybetmendiya hozanvanî li hundurê wan de heye û hemû li strînê de xwedî şîyan in û bi sadeyî û li ser xwe stranên dibêjin. Li ser dol, çiya, sûlav, rûbar, gul, çek, Hesp û bivêrî û çelengî, bedevî û nazdariya keçên kurd de dixwînin û distirin, ewane tevde ji kêrîhiya hiş û derûna wan ve tîne derve)).(D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 13).

Wate, berhemên fulkilorî li hemû kuncên jiyana kurdewarî de belav bûne û biçûk û mezinan Hespê xwe têde baz dane. Ji ber wê ku piraniya neteweya kurd nexwendewar bûne û pitir girîngî bi fulkilorê hatiye dayîn û jiber kirine û zar bi zar û pişt bi pişt parastine û tevî metirsiyên berdewam, di bîrdank û mejiyê wan de mane û nehiştine ku wunda bin. Herweha li piraniya berhemên fulkilorî de, kultur û urf û edetên kurdan hizûr heye û beşek sereke ya berhemê pêk tîne, weke stranên fulkilorî, dastan, çîrok, meselok, tirane, qerf û henek, efsane û ...htd. Li jêr de emê bo mînak hinekan bînin ber bas.

2.5.1.1.Stran

Stranê li wêjeya fulkilorî de, rûberê befirê ji xwe re girtiye û li zorbeya beşên jiyana xelkê de reng vedaye û cihê girîngî û pûteya piraniya xelkê di wê serdemê de bûye û niha jî berdewam e. Helbet vê yekê jî sedema xwe hebûye, herweha stranên fulkilorî, zaf curên xwe hene û weke stran, xweşî û nexweşî, dîwanxane, zarok, îş û kar û ...htd. Wate dîroka wêjeya fulkilorê ji wê rojê ku mirov xwastiye hesta xwe li hemberî derdora xwe bîne ziman, bi lawje û stranên hesta xwe nîşan daye û li stranên wan de reng vedaye ((stranên fulkilorî çiqên zaf hene û hemû aliyên jiyana kevna li gorî serdeman vedigre ku dikare siyasî, olî, civakî yan wesfa surûşt û ...htd be.

Ji ber vê yekê ye ku Kamran Mukrî dibêje: Hunrawe û hozanên fulkilorî, neynûkek pak ya jiyana kurdewarî ne, bingeha hunraweya kurdî ne)) (D. Îdrîs Ebdula, 2014: 114 'B , sêyem). Wata stranên kurdî reh û rîşalek dîrokî ya dûr û dirêj heye û mil bi milê kulturî urf û edetên kurdî tevî berheman de tomar kiriye, ku li gor hewcehiyê, emê hinekan bînin ber bas.

2.5.1.1.1. Stranên karkirin û xebatê

Stranên herî baw û edetî ên fulkilorî ne ku heya niha zaf mijarên kulturî û urf û edetên kurdî têde hatine baskirin û hin ji wan edet û nerîtên ku dema xwe li heynê karkirinê de kirine bi stran û beste û li dema karkirinê de hatine gotin. Wate li zaf karên wî serdemî de stran hebûne. Helbet evê jî sedema xwe hebûye. Bi vê manayê ku li dema strîn û lawjegotinê de, dest, ling û endamên cismê xwe livandine û ji karên xwe re hêz û

qawetek zêdetir daynê. Çûnkî wê demê hemû karek bi sadeyî û bi hêza dest û zend û baskan ve hatine kirin, nek bi alavên pêşketî. Lewre ji riya lawje û stranan ve, karên wan bileztir û baştir encam dane, û li piraniya karan de stran hatine gotin yan stranên taybet bi xwe hebûne, ku li jêr de emê hinek ji kar û stranan bidin berçav:

2.5.1.1.2. Strana Sawarkutanê yan zibareya Cohnî

Piştî wê ku Genim hate pakkirin, di Mencilk taybet de dikelînin û piştîre hişk dikin û amade dibe bo kutan û Sawarê. Vêca koçalekê dikolin û suwax dikin heya ku hişik dibe. piştîre xelk bi zibare kom dibin, ciwan û mêr darekê ku weke Kutik e, digrin dest û dikutin û jin jî beşdar dibin di komkirina ew genimê ku li dema kutanê de dirije derdorê. Piştîre Genim ter dikin û bi dor bi daran ku li hemberî hev de cî girtine, dikutin bona wê ku bibe bi Sawar. Çûnkî dema xwe Aş nebûye û bi wî awayî kotan e. Li dema karkirinê de, yekî/a dengxweş strana taybet bi sawarkutanê dibêje û yên din li dû de dubare dikin û hêzek zêdetir jêre didin. Heya dema ku kar bi davî dibû, bi vî awayî berdewam dikir û naveroka stranê jî pêk dihat ji edet û nerîtên kurdî û alavên stranê jî, kultura kurdî bûn weke mînak:

Ev Sawar e

Genimî par e

Lo ewsar e

Halla ya Ella alla

Hencîrokê bin davêda

Kîj balîf e û kur parwêda

Halla û Yalla

Ne kêç im ne Espê me

Ne Pêşke ne tepome

Tenha kuştay baray tom

Dewere maçekim derê

Babitkeme dostî xom

Halla yalla (Mihemed Cemal Tutmeyî, 2012: 31 – 32).

Bi vî awayî karên xwe encam didan û kora stran û Beste bi hemûyan re gerim dikirin heya ku hemûyan bi hev re kar bi davî dikirin.

2.5.1.1.3. Strana Destar Hêranê

Karê han pitir karê jinan bû. Destar du kevirên pan bûn ku li ser hev bûn, kunek li navenda wê de hebû ku ji riya destke darekê ve dizivirî û jin li hemberî hev de dirûniştin û bi hêza dest û milê xwe dizivirandin û Genim dixistine nav de û dikir bi Sawar û Genimê kutayî. Bo vî karî jî stranek taybet hebû ku jinan bi dengê xweş ên xwe distirîn:

Hay hêrra hêrra hêrra

Me Destarê xwe hêrra

Me Genim çand û li dorê bajêra

Sersingê yarê Hirmîna zêra

Xencer tênaçît ji pêlekê zêra (Xalid Hisên, 1985: 26)

Ew karê han jî bi vî stranê berdewam dikir heya ku bi davî dihat û nizmiya stranê jî diguherîn û li gor xwasta xwe digotin.

2.5.1.1.3.1. Zibareya Genim

Eva jî bi awayê Zibare tê kirin û jin û mîr tede beşdar dibin û ji wê demê de (Kombayn û Derase) nebûye, bi Daska dest, Genim dirûne û di wê rojê de bi awayê aheng û stranên ve karê dirûna xwe encam dane û bi pêşbirkê û lawje û stranên karê xwe dikin û bi rîtma dengê Dasik û liv û bizavên wan, kesek distire û yê dî jî li pey de dibêjin:

Hey nerme nerm e

Havînan çend germ e

Zistanan sexte û serm e

Hatim nermê ramûs im

Kîjolê eyb û şerm e

Kîsey Xeney lo dênim

Be Gulawî loy dertişênim

Le xewî heldestênim

Zulfanî têheldênim...(D.Şukriye Resûl Îbrahîm,1984: 118).

2.5.1.1.3.2.Zibareya Nîsk, Tûtin û Maş

Eva jî bi heman awayê Genim e, lê Dasika dirûnê pir bi kêmî bi kar tê, belkî bi dest karê dirûnê encam didin. Hin carî jî jin, mêr û zarok bi hev re encam didin. Bo vî karî jî stranên fulkilorî ya taybet bi xwe heye:

Bejnê tom darew dar e

Sîngî Qurîng e û Qerat e

Be gwêyney xom gwê daye

Lay lay bo kurî derê

Dar le darê her birdî

Westaw kara têk birdî

Çavkal lankî dejînî

Navî heyranê dêne (Nadir Rostî, 2007: 161).

2.5.1.1.3.3.Meşk hejandin

Meşke ji kevilê heywan û sewalên mezin weke Çêl, Gamêş û Bizinan tê çêkirin û piştê bi dar ve tê hilavîstin û jin wê Meşkê dihejînin û Nivîşk, Do, û Dokeşk û piştê jî Dandokê pê çê dikin û li dema hejîna meşkê de, strana taybet heye ku jin bi hev re distirin:

Meşke bijê wanabê

Kanî gulan meydan bê

Heyranit lê mêvan bê

Hey malebabim Meşkê

Emr û çavî min Meşkê. (Eqîle Rewandizî, 2010: 38).

Ger em balê bikşînine ser stranên karkirinê, dibînin ku li zaf ji wan de, neveroka stranan pêk hatiye ji baskirina kultura kurdî û urf û edetên kurdî û bi eşkere li wan de reng vedane. Stranên karkirinê zaf û berfireh in û curên din hene weke :Pez doşîn, Bêrî, Çêl doşîn, cotyarî, Mazû çinîn û nçêîrvanî û ...htd. lê em nikarin bi tewahî bas jê bikin, je ber ku basa me dirêj dibe, lê fulkilorî kurdî li vê derheqê de pir dewlemend e.

2.5.1.1.4. Strana Bûkveguhastin û Davetê

Tevî karê zaf yê xelkê, lê xweşiyên wê ji bîr naçin û boneyên xwe ji bîr nekirine û girîngiyek zêde pê daye, eva yek ji demên herî xweş ên merasîma bûkveguhastinê ye ku li jor de me qala wê kir. Komêk stranên fulkilorî li vê derheqê de hatine gotin. Herweha komêk stranên davetê hene bo demên bûkveguhastinê û nemaze li dema karkirinê de jî, bîstekê davet û reşbelek ji bo dilxweşiya keç û kuran hatiye kirin. Li dema anîna bûkê de hin lawje dihatin gotin ku eva jî nimûneyek e:

Bûkane bûkane bûkê

Bûkman çend cuwan e bûkê

Xeney le Biskane bûkê

Guwarey le giwêyane bûkê

Bûk hatiye le şarî bûkê

Dest û pê Mirwarî bûkê

Naka kurêy xarî bûkê. (D. Umer Îbrahîm Ezîz, 2004: 46)

2.5.1.1.5. Stranên Evînî

Ev strane yek ji xwast û meremên mirovî ye, mirov her ji zû de ji dildar û evîndara xwe re hesta xwe nîşan daye û vîn û heza dildariya xwe bo kesa/ê beranber

aniye ziman. Jiyan jî bo her du regezan e ku bihevrejîyan cuwan kirine û berdewamiyê pê didin. Lewre zû xoşewîstiya jin û mêran çê bûye û hesta evîndarî û hejêkirina xwe bi stranan bo hevdu anîne ziman.

Eme beynêke em zame lême

Qetrey zuxawan şev le nav cême

Wey bêne û bîbrin kifîn webalam

Leban tate şor her bot menalam

Kewtim bew gêjey behrî xeyalan

Her min kuştêy tom (Sosin)î xalan. (D. Îdrîs Ebdula, 2014: 123 ‘B , sêyem).

2.5.1.1.6. Strana Zarokan

Eva terzek e ji stranên ku taybet e bi zarokan, ku hinek taybet in bi keçan û hinek jî taybet in bi xortan. Lê hinek jî hene ku têkel in û kur û keç dibêjin. Bi taybet li demsala payîzê de, zaf caran baran dereng dibare, ku eva jî jî dexl û dan re baş nebûye. Zarok dilgiran dibin û bûk (bûkele)ekê çê dikin û yek du ji wan, bûkeleyê bi serê darekê ve dikin û kolan bi kolan digerînin û lawjeya ‘‘Bûke baranê’’ dibêjin heya ku baran bibare. Yek dibêje û yên din jî bi dû re dixwînin û xelk jî avê pê de dikin û pere û xwarinê bi niyet û armanca baran barîne didin wan, ku bi vî awayî ye:

Heyaran û meyanan

Ya xwa dekate baran

Lo feqîr û hejaran

Emsal bibarê baran

Bûke bebaranê

Seatî caranê

Avî bin dexlanê

Demê bûkê şîrinken

Le niyetî baranê (D. Şukriye Resûl Îbrahîm, 1984: 138 - 139).

Bi vî awayî wêjeya fulkilorê li zaf biyavên jiyana kurdewarî de amadeyî heye û bo hemû meremekê, strana xweş û sade ku hemû xelk tê digihîje, hebûye û cihê girîngîdanê bûye.

2.5.1.2.Efsane

Hunerek kevnar a gelan e û her ji destpêka vejyana mirov, ji dema ku hest bi derdora xwe kiriye, efsaneyên curbicur vegêrandine, bi taybet ew bûyerên ku li derdora wê de rû dane û zaniyariyek wusa li dest de nebûye, Lewre xwastiye bizane û binirxîne. Bi taybet Borkan, Birûsk, gure gura ewran, meh, stêrk û roj ...htd, xwastiye wan binase, lewre efsaneyên curbicur li derheqa wan de çê kirine û tiştên curbicur li ser wan baskirine ku zorbeya wan xeyalî û dûrî lojîk û eql in.

Nivîskar û vekoleran zaf lêkolîn li ser efsaneyê hene ku Kirîs. H. Kuyîv dibêje: ((Efsane beheştê xeyalên mirov e, mirov li vê dunyayê de, evdalê heqîqetê ne û ew evdaliye li hêvên û zatê mirov de reh û rîşal dakutiye, bigihîje her pile û payeyek zanistî û ebistmolojî jî her dev jê bernade. Renge di vê qonaxê de, reftarek din pêre bike. Eva cehdek kevnar a mirov e bona ewle û tenahîbexşîn bi riha ewdal û sergerdane wê, cehdek e bona vedîtin û ramkirina nepeniyên û verewandina tirsê û dagîrkirina giravên sergerdaniyê ...)). (D. Îdrîs Ebdula, 2014, B 3: 57).

Mijarên efsaneyê pitir xeyalî ne û ji bo têgihîştinê ne ji derdorê û verewandina hinek tirsê ye ji derdorê û ew bûyerên ku di bêdesthilatiya wan de rû didin û gotinên nesurûştî derheqî wan tê kirin û xeyal û fantezî tede serdest in ((Hin zana li ser vê baweriyê ne madam ku efsane berhema destpêka jiyana mirovahiyê ye, wate serdema zarokatiya jiyana mirovahiyê, lewre ji hesta zaroktiyê nîzîk in û zarok hez ji wan çîrokan dikin û ji bîr nakin. Ger ji nerîna felsefî ve mêzeyî efsaneyê bikin, em dikarin bi curek ji hişyariya civakî dabinên. Herwek bi hewildanek destpêkî ya mirov tê zanîn bona wê ku ji cîhanê tê bigihîje û cîhanê binase. Li efsaneya Yûnan a kevnar de, her tiştêkê Xwedayê taybet bi xwe hebû, weke Xwedayê ciwaniyê, xwedayê hunerê, xwedayê helbest û baran û zaf bûyerên din ên surûştî. Lê dîmenên efsaneya Yûnan a

kevnar ji efsaneyên zaf netewên din tên dîtin, ev jî ew e ku mirov her bi xwe li encamê de qehremanê efsaneyê ye))(D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 17 –18).

Alav û amûrên nav efsaneyan, pitir pêk tên ji Kilaw, Bermal (Sicac), firîn, Dêw, Serk û ...htd. Herweha dem jî di nav efsaneyan de asayî nine û pir bilez derbas dibe weke derbasbûna sedan salî di çend xulekan de. Herweha cih jî zaf caran di waqî' de nine, weke serê dunya û binê dunya û bajêrê ecinda û çiyayê Qaf û ...htd. Yan mirovê dukert û bûne mirov a ajel û têkelaw û bûn bi dar û ber ...htd.

Efsaneya kurdî, wêneyê Dêw û Dirinc û mirov dike bi nîşaneyê ew pirsgirêka ku ji kevnar ve li nava mirov, di nava hêza baş û xirab, yan hêza xêrxwaz û hêza xirabe de serî hildaye. Di wê pirsgirêkê de hêza xêrxwaz ku pêk hatiye ji mirov û eva wêneya millet e, hemû cihek girtiye, li hemû cihekê de heye û bê tirs li jêr tîrojka rojê de dijît û her başî û çakî afirandiye. Lê hêza kelaweyên kevn û herifyayî, zaf ji tîrojka rojê ditirsîn û her dema ku roj derhat, ew wunda dibin. Wate ji wê parçe roja ku di zaniyariyên efsaneyên kevnar ên Yûnan a kevn ditirse. Rûmet û rûçikê vê hêza xirab di efsaneya kurdî de weke xwe nemaye. Belkî hin tiştên ayînî ên taze jî têkel kirine. Bo mînak dibêje: Dêw Dirinc û karê xirab tevde di meha Remezanê de li aliyê din ên çiyayê Qaf tên girêdan heya ku xelk di vê mehê de ji xirabiyê rizgar û ewle dibin. Çiyayê Qaf li vir de, merem çiyayên Qefqaziyayê di efsaneyên Yûnanê de ye ku wê demê, aliyê din ê zemîn bû. Herweha wêneya Mar jî, wêneyek xirab e li efsaneya kurdî de. Weke Ejdehaya Zuhak, li piraniya deman de wêneyek baş e ku mirov serê Dêw yan ruha wê diperçiqîne û çakî bi ser xirabiyê de biser dikeve. (D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 19 – 20).

Li efsaneya kurdî de zaf mijar û kesatiyên din ên xêr jî cî girtine ku xuya ne û karê baş û xêr dikin, û li nav efsaneyan de weke Perî û kesatiyên ayînî û Xidir Zîndî ...htd. Ew jî rolê dilîzin di hawardeçûna lêqewmîyan de. Em dikarin bibêjin ku efsaneya kurdî pitir weke bedîl yan alternatîvekê bûye bona davîanîn bi waqî' yan realîteya tal, cuwankirina jiyânê û davîanîn bi nehametî û hejariyê, nehiştina lawazî û duristkirina bihêziyê û jîholêrakirina kul, xem û kovanan û cihgîrkirina dilxweşiyê. Ew tevde beşek in ji kultur û urf û edetên kurdî ku di nav efsaneya kurdî de reng vedaye.

2.5.1.3.Çîrok û Hekayêt

Ji kevnar ve çîrok û hekayêt hebûne û mirovan çîrokên curbicur hebûne û vegêrandine. Ji wê dema ku li şikevtan de jiyane, zaf carî bi wêneçîrokan vegêrandine û li ser dîwarê şikewtan de nexşandine. Wate dîroka çîrok û hekayêtan zaf dûr û dirêj e, ji bo çîrok û hekayêtên kurdî jî heman tişt dibe. Di nava kurdan de mêjdem e ku li şevên zivistanê de, ku hingê tu tiştê nebûye ew şevên dirêj biqedînin , çîrok vegêrandine. Zaf carî jî Dapîrê, zarok kom dikirin û ji wan re çîrok digotin ku kesatiyên nav çîrokan de cuda bûn. Hin ji wan ajel bûn weke Rêwî, Şêr û ...htd. Zaf carî jî mirov bûn. Li dîwanxanan de basa bivêrî, çelengî, nêçîrvanî û hin kar û barên rojane ên xwe, dikirin çîrok. Ew çîrok, zaf carî bo zaf armancan dihatin gotin weke perwerde, bivêrî, berbirûbûna jiyana û handana ji karên baş û jinavbirina xirabekariyan û ...htd. Zaf carî kesên taybet hebûn ku çîrok vedigêrandin û hunera xwe di destpêkirin û davîanîna çîrokê de hebûn, wan jî zar bi zar û nevî bi nevî vediguhan.

Çîrok û hekayêt berhemên mezin bûn û ji xemrevîniya mirovahiyê, dîmena pîrsgirêkên mirov bi surûştî mirovahiyê di nava xwe û li pêxema jiyana de nîşan dide. Li warê forma hunerî de, serpêhatî zor dirêj nabe û zaf aloz nîne, ew kesên ku tên nîşandayîn, zor nînin. Hin caran ew serpêhatî di çarçoveya hunrawe û hozanan de bûyerên rastîn ên jiyana gel nîşan didin.

Li çîrok û hekayêtên kurdî de, mirov qehremanê sereke ye û mirov li nav çîrokê de, giyanê rastîn e xwe nîşan dide. Qehreman li vir de meremek heye û li pêxema vê armancê de, berxwenedan û teslîmbûnê nîzane. Riya heft şev û rojan digre ber xwe, heft kaleyê asin li piyê wê de didrin û ji nav diçin heya ku digihîje armancê. Li zaf deman de, jiyana wan girêdayî pariyê nanekê ye ku bi areqê û zehmeta zêde peyda kiribe, nek bi rûniştina ber sîberê. Her beşek ji wêjeya gel, ruxsarek surûştî a gel nîşan dide. Çîroka kurdan jî kolnedan, emegnasî û bivêrî û jêhatiya wan dide eyanê.

Cehd û xebat di pêxema pariyek nan de, xeyala romantîkî ya qehremanê çîrokê bi riya nehat û nevegerê de dibin. Piştî wê ku ji jiyana pîr felaket û hejarî mandî dibin, kun bi kun li pey pariyek nan û jiyane ewle û aram de xwe davêjine nav av û agir. Ew xeyal ji destpêkê ve heya daviyê, bingeha çîrokan e. Lê qehremanê çîrokê bi hilkevt bi

ser kûpek zêran de dikeve û bextewerî rû jê dike. Ew çîrok li her cihekê û li nav koma hejar û belengazan de rû didin û digihîjin wê encama gotina nav û deng a pêşiyên kurd (Destê mandî li ser zikê têr e). Ew çîrok eyankerê wê ye ku mêr bi kar û xebatê nebe, nagihîje armancê. Ruha berxwedan, lawaznebûn û moralê li mêran de bihêz dike. Li wan çîrokan de hertim dilpakî, xêrxwazî û çakî, jîrî û hûrbînî bi ser pîsî û nepakiyê de biser dikeve.

Çîrok û hekayetên kurdî bi tewawî bi jiyana gel ve zeliqîne, li jiyane de hewildan, kolnedan e. Li kar de berdewamî, li evîn û dildariyê de emegnasî, di armancê de mikurbûn li ser berdewamî heya gihîştina bi armancê û ...htd. Ewane surûşt û dîroka neteweya me ne û bi sadeyî a xwe, rê ji ber berhema rengîniya berhema girtine ber xwe ku çîrok jêre tê gotin. Ew çîrok jî bi tenê berhema xeyalan ninin, bigre piranî di jiyana rojane de hatine wergirtin. (D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 27-28-29).

Çîrok û hekayet, pitir nişandana jiyana sade ya kurdewarî û urf û edet in û kar û xebat têde xuya û berçav in û morka kurdî pêve diyar e. Wate rengvedana kultura kurdî bi hemû çîrokan re xuya ye û bûne bi beşek sereke ji çîrokan û kultur ji çîrok û hekayetên kurdî hatine tomarkirin.

2.5.1.4. Gotinên Pêşiyên

Ev beşa fulkilorê, her ji navê wê re xuya ye û ew axaftin û gotin in ku yên berê, wate kesên pêşîn in. Wate ew gotin û axaftin in ku ji bav û kalan re mane û gel xwediyê wan e. Helbet ew gotinê jî, li encama ezmûn û ceribîna zaf ya wan di jiyane durist bûne û her yek ji wan çîrokek li pişt e ((Gotinên pêşiyên pêk tê ji berhemek zaf kevn a xelkê. Ew gotin hertim li bal gelên sade û felsefeya jiyana rastîn de çêbûne. Hemû rastî, bûyerên jiyana mirov, kar û kiryarên baş yan xirab, hemû armancek ku millet pê gihîştibe, li dor her tiştî be, diçe çarçoveya teraziya gotinên pêşiyên û mêrên dinyadîtî. Gotinên pêşiyên, lawan û nifşên nû hînî exlaq û rewîşt dike, xirabî û kêmasiyan pê dide çareserkirin, li dema nexweşî û taziye de hawarê bo wan gotinan dibin. Gotinên wusa jî hene ku bo tirane û henekan dibin û xelk bi armanca xemrevîniyê vedigêrin. Gotinên pêşiyên li cihê xwe de, encamek e ku jîrî û jêhatîbûna gel li ser bingeha dinyadîtî û ezmûnek dewlemend pê gihîştîye)).(D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 86).

Kuwusan e gotinên pêşiyar ((beşek e ji wêjeya fulkilorî, piraniya xelkê li civîn û rûniştinên taybetî ên xwe de dubare dikin, û dikin bi yasa û bingehek wusa ku felsefeya jiyana xwe li ser ava dikin, û ji vê dîtingehê ve mêzeyî tiştan dikin. Bi vê sedemê li dema encamdana her karekê de, her ji destpêkê ve dest bo hin hizrên pêşîn dibin û teslîmî wan dibin û baweriyê pê dikin, lewre van gotinan karîgeriyek mezin li ser derûna giştî hene)).(D. Îdrîs Ebdula, 2014, B 2: 8-9). Wate xelkê baweriyek zêde bi van gotinan hene ku di nava gel de hene ku çend gotinên kurt û kurdiyek hêsan û watayek mezin û berfireh hene. Çûnkî her yek ji wan gotinan çîrokek heye, vêca çîrok ya serkevtinê be yan şikestê, yan her çîrokek din ya jiyanê be, kirine bi pend(gotin) û li çend peyv, yan dêran de ji xelkê re kurt kirine, heya ku bi hêsanî tê bigihîjin û şaşiyar dubare nekin û li serkevtinan de mifahê jê bistînin. Xelk jî bi hêsanî jê fêhm dibe û baweriyê pê tîne.

Wan pend û gotinan, kultura zimanê kurdî parastine û li wî serdemî de bi zimanek kurdî yê petî û sade hatine nivîsandin, eva jî bûye sedema parastian kultura zimanê kurdî, herweha çemka bihêz pêşkeş dikin û li ser zarê hemû xelkê ne û bi ser hemû aliyên jiyanê de şor bûne û tu kuncêk jiyana kurdewarî nemaye ku pend yan gotin jêre nehatibe çêkirin. Ji sewal û navên ajelên kovî û malî, cih û keresteyên jiyana çandinî, pîşesazî, gund û bajêrên kurdî û ...htd, hemû bas ji qonaxên jiyan û kultura kurdî dikin. Herweha pend bi çend peyv yan gotinek kurt bi davî tî. Hin jî hene ku bi awayê helbest hatine nivîsandin. Herweha gotinên pêşiyar zaf caran di nava welatan de, ji ber nizîkatiya zimanî, olî û xakê wekhevî yan hevbeşî hene. Lê gotinên kurdî ziman û taybetmendiya xwe parastine û morka taybet bi xwe hene.

Emê hinek ji wan pend yan gotinan bas bikin ku di nava kurdan de girîngiyek zêde hene:

Kurdan bi çavek sivik û nizim mêzeyî mêrên betal û şolneker kirine. Di vê çarçoveyê de gotine (Hazir xorê ber sîberê). Kar û xebat li ba kurdan binirx e û bi çavê rêz û hurmetê ve mêzeyî kar û areqrîştinê dikin, lewre pêşiyar gotine (Destê mandî li ser zikê têr e) yan (her kes perrê Tawûsê dixwaze, divê zehmeta sefera Hinistanê jî

bikişîne). Kurd bi meznahî ve temaşayî mêrê zehmetkêş kirine û dikin û xatircem kirine ku pêşeroja jiyane her ji wan re ye, lewre gotine (Serê bê risq, li bin xakê de ye).

Herweha pendên zaf li ser kesên zalim û xedar gotine, weke (Kûçikê har, jiyê wê çil roj in). Yan bo kesên xirab (Tobeya Gurg, mirin e), (Gurg e li kewilê Pez de).

Yan li ser reftarên nehez û kirêt di nav civakê de dibêjin: (Ger gul ninî, qelem jî nebe). (Ziman bisekine, ser silamet e). Herweha li ser rastbêjîyê ku kurd zêde jê hez dikin û bi hêvênê serkevtinê dizanin, dibêje (Rast be, li kêlega Şêr re derbas be).

Mêranî û camêrî li nav kurdan de girîngiyek taybet heye, berevaj jî, bi çavek sivik lê dimeyzînin (Av te bibe, baştir e ji derbasbûna li ser pira necamêran). Herweha (Dewlemendî bi dil e, ne bi mal, mezinahî bi eql e ne bi sal). Çiqas ku li vir de pesinda dilovanî, dilvekirîtî, lojîk û jîriyê hatiye kirin, lê xuya ye ku felsefeya pêşiyên me ewa bûye ku komkirina pere, mirov dewlemend nake, berevaj dewlemendî ewe ye ku mirov xwediyê xizîneya dilek baş, derbasbûyek baş û xizmetek baş ya civakê be. (D. Îzedîn Mistefa Resûl, 2010: 106- 107- 108- 110).

Ew pend û hezaran gotinên din di wêjeya fulkilorê kurdî de hene ku cihê hizrîne ne û di hemû biyavên jiyana kurdewarî de reh û rîşala xwe dakutane û perawêz nexistiye. Wate gotinên kurdî, hilgirê mork, kultur û urf û edetên kurdî yên jihev neveqetiyayî ne.

2.5.1.5. Heyran

Yek ji şewazên lawje yan stranên kurdî ye ku xelk mêjdem e pêre aşna ye û cihê pûte û buhayê ye. Ji riya vê stranê ve basa biserhat, jiyana, azar û xweşiyên xwe kiriye û bi awayeke hêsan û sakar li dîwanxane û kom û civatan de anîne ziman û piraniya deman civat germ û xemlandine, bi taybetî şevên dûr û dirêj ên zivistanê pê qedandine.

Ev awaza teji soz û bibandor ku êş û azarên şivan, gavan û cotkarên kurd ji bîr dibe, dibe hêvênê xweşewîstiya Sepan û rênçberan û gîşekerê welat. Serbarê ew cihên dilrevîn ên xaka Kurdistanê, cihê jiyana dildaran destnîşan dike. Bi şox û şengî, xanedanî û mezinahiya wan êl û eşîran de dibêje û jiyana sade û sakar a derbasbûya me bi jiyar û şaristaniyeta niha ve girê dide.

Heyranbêj basa evînê û demanpakiya du dildarên kurd dike. Ev pêwendî bi şoxek nazdar ji eşîr yan gundê xwe yan eşîrek din dike. Bavê wê bar dike û mala xwe vediguhêze (vêca bi her sedemekê be), lewre ew jî hawar û gaziya xwe dibe bal hevalên xwe û nûçeya veguhastina mala evîndara xwe dide wan. Qala bûyerê ji wan re dike ku çawa bar kirine û bo ku çûne. Qonax bi qonax û gir bi gir û dever bi dever basa xerîbiya xwe dike. Basa wê bûyera dilêş dike û hozanek cuwan dibêje û bi dengê bisoz ê xwe, kezaban dişevitîne. Bi bedevî û ciwaniya nezdar heyrana xwe, bi xanedaniya malbaba wê, li wî cihê ku dadibezin heya digehîne zozana nû ya wan, qala emegnasiya xwe dike ku weke wê li ser soz û peyman û biryara xwe bimînin û heya daviyê, sûndê ji hev re bixwen.

Ger ew hozan heyran ji zarê keçikê be, ew jî hawara xwe bo destexûşkên xwe dibe û daxwazê jê dike ku sexera wê nebin, belkî daxwaza alîkariyê ji wan dike ku biçne ba rihsipî û mêmraqûlên gund û deverê, daku çareserekê jêre vebînin. (Es'ed Edo, 2015: 517 – 518).

Eva tê wateya wê ku ((heyran, parçeyek e ji helbestên azad. Yan jî pexşan, şê'irek e ku dirêjî û kurtiya dêrên wê, bi tu kêşek Erûzî yan penceyî a pîvanî nahê pîvandî, belkî li gor manaya hewce, şiyar û zewqa heyranbêj di derbirînê de kurt û dirêj dibe, peyv û destpeyvên wê hertim rohn û eşkere ne))(D. Îdrîs Ebdula, 2014: 176 'B , sêyem).

Bi giştî "Heyran"ê zimanek sade heye û piraniya deman ji nazdar heyranê re hatiye gotin û derdedil hatiye kirin û zêde li dîwanxanan de bav bûye, piştî bi meremên civakî, olî û qehremantî û ...htd hatiye gotin. Heyran pitir li deşta Hewlêr û Mehabadê de heye û girîngî pê tê dayîn. Zaf carî weke derdedilê kur û keçan bikar hatiye û pir bi ciwanî pesna keça kurd dike. Basa cil û berg, bejn û bal, wefadarî, soz û peyman û bedeviya keça kurd dike ku hemû ewane beşek girîng in ji kultura kurd.

Herweha basa zaf dever û gundên kurdan dike û dîmena cuwan a surûşt, deşt û dol û gund û bajêrên Kurdistanê dikişîne û zêr û zîw, pîşesazî û karkirina têde nîşan dide. Evane tevde beşek girîng ji kultura netewî ya kurdan pêk tînin. Ji riya hunera

‘‘Heyran’’ê ve, zaf kesên navdar hilketin û bi heyranên xwe hatin naskirin, weke Hesên Heyran, Hesên Sîsawayî û ...htd. Ya jêrîn mînakê ji vê heyranê ye:

Heyran ewro sibyanê

Şemar debzêwî le dew zê û dewzêyekey Badînan

Dedatewe le çem û çeman

Kur derê: Heyranekey min Karmamiz e

Hemû hêware û sibyanan

Şor debêtewe ser derawî Girdereşey

Le nav dirê minî mar wêran la deba xeman

Emin ew sarekey serê çend sarane

Rawestayme lebarî bejnê barîkerane

Gerdênê bexenawke

Serkî belasere

Ewende dekem û nakem

Çi birînim naka derman. (D. Îdrîs Ebdula, 2014: 179 ‘B , sêyem).

2.5.1.6.Lawik

Hunerek mezin a kurdî û yek ji stranên herî kevnar ên fûlkişora kurdî ye. Her ji kevnar ve, gelê kurd şehrezayî li gel ‘‘Lawik’’ê de hebûye, bi sedema wê ku li naverok û cewhera lawikan de, basa zaf ji êş û azarên kurdan hatiye kirin, û bo merema derbirîna êşa hejêkirin û evîndarî, qaremanetî, peymandayîn, suwarçakî û ...htd. Lawikê cî û pêgehêk taybet bi xwe li nav dîwanxane û mal mîran de heye.

Lawik, ew serpêhatiyên qaremanetî yan evînî yên xweş û bi tam û lezet in ku mirovê kurd vedigerîne rojên berê û li dol û çiya û jivangeha demanpakên me de dibe, û li dîwanxana biramezin û mêmraqûlan de, dest li ser çok û çav tejî rondik, birînen kevnar ên me vedikulîne, û bi ser bejn û balaya horîsîfet û delala pê bi xene ya çil û

çar kezî û bi kil û kildan, ahîn û kesera bêmiraziya Xecê û Sityê, Sitî Xezal û Esmerê, Kabayîzê Eyšê re dibêje . Yan şoresuwarên fedakar, ji wê dema ku kurd koç û koçberî li çiyayê Sîpanê de dakutawe, ji wê dema ku pelgên Darebenê cergê Siyabend kunkun kiriye, Bekoyê pilegewir jî bûye teraşek bi qelem di navbera Mem û Zîn de, Lawik her hebûye. Wate temenê wê, bi qasê temenê êş û azarên kurdan e. (Es'îd Edo, 2015: 493-494).

Lawik jî bi zimanek sade tê gotin û ji aliyê lawkbêjan ve bi cuwanî hatiye dariştin û basa suwarçakî, dildarî, xerîbî, bivêrî û ...htd dike. Lawkbêj bi soz û xemgînî ve lawika xwe bo nifşên nû vedigêre û diçe nav mijaran û lawikên dîrokî vedigêre û yek bi yek basa palevan, mîr û kesatiyan dike ku tevde kultura neteweya kurd in. herweha bas ji edet û nerîtên xwebextkirin, hejêkirin, û peymandana dildaran dike ku beşek girîng in ji dîroka kurdan û bi awayê lawik hatine tomarkirin û zar bi zar tene vegêrandin.

Zaf lawikên fulkilorî ên evînî hene ku bas ji evîna wan dike û bi soz ve vedigêre weke: Xec û Siyamend, Mihemed û Sêvê, Las û Xezal, Biwaro û Simo ...htd. Di vê nimûneyê de Adilexan, keçika delal û bedev ya Temer paşa ê bisilman, ku agirê eşqê kar tê kiriye, bi bê tirs û xof li hemberî bav û bira û eşîreta xwe de bi bejn û bala Derwêşê Evdî ê suwarçakê Êzidiyan de dixwîne û xweziya gihîştina bihevdu re dixwaze:

Bayeka bayekî gele sard dê, ewro serê çend rojane dengê

Derwêşê Evdî legêy Edlî giran dê

Birya li deştê Heranê bi şevê buwarî

Destî min le bin serî Derwêşê Evdî biwayê

Ramûsanî xom bikirdaye li rûmeta sor gur gurî bigirtaye cote şemamokî bendî baxerê

Bizanîn ewê demê mirdinî marwêran le min Derwêşê Evdî le gêy kêheman gele giran dê. (Es'îd Edo, 2015: 500).

Wêjeya fulkilorî kurdî teji ye ji dîroka edeba millî ya kevn û tomarkirina urf û edet û kultura kurdî bi awayên curbicur. Serbarê ew hemû felaket û nehametiyên ku hatine ser riya me, lê ji riya fulkilorê ve hatiye parastin. Mijar zaf in weke dastan, tirane û henek, beyt, hekayêt û ..htd. Evane bi xwe jî zaf curên din hene weke dastanên dildarî û qaremanetî ku bi sûd in û hin ji wan rastî ne û bi awayê lawik, vegêrandin û helbestên fulkilorî hatine tomarkirin. Kultura kurdî bi hemû şêwazên xwe di wan de hatine parastin û weke dîrokê me nasiyar dike bi kultura kurdî re. Li ber wê ye ku pêwendiyek qahîm li navbera wêjeya fulkilorê û kultur û dab û nerîtên kurdî de heye.

2.5.2. Di wêjeya nivîskî a kurdî

Her neteweyekê dîroka diyarîkirî ya xwe bona xuyakirina destpêka wêjeya nivîskî heye. Edeba nivîskî jî mifahek zaf ji fulkilorê dîtiye û kiriye bi çavkaniya îlhamên xwe. Bo mînak şahkara edebî ya (Mem û Zîn)a Ehmedê Xanî, îlham ji (Memê Alan) ê fulkilorî xelkê kurd wergirtiye. Lê wêjeya nivîskî ya her gelekê bo gelê din li gor şert û mercên neteweyê cuda ye. Bêguman kurd jî xwedî dîrokek xuya li vê derheqê de ye û hin tekstên bawerpêkirî li dest de hene ku bi dîroka destpêka helbesta kurdî tê zanîn. Helbet destpêka han bi diyalekta cuda û li serdemek cuda de çêbûye. Her diyalektekê destpêkek heye ((Du beytiyên Babatahir (937- 1010) ku kurdekî Lor e û li Hemedanê de jiya ye. Du beytiyên wî bi destpêka helbesta kurdî tê zanîn û bi awayekî giştî, zanayî û gernasîya Babatahir tevî bîr û baweriya ayîna Yarsan û sofizma strana millî ya herêmî, du beytiyên wî afirandine. Helbestên olî ên (Wilîrîkî (Xenayî) li diyalekta stranê de, helbesta herî kevnar a zimanê kurdî ye. Li sedsalên navîn de peyda bûye û li evraz û nişîvan de bûye heya destpêka sedsala 20'an. Piştî lawaz bûye heya şerê duhemîn ê cîhanî. Helbesta ayînî ya Wilîrîkî li diyalekta Kurmanciya Jorîn de piştî bûyera herî girîng (şerê Çaldîran - 1514), ku destpêkê bi şêweya helbesta millî, vêca helbesta xwendewarî a bilind hatiye holê.

Helbesta Lirîkî (Xezel û Qesîde) li diyalekta Kurmanciya jêrîn de, piştî çêkirina paytext (Silêmanî) peyda bû. Wê tevgera edebî, paşan bandor û tesîrek pir mezin ji xurtbûn û guherîna wêjeya kurdî kir)) (D. Marif Xeznedar, 2010: 181, B. yekem).

Bi vî awayî helbestên Babetahir bi yekem şêirên nivîskî ên kurdî tên hejmartin û cewher û naveroka dubeytiyên wî, pêwendiyek berfireh û qahîm tevî ayîna Yarsan heye. Lê her nebe, li serdemê piştî belavbûna ola îslamê de di çarçoveya rêbaza sofîzmê de xwe nîşan dide. Di nav dubeytiyên Babetahir de, dikarin hest bi Lirîkî dildarî a nazik bikin, lê têkel bi sirûta veheliyan di nav xwede dide. Tevî wê jî, armanca Babetahir eşqa xwedayî bûye, bila hin wêneyên eşqa mirov jî têde bin. Ji ber wê ye ku dubeytiyên wî li nav xelkê de cihek taybetî hebûne. Çûnkî rengvedana dil û derûna wan bûye. Tevî wê ku sofî bûye, lê hin ji çarînên wî, rengvedana kultura civakê bûne ku di helbestek xwe de, basa hejarî û dewlemendiyê dike û dibêje:

Be goristan guzer kirdim kem û bêş

Bidîdim gorî dewlemend û derwêş

Ne derwêş bê kefen der xak reftê

Ne dewlemend birde yek kefen biş (Şêx Mihemed Xal, 2007: 140).

Wate, min zaf seredana goristanê kir û gelek gorên hejar û dewlemendan dîtîn, min nedît heya niha, ne hejarek bê kifin were veşartin û ne jî min dewlemendek dît ku ji kifin zêdetir, tiştêkê bi xwe re bibe.

Herweha helbestvan û wêjevanên piştî wî jî li naverok û kakila berhemên xwe de, urf û edetên kurdan kirin bi alav û keresteya berhemên xwe. Helbestvanê navdar ‘‘Xanî’’ di berhema ‘‘Mem û Zîn’’ de dibêje:

Sed carî qesem bi her du nunan

Ehd min ewe digel Eyûnan

Heta reqemek dibit ji canî

Cana tu di canî da nîhanî.

Piştî wê ku Mîr bi evîndariya Mem û Zîn re dizane, Mîr dikeve azardana Mem. Mem wekî aşiq û evîndarekî rastbêj û serrast, sûnd bi her du ‘‘Birî’’ên Zînê dixwet û sozê bi her du çavên wê dide ku hetanî terahî di canê wî de bimîne, soz û evîna Zînê ji dil der neke û canê wê ji canê xwe xweştir bivê, nemaze eger bibe sedema jinavçûna wî

bi xwe jî. Berê di dema nivîsînê de, pîta (N) ser û bin dinivîsîn û şêweya wê rengê Biriyan dida.. Vêca (Mem) Birî ên wê (Zîn) weke kewanê bi pîta (N) şibandiye. (Îsmail Tenya, 2005: 28).

Vir de soz, peyman û hejêkirin û xwebextkirin, beşek ji kultur û urf û edetên kurdan in ku li helbestên Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de pir bi cuwanî reng vedane.

Herweha di helbestek Hacî Qadir de ku li ser karkirinê arasteyî neteweya xwe kiriye, dibêje:

Be qisey sade birsî têr nabê

Emele 'îzzî dîn û dunya bê

Asinî sard be fû nerm nabê

Temelî karî hîz û bêxêr e

Destî mandû le ser zikî têr e. (Fuad Tahir Sadiq, 2008: 104)

Hacî Qadir li vir de rû ji xelkê dike ku hînî tembeliyê bûne û di nav kurdan de jî, tembelî û karnekirin, diyardeyek kirêt û nehez e, û bi helbesta xwe û têkhelkêşek ji pend û gotinên pêşiyar ên kurdî, xelkê han dide ku ji xwe re nan peyda bikin û bi mandîbûna destê xwe, têr bixwen û tembelî karek nebaş û kirêt e û dev jê berdin.

Helbestvan tex û qatek şiyar û çeleng bûn. Berdewam xelk ji xwendin û zanîne re han didan. Ew haydar dikirin ku gelên dinê bi xwendinê çawa pêş ketin, lewre hewce dike ku dûrî nexwendewariyê bikevin. Bi taybet dema didîtin ku di nav neteweya wan de, hêdî hêdî nexwendewarî dibe bi kultur û nikare xwe jê derbas bike. Lewre Qani' di helbestekê de, gelê xwe ji xwendin, hînbûna zanist û zaniyariyên nû û bihorîn ji kultura nexwendewariyê re han dide û dibêje:

Be sîhrî têmegeyên îlmî zemanê

Bixwênin çûnke xwendin piştîwan e

Necatî ecnebî wa eçne kewkeb

Behêzî xwendine, çakî bizane (Qani', 1385: 581).

Yekî din ji diyardeyên xirab di nav civakê de ku ba hinekan bibû bi kultur, meseleya fêlkirina "şêx"an e ku jêr navê ol de, dek û dolab, fend û fêl ji xelkê dikirin. Nalî ê helbestvan jî weke mela û şair rexneyê ji wan cure şêxan digre û di helbestekê de dibêje:

Daîm lewte mêgelî jin, nêrgelî piyaw

Bem rîşewe le pêşewe boy be ser gele (Nalî, 1976: 468)

Wate: Ya şêx! nebêje komek jin û mêr bi dû te ketine, lê ewqas nefam in qey tu dibêjî Mih û Bizin in. Tu bi xwe jî bi rih û rêdînek dirêj, weke sabirînî sergele ketiyî pêşberî wan, û ewqas jî nefam û têngihîştî yî, ku nizanî wan ber bi ku ve dibî. Helbet di nava kurdan de zaf kes hene ku di bin navê ol de xelkê didin pey xwe û dixapînin. Nalî ê helbestvan jî rexneyê ji wan kesan digre û bi karek nehez û kirêt dizane.

Herweha helbestvanên zaf hene ku rexne ji civakê girtine û karê kirêt û neşqam destnîşan kirine û li dijî mêrên xirab in.

Şêx Reza Talebanî li vê derheqê de dibêje:

Sax le dunyada nemawe ger qisey saxit dewê

Bê hezarit pê nîşan dem ger qurimsaxit dewê. (Şêx Reza Talebanî, 2003: 217).

Helbestvan bas ji rewşa aloz di nav civakê de dike, merem eve nine ku mêrên baş di civakê de nemane, belkî dibêje mêrên xirab zêde ne. Bêguman eva jî kulturek xirab e û li kurdewarî de nahê pesindkirin. Helbestvanan jî di helbestên xwe de basa kultura kurdî kirine ku bi aliyê baş û xirab ên xwe bûne bi matiryal û keresteya helbestên wan. Piştî janrên din jî li wêjeya nivîskî de derketine holê û bi giştî kultura kurd, mijara nav hunrawe û helbestên wan de bûn ((Yekem pexşana kurdî (Destûra zimanê Erebi bi kurdî) ku ji aliyê Elî Teremaxî ku di 1000 a koçî de hatiye nivîsandin. piştî jî pirtûka Mela Mehmûdê Bayezîdî (Adat û Risûmetnamey Ekrad) ku bi kurmanciya jêrîn hatine nivîsandin û eqîdeya kurdî a wê, Mewlana Xalîd û Mewlûdnameya Şêx Hisên Qazî (1791- 1870) ku xelkê bajarê Silêmaniyê ye, hevçerxê Şêx Marifê Nodeyî ye û xwediyê yekem pexşana kurdî ye ku bi zaraweya naverast hatibe nivîsandin; ku mewlûda Pêxember (D. X) bi awayê pexşan vedigêre, û

nimûneyek e bo sec'î kurdî û zaf peyvên kurdî û ayînî bi kar anîne û zimanê wê jî, ew ziman e ku wêjeya kilasîkî pê hatiye nivîsandin)) (P.Y.D. Ebdulwahid Kuşîr Dizeyî, 2011: 125- 126).

Piştîre bi sedema nivîsînê, janrên din serî hildan û ketine nav mijarên rewşenbîrî û nivîsînê de, û bûne sedema pêşketinê di warên curbicur weke aborî, siyasî, civakî û weşana kovar, rojname û belavokên din û wergeranê ...htd. ewane tesîr li ser biyava nivîsînê kir û pêşde birin û hin janrên din jî weke kurteçîrok, çîrok, roman û ...htd serî hildan.

Helbet evane jî di çend qonaxan de geşe kirine û pêşde çûne heya ku gihîştine îro .Çîrok û romana kurdî jî pitir derfet ji nivîskaran re afirandiye ku qala rewş û tîtal û edet û kultura gelê xwe bikin û di nav çîrokên xwe de bidin ber nirxandinê û jiyana bi êş û azar û teji felaket û zehmeta cotkara, evîn û dildarî, wefadarî û sorbûna li ser gihîştina bi armancê nîşan bidin. Çîrok jî curbicur bûn, weke çîrokên li ser mirovan di biyavên jiyana, ayîn, urf û edet û kulturê û herweha li ser ajal, efsane û hizrînê û...htd. Ewane bibûn bi mijarên sereke di nav çîrok û romanên wan de ((Pîremêrd serbarê ew hemû mijûlbûn û raperandina karê rojnamevanî, helbest, wergeran û nivîsîna curbicur di biyava kurteçîroka kurdî de, çend çîrokên hunerî û cuwan hene ku mijarên wan, civakî ne û ji kelepûra kevn a kurdî ve durist kirine, hemû ew çîrokên ku li (Kovara Gelawêj) de belav kirine)) (Umîd Aşna, 2001: 62).

Herweha li dehika 60'an a sedsala 20'an de, hin ji çîroknivîsan, çîrokên civakî nivîsandine û rewş û êşên civakî diyarî kirine û bizav û coşek mezin bona çareserkirina wan xistine nav gel de, weke: Cemîl Saîb, çîroka (Le xewma), Pîremêrd çîroka (Duwazde Suwarên Merîwanê), Eladîn Secadî, çîroka (Zemawendî Reşe Xecelaw), Hisên Arif çîroka (Çay Şîrîn), Kakemem Botanî, çîroka (Tonela derbendeke), herweha Hesên Qizilcî û Mihemedsalih Dîlan û Erebe Şemo û Cigerxwîn û çend ên din, û ji bilî sedan çîrokên civakî ên din. (Fuad Tahir Sadiq, 2008: 197 – 108).

Piştîre çend janrên din ên edebî derketin holê, bi taybetî janra roman weke romanên (Janî Gel) a Îbrahîm Ehmed û (Malava Gulî Xem) ya Hîmîdad Hisên û çend ên

din ku li naveroka romanana de, urf û edet û kultura kurdî têde reng vedaye û li beşa din de, emê bi awayek zanistî şirove bikin.



3. RENGVEDANA KULTURA KURDÎ LI ROMANÊ DE

3.1.Kultura kurdî li gund û bajaran û rengvedana wan li romanê de

3.1.1. Çanda kurdî li gundan de

Romana kurdî weke romana her neteweyek ser dinê, çavkanîgirtî ji kultura xwe ye û pitir resenatiyê ji wê kulturê werdigre. Yek ji aliyên resen û kevnar ên wê kulturê jî, jiyana û urf û edetên gundan e ku bingeha kultura kurdî pêk tînin. Helbet kultura gund jî, sîma û taybetmendiyan xasmanî bi xwe hene û romannivîsê kurd bi sûdwegirtin ji wan sîma û taybetmendiyan çanda kurdî, beşek ji bûyer, karakter, dem û cihên nav rûbera romanê de diafirîne. Li vir de, emê cehd bikin ku edgarên çanda kurdî li romana kurdî de bidin xuyandin.

3.1.1.1.Şivanetî û çandinî

Yek ji pîşeyên herî kevnar e ku xelk ji bo bijîva jiyana pênasê dike, û heya îro rojê jî heye û xelk bo debara jiyana, piştî xwe pê girê didin. Lê li destpêkê de, sade û sakar bûye û berhema wan jî, sînordar bûye. Kurdan jî, ji zû de dest avêtine çandinî û ajeldariyê ku jîngeha wan ji her du biyavan re guncaw e û bûye bi çavkaniya berhevûna bijîva jiyana rojane ya wan. Di encama berketina bi wan pîşeyan re, bûye bi beşek ji jiyana civaka kurdî ku di nava janrên wêjeyê de jî reng vedaye û her ji ber wê ye ku romannivîs beşek ji bûyeran bi wan pîşeyan re girê dide û herweha buha û pûteyê jêre dide.

Di romana (Nazê) ya (Îsmail Rojbeyanî) de ronahiyê dixê ser pîşeya şivanetiyê di gundan de û ji riya fîlaşbak ve wan rojan tîne berçav ku gavanetî kiriye ((Bavê min ji min re got: Kurê min, ez kal û îxtiyar bûme, birayek te jî çûye leşkiriye, divê tu serperistiya malê bikî, çi bikim? Ji qutabxaneyê derkeve û bi kurê mam Reşîd re çêlekan biçêre. Diya min jî hevrayê wî bû. Bavê min rast dibêje. Xwe em xazokatiyê nakin. Her çiqas ku kurê mam Reşîd ji min mezintir bû, lê ez ji wî şiyartir bûm. Me, Garan bi ciwanî dibir û vedigerand. Rojek ji rojan, tu kesî/ê gazinde ji me nekirin. Li Havînê de me dûr nedibirin û her li derdora gund de diçêrandin. Keç û jin li tenîkeyan li dora me dizivîrin û çavên xwe dibîne paşîya çêlekan ji bo komkirina Tesil û rîxa wan.

Her ku didîtin çêlekekê dêla xwe bilind dike, hawar dikirin Zerde ..Zerde..Reşe..
Reşe..))(Nazê: 117-118)).

Li vir de, me bi çawaniya jiyankirina di gund de dide naskirin ku xelk mijûlê
xwedîkirina sewal û ajelan in û mifahê ji berhemên wan dibînin. Pîşeyên şivanî û
gavanî, yek ji wan pîşeyan bûne ku zaf ji xelkê gundan pêre mijûl bûn û bûye bi
çavkaniya dahat û kar û kasibiyê bo hin kesan, û piştta xwe pê girê didan. Herweha vê
yekê jî dide eyanê ku xelk hejar û belengaz bûne û paşero û Tesilên Çêlekan kom kirine
daku hişk bikin û li şûna neft û gazê, bo şevatê mifahê jê bistînin. Wate, jiyana li wî
serdemî de sade bû û pitir piştta xwe bi berhemên xwe girêdane. Herweha bas ji
dîmenên keç û jinan dike ku çawa ji bo komkirina tesilên çêlekan dibeziyana.

Her di wê romanê de, awir ji hinek kar û pîşeyên ku ji kevna ve di gundan de
birêve diçûn, hatiye vedan, ku tevî wê de jî, wêjeyek zarekî anîbû rojevê, weke
(Durûne) ku bi vê sedemê ve, strana karî pêre hatiye gotin. Romannivîs li qulçekê de
awir ji wî karî vedide û ew dêre helbestên ku weke stranên karî hatine gotin, tomar dike.
Li vê derheqê de, beşa (29) terxanî vê mijarê dike û cîranê wan, daxwaza (Azad) dike
bona wê ku bedela (Eze) ê kurê wan ku nesax bûye, nan û ratibê ji pale û dirûnkaran re
bibe. Piştî wê ku Azad ratibê ji wan re dibe, li wir dimîne û bala xwe dide ser wî kar û
pîşeyî ((Min jî biryara xwe da ku nevegerim heya ku ji wî berî xilas nebin. Serpale berê
wan nîşan kir, û hemûyan bi hev re dest pê kirin: Yalla stran.

Serpale

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirîbû tayekim gum kirdûwe

Kors

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirîbû tayekim gum kirdûwe

Serpale

Entîke û wurd û mird e

Elêy Birnewî kurd e

Bo maçî lêwey allî

Dilim pirî le derd e

Kors

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kîrrîbû tayekim gum kirdûwe (Nazê: 105- 106)

Tevî karkirin û strîna wê lawjeyê, romannivîs îşare bi pêwendîya navbera kur û keçên karker dike û dide xuya kirin ku li wan karkirinan de, derdedil kirine (xwast û hezên xwe baskirine). ((di navbera kur û keçê de, durûnkarek din hebû, kur xwast tiştêk wusa bibêje ku keçîk tê bigihîje û tevî kabra re cihê xwe biguherîne:

Serpale

Kiçê were bemplawe

Cergim bo to sûtawe

Şanê bide le şanim

Ewsa ba derçê giyanim

Kors

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kîrrîbû tayekim gum kirdûwe (Nazê: 106)

Romannivîs serbarê wê ku ji vê riyê ve basa ew kar û pîşeyê dike, li heman demê de beşek ji urf û edetên karkirin û stranên karkirinê jî tomar kirine û ji jinavçûnê rizgar kirine.

Herweha romannivîs îşare bi pîşeyek din ya civatgeha gundnişîniyê dike ku ew jî pîşeya şivanetî ye ku yek ji wan pîşeyên giran û qurs e ku cewher û kakila jiyana gund pêk tînin. Li vê derheqê de romannivîs li ser zarê karakterê sereke (Azad) û ji riya vegêrandina bîranînan bas ji wê pîşeyê dike ku çawa birêve çûye û li hember de çi

wergirtine ((Berî rojavabûnê me Garan dianî û her yek ji me canta û tûrikek dikire stûye xwe û diçûne ber deriyê ew malên ku me ajelê wan diçerandin, û me li derî dixist: Nan bînin nan. Her malekê nanek dida me))(Nazê : 119). Bi vî awayî romannivîs hewil daye ku kultur û deb û tîtalan li çarçoveya bûyeran de bîne ber bas û raya xwe li ser bîne ziman û ji neviyên pêşerojê re weke çandek kevnar tomar bike.

Li romana (Koyxa Sêwî) ê (Ezîzê Mela Reş)de, romannivîs li çarçoveya bûyeran de îşare bi hin çandên civaka xwe kiriye û di pêvajoya vegêrandinê de, bi kar anîne û sûd jê standine. Yek ji wan jî, şivanetî ye ku di civaka gundî û çandiniyê de, bi yek ji aliyên aborî ên girîng tê hejmartin. Di demsala buharê de, şivanetiyê urf û edetek bi xwe re dianî ku ew jî, koçkirina pezdaran bû bo zozanan bi armanca çêrandina pez û ajelan. Wê yekê çend hefteyan vedikêşa û kon û reşmalên pezdaran li nav şînkatiya surûştê de xuya dikirin. Romannivîs ew çanda devera Qerac û Kendînaweya deşta Hewlêrê di vê demsalê de tomar dike ((Wê demê ji hemû aliyekê ve koç û barkirina malên şivankaran li (Seniye) û (Mulkiye) û (Şemamk) û (Kendînawe) û zaf cihên din, weke Qaz û Quling û Mirawiyar, kom kom û ref bi refên neveqetiyayî bo midehê hefteyekê bi dû hev de rêz dibûn û diçûn.

Kîjan Hêstir yan guhdîrêj ciwan bana, barê wê bi têt û tûr û Milakdana tejî nexş û nîgar dixemilandin û dikirine pêşengê karwan û keça ciwan yan şorejinekê serkêşiya wê dikir. Bi riya: (Bazarge) û (Kilkey Darebizmaran) û (Qerebotk) û (Qerebêtkan) de rû jê dikirin. Di wê qeraca mezin de, cihek nedima ku reşmal û kone lê nevedabin. Heya ku giya nêr dibû, cogeh diketin nava mêrg û perêzan, pez û ajel lê deçerandin. Wê demê hevdem barge û binegeha xwe kom dikirin û ber bi binegeha xwe ya eslî vedigeriyan)) (Koyxa Sêwê: 6). Li vir de ((Romannivîs di romana (Koyxa Sêwê) de dîmenek ciwan û balkêş ji jiyana koçeriyê dixemilîne, û zozan û hobe û binegeha deverê ji me re vedigêre)) (D. Îbrahîm Hesên, 2012: 81) û weke erşîv tomar dike.

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, li dîmenek din de îşare bi hişkesalî û nebarîna nixte û baranê dike û bandor û karîgeriya wê bi taybetî li ser civaka gundnişînî û çandiniyê dide xuyakirin ((Ew salên ku baran nabare, kulp û xela bi dû re dihat.. Giranî zêde û xurt dibû. Danewêle pir girantir dibû. Nemaze balindeyên

weke pasari, Qijalik û Reşûlik, Xencerbal û Peresêlke jî kê m dibûn yan ji deverê sil dibûn û tera bera dibûn... Îca hingê tengezarî û kul û xeman dever vedigirt)) (Helkişan Berew Lûtke: 229).

Ji bo çareseriya wê rewş û kavdanê, urf û edet û çandek taybet birêve diçû. Li warê olî de, nimêja baranê dikirin ((Nimêja Baranê dikirin, ji Esman lawahî û dalahî dikirin, qurbanî serjê dikirin, vêca her tax û tîre û pîşeyek bi cuda ji wê deştê werdibûn)) (Helkişan Berew Lûtke: 229).

Ger ew nimêja baranê encamek wusa nebiba, vêca rû ji deb û tîtalên kurdî dikirin û kose û bûka baranê çê dikirin. Romannivîs hûrgiliyên wan urf û edetan bas dike ((Kosewe mêrek bû ku pirça serî wî bi gûzanê ditiraşîn û tenê şelek dikire ber xwe, û delingên xwe vedidan û rûyê xwe bi teniya binê mencilê reş dikir. Piştê dar û şeqleyek digirte dest û zengilik dikire stûyê xwe. Digihîşte ber deriyê her malekê, kalon yan pûtek avê pêde dirijandin û selewat vedidan... carna jî kilawek qûçî libadî ku xemlandî bi morik û parçeyên xişl ên tebiqî û pirtiyên neynûkan bû, li serê xwe didanî, û zarok jî bihvere bi çepikan li pey diketin û beste digotin:

Heyaran Meyaran

Ya xwa bîkeyte baran

Bo feqîr û hejaran

Hinekên din digotin: Hewreke giyan giyan

Destim bigre bême ban

Bo Qarçik û Domelan)) (Helkişan Berew Lûtke: 229-230).

3.1.2. Nêçîrvanî

Yek ji wan pîşeyên e ku mirov, her ji kevnar ve nasiye, û mirovên destpêkî bona bijîva jiyanê, piştê xwe pê girêdane û xwarin û xoreka rojane ya xwe ji wê riyê ve bidest xistine, lê piştê xelkek zêdetir weke edet û çandekê nêçîrvanî dikir. Helbet hinekan weke xwast û hezek ew kar encam didan. Nêçîrvaniyê di nava kurdan de dîrokek dûr û dirêj heye û li ba hin kesan, bibû bi edet û çand, lewre li piraniya deman

de, bala nivîskaran kişandiyê û bûyerên cur bi cur têde qewimîne, ji ber wê ye ku, zaf carî li romana kurdî de tê dîtin.

Li romana (Kordere)ya (Xusro Caf) de, Ekber li vegêrandina xwe de, dema ku basa Kelayî dike ku xwedî xwaringeh e, lê hez û xwasta wî diçe aliyê nêçîrvaniyê, û renge ya ku bidest dixê, bibexşîne û ji xwe re nebe, lê jêre bûye bi edet û renge tamek taybetî ji wê nêçîrvaniyê bibîne ((Ranik û çoxeyek gewir li ber de bû, bawerim pêre ji dayîk bibû. Wate tu kesî/ê, ew bi cilik yan Rank û çoxeyên din re nedîtibû. Rojên îne siwarê payskilê dibû û Cift (tifenga saçmeyî) a xwe diavêt milê xwe û bi armanca nêçîrvaniyê ji bajar derdiket. Carna li derî dida û gazî dikir: Ekber, Riza, Zeman, werin min Kotra Bircîle ji we re aniye)) (Kordere: 57).

Xwediyê xwaringehê ku renge zêde hewcehî bi wê nêçîrê nebibe, lê belê weke hez û xwastekê di rojên îne de bi çeka destê xwe û duçerxa xwe diçû nêçîrvaniyê. Dema ku vejeriya ye, Kotirên xwe ji Ekber, Zeman û Riza ku birê hev bûn, bexşîne. Eva tê wateya wê ku, nêçîrvanî ji riya ciftê ve hatiye kirin û curê nêçîrê jî destnîşan kiriye ku Kotir e, û li devera wan de, ew cureyê Kotirê hebûye.

Li romana (Koyxa Sêvê) a (Ezîzê Mela Reş) de, romannivîs îşare bi nêçîrvaniyê dike û weke rê û cihên wê weke çandekê tîne rojevê. Li dîmenekê de (Mam Umer) daxwazê ji (Loqdirêj) ku mêvanê wî ye, dike ku şevê bi wî re biçin nêçîrê ((Êwarî rû ji Loqdirêj kir û got: Kekê Loqdirêj çima nahêy em îşev biçin nêçîrê ...?)

Loqdirêj: Çima nêçîr bi şevan tê kirin... yan bi roj....!?

Umer: Ya ku ez dibêjim, bi şev e.

Loqdirêj: Çawa....?

Umer: Golmeka (Xendeqa Mame Xelîfe) heya niha jî tejî baranav e. Şevane her çî mambizên wê deverê hene, rû jê dikin. Îşev emê biçin li rex golmekê, norîngêkê bikolin. Emê xwe di nav de mat bikin, belkî xwedê hez bike nêçîrek dest me bikeve)) (Koyxa Sêvê: 15). Helbet nêçîrkirin li wê deverê de, cuda ji wê ku xweşiya xwe heye û ji bo dem borandinê ye, hevdem qazancek din ya madî jî heye ((Goştê wê ji bo xwarina çend danan bikar tê û hin carî ji keleşax û ser û kewilê wê jî bo xemlandin û cuwaniya

malê bikar tînin, û hin car jî goştê wê nêçîrê, weke derman ji nesaxiyan re bikar tînin. Bi giştî, nêçîrîkirinê sûd û mifahek cismî a baş hebûye û weke werzişê, bo cismê mirov bisûd e. Him bizav û him jî hilmijîna hewayê paqij bo zaf nesaxiyan bisûd e, li heman demê de nêçîrvanî hinek çelengî û bivêrî jî hewce ye, û mirov hînî aramî, bêhnfirehiyê li hember dujminê hertimî ê xwe de dike)) (D. Îbrahîm Hesên, 2012: 185).

Vêca romannivîs ew rê û cihên nêçîrîkirinê diyarî dike ku li destpêkê de, çalekê hildikolin û xwe têde diveşêrin bona wê ku nehên dîtin ((Dema ku gihîştîne Golmekê, nizîkî sed metran dûr ji avê, Umer dest bi kulandina koçalê kir. Loqdirêj tewir ji dest wergirt û got: Keko eva ne karê te ye, karê min e! Ew yek got û li bîstekê de, bidavî kir.

Wê heynê de, Umer tifenga xwe da destê wî û got: Kuwusan e her bi xwe jî here nav koçalê. Loqdirêj bi bêhtengiyê ve got: ... na ... keko nan bo nanewa û goşt jî bo qesab. Min di jiyana xwe de nêçîr nekiriye û kêfa min jî jêre nayê. Ger tenê vê carê dibêjî, eva ji ber dilê te ye û bes. Umer çûye nav çeperê û tifenga xwe siwar kir (gulle bire ber) û hinek pûş û pelaş bi ser xwe dada. Loqdirêj jî Guhdîrêjê xwe bire qulçek dûr ji golmekê girê da û bi xwe jî li nizîk de veqelist)) (Koyxa Sêvê: 16- 17).

Piştî girtinpêş a wan rê û cihan, romannivîs bi hûrî kiriyara nêçîrîkirina mambizê vedigêre ((Nişkîve dît ku celebek mamiza birêve ne, nêriyek ku ji hemiyar mezintir bû, li pêşiya wan de ye û tînin bo ser avê: wey babo îca çi nêriyek e...? Dê bavê min qurbana te bin ...! Her ku Nêrî gihîşte ser golmekê û du sê caran simkola avê kir û hawriyek ji rewê veda, mirênek bilind lê hat, dûlika xwe badaû limbûzê xwe kire nav avê de.

- Bi xwedê wusa xuya ye ku bûye bi qismet û nisîb, lewre destxweş hilketiye...!. Nîşange lê girt û ji şilke sera wê da. Borênek ji Nêrî rabû û ser û ser kete nav golmekê de. Umer bilez xwe gihandê û der anî û serjê kir: Aliyê kê 10 hoqe goştê wê heye...!) (Koyxa Sêvê: 21).

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de îşare bi diyardeyek kulturî ya civakê dike ku ew jî (ŞereKew û nêçîra Kewan e). Eva jî beşek ji jîngeh û çanda Kurdistanê dide xuya û tomarkirin ((Di Kurdistanê de şerekew baw e û li

çeperekê de, kewbaz rikeh (qefes)ên xwe bi awayê giroverî dadinên û her yek ji wan, qefesa xwe bi pîne pero yan kewilek zengiyanedar dipeçêve.

Hin şerekew hene ku yek demjimêr û nîvan vedikêşe. Rawçî û kewbaz û qerec û rewend ji qebe qeba kewan şehreza ne û dinasin! Qaspe heye ku ya şer e, qebeqeb jî heye ku ya zayînê ye, ya vexwendin bo avvexwarinê jî cuda ye, qebeqeba xwegewzandin û çînekirin û herweha ya tirs û xof û ... hwd, jî cuda ne)) (Helkişan Berew Lûtke: 85). Li vir de, hûrgiliyên vê kulturê hatine nîşandayîn ku derheq kew û cureyên wê û şerekew li Kurdistanê de heye. Piştî romannivîs, rê û metod û dema nêçîra kewan dide eyanê ((Li zozanan de, du caran kew tên nêçîrkirin, cara yekem li zivistan û payîzan de bi tor û telikdanînê; cara duyem jî, li havîn û buharan de ku xwe li nav lîm û xîzê rex cogeh û rûbaran de digewizînin, dûre xwe ditekîne heta ku per û baskên xwe paqij bike, li wê demê de nêçîrvan bi Cifta cotlûl a xwe dihingivin)). (Helkişan Berew Lûtke: 85- 86).

Romannivîs herweha tîrojê dixê ser şewazên nêçîrkirinê û sê metodên herî baw nîşan dide ((Yekem Kewa malî ku ji bo nêçîrê tê perwerde kirin û li nav rikehê de diben bo wî cihê (Rûbade) ku dixwazin. Bi peligên darberûya hişk û çirpikan, li berçavan bizir dikin. Kew jî li heyfa asîmanê berfireh û dîmena çiya û av û şînkatiyê, dike qebe qeb û birra kewa ji xwe nêzîk dike. Nêçîrvan jî ku li boseyê de xwe veşartîye, bi tîfinga dihingive...

Metoda duyem jî bi heman awayî, her du piyên Kewê girê didin û çarmedorên wê bi pûş û çirpikan digrin. Dema ku Kew guh ji qebeqeba biyanî dibe, tê bo şerkirinê. Destpêkê de her du alî dixwînin. Kewa kovî her bi dora wê de dizivire heya ku bi telikê ve dibe çavek wê bor, li berçav de zer û reş dibû ... li nêzî cihê avvexwarina wan kewan tê helavîstin. Nêçîrvan jî li vê derheqê de, bîstekê bêhna xwe çik dike. Kewên têhnî tên ku avê vexwen û ji dîtina wê dîmenê, mendehoş û ecêbgirtî dimînin û hêdî hêdî diçine pêş, heta ku ji perêza xwe ve, bi çekê wan dihingive)). (Helkişan Berew Lûtke: 86 – 87). Li vir de bi hûrî rê û şewazên nêçîrkirina kewan hatiye baskirin û pêngavên wê hatine tomarkirin.

3.1.3. Rêzgirtin

Rêzgirtin yek ji edetên herî baw ên gelê kurd e, û hertim hurmeta mezin û biçûkan, xelkê bîhanî, lêqewmayî û kesatiyên olî û bira mezin û ...htd hatiye girtin. Rêzgirtin edetek pir kevnar e û kes nine ku vê urf û edetê peyrew neke. Herdema kesek bê rêz derdikeve (nemaqûliyê dike), xelk bi giştî gazinde û sexera wî/ê dibin û bi edetek xirab dihesibînin. Renge rêzgirtina han ji cihekê ve bo cihek din ciyawaz be, û herweha ji kesek ve bo kesek din li gor demê jî guhertin bi ser de bê, lê herberdewam e û zêdetir li gundan de tê dîtin û hestpêkirin, bi taybetî derheq kesên bîhanî yan mêvanan. Edeta han li janrên romanana de bi zelalî îşare pê hatiye kirin ku rêzgirtina ji kesên bîhanî, li ba xelkê gund pir zêdetir e û berdewam xizmeta wan dikin bona wê ku hest bi xerîbî û dûriya cih û mekanê xwe nekin.

Li romana (Nazê) ya (Îsmâil Rojbeyanî) de, romannivîs edet û nerîta han kiriye bi beşek ji romana xwe û bas ji wê rêza wê demê dike ku xelk mêvanan vedixwînin mala xwe, û xwarinên baş ji wan re amade dikin. Li romana Nazê ya Îsmâil Rojbeyanî de ku mamosta Azad di wî gundî de mamosta ye û basa wan vexwandin û mêvaniyan dike ku li mala Mam Wesman de jê hatine kirin û dibêje (Zêcamek mezin a qirêjû danîbûn ku ji aliyekê ve kunek lêdabûn û xirênayek pêve kiribûn, du dewriyên Birinc li ser danîbûn ku têra 10 kesên wekî me dikir, û li ser her yek ji wan jî, teji goştê Elokana kiribûn û du tasikên teji şorbeya Qeysiyê jî li rex danîbûn. Mam Wesman destê xwe dirêj kir û ji me re got: Yalla Bismilayê lê bînin)) (Nazê:51).

Romannivîs wê urf û nerîta vexwendin û mêvandariyê, weke rêz û hurmetek di romana xwe nîşanî xwendevan dide û bas ji wê dike ku xwarinek mişe û zor tînin. Ew bi xwe sê kes bûne, wate mam Wesman, Azad û Heme ê hevalê wî. Lê Birinc û goştê ku bo wan anînbûn, têra 10 kesan dikir. Xuya ye ku eva jî nerît û edetek wan e dema ku bixwazin rêz ji kesekê bigrin, ku mêvan yan xweştiriyê wan be, xwarinek mişe û goşt û qeysî jêre amade dikin. Evane hemû beşek in ji çanda kurdî ku xwarinên curbicur û zaf ji mêvanan, xelkê bîhanî û bi taybet mamostayên ku li qutabxaneyên gundan de waneyan dibêjin, tînan amadekirin. Romannivîs dixwaze wê rêz û hurmetê nîşan bide ku,

xelkê gund bi vexwendinan, rêz ji mêvan û mamostayan digrin, bi taybetî mamosta li ba wan, kesên rêzdar û qedirgiran in.

Herweha bas ji wan dîmenan dike ku mamosta diçe bo qutabxaneyê, û piştî wê ku ji girtîgehê serbest bûye, zarok û qutabiyên, çawa xweşî û şadiyên xwe anîne ziman ((Zarok li ber deriyê qutabxaneyê weke têtîka peresêlkeyê xwe dikutan, dema ku bi dîtina min hesiyên, hawara wan bilind bû, erê weleh mamosta hat, hemû reviyane derve û ji xweşiyên nedizanîn çî bikin)) (Nazê:53).

Li vir de vê yekê nîşanî me dide ku hînî zarokan kirine, çawa rêz ji mamostayê xwe bigrin û jê hez bikin. Bi watayek din, mezinan qedr û hurmet li ba zarokan hene û herweha berevajî jî. Evane tev de derbirîna xoşewîstiyê ne ji mamostayan re û rêzek zaf jêre hene, û herweha bi dîtina wan keyfxweş dibin.

Romannivîs li dîmenek din de bas ji kulturek din ya rêzgirtinê dike ku ew jî hurmetgirtin e ji mêvan û kesên bîhanî. Vêca, ger ew kes mamosta be, bêguman qedr û qîmeta wî zêdetir e. Ew rêz û qedra ku mamostayan wekî kesatiyên rewşenbîr û zana di gundan de hebûn, nîşana wê ye ku kurd xwediyê kulturekê bûne ku, rêz û hurmetê pêgehek bilind têde heye. Rêzgirtina han pitir di vexwendin bo mêvanî, nanxwarin û piştevanîkirin ji helwestên mamosta bûne. Mamosta Azad hest bi vê yekê dike û dizane ku retkirina wê vexwendinê, weke sivikatî û bêrêzî bi xwediyê malê ye ((Min hinde zanî (Mam Wesman), (Xule)ê kurê xwe şandiye pey min, bona wê ku şivê (nanê êwarî) li mala wan de bixom. herçiqas ku min pê nexweş bû, lê neçar bûm, çûnkî qebûlnekirina mêvaniyê, weke kêmgirtina mazûvan tê zanîn)) (Nazê: 28).

Herweha li dîmenek din de, dema ku karakterê serekî (Azad), mamostayê gund e, bi navtêdan û fititiya (Qale) dikeve girtîgehê, xelkê gund tevde piştevaniyê jê dikin û piştî azadbûna wî, bi nîşaneyên rêzgirtinê deiwet û mêvanê mala xwe dikin ((Min xwast biçme cih û mekanê xwe, lê (mam Wesman) destê min girt û bi zor bo mala xwe birim)) (Nazê: 50). Li vê derheqê de, romannivîs bi hûrî basa demên wê mêvandariyê kiriye û xebitiye ku ji wê riyê ve, meznahî û qedr û pêgeha mamosta li gundan de nîşan bide.

Serbarê wana jî, ew vexwendina mamosta, beşek ji pêvajoya bûyeran li stû girtiye. Çûnkî romannivîs kariye ku tîrojê bixe ser beşek ji bûyeran. Li beşa (16) mîn de ku ji vexwendina mamosta bo mala (Heme Cemîl) hatiye terxankirin, romannivîs bi hûrî şêwaz û çawaniya vexwendinê eşkere kiriye ((- Sibeyî êwarî dixwazim mamosta (Azad) bo şîvê vexwînim malê.

Jina wî jê pirsî: Başê em çî jêre bikin?

- Gîskekê jêre?

- Kiçê herwa sor bike.

Îca rû ji (Hîwa)ê kurê xwe kir: Hîwa tu bi çî ve mijûl î?

- Waneyên xwe dinivîsim.

- Sibe ji mamosta re bibêje: (Bavê min got, bo êwarî mêvanê me ye).

Jina wî got: Bi gotina wî zarokî çawa tê!

- Bila carê ew jêre bêje, ez jî dê piştînavro jêre bibêjim)) (Nazê: 60–61)

Êdî hemû şêweyên vexwendin û çawaniya nanxwarinê zelal, û bi hûrî bas jê kiriye. Tevî wê jî beşek ji pêvajoya bûyeran bi vê yekê sipartiye û piştî xwarina şîvê, bas û guftigoya wan digihîje ser pêwendiya dildarî û evîndariya navbera (Azad û Nazê), lewre Salar ku xelkê gund e û li dewatê de beşdar e, jêre dibêje: ((-Mamosta dewatê nakî?

- Dewata çî?

- Hey xwedê te silamet bike, piştî wan hemû bezm û rezman, dibêjî dewata çî?

- Hêj min xwazgînî jê nekiryê.

- Îca guneha te ye, bo dawiyê pê nahînî..?

- Ya rast, min pereyek wusa di dest de nine.

Heme Cemîl ji min re got: Çiqas dixwazî didim te.

- Sipasdar im.

(Salar) kuçek avêt: Ditirsim ji tirsê (Qale) de nexwazî.

- Qale! Bila bi xwe (sîrê bixwe û zirnayê lê bixe)

- (Heme Cemîl) got: Mamosta, bişîne xwazgîniyê bila çiq lê şîn nebin)) (Nazê: 66).

Li wê dîmenê de romannivîs xwastiye ku deng û basên nav gund li dor pêwendiya evîndariya navbera (Azad û Nazê) bîne berbas. Li vir de mifah ji edet û nerîtekê wergirtiye ku weke rêzgirtin, peyrewî jê tê kirin, ew jî, ew vexwendin û deiwetiye ye ku kariye dengvedana pêwendiya dildariyê li nava gund de nîşan bide.

Di romana (Koçî Sûr) a (Heme Kerîm Arif) de rêzgirtina ji mêvanan di kultura kurdî cih û pêgehek taybetî heye û bi çavê rêzdarî ve mêzeyî mêvanan hatiye kirin, û mêvandarî, nîşaneyê nandeyî, azayetî û çavtêriya malbatê bûye. kultura han li romanê de bi cuwanî reng vedaye, bi taybetî li romana Koçî Sûr de ku riya rêvîngan bo mêvaniyê dikeve gundan (ya baş ew e ku li zaf ji gundên Kurdistanê de, şîv li derengî şevê de tê xwarin, neku mêvan yan rêwiyek rû ji wan bike û şermezar bibin.

Min navê xwedê lê anî û li derî da, malê!? Sîber û tarîtiyek kete ser deriyê serban û ji wir ve bi dengê nazik, bersiv hat: kî ye?

- Ez im xûşkê, mêvanan xwedî dikin?

- Keremke bira, mêvan xweştiviyê Xwedê ye.

Teklîfek kir, lê bi dengê zelal û naziktir got:

- Bisekine, tarî ye bila ez çirayekê bînim..

- Zehmetê nekişîne, min alatişk heye.)) (Koçî Sûr: 119).

Romannivîs bas ji mêvanperweriya xelkê gundan dike û wê çandê tîne berbas ku xelkê gund, dereng nan dixwen, neku rêbwarek bê û bibe mêvanê wan, û risq û xwarina wan nemabe û şermezar bibin. Li urf û edetên kurdî de, mêvan xwedî qedr û rûmetek zaf e û rû ji her malekê bike, çi tiştê xwarinê hebin, li pêşberî dadinên û rêzek zaf jê digrin. Ji ber vê yekê ye ku piraniya Rojhilatnasên ku rû ji deverên Kurdistanê kirine, rastiya han anîne ziman ku kurd, mêvanperwer û mêvanhez in û qedrê mêvanan digrin.

Li vê derheqê de, romannivîs vê yekî tîne ziman, her dema ku rû ji malekê bikî, bi başî têtê pêşwazkirin û dibêjin mêvan, ezîz û xweştiviyên Xwedê ne.

3.1.4. Lîstik

Di nava kurdan de leyîz weke çandek kevnar e, û leyîzên curbicur hene ku ji bav û kalan ve bo me bi cih mane. Her ji mezin ve bo biçûkan, lîstikên taybet bi xwe hene. Ew lîstik jî di nava janrên wêjeyê de cihê pûte û girîngpêdana zaf ji nivîskar û romannivîsan bûye, ku helbet wan jî armancdar ew yek bikar anîne, weke li romana (Malava Gulî Xem) a (Hîmdad Hisên) de hatiye ((Her bîstekê piştî rojavabûnê, hêj parî jî gewriya me jorde neçûbû ku dengê zarokan di kûçe û kolanan de bilind dibû û bihev re hawar dikirin:

Rabin rabin ji xewê

Werne gemanî şevê

Ew serdem, serdema zarokên pak û dilpak bû, çiqas hatiye guhertin, heya derengî şevê, me Qawqawanê û Piştereqê û Weşarko dikir)). (Malava Gulî Xem: 6 -7)).

Armanca romannivîs li vir de, pitir derxistin û nasandina jiyana wî serdemî ye. Herweha nasandina taxên hejaran û çawaniya têkelbûna xelkê li wî serdemî de, ku zarok berdewam şev û rojan mijûlî leyîstinê bûn. Herweha bas ji çanda leyîstina zarokan di kûçe û kolanan û cureyên leyîzan dike û nasandine, yan jî stranek fulkilorî têde bas kiriye. Helbet navbirina lîstikên kevn ên kurdî û stranên fulkilorî, renga bi armanca parastina wê kulturê û bandora wê be ji jinavçûnçê û beşek be ji bîranînên nivîskar. Ji aliyek din ve jî, nivîskar dixwaze bibêje ku ji zarokatiyê ve Dilêr nas dike û pêre heval e, û haydarê hûr û girên jiyana û mijarên nav romanê de ye ku hatine baskirin.

Li romana (Tole) ya (Mihemed Mokrî) de, romannivîs li destpêka romanê de, dixwaze wêneyeke gundê xwe berî têkdanê nîşan bide ku piraniya bûyerên nav romanê de têde diqewimin. Di wê dîmena ku romannivîs cehdê dide bikişîne, bas ji hin lîstikan dike û dibêje ((serdanek kin ji çapxaneyê biçûk û dîtina Hecî Mihyedîn ku bi dengê bilind bi zelamek din re Dameyê dilîze, eve Fetahê Seknî (Kerîmê Sofîrî didît ku bi hemû hêz û taqeta xwe ve, polên Domîneyê dirijandine ser maseyê û eznîf dikirin.

Seîde Sor ê çayçî jî her li ser pirte pirta xwe berdewam bû. Li navbera du (rîkorde) de, tûşî sergerdaniyê bûye, her dixwast stranên Hesên Zîrek bixîne ser Newarê û du qatî bifoşe)) (Mihemed Mukrî, 2015: 1-2).

Romannivîs li kêşana wêneyê gundê xwe de, vê yekê tîne berbas ku li hinek dukanan de, bi taybet li çapxane û çayxaneyan de ku xelk li dema bêşolîyê li wir kom dibin û mijûlî leyîza Domîne û Dameyê dibin, û guh ji hinek stranên digrin. Eva, ew çand e ku ji kevînar ve li cihekê kom dibûn bo demborandin û gotinên xweş û vegêrandina çîrokan, û piştê jî li çayxaneyan de stranên biserhatî, lê li bajaran de jî bi ciyawaz derdiketin.

Li romana (Janî Gel) a (Îbrahîm Ehme) de, romannivîs weke zemînesazî bo wê pêwendîya evîndarî ku li navbera (Cuwamêr û Kalê) de çêbûye, penaya xwe bo lîstîkek fulkilorî a kurdî dibe ku heya serdemê niha yê teknolojiyê jî, di nav civaka kurdî de bi zîndî maye û ji aliyê takên civakê ve tê encamdayîn, ku ew jî, leyîza Dame ye. ((Bi hêsani Kalê hînî Dameyê kir, dirûniştin û yek du demjimêran bihevêre dilîstin, carna jî bi xwe sist fikir, daku jê bibe)) (Janî Gel: 47).

Baskirin ji vê lîstîkê ku bûye bi çand, tenê ji bo zîndîtî û amajekirin bi kultur û fulkilorî kurdî nebûye, belkî romannivîs bi hişyarî ve ew lîstîk aniye nav pêvajoya bûyeran û ji wê riyê ve, ew pêwendîya evîndariyê ku li dil û derûna her duyan de derketiye, bihêztir kiriye û rêxweşker bûye ku pitir hevdu nas bikin.

Li romana (Koyxa Sêvê) ya (Ezîzê Melayê Reş) de, li dîmenek din de romannivîs ji riya vegêrandina jiyana zarokatiya (Koyxa Sêvê) ve, amaje bi beşek ji wan leyîstokên fulkilorî ên zarokan dike ku pitir berhema civaka gundî a çandînkariyê bûye û tomar kirine. Wê yekê ji zar (Koyxa Sêvê) ve vedigêre ku ((xincî Elî Eze ê pêxas ku hevtemenê wî bû, tu zarokê din nebû ku pêre bilîze. Ew du zarok di hemû lîstîkekê de: (Qur qurêkê, malçêkirin, Morkanê, Pêncokanê, Qaqayanê, Dapîre Reqe û xuşokanê û ...) hevdu re bûn)) (Koyxa Sêvê: 2008). Vir de romannivîs navê wan lîstîkan tomar kiriye bêy wê ku basa wan bike yan şêwaza wan rohn bike.

Li romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, îşare bi çend listikên kurdewarî kiriye û weke kulturekê, rûkarên wan hatine tomarkirin. ((Sala borî xiste hizra min ku digot: (Helûr Belûr tekame, zerd û sûr û şemame, berbance, Silêman qince, mêxim kutî, şêx helbezî, tîkerastî, emey gezî). Di wan rojan de, min her du lingên xwe dirêj dikirin û wî jî derheq wê listikê, serê tiliya beran ya piyê min digirt û dihejand)) (Helkişan Berew Lûtke: 53). Li cihek din de û ji zarê (Tofiq) ve bas ji wan leyîzan tê kirin ku şevane li malan de bona dem borandinê dikirin ((şevane me ev mal û ew mal dikir bo Kelemistanê û Kilawên... Leyîz ku weke sînê û amanekê ye... Me li ser warikekê dilîst yan li ser Gûz û Eşresî. Piştî me Cilaxanê dikir)) (Helkişan Berew Lûtke: 106).

3.1.5. Zibare

Karkirina bihevre, yek ji wan edet û nerîtên herî kevnar e ku heya niha jî li gundan de maye û bûye bi çanda gundan û hemû peyrewiyê lê dikin, û bi dilxweşî û awayekî baş pişikdariyê têde dikin û herweha şanaziyê pê dikin.

Ew deb û tîtal li hin romanên de ku pitir rengvedana bûyerên nav gundan de ne, zibare bi başî û bedevî di nava janrên romanê de hatiye cihdan, û di nava wê zibareyê de, zaf bûyerên din serî hildidin. Ji wan, li romana (Tole) ya (Mihemed Mokrî) de piştî kavilkirina gundê wan, Mistefa wusa qala nûjenkirina gundê xwe dike ku di çarçoveya karê zibare de bûye ((Hecî, berî wê ku mala xwe avedan bike, ji şefeqa sibê ve heya êwarî, bi qasê yek du kedkaran kar ji bo avedankirina qutabxane û mizgefta gund dikir... piştî mala ew kesên ku hevser, kur yan kes û karên wan hatibûn kuştin, û li dawiya hemûyan de, gera mala wî bû. Bi dengê bilind, xelk han dida û morala wan bilind dikir, û ji wan re digot:

Bi başî avedan bikin, qutabxane û mizgevtê mezintir bikin.. werin em bi awayek baştir xanîberan ava bikin dey xortino)) (Tole: 18).

Li vir de, bas ji nûjenkirina gundê xwe bi awayê zibare dike ku xelkê bihevre kar ji bo nûjenkirina gund, mizgevt û qutabxane, malên hejar û bê seymyanên gundê xwe dike ku him weke edet û nerîtek kevn, him jî weke xêr ew kar encam dane. Bi taybetî li

gundan de destê hevkarî û xêrê pitir e ji bajar. Ji ber wê ku, zaf sedemên civakî û xizmatiyê, wan bihevdu re girê dide. Wan han dide ku li dema tengasiyê de, alfkariya hevdu bikin. Herweha bas ji Hecî dike ku berî avedankirina mala xwe, mala xelkê avedan dikir. Ew yek, nîşaneyên dilsojî û xemxoriya bo gund, û xweşewîstiya bo xelkê ye ku dixwazin li gund bimînin, û xelk jiyana li gundan dest pê bikin.

Li zaf gundan de, dîwanxane, axa û biramezin hene ku li gundan de, rolek mezin dilîzin û kar û barên zaf dixine stûyê xwe. Li xweşî û nexwşiyên de beşdar in. Helbet li hin dem û dewranan de, rolek baş nebûne. Dema ku em basa kar û barên gund û serdemê zû dikin, nabe ku em dîwanxane û kesatiyên gund ji bîr bikin ku rolek girîng û mezin di serdema xwe de hebûne.

Her ji vê dîtingehê ve, romannivîsan ew rola girîng ya dîwanxane û kesatiyan li gundan de ji bîr nekirine û cihek xasmanî û girîng di nav romanên xwe de pê dane.

3.1.6. Axa û Dîwanxane

Li romana (Nazê) ya (Îsmâil Rojbeyanî) de, dema ku mamosta Azad ji girtîgehê tê serbest berdan û diçe gund, mam Wesman ku kesatiyek xwedî dîwanxane ye, bi çî awayî pêşwazî ji mamosta Azad kiriye û dibê bo dîwanxana xwe ((Mam Wesman destê min girt û ez bi zorî birim mala xwe. Dîwanxane wusa teji bibû ku êdî cihê tu kesê nebû.

Mîn rû ji rûniştîyan kir: Bi rastî, we ez şermezar kirim, nizanîm çawa sipasiya we bikim.

Mam Wesman bersiv da: Kuro babo tu çî dibêjî, ya ku me kiriye, bo me bi xwe bûye, şukur ku zû rizgar bûy.

Yekî din ji hêla din ve got: Xweda mirovê pîs bigre!

Mam Wesman got: Amîn, hinde pê neçû ku xelk yek bi yek rabûn û xatirê xwe xwastin. Mam Wesman xulkê hemûyan kir ku bo nanxwarinê bimînin, lê wan digot: we hinoşîcan be, paşan emê vegerin)) (Nazê: 50–51).

Romannivîs rola dîwanxane û kesatiya Mam Wesman di bûyeran de bas dike û di fezaya nav romanê de, pişikdar dike. herweha xelkê gund jî, pêştir bo piştevanîkirina mamosta Azad, wajo kom kiribûn ku bêguneh e. Piştî serbestberbûnê jî, li dîwanxanê de dildaneve û pêşwaziya wî kirin û mamosta Azad jî, sipasiya tevan kir. Aliyê din jî, ew e ku dîwanxane hertim teji xelk e û xelkê gund bi berdewamî hatin çûyîna wê dikin û piraniya caran têde, pirsgirêk bi destê axa û biramezin têne çareser kirin.

Serbarê wê jî, hinek axa hebûn ku hemû dever bi ya xwe dizanîn û nemaze dar û berên gund jî bi milkê xwe dizanîn. zulm û zordarî ji xelkê dikirin. Romannivîs ji zarê Azad ve qala wê dike ku mala wan ji ber dûkelê reş geriyabû û dixwastin suwax bikin, lê ji aliyê axa ve, rêgirî jê hatibû kirin ku xakê ji suwaxê re bibin ((Diyar min gazî min kir: Kurê min Aze, were em biçîn yek pût xakê bînin daku wan dîwaran sor .. bikin. Gava yek tê mala me, em şermezar dibin. Hêj li cihê axê dîr neketibûn ku ji dîr ve, axa hawar kir, kiçê bisekine!

Ew weke mîxçê li cihê xwe de çeqî û tund destê min girt. Gava axa ji me nizîk bû, bi kerb û tûreyî ve got: Tu vê axê bo ku dibî? Dixwazim bi dîwarê odeya xwe bihisûm. Hey hey, xanim dîwarê odeya xwe pê sor dike...! Başê bo sipî nakî? Dey birijîne dê, zû be. Bi neçarî xaka dagirtî, rijande erdî û paşde vegeyriyan. Li rê de dest bi dua û nifiran kir: Ya rebî, heya kengê vê zulm û zordariyê qebûl dikî? Ka eva jiyar e.. ax ..û maxa asayî jî, ji te qedexe bikin.))(Nazê: 102–103).

Romannivîs vê yekê nîşan dide ku hinek ji axayan, çawa xelk çimisandine û zulm û xedr ji xelkê hejar û belengaz kirine. Wan ruxset nedane li wî gundê ku têde dijîn, sîd û mifahê ji tu tiştî bibînin û diviya her tişt li jêr destê wan de bûya û bêy pirsikirina bi wan, nekarin çî bikin. Her tişt ji wan re helal bûye û ya ku xwastiban, encam didan, lê xelkê nedikarî çî bike. Helbet ew cure zulm û zordarî ji aliyê hinek axa û began ve li hin cihan de hebû, lewre romannivîs wê bûyerê di romanê de tomar dike, daku dîroka hin ji axayan, weke xwe vegêre.

Herweha romannivîs hemdîs zulma hinek axayan tîne berbas ku xelkê gund neçar kirine ku bi suxre kar ji wan re bikin ((Payîzek dereng bû, xelk bi xwe ketibûn û li ber deriyê her malekê Suwax (kurr) girtibûn, lê ji tirsaxa, kesê nediwêra dest bi karê

xwe yê suwaxê bibe. Êwariya roja pêncşemî bû ku axa dîsan ragihandibû: Bo sibeyî, her malek, zelamekê bişîne bo kurkariyê (suwax). Wê carê ez bi xwe çûm, ev kare bi min sipartin ku tenê binê zerik (setl)an ter bikim)) (Nazê: 110).

Armanç ew e ku axa cuda ji wê ku xwe bi xwediyê hemû gund dizanî, diviya hemû kes karê mala wî jî bikin. Wate, berî karê xwe, diviya karê axa bi dawî bikin. Anku mala axa, ji mala xwe pêştir û ferztir bizanin. Ewa jî kulturek e ku hinek ji axayan hebû.

3.1.7. Rengvedana efsane û bîr û baweriyên kevn

Xelk berê zêde şehreza nebûye, bi taybetî şehrezayiyek wusa li ser jiyane nebûne. çûnkî zanist û zaniyarî jî, weke niha pêş neketibû, lewre bo zaf mereman, pişt bi efsane û bîr û baweriyên ecêb û gotinên xeyalî û xewnan girê didan û zaf carî baweriyek tewaw pê hebûne.

Di romana (Malava Gulî Xem) ya (Hîmdad Hisên) de, romannivîs sûd ji wan bîr û baweriyên dîtiye û kirine bi bûyerên nav romanê de. Ew bas ji dildariya wan dike, dema ku Dilêr vegeyriyaye zanîngehê û Neşmîl hêj nevegeyriyaye. Dilêr ewqas hizir jê dike ku tê xewna wî, û dibêje ((Di xewna xwe de bi Neşmîlê re di nava rez û baxên zor de diçûm, li rê de tûşî kabrayekî ser û rihsipî ê rûken bûm. Girnijînek kir û got: Na na.. netirsin..Destê xwe kire berîka xwe, sêvek derxist û got: Her yek ji we, keriyekê bixwen. Eva got û kabrayê nûranî li ber çavê me bûye balinde û firiya! Ew çû, em rastî Dêwekê hatin, em zaf tirsîyan ku renga me bixwe. Lê di xewnê de, Dêw (Neşmîl) rewand û dûr ket. çiqas li pey ketim, bêencam bû û li şeqyatî û tirsê de ji xewê şiyar bûm)) (Malava Gulî Xem: 56).

Wate, ewqas li bendê bûye û ji jidestdana wê tirsîya ye, lewma zêde hizir jê kiriye ku hatiye xewna wî. Li xewna xwe de, çend efsaneyan bas dike ku di nav çanda kurdî de hene û baweriyek zêde jî pê hene, weke: kabrayê nûranî, Xidir Zînde, Sêw, Dêw, rewandin û ... ku tevde li nav kultura kurdî de hene û xelkek zaf jî bawerî bi nirxandin û şiroveya wan terze xewnan heye. Nemaze niha jî xelkek zêde baweriyê bi wan xewnan dike. Armanca romannivîs, ew e ku bîrkirin ji kesekê ku bixwazî bidest

bînî, tète xewna mirov jî. Herweha ew terze xewndîtine û çawaniya bûyerên nav xewnê de, zaf carî di nav xelkê de dubare dibin, ya ku ji xelkê re di waqî' û rastiyê de ser nagire, zaf carî xewnê pê dibînin.

Di romana (Nazê) ya (Îsmaîl Rojbeyanî) de, romannivîs di yek ji bûyeran, qala diyardeyekê dike ku hingê xelkê baweriyek zêde pê hebûne, ew jî, navik ketin bû. Dema ku Azad diçe ba keçikê li mala cîranê xwe de, diya Azad pê dihese û li dû diçe û Azad vedigerîne. Li wê demê de, jinek cîran, wan dibîne û bi diya Azad re dibêje ((Eve hûn ji mala Xecê tên? Diya wî dibêje: Erê wula, dayka Azad bimre, navka wî ketiye, min got ka bizanim mam Emer bo nahîne cî))(Nazê: 6).

Diya Azad hêcetê ji wan re tîne daku abirû û şerefa wan neçe, çûnkî kurê wê çûye ba keça cîran, lê dibêje navka wî ketiye, lewre biriye mala Mam Emer (mala babê keçikê). Hingê xelk li dema nesaxiyê de diçûne ba hin kesan, ku xwe bi hekîm û nojdar dizanîn û çareserîya hin nesaxiyên dikirin, û xelkê jî bawerî bi wan hebû, bi bê wê ku xwendewarî yan pisporîya wê biyavê hebûbin. Wê demê, xelkek zaf pişt bi wan terze çareserîyan girê dida, bi taybetî navkêtin ku renge tu bingehê zanistî nebe. Herweha yek ji wan bîr û baweriyên ku xelkê baweriyek zaf pê hene, xewn e. Romannivîs yek ji wan xewnên ku Azad bi evîndara xwe re dîtîye, vedigêre ((Min li xewnê de dît: Eve Nazê bi kincên bûkîniyê ve li hemberî min de rûniştîye, bi awayek şermoke mêzeyî min dike, min çiqas kir, nekarî xwe rabigrim û yekser bi ser de ketim û min, ew digewizand û bi şilpêna maça xwe, ji xewê şiyar bûm)) (Nazê: 67).

Vegêrandina xewnê di wê demê de, tê wateya wê ku bîr û hizra wî berdewam li ba Nazê bûye, lewre şevê jî hatiye xewna wî, û li xewnê de jêre bûye bûk. Helbet xewnên wusa di nava xelkê de analîz û nirxandinên curbicur hebûne, xwedî xewn dibe xwe ji bo qewmîna bûyerekê amade bike. Lewre romannivîs ew xewn bi vî awayî aniye ziman ku, xewn yek ji wan diyardeyan e ku xelkê baweriyek zêde pê heye û li wan deman ku li hember bûyerekê de neçar û bêdesthilat î, bawerî bi hin tiştan tê kirin ku renge li demên asayî de her hizir jê nehê kirin. Lewre Azad li wê demê de, berdewam li hizra evîndara xwe de bûye, lê li xewnek bi wî awayî de, dikeve nav guman û tirsê de.

Di romana (Koçî Sûr) ya (Heme Kerîm Arif) de, bas ji bîranînên kevn dike ku xelkê bi giştî û jinan bi xasmanî baweriyek zaf pê hebûne, û li zaf aliyan de jî piştî xwe pê girêdidan, ew jî xewn e. Xewn di wêjeya kurdî de cihê baldariyek zaf e, nemaze li hinek dastanan de jî, kariye cihê xwe bi tewahî veke. Di yek ji bûyerên wê romanê de ku (Atê) hevsera Sadiq e, berdewam xewn didîtin û piraniya caran jî, li ser xwarina taştê û berdana çayê ji mêrê xwe re, ew vedigêrand. Hevdem li gel vegêrandina xewnê de, tirs dil û hinavên wê dadigre û dibêje: dê tiştêk biqewime. Ya xwedê, tu bi xêr bigêre ((Li xewê de em bihevre çûbûne dewçem (Qeraxa rûbar).. Avek safî û zelal bi xure xur diherikî, pêlên biçûk weke zarokên sêvî, nerim nerim ber bi qeraxa rûbar dihatin û li wir nediman, û dîsan pêlên din cihê wan digirtin. Te li derdorê dinihêrî û ji min nizîk bûy, û te dewê xwe anî ...

Îca te got: Atê jîyan her wusa ye, rast weke navbera du qeraxên rûbar e. Min ji te fam nedikir, tu tûre bûy û destê min bi tundî girt û em çûne nav rûbar.. xîzê bin avê de weke pûlekên kirasê tazebûkê dibiriqîn, birisqokên hênik! Nişkîve min qîrand û ber bi paş vegeyriyam, lê tu li nav avê de mabûy û tîq tîq bi min pêdikeniyay. Nişkîve av şêlû bû, lêmişt û lehî rabû, min hawara te kir: Xwe xilas bike..êdî li pîrte pirta Misto şiyar bûm. xêr e însala...keçê ewda xwedê! ewqas bi xeyalan dirazêy lewma)) (Koçî Sûr: 104).

Romannivîs basa wê xewnê dike ku zaf carî li kultura kurdî de, xewn, pîvan e bo rûdana tiştêkê ku reng e biqewime û bi taybetî jinan baweriyek tewaw pê hene. Lewre pir girîng dibînin ku xewnê bo kesên nizîkî xwe, bas bikin û raya wan bizanibin ku wateya wê xewnê çi ye. Yan zaf carî bi armanca şiyarkirinê bas dikin ku haydarê xwe be. Yan hin caran, wusa nîşan didin ku xewna wan dibe rastî û nîşaneyên baş têde hene, lê pitir li nav jinan de girîngiyek zêde heye. Lewre romannivîs neveşartiyê dema ku dawî bi vegêrandina xewna Atê tê, mêrê wê jêre dibêje: Evda xwedê, hinde li ser xeyalan nerazê. Wate mêr jî dizanin ku ew xewn, berhema xeyal û hizrîna rojane ya wan e ji meseleyan.

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, îşare bi hinek efsaneyan hatiye kirin ku bûne bi cihê baweriyê xelkê û weke kulturekê di nav jiyana

wan de reng vedane. Weke, dema ku bas ji xwarbûna minareya Tekiyê tê kirin, sedema wê bo efsaneyekê vedigerînin. Dibêjin, dema ku Şêx Elî ji Hecê vegeriya ye, murîd û xelkê tax bona maçkirina destê wî kurnoj birine ((Ew minare jî.. ew jî bi heman awayî xwe diçemîne daku destê şêx ramosîne.. .. dema ku Minare dixwaze destê şêx maç bike, mam şêx bilez destê xwe dide ber minareyê û li cihê xwe de disekinîne! erê ew xwarbûn, ji ber wê ye)) (Helkişan Berew Lûtke: 20). Li vir de ew efsane pitir bo bilindkirina cî û pêgeha (Şêx Elî) hatiye çêkirin û bona mezin û girankirina wî ye.

Serbarê wê, romannivîs bas ji çend bîr û baweriyên derheq çêbûna goy zewî dike ku teji ji efsaneyan in ((Dibêjin: (Goy zewî li navbera du şaxên Ga de ye, Ga li ser piştta Masiyê ye, Masî jî li nav deryaya bê bin) xwe qise û gotin bi pere ninin)) (Helkişan Berew Lûtke: 43).

Helbet li vir de efsaneyek derheq dunyayê hatiye çêkirin ku bi raya romannivîs, dîr e ji rastiye û ji efsane û gotinekê pitir nîne. Li dîmenek din de, îşare bi terzek ji efsane û bîr û baweriyên xelkê li dema geşt û gerê de dike. Dema ku (Salar) diçe gerê, ji aliyê (Nexşîn) a hevîna wî ve, tasikek avê bi dûre dirêje ((Rojê Înê bo êwarî, Nexşînê Salar şand, her li pêngava yekem de, tasika avê li dûre rijand)) (Helkişan Berew Lûtke: 154). Cuda ji wana, romannivîs kesatiyek efsaneyî tîkel bi deqa xwe kiriye ku ew jî, Xidir Zînde ye ku ji riya Sofî Mihyedîn ve ku karekterek olî ye û hewil dide bigihîje dîdara wî ((Çûye ber derî, û Sofî Mihyedîn pala xwe dabû dîwar, guh jê bû ku digot: (Ho Xidir Zînde, dê her bême dîdara te)))(Helkişan Berew Lûtke: 217). Piştî ji riya guftigoya nabvera (Newzad) û diya wî re, pitir li ser kesatiya (Xidir Zînde) û kesatiya (Ehmedê Şêx) tê gotin ((Erê gelo tu bêjî Xidir Zînde û ... rast bin!?

- Be çawa!! Atê bi dengê taybetî li ser vê mijarê domiya.

- Kurê min, ev dunya bi wan ve girêdayî ye û ji ber xoşewîstiya fexrê kaînat hatiye çêkirin.....

- Tu niha binive, Xidir Zînde û Kake Ehmedê Şêx li gor dilê te bidin te. Newzad bi girmijîn û pêkenînek nerm ve, dengê wî tama pûngê hebû. – Îca çizanin ku çî li dilê min de heye!

- Ew! Nizanin!? Ez bi bi vê saffilketiya xwe, dil û derûna te dibînim, vêca ew zatên ku çavê xeyb hene, çawa nabînin)) (Helkişan Berew Lûtke: 288-289).

Lêre de du boçûnên cuda tên xuyakirin. Ramanek ku ya nifşa nû ye û ji zarê (Newzad) ve bîr û baweriyên wan hatine ziman, û baweriya wan bi wan terze efsaneyan nine. Ramana din jî ya nifşa kevn e ku ji aliyê dayka wî ve hatiye temsîl (nûneratî) kirin û ne tenê baweriya wan pê heye, belkî bi bîr û hizrên ayînî jî hatiye têkel kirin û bi pîroz hatiye hesibandin.

3.2.Çanda kurdî li bajar de

Bajar dîrokek dûr û dirêj li nav civaka kurdî de nine û ew kêrahiya berfireh ku ji bo romana kurdî li gund de misoger bûye, ji bajar re bi wî awayê berfireh nine. Tevî wê jî, romannivîsê kurd bi taybetî li serdema nû û hemdem de ku hêdî hêdî bajarên mezin û bazar û bazerganî li nav civaka kurdî de hatine rojevê, sêdek zaf ji kultura bajar wergirtiye û li nav romanên xwe de reng vedaye, sîma û taybetmendiyên kultura bajar, ew in:

3.2.1. Jiyana rojane ya bajar

Ji ber wê ku bajar mezin û berfireh e û zaf ji dem û dezgehên mîrî, rêkxistin, sendîka, xelk û zimanên cuda, bazar û karên curbicur têde hene, lewre li warê çandî ve ji gund ciyawaz e û hin deb û edetên taybet bi xwe hene, û xelkê wê, hilgirê wan edet û nerîtan dibin ku li wî bajêrî de tene peyrewkirin û sîmayek taybet bi xwe ava dike ku li zaf deman de pê tê naskirin.

Dema ku romannivîs dixwaze bas ji hinek bûyeran bike ku li bajar de ne, dibe hinek wêne, jîngeh û kultura bajar bîne nav basa xwe, daku kultura bajar têde reng vede.

Li romana (Nazê) ya (Îsmaîl Rojbeyanî) de, dema ku basa wê dike ku Nazê û mamosta Azad li bajar de dijîn, ji zarê Azad ve bas ji wê jîngehê û hinek kel û pelan dike ku li bajar de hene û dibêje ((Roj bi rojê jiyana me nû dibû, zaf carî em bihevve diçûne bazarê, zaf cureyên eteg, kiras û fîstanên reng bi reng.. pantron..suxme (êleg)..cilên razanê)) (Nazê: 74).

Di baskirina Tenûre, kiras û fistan û pantron û ...htd, tevde cilûbergên bajar û kultura bajar bûn. Dema xwe ww kinc û kel û pel pitir li bajaran de bikar dihatin û li gundan de ji ber zaf sedemên weke pezdari, çandinî û ...htd, nekarîne wan bikin ber xwe. Çûnkî ew kereste û bazarê, pêwendî bi kultura bajar ve hene. Merema romannivîs jî ew e ku ji wê dema ku hatine bo bajar, jiyan û kultura keçikê jî, guhertin bi ser de hatiye.

Herweha li cihek din de ji zarê mamosta Azad ve basa wê yekê dike ku hatine bajar û hîn xwendinê bûne ((Sal hatin û çûn, ez her mijûlî elimandina wê bûm, heya gihîşte astekê ku hêdî hêdî dest bo xwendina kovar û rojnameyan dirêj dikir, ewqas hez û meraqa xwendinê dikir ku zorbeya ew pirtûkên kurdî xwendibûn ku min li malê de danîbûn)) (Nazê: 75).

Li wir de, romannivîs weke handanekê dixwaze bibêje ku xelk li hemû temenekê de dikare hîn bibe û gelê xwe re dibêje ku bixwînin. Herweha Nazê jî li bajar de ew derfet jêre afiriye ku xwe ber bi pêşde bibe û xwe bi xelkê bajar re biguncîne û mil bi milê wan, pêngavên serketinê bavêje û li dijî nexwendewariyê bisekine.

Herweha li cihek din de ji riya filaşbakê ve, bas ji wan rojan dike ku (ka) li gund kom dikir û bo firotinê dibire bajar ((Hemû şevê hevalê min hebûya yan nebûya, min barek (Ka) li kerê boz dikir û ber bi bajar diketim rê.

Me demjimêr û tiştên wusa nedizanîn. Diya min derdiket derve û mêzeyî esman dikir û digot: Weide ye.. teraz û berz e., Berbanga sibê digihîştme bajar û zaf carî min serxewek dişkand û îca bajarî derdiketin derve. Ger wê rojê min barek bi 100 filisan bifirota, wê rojê daweta min.. bû)) (Nazê, 123).

Romannivîs bas ji wî karê Azad dike ku li navbera gund û bajar de encam dane. Wê yekê tîne ziman ku diya wê sibêdeyan çûye derve û jêre gotiye ku terazî ye tewaw e. Wate dem jêre destnîşan kiriye û piştî xwe bi zaniyariyên xwe girêdane, nek demjimêr û teknolojiya. Lê dema ku gihîştîye bajar û serxewek şikandiye, ewcar bajarî derketine derve. Eva jî tê wateya wê ku xelk li gund, zûtir ji xewê radibin û karên pitir û girantir ji yê bajarî hene ku encam didin û hemû jî bi hêza zend û baskên xwe, lê di

bajar de, xelk derengtir ji xewê radibin, û pitir alav û amêrên serdem û teknolojiyê bo karên xwe bi kar tînin.

Li romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, bajar kulturek cuda ji gund heye û rêwî û musafir kêmtir diçine mêvandariyê li malan de, û zêde li xwaringehan de nan dixwen. Ji ber wê ye ku li bajar de Hotel û xwaringehên curbicur hene. Romannivîs jî bi girîngî ve wan cihan di romanê de cî dike û ji zarê Ekber ve bas ji wê xwaringehê dike ku li bajarê wan de hebûye ((Kebabxaneya wî li rex Kordere, nik xelkek zaf naskirî bû, bi taybetî di nava texa hejar, belengaz û reş û rûtan de...))

Ew, ne peykersaz û ne jî zêringir bû, lê bi wan çavên xwe ên jar, ji nîgarkêşekê bişiyantir, ji peykertaşek destrengîntir, û ji zêringerek hûrbîntir û çelengtir bû. Ewqas bi hûrî goşt ji hestî cuda dikir, te digot qey ku bi hezaran Mêhrûyan ew hêstik, vekirandine. Wate saf û lûs dikir, dîsan jî dest jê nedikişand û hêstikên kirrandî dixistine nav mencelekê û dikelandin û rûnê wê digirt û ava wê jî dikire şorbe tirî û difrot)) (Kordere: 54- 55).

Li wir de dixwaze pîşeya xwaringeh û cureyên xwarinan û xwediyê xwaringehê binase ku xwaringehêk binav û deng li bajarê wan de heye û her kesek li pîşeyekê de şehreza ye û dibe xwedî karê xwe.

Herweha romannivîs bas ji karên bajar dike ku dukan, yek ji wan e û xelkek zaf, hene û bûye bi pîşeyek sereke ya hinek bajariyan û her yek ji wan dukan û bazaran jî, taybetmendî û çanda xasmanî bi xwe heye. Ekber basa wê dike ku dukanek li bajêr de daniye ((Min bi neçarî dukanek pirtûkfiroşiyê ji xwe re vekir û kitêbên kevn û nû difrotin û dikrîn, li wan du sê mehên derbasbûyî de, xwedî pirtûk û alîgirên kitêban dizanîn ku min dukanek wusa vekiriye, lewma seredana min dikirin)) (Kordere: 143-144).

Ew lêre de, dukana kirîn û firotina pirtûkan, weke pîşeyekê bas dike ku bi armanca dabînkirina bijîva jiyana xwe li bazarê de vekiriye. Lê ew yek, pitir li bajaran de heye û xelk kirîn û firotinê bi pirtûkan dikan.

Romannivîs bas ji yek ji kulturên kevnar ên bajar dike, dema ku du gerek bi her sedem yan hêcetekê be, bi şer dihatin. Helbet ew çanda şeregerêk di nav kurdan de pir kevnar e û hertim gerek (tax)an bi hev re pirsirêk hebûne û zaf carî, bi şer hatine. Di romana Kodere de jî, Ekber basa wê dike, dema ku li benda Menîcê bûye ku hatiye bal, şipirze bûye ((Çêstingayek bilez Menîce peyda bû, hinekê şipirzeyî li rûçikê wê de xuya bû û got: Min soz dabû ku bêm lewma hatim, lê li bextê reş ê min, li serê din ê bazarê, şerê du gereken bû)) (Kodere: 153).

Helbet romannivîs xwastiye wê dîmenê jî weke dîrok tomar bike daku li nav dîroka bajaran de bimîne û wunda nebe, çûnkî zaf carî li bajar de dibû şerê gereken. Wê yekê, bala romannivîs kişandiye û tomar kiriye.

Herweha cihek din ku xelk ji bo dîtina filman rû jê dikirin, Sînema bû ku weke kulturekê li bajaran de hebû û xelk bi merema dîtina filman serî lê dixistin. Lewre romannivîs bi girîngî û baldarî ve, Sînemayê di nav romanê de tomar dike taku bizane xelk li wî serdemî de ji bo dîtina filman rû ji bajar kirine ((Ji aliyê dinê ve dengê Duhol û zirnayê dihat, dema ku nîzîk bûm, derket ku reklama filma sînemê dikin. Kabrayekê tevî duhol û zirnayê re digot: Zor û palevan, zor û qareman e, heyfe nebînin)) (Kodere: 97- 98).

Cuda ji wê, romannivîs basa wê dike ku sînema li bajaran de, cihek bûye ku xelkê demên xweş têde borandine. Herweha eşkere dike ku di wê demê de, reklam bo dîtina filman bi awayê Duhol û Zirnayê bûye û li nav xelkê bajar de geriyane ku rola palevanê filma sînemayî lîstîne.

3.2.2. Hejarî û Dewlemendî

Çînayetî pitir ji gundan, li bajaran de tê dîtin. Ew dîratiya ku li navbera xizan û dewlemndan de heye, li bajaran de pitir e, û mirov pir bi hêsanî dikare ji hevdu cuda bike.

Di romana (Malava Gulî Xem) ya (Hîmdad Hisên) de romannivîs bona wê ku bide selimandin ku mala Dilêr, malek xizan in û li taxek hejar de dijîn, rave û şiroveya mala Dilêr kiriye ((Wêneya bavê xwe qab kiribû û li dîwarê odeya xwe hilavîstibû, li jêr

de nivîsandibû (Xwedêjêrazî Mela Bayîz Mela Îsmâil). Li du aliyên din ê dîwarê odeyê de, du berkaz û pencereyên biçûk hebûn ku li yek ji wan de, refîkek hebû û heft heşt pirtûkên pizirî û tozgirtî li ser danîbûn û li ya din de, bawlêkî biçûk têde bû. Banê odeyê, bi karîteyên mezin, rizî û xwar û xîç û hesîrên reşbûyî hatibû girtin. Li navbera perdikan de jî, Pîrê (Dapîrjojkê) tewna xwe çêkiribû, te digot qey şikewta ‘‘Hera’’ ye. Pencereyên odeyê, li ser şêwaza mîhraba mizgeftê bûn ku bi naylonê hatibû peçavtin. Nylon çî nylon, her bi nav sipî bû, toz û dûkelê wusa peçavtibû ku rengê wê gewir bibû û rengê miriyan lê ketibû û du rayêx (libad) ên dirêj ên gul gulî (sor û zer) li odeyê de hatibûn raxistin)) (Malava Gulî Xem: 14).

Romannivîs di wê wesfa xwe de, dixwaze kultura navmala hejaran nîşan bide û eşkere bike ku çî malek hene û etekêtên mala xwe çawa rêk dixin, û herweha navmal û kel û pelên malên hejaran, çawan in. Li hember de, basa navmal û jiyana dewlemendan dike. Ew ji zarê Dilêr ve wesfa mala Neşmîlê dike ku malek dewlemend e, û bavê wê quntiratçî ye. Dibêje ((kabayekî keleşê e pirç belek ku kiras û derpêyek li pê de bû, hate jor û destê xwe da min û rûnişt. Ew hola ku em têde rûniştibûn, pir ciwan hatibû xemlandin, te digot qey dika şanoyê ye! ger tenê li rojname û kovaran de tiştê wusa ketibe berçavê min. Cara yekem bû ku hest bi kêmasiyê bikim û hêviyek kêr jî bi dildariya me bimîne. Li wir, ez dihizirîm ku divê bi lojîk û mejî bifikirim nek bi hez û xwasta dil, başê ez li ku û ew li ku)) (Malava Gulî Xem: 28).

Romannivîs li vir de bi cuwanê ciyawaziyên çîneyetî li navbera hejar û dewlemend de bas kirine. Herweha basa wan cudahî û ciyawaziyên kiriyê ku li bajaran di navbera hejar û dewlemendan de hene û bandor û tesîr li ser jiyana civakî a wan û jin û jinxwaziya wan heye. Tevî wê jî, kolnedan durûşma keç û kuran bû û berdewam cehd dikirin ku evîndariyê bi ser çîneyetiyê de zal bikin û hewla kêmrêngkirin û jiholêrakirina wê kulturê bidin ((Her li yekem nasîne de, min zanî ku pîvan û teraziya me laseng e û min piyê xwe zêdetir ji berika xwe dirêj kiriyê. Ez ê kurê Mela bayîzê pînedûz li ku û keça qunteratçiyek mezin li ku!? Lê coş û keleşanê wusa bal bi ser min de kişandibû ku hiş bo min nehiştibûn, yan jî renga wusa hizirîbim, yan min gotibe îca çî qeydî ye. Cara wusa hebûye ku kiçê li pêxema evîndariya xwe de, dev ji sermiyana

bavê xwe aniye û bîr û hizra çînatîyê jêre ne girîng bûye. Bi taybetî çar mehan şûndatir ji min re digot: Ez amade me ku li xîwetekê de bi te re bijîm û dest ji her tiştî berdim. Tu ji min re, her tişt î, bi vê çendê agirê eşqa min çend qat geştir dibû)) (Malava Gulî Xem: 24).

Li vir de dildariyê wusa bal bi ser wan de kişandîye ku dev ji çînatîyê kişandine. Herçiqaş ku Dilêr bi baskirina wê şîret û gotina fulkilorî, hîs dike ku piyên xwe, zêdetir ji berika xwe dirêj kiriye, lê keçikê jêre gotiye ku evîndariya me ji her tiştî girîngtir e, nemaze ji saman û heyîna bavê wê. Ew cudahiya navbera wan de, hevalên wan jî hest pêkiribûn, bi taybetî Dilşadê hevalê wî berdewam jêre gotiye ((Keko can, ew ji tex û qatek jor û burjuwa ye, û tu li texek çimisandî û reşûrût î... wan gotinan mejiyê min dagirtibûn, lê tevî wê jî, min ew gotin, bi du filisên şewitî nedikirîn, û min nedikarî dev ji (Neşmîl)ê berdim)) (Malava Gulî Xem: 50).

Ew çînatîya di nav çanda kurdî de heye, ji bo karê jin û jinxwazî û biyava civakî û xizmatîyê, hemûyan hest pê dikir, lê di pêxema sewdaserî û evîna xwe de piştguh diavêtin, û hêj hêvî hebûn ku ew nabine rêgir li pêxem bihevregihîştina wan de.

Romannivîs pitir bas ji wê cudahiye dike, û roja ahenga hevdunasîna kolêjê dike hêcet, daku li çawaniya jîyan û rengvedana wê li ser wan ji zarokatiyê ve heya niha tê bigihîje, lewma zêdetir hest bi wê ciyawaziyê dike ku ji zarê Dilêr ve dibêje ((Ez bi pirsîyarên Neşmîlê dilteng dibûm. axir min bêhna çi gulavekê pê xweş be! Ez heta dawîanîna pola şeş a amadeyî jî, li du odeyên tarî û şeş û şîr de ku niha jî li berçavê min in, mezin bûme. Eger bêhnsariya odeyan bi cismê min ve zeliqî be û difina min teji kiribe, nexa gulava çi û gula çi? Ma me baxçe hebûye heta ku gulên curbicur tede hebin û ya herî cuwan diyarî bikim. Ax zemanê, zaroktiya min jî her ahîn û keser in, weke tu bi xwe jî haydar î, em hingê cîran bûn, bavê min jî pînedûz bû. Her li dukana bavê xwe de min jî pêlav boyax dikirin. Danekê diçûme qutabxaneyê û danê din jî min boyaxçîtî dikir. Min serpayî di dest digirtin, kolan bi kolan, û li çayxane û dukanan digeriyam û li hemberî xelkê de min xwe xwar dikir û digot:

(Boyax nakî?)

Vêca gava ku yekê xwe ji min tûre bikira yan bigotiba na, hemdîs min dubare dikir û digot:

(Ger şewq neda û neçilwilî, pere mede).

Kesên wusa hebûn ku bêhewsele bûn, xwe ji min aciz dikirin û hawar dikirin:

(kuro ka wêde here ûû).

Du sê dijûnên ter jî didan min. Lê ger yekê jî pêlawên xwe derxistiban, heta bîstekê şadî û keyfxweşî dibû mêvanê min. Min pêlaw hildigirtin û bi hilatin ve diçûme dukana bavê xwe)) (Malava Gulî Xem: 21- 22).

Lêre de romannivîs diyalog û guftigoya navbera Dilêr û Neşmîlê di roja hevnasîna kolejê de, kiriye bi hêcet bo eşkerekirina hin zaniyariyan ku jiyana û guzerana Dilêr û kar û kasibîya wan çawa bûye û keçik di çî naz û neimetekê de jiyaye. Herweha Neşmîlê pirsîyarên bi çî awayî li ser gul û gulvan ji Dilêr kirine, û herweha Dilêr jî li bazarê de alîkariya bavê xwe û karê boyaxçîtîyê kiriye. Eve nîşaneyê hebûna du tex û çandên cuda ji hev in. Lêre de bas ji bajar jî hatiye kirin ku pêk tê ji çayxane, dukan, bazar û ...htd.

Bi giştî di romanê de, tex û çînatiya aborî û civakî li navbera keç û kur de bi zelalî bas kiriye, û karîgeriyên wê jî li encama evîndariya wan de, reng vedaye. Her wekî wê ku li kultura hejarî û dewlemendiyê de jî reng vedaye.

Di romana (Tole) ya (Mihemed Mokrî) de, ji zarê Mistefa ve bas dike ku jinbab û du zirbirên wî hebûn, û li mala xwe de dijiyan. Mistefa bas ji nexwendewarî û xizanî û belengaziya bavê xwe dike ((Bavê min, hejarekî reben û nexwendewar, lê tirmezin bû. Nizanim kê û çawa, ew hînî nivîsandina navê xwe kiribûn, şeş heft deqîqe vedikêşan heta ku navê xwe li ser kaxezê dinexşand. Te digot qey ku karek mezin encam dabe!. Nivîsîna xwe nîşanî xwendewaran dida, û bi xwe jî heyrî dima û car car jî digot: (pekû navê min çend giran e). Her çend ku xwe bi zanayek mezin dizanî, û li wê baweriyê de bû ku serê wî ji hemû zanist û ulûmekê derdîçe, û pispor û şehrezayekî mezin û jêhatî ye ku hewce dike şêvr û rawêj pêre were kirin)) (Tole: 4).

Bûyerên romanê li nav gund de çê dibin. Li nav gundan de, mêtên wusa hejar zaf in ku nexwendewar bin, lê xwe bi zana û xwendewar dihesibînin. Ew li bingeh de nexwendewar û nezan in, lê ji ber serhişkiya xwe, her gotina xwe dikin. Eva jî curek e ji hejariyê, yan derdek e ku xelk pêrahatiye ku her gotina xwe bike. Lê cehda hînbûnê nede û rastî û waqia xwe nebîne, ku nexwendewarek hejar e, lê naselîmîne û li wê baweriyê de ye ku li ser rastiyê ye. Romannivîs ji me re dibêje ku hejarî û nexwendewarî, ew derd in ku pêşîra civaka kurdî girtine û dibe ku hewla jinavbirina wê bihê dayîn.

Li romana (Nazê) ya (Îsmâîl Rojbeyanî) de, dema ku Heme ê hevalê mamosta Azad, pirsiyarê ji mamosta Azad dike, û jêre dibêje ((Erê başe kek Azad! tu ê mamosta û Nazê ya nexwendewar çawa bo hev dibin? Mamosta Azad li bersivê de dibêje: Merc nine hemû mamostayek, keçek xwendewar bîne. Xwedê dike didin min, bizane çawa dikim xwendewar)) (Nazê: 31).

Romannivîs bi vê pirsiyara Heme wusa nîşan dide ku ew du texên cuda ne; yek xwendewar û ya din jî nexwendewar. Li piraniya deman de, çînatiyê dewr û rola xwe di nava civakê de lîstiyê, taku bikarin bihevre biguncin. Wê yekê karîgerî li ser zaf mijaran hebûye, nemaze li jinhînanê de û her yek ji wan, li tex û qatên xwe de, karê jin û jinxwaziyê kirine. Lê mamosta Azad, kesekî rewşenbîr e û nexwendewarî nabe asteng û pîrsgirêk li hember de, û evîndariya pak û rast pitir armanca wî ye. Ew çînatiyê nake pîvan, û nexwendewariyê jî weke asteng nabîne. Renge romannivîs li vê derheqê de xwastibe çînatiyê nehêle, bi xasmanî ji aliyê dildarî, jiyana hevpar û karên civakî de.

Li romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, romannivîs bas ji texa xwedêpêdayîyan dike, û bi awayek cuda bas ji jiyana û guzerana wan tevî hejaran, û herweha bandor li ser jiyana zarokan dike. Li nav romanê de, ji zarê Ekber ve bas ji qutabxaneyê dike ku zarokên dewlemend pêre ne. Qala wê dike ku li warê jiyana û guzeranê de, çiqas ciyawaz in ((Bi Ebdula re li yek pol û li ser yek text dirûniştim. Hertim bêhna rûn û kulîçe û nanê birinc ji wî dihat ...berîkên wî pir bûn ji şîrîniyên çewr. Bazinên çewr.. bibûne nexşê ser berîkên wî, her ku nizîkî min dibû, heza xwarin û çilûziya min

dibiziviya, av ser dilê min diket. min dixwast bixom, çûnkî ewqas bêhna xwarinên hezbizvan lêdihat)) (Kordere: 85).

Romannivîs basa ciyawaziya navbera du qutabiyên dike ku li yek pol û li ser yek textî bûne. Yek ji wan dewlemend e û yê dinê jî hejar ku li rûçik, cil û berg û bêhnê re diyar bûn ku ji hev cuda ne. Mirov bi hêsanî hest bi vê ciyawaziyê dike ku çawa basa kesê dewlemend kiriye.

Piştî bas ji qutabiyê xizan dike ku serbarê xwendinê, kar jî kiriye, û her bi wê sedemê ji qutabxaneyê hatiye dîrxistin ((Roj ne rojekê diçûme qutabxaneyê..Min kar dikir.. kedkarî dikir, ji kar û xebatê re tu kêmasiyek min nebû. Min çiqas dikir û hewil dida, destê min nedigehişt ku. Rojên ku neçûbûme qutabxaneyê, yekcar zaf bibûn. Ez birim cem birêveber.. Min çiqas nerazîtî nîşan da, bêencam bû, li mektebê hatim derxistin)) (Kordere: 89).

Li vir de, wêneyê hejariyê nîşan dide. Hejariyek ku ji ber nebûnê û belengaziyê, serbarê qutabxaneyê, bi neçarî kedkarî jî kiriye, û ji ber bêserûberiya di çûna bo qutabxaneyê, ji wir hatiye derkirin. Wî polînbendiyek durust û hûr li navbera qutabiyên dewlemend û hejar de kiriye. Yê dewlemend tu karekê nake, lê li çi xweşiyekê de dijî. Herweha qutabiyê xizan û destkurt jî, bi sedema kar û kedkariyê ji qutabxaneyê hatiye dîravêtin.

3.2.3. Bazar

Li piraniya bajar û bajarokan de, nemaze li hin gundên mezin de jî heye. Cihê e ji bo saxkirina kel û mel û berheman, yan jî guherandina wan bi tiştên din re. Piraniya xelkê ji bo bidestxistina hewcehiyên malê û xorekê rû ji bazarê dikin. Tevî berfirehbûna bazarê û çêbûna qerebalixiya zêdetir a bazar û bajarokan, zaf cihên din bo demborandinê hatin avakirin. Ji ber wê jî, hin cihan di bazarê de taybetmendiya xwe wergirtine. Dukan û bazaar jî, bûn bi beşek ji jiyan û kulturê, ku zaf sîma û edetên taybet bi xwe hene, û xelkê jî rojane, wan dubare dikin, û cihê wê jî di nava janrên wêjeyê de jî hat vekirin.

Li romana (Nazê) ya (Îsmâil Rojbeyanî) de, bas ji seredana Azad bo bajarê Bexdayê dike. Ew bajarek mezin e ku bazarek mezin jî heye. Di sefera xwe de diçe cem

hevalê xwe (Haşim), ku bavê wî dukanek mezin ya kel û melên jinan li bazarê de heye, û bi wî awayî basa dukanê dike ((Dema ku em çûne hundur, ez bi bavê xwe re nasandim, wî jî rêzek zêde ji min girt. Heta ku bixwazî, dukana wî mezin û tije bû. Tiştên curbicur ên jinan têde hebûn, weke: dermanê makyajê, gulav, sermemik.. binkiras.. derpêyên kurt.. Li hundur de jinên kiryar mijûlê nirxandin û kurrîna kel û melan bûn, du ji wan, çend şort yan derpêyên kurt girtibûne destê xwe û weha bihevre diaxivîn. Ya sor cuwan e! ya din digot: ê, bawerim ya şin cuwantir e)) (Nazê: 23 – 24).

Romannivîs bas ji bazara bajêrek mezin dike ku tiştên curbicur têde hene. Bi taybetî bas ji wê dukanê dike ku kel û melên modelê têde hatine firotin. Wê demê, ew tişt û mişt û model, tenê li bajêrên mezin de hebûn. Herweha li wir de xwastiye ku wê kultura bajêrên mezin nîşan bide ku makyaj, gulav û binkiras û ...bikar tînin û jiyana wan ji ya gundan re cuda ye. Herweha Haşim dike ku kurê xwediyê wê dukanê bûye. Wî zaf carî, ji Azad re gotibû ku ji riya wê dukanê ve, destê xwe bi çend jinan re têkel kiriye û nizîkatî bi çend jin û keçên ciwan û law re kiriye.

3.2.4. Bêkarî û kirêçîfî

Betalî û kirêçîfî, yek ji wan azar û girftên mezin in ku tevî avabûna bajar re, serî hildane, û xelkê bi giştî pirsgirêka bêkarî û akincîbûnê hene. Bi taybet yên ku li bajaran de dijîn û pisporiyek taybet ninin, û hemû karekê jî nizanin. Yan ji gundan ve koçberî bajêran bûne ku karzan ninin û destkurt in jî. Yan nesaxiyên demdirêj hene ...htd. Li bajaran de xelkek zaf tîn dîtin ku kirêçî ne û dahata rojane ya wan pir kême, û têra jiyana wan nake. Yan betal in û tu dahatek bo bijîva jiyane ninin. Ew li neçarî de, penaya xwe bo gelek karên kirêt û neyasayî dibin. Li hin taxan de dijîn, ku bo jiyane nabin. Ewane tevde tesîr ji kultur û deb û edetên wan dike. Lewre romannivîs hest bi êş û kul û derdên wan dike. Ew zaf carî li nav romanên de, bas ji pirsgirêk, nebûnê û kirêçîtiyê dike, û herweha giriftên civakî jî destnîşan dike.

Di romana (Nazê) ya (Îsmâil rojbeyanî) de, bas ji wê koçberiyê dike ku ji gundan ve ber ji bajar tê kirin, bêy wê ku tu kar, kesabet û pisporiyek hebin, yan xwedî mal û milk bin ((taxê me hêdî hêdî dibûye çoleme, her heftiyê malek û diduyan bar dikir û diçûn. Malên vî alî û aliyê din ê me, bibûne kelawe. Diya min ji bavê min re got: Bila

em jî bar bikin û biçîn. Bavê min bersiv da: Me kê li bajar de heye ku ji me re kar û kesabetê bike? Çima! şukur tu sax û silamet î. (Heme Nûrî) jî dê vê mehê vegere û leşkiriya xwe biqedîne. Emê Çêlek û ew du sê Bizinan jî bifroşîn, parçe zewiyekê pê bikrin, îca her çawa be jî, emê kolixtekê têde ava bikin!

Bi hêrs û tûrebûn ve jêre got: Tu çawa dizanî, wusa bike!

Diya min ji xweşiyar, li ser lingekê direqisî. Me xirt û pirtên xwe komî serhev kirin û ‘pas’ek kerexepik girt. Me heyî û neyî ên xwe jê bar kirin. Li hewşeyekê de, me odeyek bi kirê girtibû ku te sed sûnd dixwar ku heman odeya me ya gund e. Her çawa be, me kolixtek li nav zewiyê de çêkir û her çi xirt û pirt û kel û melên me hebûn, me li nav de cî kirin û têde akincî bûn.

Bavê min, erebaneyek sêtekere kirî û dest bi firotina sardemeniyan kir. Zaf carî, ez jî bi xwe re dibirim. Baş bû, rojê pênc şeş pênceyî dest me diketin. Heme Nûrî ê bira jî, leşkiriya xwe xilas kir û dest bi kar û karkeriyê kir)) (Nazê: 125- 126).

Romannivîs bas ji wê bêşolîyê dike ku li gundan de serî hildabû, û di encamp de xelkê rû ji bajaran dikirin. Lê zêdeyî wan li wir sergerdan dibûn. Çûnkî tu mal û cihek akincîbûnê nebûn. Ha bi xwe dibêje ku me li wir odeyek girt, te digot, qey ku odeya me ya gund e. Wate, odeyek li bajar de bi kirê girtine, ku her wekî ya gund bûye. Anku taxê hejar û xizanan bûye. Herweha bavê wê, bi erebaneyekê sardemenî firotine. Ew jî karê neçarî ye, çûnkî bavê wê xelkê gund e û tu pisporiyek li kar de nine, û tenê bo bijîva jiyana xwe, wî karî dike. Piştî jî, birê wê dest bi kedkariyê dike. Hemû ewane, nîşana wê ne ku li bajaran de mirov dibe pisporî hebe taku kar û dahatekî baş hebe.

Herweha li bajaran de, dibe hemû kes kar bikin, daku bikarin îdareya xwe bikin. Serbarê wê jî nikarin biçine tax yan gerekên xweş û baş, çûnkî pereyê wê ninin ku bikarin kirêmalê bidin. Dema ku diçine taxên dût û derveyî bajêr, xuya ye ku encamek baş ji wan re nabe. Herweha dema ku têne bajar, kultura gund bi ya bajar re ciyawaz e. Weke pêştir me anî ziman, têkiliyên civakî li gundan de xwerisk û surûştî ne û li ser bingeha xizmatî û xoşewîstiyê ye, lê di bajar de, li ser bingeha kar e. Tu çiqas dikarî ji min re kar bikî, ez jî dê ewqas heqdestê bidim te, li warê kulturî ve cudahî heye.

Li romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, hejarî, nebûnî û bêşolî bi terzekê di nav cîhanê de xurt bûye ku bûye bi beşek sereke ya cewher û naveroka romanên cîhanî û nemaze kurdî. Lewre li beşek ji romanê de, mijara sereke, bêkarî û hejarî ye. Di romana Kordere de, bi hêsanî bas ji derdê han dike ku tesîr û bandora wê li ser zarok, tax, kultura nevî û nifşan ku rê û arasteya jiyana wan destnîşan dike. Di romana Kordere de, ji zarê Ekber ku karakterê serekî ê romanê ye, qala ew taxê hejarnîşîn dike ku li zivistan û berf û baranê de, dibû kur û şêl, û jiyan pir zehmet dibû ((Min dizanî ku her di mala me û taxê tulefiroşan de bahoza Nûh rabûye.. erê can, Kordere çiqas xurêna wê bilind be, kef biçerîne.. li asta çimento û dîwarê kewirî de bê şiyar e.. Her bi yê wek me û dîwarê nimdar ê kurrê, kûçik û pişkên bîrsî û gerok û teres divêrî. Dema ku lehî bi davî dibû, diviya em bi ser ketiban, û şevê biçûbana mêvaniya cîranê berjor ên xwe.. kaxez, dar û çirpikên zaf me komî ser hev dikirin û li odeyê de agir pê fikir, heta ku dîwar hişk û kizir bibin. Bavê min, bi bavê cîranê jorîn ê me re, heta direngî şevê basa bêşolîyê dikirin.. Bavê wan jî, wekî bavê me destkurt û hejar bû)) (Kordere: 11).

Bas ji wê taxa hejarnîşîn dike ku li dema zivistanê de, av bi mala wan ketiye û bi şev çûne mala cîranê berjor ê xwe, ku ew bi xwe jî, nedar û bêşol bûne. Wê wêneyê nîşanî me dide ku xelkê deverê, hejar û betal in. Awahî û xanîberiyên wan ji kurê hatine çêkirin, û tab û bergeya baran û lêmiştê nagirin. Herweha ciyawaziya taxan nîşan dide, ku heman lehî û bahozê, tu tesîr û karîgeriyek li ser xaniyên dewlemend û xwedêpêdayîyan nekir. Çûnkî ew ji kewir û bilûkan hatine çêkirin. Lê yê wan, tevde qur û herî ne. Herweha zû ter dibin, piştî, divê daran kom bikin daku pê hişk û zuha bikin.

Serbarê bêserûberiya tax û xaniyê wan, kirêçî jî bûn û li zaf deman de, şiyana wê nebûne ku kirêya malê bidin. Li şevan de, zaf carî xalên wan dihatin mêvaniya wan, û şîn ji Kerbelayê re dikirin (bîr û baweriya şîmeseban hene). Wan cure giryanek hene, û şîn û taziyê bo îmaman dikin. Dibêje bavê min digot: Ger xwediyê malê hat, hemû bihvre û hor hor bigrîn, heta ku kirêya wî ji bîr biçê ((carna xwediyê malê dihat û ji pencerê re mêzeyî hundûr fikir, hingê dengê girîna me zelal dibû.. Em bi dengê bilind digiriyan. Babo digot: Her gava ku ew hat, tundtir û dilsotîtir bigrîn, belkî dilê wî nerim

dibe û pêşîra kirênedana me berdide!! Xwedîmal bi giriyana me digeşîya, pir keyfxweş dibû ku em wusa ji dil digrîn. Dîmena giryan, kas û gêjbûn, kovan û tazîdariya me, niqumbûn di nav bûyerên Kerbelayê, dilê wî hênîk dikir, çûnkî nediketî hizra kehreb û ava boriyê)) (Kordere: 19 -20).

Karîgeriya olê li ser wan hebûye. Wusa kirine ku olê bo berjewendiya xwe bikar bînin, daku xwedîmal, kirêya xwe ji bîr bike. Wate hejarî û nebûnî, zaf karan bi mirov dide kirinê, ku renga bi hez û xwasta mirov nebin. Lê karên wusa, rengvedan li ser jiyana wan dibe. Renge ji zarokan re bibe bi edet û çandek ku di jiyana rojane ya xwe de peyrewiyê lê bikin û bibe bi nesaxiyek bo xelkê hejar û nedar.

Herweha romannivîs li ser hejarî û encamên xirabe wê, dibêje: Zaf carî, neçar bi karên xirab dike. Ekber dibêje: Me pir hez ji Kemanê dikir, lê pereyê wê tunebû ku em bikrin. Bi neçarî, me rû ji diziyê kir, heta ku em bikarin pereyê Kemanekê berhev bikin ((Ketme bin Riza û Zeman, min mejiyê wan bir û xapandin. Ger ku em bihev cehd bikin, emê bikarin pereyê Kemanekê kom bikin. Me biryar da, her çawa dibe, divê em bibin xwedî Keman. Em ji bo kirîna her tiştî hatiban hinartin, me yek filis vedişart û dixiste nav kûpik. Me çend carî bi vî awayî dizî kir...!!)) (Kordere: 22).

Em dizanin ku dizî, karek kirêt û xirab e. Lê her sê birayan, ji ber nebûnî û cîbecîkirina xewn û hêviya xwe, dest bo karek xirab birine ku ew jî dizî ye. Renge bi vî karî hîn bibin, û êdî bibe pîşe û sedema xirabiya wan li pêşerojê de. Lewre, nebûnî û bêkarî, hin car mirov ber bi karên xirab ve dibe, û rengvedan û karîgeriya xirab jî li ser zarok û malbatê dike.

Li ser êş û azarên kirêçîtiyê, Ekber bas ji bavê xwe dike. Ew dibêje, ji ber nebûniyê, nekarîbû kirêya xwe bide, û ji şerm û tirsan de, direngiya şevê bi dizî ve hatiye û zû xwe daye xewê ((Bavê min, bi dizî ve, xwe dikire jûr ..Heya direng nebûya, nedihat.. Du meh bûn ku me kirêya odeyê nedabû.. Her ku digihîşte malê, yekser diraza.. dayîkê jî çira nevî dikir, û hêdî hêdî pite pit dikir û ditemirî)) (Kordere: 35).

Romannivîs wê dîmena biazar nîşan dide ku xelkê kirêçî û nedar, li heyfa nebûnî û belengaziya xwe de, çiqas fend û fêl bikar anîne. Bavê wan, heya direngî şevê nehatiye, her ku hatiye jî, ji tirsra kabrayê kirêdar û xwedîmal de, xwe xewra biriyê.

Herweha romannivîs bas ji kesatiya Kelayî dike ku piştî ji destdana xwaringeha xwe, betal maye û bi neçar, kedkariyê dike ((Min çend salan şûndatir, Kelayî bi heman Çekît û cilkên gewir ve dît, pêmere li dest de bû û suwaxa malekê dikir. Ew bi wan destên tejtî dilovanî, hezkirin û viyanê, li cihê şorbe û kelepçeyê, qur (herrî) ji kedkaran re tejtî dikir!!)) (Kordere:59).

Armanç ji wî karî, ew e dema ku mirov bêkar û bêpere bimîne û karê xwe jî, ji dest dabe, neçar dimîne hinek karan bipejirîne ku bi kesatiya mirov re neyê. Weke Kelayî ku xwediyê xwaringehê bû û xwarinên xweş û bi tam çêdikirin, lê niha karker e û herî (qur) ê bo kedkaran tejtî dike.

3.3.Çanda kurdî ya hevpar di navbera gund û bajar de

Ew kulturên ku di navbera gund û bajar de hevbeş in, ev in ku çiqas cudahî jî di sîma û taybetmendiyên navbera wan de hebin, lê bone heman bone ye li her du civakan de. Wê yekê wusa kiriye ku romannivîsê kurd li deqên xwe de, mifahê ji wan kulturên hevpar bibînin û beşek ji pêvajoya bûyeran bibînin ku ew in:

3.3.1. Rê û resma jinveguhastinê

Rêûresma jinveguhastinê di nava kurdan de pûte û girîngiyek xasmanî heye. Cuda ji wê ku bi karek pîroz dizanin, buha û girîngiyek zêde pê didin, û zaf edet û çand hene ku di wê merasîmê de encam didin. Herweha zaf mijarên kulturî ên cuda hene ku kurd girîngiyek zêde pê didin.

Di romana (Malava Gulî Xem) ya (Hîmdad Hisên) de, romannivîs ji zarê diya Dilêr ve dibêje: ((Welahî ew seyîdê nazdar ku tu dibînî, hemû care tê serdana me dike. Ez li ser destê wî, ji Bayîz re hatime dayîn. Bavê min zaf got ku carê zarok e, lê sûda wê tunebû. Heft şev û heft rojan, duhol zurna lêxistin. Dayîka Bayîz, ez hembêz kirim û li ser piştta Hesp anîme xwarê, û got: Ey babo ji ber wê keçîka azeb û bûka min a ciwan)) (Malava Gulî Xem: 10 – 11).

Romannivîs ji zarê diya Dilêr ve, bas ji urf û edet û çawaniya jinmarekirin û veguhastinê dike. Ew dide xuyakirin ku deb û edet li nav kurdan de girîng û cihê pûtedayînê ne. Jinek sade, bas ji sadeyî a xelkê hingê dike û her tiştî bê dudilî tîne ziman. Bi wê temenê ve, hêj rojên marekirin û veguhastin xwe ji bîr nekiriye. Herweha ji riya wê jinê ve, wê yekê eşkere dike ku jinmarekirina hingê, ji aliyê seyîdan ve bûye. Wê demê dadgehane, girîngiyek wusa di warê civakî de ji xelkê re nebûne. Herweha bas ji çawaniya roja veguhastinê dike ku bi heft şev û rojan bi duhol û zurnayê re aheng jêre lidar xistine.

Herweha, yek ji kulturên xirab ên wê demê tîne berbas, ku zûzewicandina keçan bûye. Nîşan dide ku deb û edetên kevn, bûne sebaba zû biûşûdana keçan. Wate, bi xwe ewqas biçûk bûye ku diya Bayîz (xesûya wê) hembêz kiriye û li ser piştê Hesp aniye xwar. Herweha kulturek din ku romannivîs aniye berbas, bûk veguhastin e bi suwariya Hespan. Wê demê, suwaran merasîmek taybetî encam didan û di roja bûkveguhastinê de, bûk suwarî Hespî dikirin û dibirine mala zawa.

Wate, romannivîs ji zarê dayîka Dilêr ve, basa zaf kulturane ji me re kiriye. Herweha romannivîs li cihek din de qala çandek din dike ku ew jî, zewicandina bi neçarî ya keçan e ji aliyê malbatan ve. Ji zarê Dilêr ve basa Neşmîlê dike û dibêje ((Çar meh derbas bûn û rojekê ji min re telefon kir û got: Ji aliyê malbatê û bi taybetî bavê xwe ve, bi çavek sivik tê nihêrtin girîngî jêre nahê dayîn. Dayka wê jî weke şeytan, berdewam li guhê babe wê de dixwîne û dibêje: bi dilek xweş be yan nexweş, dibe ku mêr bi kurxaletê xwe bike. Bavê te, tu pêşkeş kirî, bi zorî na, lê ger mêr bi wî neke, êdî zewicîn tunine, û biskên xwe yê sipî vehûne. Bas fikir ku çiqas zalimane pêre reftar kirine, û bi kul û keser ve got: berê li ku, û niha li ku. Ne tenê mala wan, belkî gava xizm û kes jî tîne seredana wan, lome û gazindeya wê dikin û sexera wê dibin)) (Malava Gulî Xem: 64).

Wate li wê vegêrandina Dilêr de ku ji zarê dildara xwe (Neşmîl) re vedigêre, xuya ye ku di malê de reftarek kirêt û xirab pêre kirine, daku razî bikin mêr bi kurxaletê xwe bike nek evîndarê xwe re. Ji bilî dê û bavê wê, xizm û kesan jî sexera wê birine. Eva yek ji kulturên xirab e ku di nav civaka kurdî de hebûye, û renga heya qasekê jî her

mabe û berdewam bike. Lê romannivîs, diyardeyekê tîne ber bas ku di nav çanda kurdî de zêde bûye û çend kes ji ber wê sedemê, nehiştine ku bizewice. Jêre gotine ku nabe şû bike, madam ku ji gotina malbata xwe derçûye. Bi çavek kêr hatiye nihêrtin û jêre gotine, dibe ku pora sipî vehone. Wate, tucar nabe bizewice.

Herweha li romanê de kulturek kurdan bas dike ku li dema xwe de zêde baw û edet bûye, ew jî, jin bi jinî û binpişk bû.

Ew ji zarê Dilêr ve, basa hevaleyê xwe ê bi navê Dana dike û dibêje ((Tenê Dana nebe ku dezgirtiya xwe li Koye hebû û her ji zarokatiyê ve li cihê Binpişkê, ji Dana re mare kiribûn. Ew li malê de bo birayek xwe hatibû jin bi jinkirin (mezin bi biçûk). Wekî bi xwe bas dike, pir hez ji dezgirtiya xwe dikir, wan her ji zarokatiyê ve li (Sergird) bihevre dilîstin)) (Malava Gulî Xem: 38).

Eva jî yek ji wan kulturên kurdan e ku berê zaf jin bi jinî û mezin bi biçûkî dikirin. Di encama wê diyardeyê de, pirsgirêkên zaf li navbera du malbatan de derdiketin holê. Çûnkî kêr hildiket ku hevdem çar dil bihevre razî bin, lê romannivîs bas ji xirabî û başiya wê kulturê nekiriye, tenê bas ji kultura mezin bi biçûk û Binpişkê kiriye. Weke wê ku bibêje, ew terze ji jin û jinxwaziyê jî, di nav çanda kurdî de heye.

Li romana (Tole) ya (Mihemed Mukrî) de, romannivîs çandek kirêt ya jinhînanê bas dike ku bi wê sedemê ve, jiyana jin û zarokên wan jî dibe bi dojah û bi çavên kole ve tîn dîtin. Lewre Mistefa di romanê de, gumana wê dike ku renga ji ber kerblêvebûna bavê wê be. Çûnkî diya wê, weke bedelxwîn hatiye wergirtin ((Guhdirêjek diçe nav tûtina wan, ew jî çend caran hişdariyê dide xwediyê guhdirêj, ku zererê dide wan. Lê dûr nine ku xwediyê guhdirêj, her guhdariya wî jî nekiriye. Lewma kerbê bavê min vedibe û guh û dûlika guhdirêj qut dike (Dibirre). Xwediyê wê pê dihese, û li heyfan de, mamê min dikuje. Bavê min jî, demildest xwediyê sewalê, serjê dike. Êdî dujminatî û xwîndariya navbera wan, germ dibe. Destê kes û karên xwediyê guhdirêj nagihîje bavê min, lê li derfetekê de, bapîrê min jî dikujin.. Êdî xelk û xwedê dikevîne navbera wan û berevaniyê dikin, û wan li hev tînin. Lê li hember de (li cihê xwînê), diya min didine bavê min.. Lê, bavê min li nav xelkê de bas kiribû ku ji dil ve pêk nehatibû, û nefretê ji wê malbatê dike. Hemû tiştê wan, bi dujminê xwe dibîne. Dibe ku bavê min, ji

dîtingeha wê dujminatîyê ve mêzeyî min jî bike û ez bi nîv dujmin hesabandibim)) (Tole: 19 – 20).

Li wir de romannivîs bas ji kultura dujmîndarî û tolhildanê dike ku di nava kurdan de baw e. Hertim şer û xwîndarî di nava kurdan de hebûye. Li dema pêkhatin û aştîyê de jî, pere û jin weke bedelxwînê hatiye dayîn. Eva jî, karek kirêt û nebicî ye, bi xasmanî ji jinê û zarokan re. Çûnkî zaf carî, ew sergerdan dibin, bi çavek xirab tên dîtin, ji aliyê malbat û nemaze mêrê jinê re, azara cismî û rohî tên dayîn. Eve Mistefa bas dike ku bavê wî li cem xelkê gotiye ku ji dil ve pêk nehatime. Lewre Mistefa di vê baweriyê de ye, madam ku diya wî weke bedelxwîn bi bavê wî re hatiye dayîn, jê hez nake û nemaze ji malê derkiriye.

Herweha romannivîs, her bi vê hindê nasekine, belkî qala kuştin, jinxwazî, jinkuştin û jinrewandinê jî ku diyardeyên pir xirab û nemirovî ne, dike û dibêje ((Berî wê karesatê, tûşî felaketek dilêştir dibe. Ew hez ji keçek Germiyanî dike. Çend cara dişîne xwazgîniya wê, lê malbata wê nedane, û jêre gotine: Em keça xwe li hember keçîkekê de didin. Wate jin bi jîniyê dikin. Lê tu xûşkên bavê min nebûne ku wî karî bikin, lewma bavê min keçîkê dixapîne û direvîne... Malbata keçîkê li heman rojê de dikevin pey wan, û keçîkê dikuji û bavê min jî bi hezar derd û halî, xwe bi birîndarî rizgar dike... Midehek şûndatir, malbata keçîkê li nav gund de, dîsan derfetê dibînin û sîngê wî bi fişekê dihingivin û nîvrihî dikin. Kesê bawer nedikir ku ew dê bimîne. Lê weke pişîka heft rih, piştî yek du mehan, bi heman gîrnîjîn û reftaran ve dirabe ser lingên xwe û baş dibe)) (Tole: 20).

Romannivîs zaf diyardeyên kulturî weke evîndarî, jin bi jinî, tolhildan, jinkuştin, jinrewandin, xapandin û ... tîne ber bas. Bi taybet, dema ku dibîne bi hêceta jin bi jîniyê, keçîkê nadin hezkiriyê wê. Eve beşek e ji çanda jin bi jîniyê ku di nava kurdan de baw bûye, û karesat û felaketên mezin bi dû xwe re anîne. Weke me anî ziman, bi kêmi çêdibû ku çar dil li yek dem de razî bibin û bihevre biguncên. Lewma ya ku li derbasbûyî de qewimiye, karekî xirab bûye. Herweha her xortê ku xûşk/ên wî tuneban, bi hêsanî nedikarî jinê bîne. Diviya pereyek zaf bo jinhînanê bide, ku li wî serdemî de jî, ew yek pir zehmet û dijwar bûye. Herweha jinrewandin, karekî dîr ji urf û edetan

bûye û bi karek xirab hatiye zanîn. Ji ber wê ku malbata keçê tên û bivêrî û mêraniya xwe diselimînin û keçikê dikujin. Bi vê çendê, şeref û namûsa xwe ya ji destçûyî distînin û şerm û heyaya xwe pê paqij dikin. Her çend ku hin caran, hez û xwasta wan jî neba, lê ji ber lome û gazindeyên xelkê (keça wan dû ketiye û nakujin), diviya wî karî bikin. Herweha kurd li heyfstandin û tolhildanê de gelek çeleng û bivêr in, û tucar, tola xwe ji bîr nakin. Li vê derheqê de, bas ji wê dike ku çend caran bo kuştina bavê wê hatine. Romannivîs ew deb û edet û kulturên weke, jinxwazî û jinkuştinê ku di romanê de cih dane, bi edetek xirab dizane. Hevdem Mistefa jî bûye bi şevata wê jinxwaziyê, ku encamek pir xirab jêre hebûye.

Hemdîs romannivîs nasekine û derd û azarek din ya jinxwastinê tîne berbas, ku ew jî zewaca bi neçarî ye li gel mêrên ji xwe mezintir ((Diya min, yek ji wan jinên bênaz, bêdeng û bênav bû ku tenê erkê tejkirina valahiyan ketibû stû û tewaw. Min tu carî û ji tu kesan, tiştê li ser diya xwe nebihîst. Min tenê navê wê dizanî û ewqas. Ayşêya Mîrza Rehîm. Eva jî min dizanî ku bîst salan ji bavê min biçûktir bûye, li cihê xwînê, wate bedelxwîn bi hêza xencerê, bavê min re dane..)) (Tole: 92).

Zewaca neçarî ya keçan bi zora xencerê, yek ji wan kulturên e ku li nav kurdan de baw û naskirî ye, bi taybet li dema xwîndarî û bedelxwînê de. Xirabtir ji wê jî, bi kesekê didan ku zaf ji keçikê mezintir bûye. Li rastî de, eva zulmek mezin e derheq jinan, û heta mirinê, karîgerî û bandorên xirab ên wê li ser jinê, jiyana û zarokan dima. Romannivîs wê urf û edeta xirab dide berçav û basa rezalet û zelûliya jinê dike. Herweha, destpêka jiyana wan laseng e, û nikare bi mêrek ji xwe mezintir re bijî ku hez û hêviyên wan cuda bin. Ev jî valahiyek mezin e li navbera jin û mêr de ku dibe sedema jiyaneke neçarî.

Di romana (Nazê) ya (Îsmâîl Rojbeyanî) de, bas ji diyardeya jin bi jiniyê hatiye kirin ku du kesan jin bi jinî kirine. Pîremêrekê keça xwe daye bi birayê keçikê, ku cihêl e û li hember de, xûşka wî cihêlî jî bi pîremêr re hatibû dayîn ((Jin bi jinî hatibû kirin, pîremêr keça xwe dabû birayê wê)) (Nazê: 14).

Li vir de, romannivîs basa wê dike ku Azad çûye cem jina cîranê xwe, daku li pêre binive. Li halekê de ku mêrê wê ne li mal bûye. Jinik pir ciwan û cihêl bûye û

daxwazê jê dike ku pêre razêt (cot bin). Ew jin, bi kalemêrekê hatibû dayîn ku pir zêde ji wê bitementir bûye. Her ji ber wê ye ku dibêje: Ger jina wî kalemêrî nebûya, karek wusa nedikir. Ew terze jin bi jinî ku mêt pîr û jin jî cihêl be, yan berevaj, banor û tesîrek pir xirab bi dû re tê û dibe sedema têkçûna civakê.

Herweha yek ji wan edetên ku li jin û jinxwaziyê de heye, çawaniya xwazgînîkirina keçê ye di mala bavê xwe de. Helbet bo vê yekê jî, rêûresma taybet bi xwe heye. Nabe kurik rasterast daxwaza keçikê bike. Evê jî çend qonax hene. Romannivîs çawaniya xwazgîniya keçikê li malê tîne ber bas, û dema ku Azad, daxwaza Nazê dike. Di destpêkê de, diçe cem mam Wesman, daku wî karî jêre bike ((Bo sibê êwarî çûme cem mam Wesman. Min daxwaj jê kir ku biçe xwazgîniya Nazê ji boy min. Mam Wesman got: Baş e. Tu bi Xule re li malê de bimîne, ez û Efrûz dê biçin û cîbecî bikin)) (Nazê: 70).

Ji bo xwazgîniya keçê, dibe li destpêkê de kesek rêzdar û naskirî û xwedî kesatî bişîni bo mala keçikê û bi rêz ve daxwaza keçê bê kirin. Helbet Azad bo wî karî, mam Wesman û xêzana wî hilbijartibûn, ku kesek xuya û rêzdar û jêhatî ê gundê wan e, û pir bi kêmî gotina wan tê retkirin. Herweha ew kesên birêz ku diçin xwazgîniya keçikê, xuya ye ku piştevaniya xortî dikin. Herweha xuya ye ku kurik, kesek baş û birêz e, lewma jêre xwazgîniyê dikin. Lewre razîbûn nizîktir e ji nerazînbûnê. Zaf carî jî, kesê dawakar, kesek wusa dişîne ku tesîr û karîgerî li ser mala keçikê hebe. Romannivîs li vê derheqê de, mam Wesman destnîşan kiriye ku kesek jêhatî û rêzdar ê gund e, û xwastiye wê kultûrê jî weke dîrok biparêze ku li kevnar de xwazgînîkirina keçê li mala bavê wê de bi çî awayî bûye.

Li romana (Koçî Sûr) ya (Heme Kerîm Arif) de, pir bi hûrî bas ji kultura jin û jinxwaziyê dike. Bi girîngî ve bas ji wan dîmenan dike ku li romana wî de hatine tomarkirin. Her ji çawaniya xwazbîniya keçê heta digihîje veguhastin û zaf dîmenên balkêş têde tînin. Bi taybetî gava ku basa berbûkê dike û xaltîka "Helaw" hinek qise û basan tevî zava dike ((Ey tu nizanî?! Ez bi berbûkî diçim, îca bizane çî bûkekê bo kurê xwe bixemilînim û saf û law bikim. Li wan du rojan de, ezê ewqas tiştan li ser mêt kirin, maldarî û reftaran hînî te bikim ku li hemû temenê xwe de hîn nebibî. Dê

bûkek ewqas ehl û sehl bo te bînim heta ku bimînî, her rehmetan bo gora miriyên min bişînî)) (Koçî Sûr: 130).

Li vir de basa erk û wezîfeya berbûkê dike. Dema ku diçe pey bûkê, wê dixemilîne, serperistiya merasîmê dike, û rênimayî a bûkê jî dike. Berbûk dibe ku kesek şehreza be li vê biyavî de û wezîfeya han bi hemû kesê nahê sipartin. Lewre romannivîs bas ji berbûkê dike û bi girîngî ve di romanê de beşdariyê dike, bona wê ku vê kulturê bîne ber bas û jinav neçe.

Herweha romannivîs basa wê dike ku li roja veguhastina bûkê de, xelk hemû beşdar dibin li amadekariyên roja veguhastinê de. Ew mizgîniya wê kulturê didin zava, ku erkek zêde nakeve ser milê wî. Xelk li dîwanxanê de şîvê çê dikin û bihev re dixwen ((hemû malek roja bûkanînê de, şahiya wan e û her kes li mala xwe de xwarinek herî baş dipêje, û tevde tînin û li dîwanxana gund de bihev re dixwen. Hez dikim xwe nerihet nekî û xwe bi qerdar nezani)) (Koçî Sûr: 131- 132).

Herweha romannivîs dîmena roja bûkveguhastinê ku rojek taybet e, û bûyerên curbicur têde hene, ji me re dinexşîne û dixê berçav. Wate weke tabloyek kurdewarî ya teji ji urf û edetên kurdî dinexşîne û nîşanî me dide. Ew basa wê rojê dike ku xelkê xweşiyên xwe tînin ziman, û kur û keçên gund davet û dîlanê digerin û serçopiyê digrin ((Refa cergebez û reşbelekê ku serûbinê wê diyar nebû, roj roja dildaran bû, qûreqûra çopîkêş, xirexira gerdnbeniyê, xirîngeya lertzane, çîve çîva dengê demançe û çekan, çavçavnêya kur û keçan, lertzîna sîng û memikan, dîmenê cemadanî li ser şan û mil alandî ya evîndaran, areqa ser sûmetê keçikên nûgihîştî û xweşkok, tîlîya zelal ya qeyrekeçan, dil û hinavê mirov hêsayî dikirin. Te jî bîstekê xwe hilavêt, lê davetkaran tu zû derxistinî. Kek Sadiq! tu nabe xwe mandî bikî, hilbigre bo şevê! şahiya te û bûkê, şevê ye şevê!)) (Koçî Sûr: 131).

Romannivîs li wê tabloyê de, zaf kulturên kurdî nîşan dide ku kurd li dema bûkveguhastinê de encam didin, weke: serçopî, gulleberdan, tîlî lêdan û dildariya kur û keçan û ...htd. Evane tevde li roja bûkveguhastinê de tînin encamdayîn û weke edet û nerîtên wê rojê ne. Nivîskar herweha bas ji cuwanî û destûra keça kurd dike li roja

bûkvegühistinê de ku çiqas law û binaz û xişkuk in. Ew wê tabloyê weke dîrok tomar dike ku rêuresma davet û govend û xweşiyê di wê rojê de, çawa bûye.

Herweha romannivîs her bi vê hindê jî nasekine û hinek ji wê merasîmê jî dinexşîne û tabloyê tewaw dike. Dema ku bûk digihîje cî, hinek ji wan nerît û edetan nîşanî me dide ((Bûk ji trombêlê anîn xwarê, tora sor a gulgulî ji dûr ve li ser serê bûkê diçilvilî. Bûk suwarî mahînekê kirinê ku xal Heme jî serkêşiya Mahîne girte dest. Salihok û Ehmedê çavcuwan jî, li her du aliyan de rikêba bûkê dikirin. Cihêz û kek û pelên bûkê jî li pişta du sê hespan kiribûn, ku berbûk, suwarî yek ji wan hespan bû, û hêdî hêdî bi rê ketin. Suwar ketine cilîdanê li çarmedorên bûkê de. Ji hêla din ve jî, xortên çek li mil û Demançe li kêleg çûbûne serbanan, û li benda yekem teqeya pêşwaziya bûkê bûn, daku ew jî, li wir dest pê bikin. Qamûşek lelekirî ya dirêj dane destê te, daku berî bûk bikeve hundur, li ser kofiya wê bidey! Goya bi vê yekê, sam û heybeta zava bi ser bûkê de zal dibe!

Ji hêla din ve jî, çend kesan torbikên mewîj, birêjik û şîrînokan bi dest girtibûn, daku bi gihîştina bûkê, bi ser de bibarînin. Goya, pêpal bixêr û ser bi risq dibe. Yekem teqe ji wî alî ve hat, êdî ji vî alî ve jî dest pê kir... Xort ew xort bû ku zû biteqîne. Goya nîşaneya dilsojiyê ye ji bûk û zava re. Dilê bûkê pir şad dibe û dibêje: Eva hemû teqeye, ji xweşiya min e. Bûk gihaye cî)) (Koçî Sûr: 132- 133).

Bi wî awayî, bûk gihaye cî. Herweha hin edetên din jî hene ku, dema bûk hêj ji pişta Hespî nehatiye xwar, suwarên Mahînan tên û diyariyê ji zava werdigrin. Romannivîs hemû ew urf û edet bas kirine ku li dema gihîştina bûkê de hebûne, û weke dîrok tomar kirine. Herweha wekî hunermendekê jî, tablo nexşandiyê. Romannivîs dîsan li ser wan deb û tîalan diaxive, û basa yek ji kulturên kirêt dike ku dema xwe li zaf gundan de hebûye. Ew wê kulturê rexne dike ku jêre dibêjin “şeva zavatiyê”. Wate, yek ji kesên nizîkî zava, rênimayiya wî dike, û şeva yekem, jêre şirove dike. Lê romannivîs hêj li ser wan edetan berdeyam dike û wê kulturê, bi edetek kirêt û nejhêatî dizane, lewre dibêje ((Kek Doxrî ê ezîz, dema ku te xwast şevê nizîkatiya bûkê bikî, wekî kurdê dunyanedîtî, êrîşî ser bûkê neke ha. Çûnkî renga tesîr û karîgeriya şeva yekem, li ser hemû jiyana ew jin û mêrî bimîne, vêca çî bi erênî û çî bi nerênî. Lewre,

dibe mêr hêdî hêdî jinê ram bike û şerma wê bişkîne, û xwe li dilê wê de şîrîn bike! Ji ber ku, ew şîrînatî li hemû jiyane de dimîne. Herweha eger xwe li berçavên wê tal bikî, ew jî her dimîne... Wê jî bizane, gava ku diçine ser cî û cot dibin, cimaet dê zû bêne ber derî, û gazî bikin, tewaw nebûy! Bo hinde giro bûy? Ka bilezîne! û ... ji wan tiştên pûç û teres.

Jiber wê ku di mentalîteya eşîretî de, zû zavabûn, nişaneyê mêranî û resenatiyê ye. Renge hin tenê bo wê hindê bêne ber derî ku zava jî derkeve derve, û bi vê yekê jî, davîn fişekên xwe biteqînin û vegerin. Çûnkî, zava piştî wî encamdana wî karî, êdî bi fermî dibe zava. Lewma xort û cihêl jî teqeyê bi ser de dikin û dibin, lê tu guh need wan tiştî. Tu dikarî wan bixapînî, û berî wê ku bibî zava, were derve û bila ew jî teqe bikin û desta ji te bikşînin)) (Koçî Sûr: 132).

Romannivîs bi anîne berbas a vê culture, ronahiyê dixê ser yek ji wan edetên xirab ku di nav xelkê de baw e û li şeva zavatiyê de, hinek reftarên xirab encamp dane. Bo nimûne, basa wê şevê dike ku çawa yek ji nizîkên zava, şiroveya wê şevê jêre dike ku cava reftar bike yan tevbigere û bi şevê girîng dizane ku ew şev, bandor li ser hemû jiyana bûk û zava dibe. Li hember de basa wê dike ku ba xelkê eşayir, dibe ku zû bibî bi zava û derkevî derve û rabigehîni, daku xelk dest bi teqekirinê bikin. Lê romannivîs rexneyê ji vê culture digre û dibêje ku tu wanbixapîne daku ew teqeya xwe bikin û biçin. Eva tê wateya wê ku romannivîs jî ew yek bi çandek xirab zaniye û dibêje: ewa kulturek eşîretî ye û tu weke wan neke.

Di romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, romannivîs bas ji yek ji kulturên kirêt û nehez ên din dike ku eger kesekê xûşk tuneban ku ji xwe re bide jin, bi hêsanî nedikarî jinê bîne. Yan hinek mêr hebûne ku keçên xwe, ji xwe re didan jin. Ew, basa wan du kesan dike ku ji hevdu hez dikirin, lê bavê keçikê razî nedibû. Bi wê hêcetê ku tu kesek (xûşk) wî nine li şûna hezkiriya xwe bide wan ((Midehek dirêj bû ku Feyzek û Tela sewdaserê hev bûn. Feyzek her çî mêmraqûl û ridînsipî ên tax û derdorê hebûn, bi dor hinartibûne cem Heyas Tî Tî, daku Telaya keça wî jêre bixwazin... Heyas suwarê şaxê şeytan bibû, nedida ku nedida, û digot: Min Tela daniye ku ji xwe re bidim jin. Feyzek

jî jin nine heya ku bideme min...vêca bila wê xeyalê ji hişê xwe derbixîne.. !!))
(Kordere: 77).

Eva jî yek ji wan edetên xirab bûye ku bab, keça xwe ji xwe re bide jin, û jin bi jinî pê fikir. Yan eger kesekê xûşk nebûna, bi hêsanî jin pê nedidan. Herweha bas ji wê dike ku xelkekî zaf ji rihsipî û mêrxasên tax şandibûn. Wate bo vê meselê, xelkê mêrxas dişandin û rêz ji wan dihat girtin û zaf carî, ser xatra wan mêrmaqûlan, karê wan ser digirt. hin carî jî, rêza wan jî nehatiye girtin û razî nebûne ku keça xwe bidin.

Di romana (Janî Gel) ya (Îbrahîm Ehmed) de, îşare bi hin deb û çandên civakê hatiye kirin ku li pêvajoya bûyeran de, hatine pişikdarkirin û karîgerî li ser çarenivîsa karekteran hebûye. Hin ji wan diyardeyên ku li romanê de hatine ber bas, sîma û taybetmendiyên civakek nerîtgera û daxistî ye, tevî wê jî romannivîs tu helwestek li hember de negirtiye û nedaye ber rexneyan. Ji wan jî, diyardeya desgirtîbûna (Askol) ê bo (Cuwamêr). Ew kar her ji zarokatiyê de hatiye kirin bêy wê ku bîr û hizr û surûştaya wan mirovan were berçavgirtin. Çûnkî renga li temenê ciwanîyê de, dilê wan bo hev neçe û hevdu pesind nekin.

Romannivîs îşare bi wê dike serbarê wê ku ew dotmam pismamê hev in, û pêwendiya xizmatiyê di navbera wan de heye, lê malbatên wan li temenê zarokatiyê de, ew ji hevdu re danîne. Wan hêj nekarîbûn bihev re baxivin û ji hev tê bigihîjin ((Wî Askol a desgirtiya xwe, li temenê 12 saliyê de bi tenê, nedîtibû. Herweha bi tewahî nizane ku keçek çawan e, û nizane li heyama wan pênc şeş salên ku ji nizîk ve hevdu nedîtine, çi bi ser de hatiye. Wate, him li rûyekî û şeklê xwe de û him jî li naverok û reftarên xwe de)) (Janî Gel: 47).

Bêguman eva diyardeyek civakî ya paremayî ye ku bi tu pîvan û pîveran, li civakên vekirî û saxlem de nahê kirin. Dûr ji hest û soza mirovan bi xwe..bi taybetî piroseya hevjinîyê û pêkanîna malbatê, karek e ku pêşeroja civakê li ser tê avakirin. Lewre nabe li temenek biçûk ya zarokatiyê de ku ew hêj wan meselan fam nakin, ew kar bê kirin, cuda ji wê jî, nabe malbat biryarê li ser çarenivîsa jiyana pêşeroja a wan bidin ku bi xwe tu rolek têde ninin. Lewre diviya ew diyarde li nik romannivîs ve hatiba rexnekirin. Bi taybetî ku (Cuwamêr) nimûneya ekterek hişyar û rewşenbîr e, û piştevanê

mafê jinan e jî, diviya helwesta xwe li ser wê diyardeyê nîşan daba, û piroseya hevjinîya bi vî awayî retkiriba. Nek berevaj, tekeziyê li ser bike û diya xwe çend caran bo wê meseleyê bişîne. Çûnkî helwestek bi wî awayî ya Cuwamêr ku eger li dijî wê diyardeyê bibûya, wê demê tevî wan helwestên ku piştewaniyê ji mafên jinan dike û di romanê de ketine berbas, hevdu digirt. Herçiqas, ew piroseya hevjinîyê jî serkevîtinê bidest nahîne û (Askol) şû bi kesekî din dike, lê diviya retkirin û betalkirina wê diyardeya kirêt û paremayî, ji aliyê (Cuwamêr) ve bibûya û îcar Askol ji xwe re zewicîba.

Li dema zewicîna Askolê de jî, romannivîs diyardeyekê têkilî bûyeran dike ku hingê weke kevneşopî û edetek civakî li dema hevjinîyê de di nava civakê de peyrewî jê hatiye kirin. Ew jî (şekrav)a mêrkirinê ye ku malbata keçikê bo malên xizm, cîran û nasiyaran dişînin ((çend roj derbas bûn, sibêdeyekê piştî çûyîna Cuwamêr bo îdareyê, diya wê ku mijûlê paqijkirinê bû, qîzikek deh dazed salî dît ku hate hundur û pirsî: Vira mala Cuwamêr ê fennî ye? Eve şekrava mala fatime xanimê ye, min bo we aniye! Wusa got û paketa nuql û şîrînokan li ser hesîrê danî û çû)) (Janî Gel: 58).

Ew şekrav ji nuql, şîrînok û şîrîniyan pêk dihat û weke agehdarkirinê bû li dor mêrkirina keça wan. Helbet ew yek, piştî qonaxa xwazgîniyê tê û piştî pêkhatina her du malbatan, şekrav tê bexşîn. Helbet tevî guherînkariyê di biyavên aborî û rewşenbîrî de, diyardeyên civakî jî tûşî guhertinan dibin. Li vê çarçoveyê de, niha ew şekravbelavkrin nahê encamdayîn û tenê weke urf û edetek dêrîn tê dîtin.

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, romannivîs bi hûrî bas ji rêûcihên bûkveguhastinê di wî serdemî de dike. Ew jî li wê demê de ye ku bas ji bûkveguhastina Nexşînê bo Salar dike. Li destpêkê de, kiryara xwazgîniyê tîne berbas ((Navê çar mêmraqûlên gerekê anî û çûne xwazgîniyê. Ele Gurge, Saleyê Emîne Motî, xizmek Salar û ez). Me li deriyê mala Umer da, xweda û rastan, ew kar zû serhev de anî (Caran ger karek bi hêsanî cîbecî bibûya, digotin kuze kemtiyar hilgirtiye yan nivîştî pêre ye ku li hestiyên pelpelîska Silêman, bi xwîne hatiye nivîsîn!) Mam Umer kete pêş û dengê tîlîliyan li tax de bilnd bû)) (Helkişan Berew Lûtke: 103).

Lêre de kiryara xwazgîniyê bi awayek asayî birêve çûye û çend kesên xweyî û naskirî ên tax, çûne mala keçikê û ji bavê wê xwastine. Lê hevdem îşare bi karek pûç hatiye kirin, ku ew jî, basa kuze Kemtiyar û niviştîyê hatiye kirin, ku xuya ye baweriya xelkê pê hebûye ku bandora wan di bicîhatina wan karan de heye.. Piştî amaje bi daxwaziyên mala bûkê hatiye kirin ku helbet ew kar, berî marekirinê bûye ((sê rojan piştî derbasbûna xwazgîniyê, diya Nexşînê daxwaza pişteder, berpâl (Qestem)ên sor, çar kîse xene, çil qalib sabûn û pênc dînar pereyê serşoka jinan kir, tevî du batman şekre tîrşe, şîrînok û cil û bergên rengîn. Tevde bi zorî şandin, û li nav torbikekê de, sê lire û zincîrek nîşaniyê ya Nexşîn. Mela Seidî ew mare kirin û pêncşemiya serê mehê, ji bo veguhastina bûkê, diyarî kirin)) (Helkişan Berew Lûtke: 108).

Helbet ew daxwazî li gorî wî serdemî, zêde bûn û bûha û qîmeta xwe hebûye. Lewre romannivîs tomar kiriye û weke kulturek parastiye.

Li vê derheqê de, amaje bi rêûresma roja veguhastina bûkê hatiye kirin ((bo roja davetê jî, batmanek silq, sê selik badimcan, sê hoqe kudî, yek hoqe dîngê pez, nîv hoqe rûn û sed girem simaq tevî batmanek birincê sor û yek hoqe bîber, pêncî girem xê ji bo dolmeya birûn bo mêvan û dawetkaran şandin. ... Roja sêyem, cergebez û reşbelek li pêş mala zava hate kirin ... Êwarî hecî Mihemedê berber serê zava û birazavayan tiraşî û çûne germava Ele... Ji mala bûkê ve bo mala zava, her sed pêngav dibû, lewre her bi piyan veguhastin)) (Helkişan Berew Lûtke: 108).

Eşkerekirina hûrgiliyên merasîma bûkveguhastinê ji aliyê romannivîs ve, bona wê ye ku şêwaz û metodên rê û resmê bo nîşên pêşerojê veguhêze, û bi deb û tîtalên civaka xwe re nasiyar bike ((Du jinan milê Nexşînê girtin, û pêxesûyê neynûkek li berbirûyê bûkê de girt. Diya zava bi vê kirixînê, bi destekê kefgîr û bi destê dine jî, dewriya ard hilgirtibû. Goya eger bûk destê xwe bixe nav ar de, wusa erzanî çêdibe! Kevgîr jî webizanim bo wê ye ku bibe bi kabaniyek baş û jêhatî)) (Helkişan Berew Lûtke: 108 – 109).

Vir de romannivîs deb û tîtalên bûkveguhastinê û jinhînanê li nav civaka xwe de bi hûrdekariyan ve nîşan daye. Piştî jî îşare bi şeva zavabûnê kiriye û rê û cihên wê şevê di wê serdemê de wêne kiriye ((piştî banga şevê, zava paldane odeya bûkê û

çavnihêr man... ji nişkîve tîlîlî ji her çar aliyan bilind bû. Zava derket derve û li navçavên wî de, dilopên areqeyê dirijiyân... Her kesê rahişte çek û demançeya xwe û pelepîtke givaştin. Teq hey teq, vîze vîza gulleyan li berguhê wan de dihat)) (Helkişan Berew Lûtke: 109).

Ew rê û cih, weke deb û edetên wê serdemê bûn ku romannivîs hûrdekariyên wê tomar kirine û li çarçoveya romanê de bi zîndî hiştiye. Her girêdayî bûkveguhastinê, bas ji zewicandina keça naverast a xwe (Reşeyê pînedûz) dike ku weke urf û edet, dibe li destpêkê de, ji keça mezin dest pê bike û dûre keçên din yê male, yek li pey yekê bi şû bidin. Eva jî di guftigoyek navbera (Tofîq) û diya wê de berçav dikeve ((- Başê dadê, ma Reşeya pînedûz, şeş keçên wê nebûn, çawa ye ku ya naverastê bi şû daye?

.....başê ma edet wusa nine ku keçan li gorî temen, bi şû bidin, yek li dû hev.

- Be, lê ger Reşeyê wusa kiriba, diviya biba şivanê wan heytaneyan!! Min derfetek dît û kuçê xwe avêt: - Kuwusan e ji edet û nerîtê derçûye!Dê çarenivîsa wê xêr bît. Dadê xwe caran bo kuran jî bi wî awayî jin mare dikirin! Li destpêkê de birê mezin jin dixwast, piştîre yê biçûk û dûre ê herî biçûktir.

Kurê min, hingê cuda û niha cuda. Wê demê wusa dixwast û îrrojê jî vê metodê dixwaze)) (Helkişan Berew Lûtke: 82 – 83). Vir de berhingarê guhertina rewş û tîtalan û kultura civakê dibin ku bi sedema guhertin û pêşketina biyavên civakî û aborî, kevneşopiyên berê hatine piştguh xistin û urf û edetên nû û pêşketî, dewş û cihê wan girtine.

3.3.2. Rê û resma Taziyê

Merasîmek olî ya taybet e û li dema mirina her kesek bisilman de, çend rojan tazî û serexoşî jêre tê danîn, ku cuda ji aliyê olî, wêneyek kulturî jî bi xwe girtiye. Hinek ji merasîmê, bûye bi çand û ew rê û resm li cihekê ve bo cihek din heta qasekê cudahî heye û renge li gor dewlemendî û hejariya mirî jî, ciyawazî hebe.

Li romana (Malava Gulî Xem) ya (Hîmdad Hisên) de, dema ku Dilêr basa taziya bavê xwe dike ku kesekî hejar û belengaz bûye, bi hêsanî û zelalî ew cudahiya navbera

hejar û dewlemend de hest pê kiriye û dibêje ((Nizanim basa çî bikim, mirina wî jî asayî nebû. Roja ku koça dawiyê kir, kes nebû ku di çalkirin yan bi xaksipartinê de, alîkariya me bike. Ger kabrayek dewlemend bibûya, dê bi merasîmek taybet û karwanek tîrombêlan ve hatiba birêkirin. Heya midehê mehekê, her tişt ji bîra min çûbû. Li kuncêk wê odayê (bi dest îşare bi wê odayê kir ku em têde rûniştibûn) de, dirûniştim û dernediketim derve..Pir kê.. Wekî kesek ku kas û gêj bibe, lê hatibûm. Min, mam û kurmam û kes û kar jî, tenê li her sê rojên taziyê de dîtin. Carek din her nehatin ku bibêjin çî ji we hat, hûn mirine, mane!?! Tenê pismamek min nebe, rewşa wî başe û destê wî jî diçe, heya niha jî serdana me dike û berdewam alîkariya me dide)) (Malava Gulî Xem: 53).

Di Vir de, bas ji merasîma taziyê di bajar de dike, bi taybet ger ku kesek hejar be, taziya wî jî sar, bêkes û hejarane birêve diçe. Nemaze xizmên xwe jî, girîngiyek wusa bi taziya wî nadin û xwedî jê dernakevin. Herweha têkiliyên civakî li bajar de, pitir li ser bingeha berjewendî û aboriyê têne avakirin. peywendiyên civakî olî heya qasekê, bûne bi berjewendî, yan ber bi kêmbûn û nemanê ve diçin. Lê ji kesên dewlemend û destroyîştî re cuda ye û xelk zûtir bi hawarê de diçin. bi vê wateyê ku merasîmên civakî û hin mijarên weke tazî û serxoşiyê jî bûne bi berjewendî. Romannivîs beşek ji rê û resma taziyê xistiye berbas. merasîmek ku xelk, girîngî û buhayê pê didin û heya çend rojan, wê merasîmê birêve dibin.

3.3.3. Rola Jinan

Di civaka kurdî de, jin rolek mezin û girîng dilîze. Çî li bajar yan jî li gund de bin. Ew hertim mil bi milê mêran li kar û xebatê de bûne, cuda ji wan karên ku taybet bi xwe ne. Herweha daykatî û xwedîkirina zarokan jî li ser milê wan bûye. Jin texa herî bibandor ya civakê ne ku ji aliyê wêjevan û edebnasan ve girîngiyek taybet pê hatiye dayîn. Tevî peydabûna wêjeya fulkilorê, rola jinan bi girîng hatiye zanîn û bûye bi hêvênê berhemên fulkilorî û heya îrorojê jî li hemû serdem û janrek edebî de, amadeyî û beşdariyek karîger hebûne. Roman jî yek ji wan janran e ku pûte û buhayek zêde bi rola jinan daye.

Di romana (Nazê) ya (Îsmâîl Rojbeyanî) de, basa rola jinê cuda ji wê rola girîng ku li malê de dilîze, dike. Ew hevkarîya hevjinê xwe jî dide, zaf caran jî bûye bi xwedî aboriya xwe. Dema ku Azad hewcehî bi tînûsa wêneyan dibe, penaya xwe bo diya xwe dibe bi armanca standina pere û kirîna wê. Jêre got ((mamosta ji me re got: Guhdar bin, her kes bo dusibe tînûsa wêneyan nehîne, ezê bi şivikan, şilukut bikim. Her ku dengê zengilê hat, em yekser beziyan bo male. Çûnkî davîn wane bû. Dema ku çûme hundur, dayka min mijûlê nan patinê bû. Min cantayê xwe li kulengê de danî û bilez û bez, xwe gihande ser tendûrê, û ji diya xwe re got: Dadê! Mamosta tînûsa wêneyan ji me dixwaze. Ka here ba mela îbrahîm defterekê bîne, paşan ezê hêkan bedela wê bidim mela)) (Nazê: 100).

Romannivîs dixwaze vê yekê ji me re bibêje ku, jin cuda ji wê ku karê malê dike, bazarê jî dike û tiştan li dukanê de li gel hêkan diguherîne. Wate, karê guherîn û kirîn û firotinê jî dike. Herweha li gundan de, jin xwedî sermiyana serbixwe ne û hinek Mirîşk hene ku bi xwe berhemên wan difroşin û bazarê bi pereyê wan dikin, û hinek Çêl û berhemên wan jî difroşin ku pereyê wê jî, ji wan re ye. Hinek hene ku zewî zarên taybetî hene û berhemên wê ji xwe re difroşin û pereyê wê jî bi keyfa dilê xwe bo mal û zarokan dimezixînin û renga muîamilê jî pê bikin. Li bajêr jî, bi awayekî dîn e. Wate, jin rolek mezin û girîng di nav çanda kurdî de dilîzin.

Li romana (Koçî Sûr) ya (Heme Kerîm Arif) de, romannivîs li romana xwe de, rola jinê piştguh nexistiye û dema ku basa gund dike, bas ji kaniya jinan jî dike ku çawa û bi çi awayî, avê vediguhêzin û qise û basên zaf jî dikin. Hinek ji qise û basên jinan ji zarê wan bi xwe tomar kiriye ((Dema ku digihîjî nav gund, dibe ku li rex kaniya jinan de derbas bibî. keç û jin ji hemû tax û gerekan ve bilez ber bi kaniyê ve dimeşin daku davîn gera avê, bibin. Qîje qîja zarokan û çeçe çeqa jinan, tequireqa aman û tenîke û kalonan, şilpêna tep û kutan, şere dijûnên nobebirînê, tîle tîla keçên azib û tîqe tîqa keçên biçûk, tirane û laqirdiyên jinan, dijûn û nifirên jinên nerazî ji mêran û ... mirov gêj û hêr dikin...

- Rebî kore be.

- Hey zimanê te lal be kiçê.

- Kiçê Fatê, Lence Eysê leber helkîrawe.
- Sotisûya pêşiyê, daye li serê.
- Xweziyek te Mîna xêl.
- Melek! te baş destê xwe bi Ehol re têkel kiriye ha.
- Bi koratiay çavê nehezan.
- Bibî jinbiraya min îşala.
- Tu xwedê, rê bide min, ez lez im.
- Rast dibêje êxtê wê hatiye.
- Xweziyek wê!
- Hey kore, te bo destê xwe kire nav de, tu nizanî min bo rakirina cinabetê ye (xwe nivêjîkirinê ye).
- Dilê min jî xweş e ku min mêr heye, oh rebî, laşê saxê wî, sîbera te be.
- Bêje kone qeltax, taze çi bi te ve maye!)) (Koçî Sûr: 117 – 118).

Lêre de romannivîs komek mijaran tîne berbas û dixwaze wêne û dîmena gund û rola kaniya jinan nîşan bide. Herweha bandora wê li ser civîna jinên gund û ew qise û axaftinên di nav jinan de, bîne rojevê. Wate, bi hêceta kaniya jinan, perde li ser çend mesele û guftigoyên navbera jinan vedide, weke: Reftarên jinan bi hevdu re, bi mêrên xwe re, hesûdî, naz û nûz û eşqbazî û niqurçkirtin ji hevdu û ...htd. Herweha li çanda kurdî de, kanî û avhînan ji kaniyê, kulturek kevn e ku mêjdem e xelkê nasiyarî û şehrezayî li ser heye. Kanî bi nav û deng e, zaf stran, çîrok, helbest, evîn û ...li ser hatine çêkirin. Herweha li hinek cihan de, basa curên jin û keçan û wesfa bedeviya keça kurd dike, û rola wan li jiyana, karê malê û karê derve de ku berdewam e, bilind dinirxîne. Wate, jin li gundan de hertim li kar û fermanan de ne û rolek mezin dilîzin.

Di romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, rola jinan di nav romanên de dibiriseq, weke wê ku li jiyana de jî wusan e. Lewre li nêromanekan de, jin rolek cuda cuda dilîzin. Li romana Kordere de, ji zarê Ekber ve basa rola diya xwe dike ku bi sedema

destrengînê û karkirinê ve, rolek girîng hebûye di jiyana zarokên xwe de ((Midehek bû ku diya wî çend cotên Kilaşan raçandibûn, çûbû bazarê daku bi Şeiban Serac bifroşe. Ji wir ve jî, şirînok û çiklêtan bo me bikre. Dema ku zarokan şirînok bi xwe re anîn qutabxaneyê, ber dilê me ewqas xweş û cuwan bû ku hinde nemabû kamçûyî bibim)) (Kordere: 15).

Jinan rolek mezin di jiyânê de lîstine, serbarê karê xwe ê malê, karên din jî bi stû girtine, û bi sedema bêşolî û betaliya mêrê xwe, karê raçandina Kilaşan kiriye û bi firotina wan, kariye beşek ji hewcehiyên zarokan dabîn bike. Wate, destrengîniya jinan li zaf deman de bi hewara mêran ve çûye. Bi taybetî li dema bêkariyê de ku jin bûne bi xwedî saman û heyînek serbixwe û ji zarokên xwe re, gor dilê xwe mezaxtine.

Herweha pitir bas ji rola dayka xwe dike ku weke jinekê, hertim li xema mala xwe de bûye û karek kiriye ((Du sê zerikên doynê xistine nav avê, heya ku bo firavîna me bixûsiyêt. Ew kilaşên ku çinîbûn, rakirin û ber bi bazarê ve derket derve, daku ji şevê re bê nan nemînin)) (Kordere: 49).

Eva xemxoriya diya wan e ji zarokên xwe re, ku him weke jin di malê de rola xwe dilîze, him jî weke kesek kasib, kilaşan bi armanca bijîva jiyana zarokên xwe didûre.

Romannivîs pitir li ser jinê dibêje û bas ji destrengîniya diya xwe dike bona wê ku nan ji zarokên xwe re peyda bike. Her kes karê durûman û cilikdirûnê nizane, û hemû kesan jî, mekîna cilikdurûnê nine, lê diya wan ji ber nebûniyê, yek ji wan amûran kiriye û cilkên xelkê didûre bona wê ku pere ji bo bijîva jiyana wan peyda bike ((Dayê çerxek durûmanê kirîbû û durûmana xelkê encam dida. Şev û rojên wê xuya nebûn, me jî carna şeqîtiya wê derdikir û destik û girdîlka çerxê jêre dizivirand.. Durûman û destxetê diya min li nav xelkê kotalfiroş de nav û deng peyda kiribû.. Her ku karê yekê bi davî dikir, dixiste nav baxçikê û li benda xwediyê wê dima. Me jî weke dayîkê hez dikir ku xwediyê cilikan zû bê û heqdesta durûna wê bide dayîkê. Her ku dengê dihat, me zû diya xwe agehdar dikir.. Carna jî, xwedî qumaş nedihate ser parçeyê xwe, yan pere nebû yan derfet nebû.. Eger nehatiba, em ji nanê gerim bêpar diman û neçar dibûn

ku nanê sar bi çayê re vexon. Îca Riza ji me hemiya çilûztir bû, destên xwe bo esman bilind û dua dikirin: Ya xweda, dê bila bêt û parçeyê xwe bibe)) (Kordere: 81).

Jinan hin caran weke pîşe, xwe hînî hinek pîşeyan kirine. Cilkên jinên kurd, bi yê gelên din re ciyawaz in û zaf carî, bi destê xwe durûne û eva jî bûye bi derfetek ku hinek ji wan, weke pîşe xwe hînî terzîtiyê bikin û jê sûdmend bibin, bona wê ku bibin xwedî pere û ji zarokên xwe xerc bikin. Helbet eve jî bê kêşe û pirsgirêk nebûye, lê dîsan jî, karê zêdetir kirine daku bikarin zarokên xwe ji birsîtiyê rizgar bikin û mil bi milê mêran, rolek girîng leyîstine.

3.3.4. Mezargehên Olî

Mêjdem e ku bîr û baweriya xelkê bi mezargehên olî re heye û niha jî hin ji xelkê, bawerî pê hene û bo zaf mereman diçine serdana wan, xêr û xêratan dibexşin, û gelek caran jî, piştî xwe pê qahîm dikan û bi wan, hêvîdar in.

Li romana (Nazê) ya (Îsmâîl Rojbeyanî) de, romannivîs bas ji sefera Azad bo bajarê Bexdayê dike, ku dixwaze biçe cem Haşim ê hevalê xwe. Her ku diya wî, Azad ê kurê xwe dibîne, lê dipirse bo ku diçî? Bersiv dide û dibêje: Diçim Bexdayê bo cem hevalê xwe. Diya Azad dibêje ((Ê, bila ez jî gel te de bêm. Bi xwedê mêjve ye ku min ehd kiriye ku biçime ziyareta Xews))(Nazê: 15).

Xuya ye ku dayka wî, navê Xews tine. Merema wê, Şêx Ebdilqadir Geylanî ye ku mezargeha wî li Bexdayê ye. Xelkek zaf bo tiaf û ziyareta wî diçin Bexdayê. Lewre diya wî dibêje ku ezê bi te re bêm, çûnkî mêjdem e dixwazim biçim ziyareta wî. Wate, xuya ye ku xelkê baweriyek zêde bi mezargehên olî hene û riyên dûr û dirêj dipîvin heya ku digihin wan mezargehên olî.

Li romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, li dema nexweşketin, zaroknebûnê (nezokî) yan xwastina kur û keç û ...htd, xelkek zaf pena dibine ber mezargehên olî. Li wir, xaka wê, yan pîne pero, kevir û hinek tiştên din dikine tiberik ji nexoş re. Helbet ew bîr û bawerî jî bûye bi kulturek û li nav xelkê de belav bûye. Ji ber wê ku li nav janrên romanê de bûye cihê girîngî û pûtedayîne û ketiye ber bas...

Li romana Kordere ya Xusro Caf de, dema ku diya Ekber nexweş dikeve û ji bo derman û çareseriya wê re, pena birine ber avekê ku li nav misilmanên şîe meseb de, jêre dibêjin (Ava Şefa) yan (Ava Turbet). Wata ava serzewîna Kerbela. Baweriya wan wusa ye ku her kesek nesax be, ger ji wê avê vexwet, dê baş bibe. Her ji ber wê ye ku wê avê jêre tînin û didine diya Ekber. Lê piştî vexwarinê, ew diverêşe, lê bab û xalên wî dubare ew av weke tiberik, vexwerine. ((nîv piyaleyek ji wê avê bide min, ji kuxika singe min re başe!! Bavê min û xal Remezani jî her yekê û çend qurt ji wê avê weke tiberik vexwarin.. Riza çûye cem dapîrê û got: Pîçek jî bide min, bo waneyên min başe, çiqaş dikim xiştêya lêkdanê fêr nabim..!)) (Kordere: 67).

Romannivîs ronahiyê dixê ser wê ku ewan bawerî bi wê avê hebûye û li ba wan, pîroz û tiberik bûye. Madam ji Kerbelayê hatiye, şîfa û pîroz e. Her nesaxek vexwet, nemaze eger nesax jî nebe, tiberik û baş e û dê sûda xwe jêre hebe. Wate, ji çareseriya nesaxên xwe û bicîhatina xwastên xwe re, pitir pişt bi mezargeh û tiberikê girêdane heta ku pizîşk û nojdaran.

Herweha hin kes, dema ku temenê wan jorde diçe, yan kesek ezîz ê xwe ji dest didin, yan bi her sedemekê be, dest ji jiyana berdandin, temenê mayî ê xwe, li mizgevt yan mezargehan de diqedînin, û dibine xizmetkarê mezargehan. Li romanên Kordere de, ji zarê Ekber ve basa Xalid tê kirin ku çawa demên xwe ji mezargehan re terxan kiriye ((Xal Sêfulla piştî mirina dapîra min, ehd û peyman kir ku heya dawîn roja jiyana xwe, ji mezarê îmaman dûr nekeve, û derdorên (Herem)ê paqij bike, bi ava Turbetê destnimêjê bigre û li rex mezarê îmaman, nimêjên xwe bike.!)) (Kordere: 137).

Xelkek zaf bawerî bi wê hene ku ger li mezargehan de nimêjê bikin, xêra wê zêdetir e. Herweha dibêjin xizmetkirina bi mezargehan, xizmet e bi ol û sedemek e bo çûyîna beheştê. Bîr û baweriyên zaf li ser wan îmam û mezargehên olî hene û xelk jiyana xwe dike gorî wan mezargehan û xizmeta wan dikin.

Li romana (Koyxa Sêvê) ya (Ezîzê Melayê Reş) de, romannivîs îşare bi bîr û baweriya xurafî a xelkê derheq mezargehan dike ku ew bi xwe mirine, lê dikarin bextek baştir ji zîndî û saxên ser dinê re bînin, nesaxiyên wan çareser bikin, û pêşeroja wan bixwînin. Yek ji mezar û "Çak"ên ku xelkê bawerî pê heye (Çak a Baba Gurgur) e.

Goya bo ew kesên ku kur (xort)ên wan nabin, diçine ser û piştî lawahî û niza û duayan, kur ji wan re tê bexşîn. Karakterê sereke, ji riya teknîka filaşbak ve, bûyerên derbasbûyî vedigêre û diçe serdema dapîra xwe ku basa ew ‘‘Çak’’ jêre kiribû ((Şevêkê Sêvesorê jê pirsî: Nene, tu nabêjî min: Çak a Baba Gurgur çi ye...?).

Girnişnek hate ser lêvên wê û got: - Role! Nizirgehek zor pîroz û nûranî ye, beynabeyn nûr û ronahî lê diçe. Her kes bi niyetek pak ve biçe ser, bêhêvî venagere. Bîstekê bêdeng bû. Piştî berdewam kir û got: - Bavê te, yê wê ye!

Sêvesor: Çawa...!?

Piştî şeş keçan, êdî ji zayîna kuran, bêhêvî bûm. Rojekê min serê xwe berda û çûme ziyareta wî:

Bawe Gurgur Bawe Gurgur

Cêgey niyazî bo kiç û kur

Hatûmete lat be şermeve

Korpe bixeyte baweşmeve

Min nezra Conegayekê jî kiribû. Her ku vegeyriyam, min serjê kir û bi ser der û cîranan re parve kir. Sal vegeyriya û Xwedê bavê te da)) (Koyxa Sêvê: 187 – 188).

Virde bîr û baweriya sade ya xelkê li dor bawerkirin bi wan çîrokan derdikeve ku eva jî yek ji edet û kulturên civakek kevneşopî ya daxistî ye.

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, rûberek berfireh ji bo baskirin ji kulturê hatiye terxankirin û bi wê sedemê ve, romannivîs kariye çandek curbicur ya civakê bîne ber bas, tomar bike û asta hizrî û têgihîştinê li cem takên kurd û civaka kurdî bide xuyandin.

Yek ji wan mijarên ku ronahî xistiye ser, kultura serdankirina nezirga û merqedan e. Bawerîhînan bi wan kar û kiryarên ku bi sedema wan ve, li jiyana dunyayê de misoger dibe ((Her ew Bawe Gurgure jî serdemekê, çarşemiyên penageha wan jinan bû ku zarokên wan nedibûn, yan biçûkên wan liber diçûn. Lewre bi niza, rica û lawahiyan, jinek wusa, digot:

Bawe Gurgur

Hatim be gurr

Be gurr hatim

Bo kur hatim (Helkişan Berew Lûtke: 5).

Lêrede bîr û raya sade ya xelkê û baweriya wan bi wan merqedan, ku karê dunyaya wan jêre diqedînin. Li cihek din de, bikarhînana merqedan bo eşkerekirina diziyê bikar hatiye, weke merqedê (Îmam Ebas) ku ji wê meremê re bikar hatiye ((Dizanî caran, her kesê ku li wî bajarî de zêr û xişl dizîban û guman li ser hebana, cixiza îmam Ebas jêre dikişandin!..

Bazne yan giroverek bi Geç ê li ser erdî dikişandin û kesê/a gumanbar dixistin nav wê cixizê. Eger diz nebûya, lûs û zirav lê derdiket, lê eger tawanbar bûya, qelesa destê wî û çokên wî dişkestin û diziya wî eşkere dibû)) (Helkişan Berew Lûtke: 7).

Yan bi awayekî din, bawerpêkirin bi wê ku (Îmam Qasim) çavên kor vedike ((Ey çawa dibêjin di meha (nûr) li wê Îmam Qasim û Zeynelabidîn de, salê çavê yek du koreyan vedibe. Lê bi qasê ku tê bîra min û li wê Îmam Qasim de me, min tu kes nedîtin ku çavê wan, vebe (sax bibe)) (Helkişan Berew Lûtke: 7).

Vir de bîr û baweriya romannivîs derheq wî karî, ketiye ber bas ku heta niha tiştên wusa rû nedane. Eva jî curek e ji rexnegirtin ji wê kulturê ku bi baweriya wî, rola kesên mirî di jiyane de mabe. piştî wê romannivîs îşare bi wan Çak, Pîr û Mezargehan dike. Herweha rola wan di jiyana civakî de rohn û eşkere dike ku her yek ji wan bo babetek diyarîkirî tê bikaranîn ((ew kesên aliyê me, her yek ji wan li warê nesaxî û êşekê ve şehreza ne. Omermendana, pisporê har û dînatîyê ye! Okaşe yê pêgiraniyê ye! Ocax, bo zaguzarkirin! Îmam Qasim û Zeynelabidîn, çavan vedikin. Îmam Ebas dadvan û pizîşk e!

Xate, ey kê bo hevişîn û çikbûna şîr baş e? Îmamê ber qelayê. Çûnkî tazebûk bûye û cendirmeyên Usmaniyan bi sungê hûrgê wê dirandine!)) (Helkişan Berew Lûtke: 218 – 219).

Diyarîkirina wan nizirgehan û kar û kiryarên wan ji aliyê romannivîs ve, nîşana wê ye ku romannivîs, hemû ew bîr û baweriyên ku li ser wan hebûye, weke kultura civakê tomar kiriye. Her çiqas ku bi xwe jî bawerî bi wan karan nebûye, û bi tiştên pûç û vala zanîne. Eva jî ji zarê (Tofîq)ê karakterê serekî di guftigoyek bi (Xate) ya hevsera wî de derdikeve. ((Tirane û henek û micêzê min ji wan gotinên pûç dihat, lê Xate berevaniyê lê dike: (Mêro, tu bo hinde bêbawer î?) Min jî bi tûrebûnek kêr ve, bersiv dida (Bo, wa nine? salê çend pas û loriyan dibine ser Omermendana! Ji Hewlêr, Pirdê û Batas ve nahêne ser Omermendana? Nahên bo Okaşe? Bo Îmam Qasim...? Çiqas jinên nezok (stewr) rû ji ocaxa riya (Leylan) dikin! Xwe bi sedan pas ji başûr ve tîn bo Zeynelabidînê nizîk ji (Daqûq)ê û bi şev jî li wir dimînin! Ey cixiza Îmam Ebas! Yê/a ku li wir bi derew sondê bixwe, goc û gurrî dibe! Serê xwe lind nake wusa tê ser, de bêje wa nine!?).

Xate tu tiştê nedîma ku bêje û bin lêvên xwe de digot: (.....ewa edet û tîtalên bav û kalên me ne))) (Helkişan Berew Lûtke: 219).

Lêre de romannivîs asta bawerbixwebûna xelkê bi wan pîr, çak û merqedan nîşan dide, ku bi kom serdana wan gor û mezarên dikin, û daxwaziyên jiyana xwe ji wir dixwazin. Herweha li wir jî dimînin û şeva xwe bi dawî tînin. Helbet ji zarê karakterek wekî (Tofîq) ve romannivîs bîr û hizra xwe li ser wan tiştan aniye ziman û bi pûç û vala hesibandine. Lê ji zarê (Xate) ve, ew kar weke edetek bav û kalan hesibandiye. Eva jî terzek e ji rexnegirtin ji wan edetên paremayî û hewce dike ku bîr guherîn û civak li vê derheqê de bê hişyarkirin.

3.3.5. Kesatîyên olî

Kesatîyên olî li nav xelkê de, pile û payeyek bilind hene û xelk rêzek zêde ji wan digre û ji gotina wan dernakevin û hertim qise û gotinên wan tîn qebûlînin. Ji ber wê ku xelk misilman in, ew jî li nav ola îslamê de xwedî pile û pêgeh in, û li zaf biyavên jiyana de jî rolek baş dilîzin. Lê hin ji şêx, mela û kesatîyên olî, wê rêz û mezinatiya nav xelkê de ji bo berjewendiya kesî a xwe bi kar tînin, û fend û fêlan ji xelkê dikin û dixapînin. Ji ber wê ku, mîrên ayîmî di nav civakê de rolek baş dibînin, nivîskar bi giştî

û romannivîs bi taybetî ewê rolê li nav deqên edebî de cî dikin û rol didin wan, herwekî wê ku li nav civakê de rola xwe hene.

Li romana (Nazê) ya (Îsmâil Rojbeyanî) de, hatiye ku Azad ji riya xeyalan yan filaşbak ve, nostalijî û zarokatiya wî dikeve bîr. Dema ku zarok bûye, li heynê leyîstinê de, Derwêş hatine gund û dibêje ((Dema nanxwarina roja îne bû ku em hemû mijûlê Mûşînê bûn, ji nişkîve dengê duholê hate ber guhê min. Me lîstika xwe betal kir û ber bi çavkaniya deng ve hilatin. Kabrayek teple bi ser ê bejinbilind ê navmilpan li pêşberî xelkê diçû. Ebayek reş li ser cilkên xwe dadabû. Tizbiyek dirêj bi milê çep ê xwe de şor kiribû.

Ewqas nerm û li ser hemdê xwe pêngav dirakirin, te digot qey ku taze zava ye û ji serşokê ve hatiye. Deh pazde kes jî li pişt serê wî dimeşîyan ku hinekan fê girtibûn.

Dîmenek wusa bû ku te digot şoresuwarek hatiye şehîdkirin. Ewên din jî, jinên tax in ku şîn û zariyê bo dikin, lê ma hedê wê hebûn ku pêş mame şêx bikevin!. Xelk ji bo maçkirina destê kabrayê teple li ser, zext û givaşek wusa dikirin ku hinde nedima sukra hevdu bişkînin. Ew çûne mala murîd û peyrewkarek xwe, em jî vegeyriyane ser leyîza xwe. Ewqas nebihorî ku me asin bi nal kirin. Min û yek du ên din, xwe kutaye mala kabrayê murîd, daku bizanîn mame şêx û peyrewkarên wî çi dikin. Li odeyek giştî de, li ser mafûrê taze, pala xwe dabû berpâlê. Min dît ku kabrayek hat û ji dûr ve rahişte destê wî û kurnoj jêre bir. Dema ku destûra rabûnê jê wergirt, pişt û pişt paşde vegeyriya, ku hinde nemabû sê çar kesan pêpes bike.

Mame şêx, ketkete dinikên tizbiyên destê xwe de vedidan. Xuya bû ku deskevtên wê seferê dihejmartin. Hêdî hêdî lêvên xwe jî dibizivandin bona wê ku li cem murîdan bi xwedaperestî bê hejmartin. Kê nabêje wî digot: Pênc qeznax li mala Derwêş Elî, şeş li mala Derwêş Hesên, du hoqe rûn li mala Necîm Mene, Gîskek li mala Şasuwar..du Hirî li mala ... Xwediyê malê gîskek serjê kiribû û li mencela sawar kelandinê de, hinek av berdabûne ser. Ger şaş nebim, yek du çelp birincê sor jî ser de kiribûn. Jinek din, ji wî alî ve her dengê ciz û biz û sise sisa wê dihat. Me çav birîbû wan, ku pirtikek goşt yan her nebît tasikek tirîta şorbeyê danên pêşiya me. Ji derwêşan

re şorbeyek zêde danîn, mame şêx jî berbibûye canê goştê sorkirî û em jî bi ahîn û keser ve derkirin))(Nazê: (86- 87- 88).

Romannivîs dixwaze ji riya filaşbakê ve ku Azad hizir ji zarokatiya xwe dike, wê dîmenê ji me re bas dike. Dibêje şêx û derwêş hatine gundê wan, û şêxê berjewendîxwaz li pêxema qazancên xwe de, çawa xelk xapandî ye û xelk neçar kiriye ku xwarinên baş jêre amade bikin, diyariyên binirx jêre bînin, û ew û derwêşn xwe jî, her mijûlê xwarina risqên xweş bûn. Wê demê xelk kêzanan bûye û şehrezayek baş ji ayînê nebûye, lewma hinek ji kesatî û mêrên oldar, ew kêzananîna xelkê, weke derfet bo berjewendiyên xwe vediguhastin û bi navê dîn ve xwe dewlemend kirin, û berhem û tişt û miştên zaf ji xelkê standin.

Lêre de romannivîs, beşdarîkirina şêx û derwêşan di romanê de bona wê aniye ku beşek bûne ji jiyana sade ya xelkê wê demê, û tomar kiriye, weke dîrok parastiye, û herweha karên xirab ên wan jî, bi awayek rexneyî bas dike. Weke, dema ku nerim nerim pêngavan hildigire, mirov dibêje teze zava ye ku ji serşokê vegeyriyabe. Yan deskevtên xwe bi tizbiyên destê xwe dihejmêre, daku ew jî weke zikr û tahet jêre bihesibînin. Yan, gava ku xwe ji goştê sorkirî xweş kiribû û em jî dixistine derve. Herweha bas ji wê dike ku bavê wî jî, derwêş bûye. Zêdebarê wê ku dema şol û xebatê bûye, û kesekî destkurt û xizan jî bûye, lê şêx daxwaz lêkiribû ku divê seferê de, hevrêtiya wî bike û tiştan kom bikin. Bavê wî jî nekariye gotina şêx ret bike û bi wan re çûye, lê heta ku bavê wî vegeyriyaye, birê wî ku nesax bûye, koça dawiyê kiriye.

Romannivîs cuda ji şêx û derwêşan, bas ji melayekê dike ku xelk, ji bo çareseriyê çûne cem wî. Di wê xeyalê de, dîmena wê rojê dikeve berçav ku tevî dayka xwe çûne ba melayekê ku xwastine duayan ji birayê wî re bike ((Pereyê mirîşka xwe xistibû berîka êlegê kevn û pizirî ê xwe..Daxwaz ji jina cîranê me kir ku pêre biçê cem melayê gundê wêdayî me. Bi vê meremê ku dibêjin dewziman û nifûsa wî başe, belkî duayek ji zarokê wê dike. Ez jî bi girîn û lawahî ve bi dû wan ketim. Neçar man ku min jî bi xwe re bibin. Birayê mezin ê me jî, li cem nesax ma. Diya min ji mela re got: Mamosta, qurbana te bim, duayekê bo kurê biçûk ê min bixwîne. Bi xwedê halê wî zor şirr e. Duaya başan bît. Kaxezek deranî û çend xetxetok kişandin, û rû ji dayka min kir:

Keça min, lêdane!. Vê duayê ji mom hilkêşe û ser milê wî yê rastê bide. Înşala dê baş bît. Wê jî destê xwe bire berîka êlegê xwe, û pere derxist, û li bin balgiyê mela danî.

Dayê!.. bavê min.. sibe vedigere.. Nîveşevê ji ber dengê girî û lorîna dayka xwe, em şiyar bûn. Birê min jê pirsî: Dayê eve çiyê? Qur çû serê we, birayê we mir)) (Nazê: 90 – 91).

Lêre de romannivîs dixwaze vê bîne bîra me ku xelkek zêde bawerî bi nivîştîyên wan kesatîyên olî hebûne. Herweha zaf carî li cihê nojdar û pizîşk û derman û çareserê, pişt bi wan nivîştîyan girêdidan, ku hinek melayan, ji bo peydakirina pere, nivîştî çêkirine. Duayek jêre nivîsandine û gotine dê baş be. Helbet hingê melayên baş û xirab jî hebûne. Ev çanda nivîştî û duakirinê li nav kurdan de baw bûye û nemaze heta niha jî li ba hin kesan, weke çareser tê dîtin û ji hinek melayên berjewendîxwaz û şêxên xweperest re bûye bi jêder û çavkaniyek baş ya xwe dewlemendkirinê. Weke diya Azad ku herçiqas pere hebûye, xistiye bin balgî yan doşega mela. Helbet eva ji kêmzanîn û kêmşiyariya xelkê ye ku wusa kiriye xelk ji nesaxiyê re, pişt bi dua û nivîştîyan girê bidin. Helbet kesatîyên olî ew nezanîna, weke derfet bo xwe dewlemendkirinê zanîne.

Di romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, cuda ji kesatîyên olî û mesebî, terîqetan jî komek rê û resmên taybet bi xwe hene. Her ji ber wê ye ku li janra romanê de bûye bi cihê hizrîn û têramînê, û cihê xwe vekiriye. Li romana Kordere de, basa hin ji wan merasîmên olî dike ku şîemeseban li hin mehan de, peyrewiyê lê dîkin. Pitira wan merasîman, şîn û girîn e. Hinek sirût û biserhatan vedigêrin û bi kors digrîn. Diyarê ku ew girîn jî, li nav hinek xelkê hejar de bûye bi beşek ji jiyana wan û weke kulturekê lêhatiye, û mezin û biçûk divê peyrewiyê lê bikin. Romannivîs ji zarê Ekber ve vedigêre ku: Ew zarok bûne û li dema sirût xwendin, civîn û rojên taziyê de, diviya em bigrîn ((Giryan bibû bi beşek ji şevên jiyana me.. Li meha Muheremê de, em tazîdar bûn..Îca ma kengê em tazîdar nebûne..Li cejnan de jî her digiriyan.

Carna Riza û Zeman hor hor digiriyan, bi taybetî li wan demên ku rewşa wan li qutabxaneyê de baş nedibû. Bavê min, bi çavek sorbûyî weke xwînê, digirniyiye min û digot: Tu bo nagrî hey tixmê pîs? Min di dilê xwe de digot: Xwe ez Riza û Zeman ninim ku li qutabxaneyê de baş nebim û li heyfa wê de bigrîm. Xal Sêfula dihate

nabeynê û digot: Bêguman li hizra (Sîm Nimas) de ye. Sîm, giryan ji bîra xelkê biriye. Ji Îmam Zeman re dibêjin ku kerê Decal tê, eger bêt jî, her wekî wê dema niha ye ku em têde ne. Li nav pirtûka “Musîbet name” de, zêde basa Hezretê Hisên dike.. Dema ku xal Remezan navê Hezretê Hisên dianî, min hêvî dixwastin ku bi şîmşîra rût bi hawara wî re biçim. Giryan pir zû mirov mandî dike. Xwe giryana me danek û du danan nebû, em têr digiryan heta ku dikirixîn.. îca dirazan.. Bavê min, carna di xewê de jî digiriya)) (Kordere: 20-21).

Romannivîs dîmenek ayînî a şîe meseban nîşanî me dide ku çawa tesîr û bandor ji zarokan kiriye û wusa kiriye ku bi zor, ew jî bigrîn. Xuya ye ku sirût û bûyerên bixwîn ên derbasbûya mesebê wan, tesîr jê kiriye, û şev û roj bi giryan, niz û lawahiyan ve mijûl dikirin. Dil û derûna wan, tejî tirs û dilkutokê kiriye. Eva jî nîşana wê ye ku bi giştî xelkê baweriyek zêde bi meseb û terîqetê hene, peyrewiyê lê dikin, û kirine bi kulturek û zarokên xwe jî gor wê, dielimîni

3.3.6. Cejn

Cejn rêûresmek olî yan netewî ye ku zaf cureyên wê hene. Lê cejn, ew roja xweş e ku dilê xelkê bi giştî xweş e û hest bi xweşî û şadiyek zaf dikin, û bi awayên curbicur keyfxweşiya xwe tînin ziman. Li nava kurdan de, him cejnên olî û him jî cejnên netewî cihê pûte û girîngîpêdanê ne.

Romannivîs di romanên xwe de girîngiyek zêde bi vê boneyê dane û kirine bi bûyer û matiryala nava romanên. Cejn di zaf cihan de, alîkar e ji tewawkirina bûyerên nav romanê de. Baskirin ji çawaniya wê kultur û deb û edetên ku li nav romanên de bi ser xelkê tînin û xelk li wê rojê de, cejna xwe pîroz radigrin û xweşiyên xwe nîşan didin.

Di romana (Tole) ya (Mihemed Mokrî) de, ji zarê Mistefa ve vedigêre ku bi babê xwe re sil e û nikare pêre bi axive, lê hez dike pêre aşt bibe, lê nizane çawa û bi çi awayî wî karî bike. Lewre rojek weke cejnê bi derfet dizane daku biçê mala bavê xwe ((Li gor hemû hesabek mirovî, diviya kerbê min ji babê min vebibe û bi tu awayî wekî mirov nas nekim. Lê kerbê min ji zirdayka min nevedibû, li cihê wê kerb û kînê, guneha min lê dihat. Zaf carî û bi taybetî li cejnên de, min ji dil diviya biçme mala bavê xwe.

Min zêde digote xwe ku here. Şevan min biryar dida, lê sibêdeyan poşman dibûm, ditirsiyam û nedîçûme mala wî, neku min bike derve. Lewre her ji dût ve min ji derî dinihêrî û bes))(Mihemed Mukrî: 9).

Romannivîs bas ji wê kerb û tûrebûnê dike ku li navbera bab û kur de heye, û serbarê wê ku kur ji malê hatiye derkirin, lê dîsan çavê wî her ji mala bab û jinbaba wî ye, û dixwaze roja cejnê bike hêcet, bona wê ku bi wan re pêk bê. Çûnkî him weke ol yan deb û edetekê lê hatiye. Yê ku ji hev aciz û sil in, yan nerihetî û nexweşiyek di navbera wan de çêbibe, li roja cejnê de li hev tên, diçine mala hev û roja cejnê, bi roj û xêrek mezin dizanin. Piraniya caran, xelk bi dost û neyaran, serdana hevdu dikin û serxatirê wê rojan mezin ji hev xweş dibin. Lewre romannivîs, roja cejnê diyarî kiriye daku vegere mala bavê xwe, heta ku der nekin. Lê Mistefa hêj bi guman e û serhişkiya babê xwe dinase û nevêre biçe, lewma her ji dût ve, çav ji deriyê malbaba xwe dike.

Di romana (Kordere) Ya (Xusro Caf) de, yek ji wan kulturên ku xelk berî cejnê amadekariyê jêre dikin, ew e ku xelk mijûlê kîrîna tişt û miştên nû bo malê, cilkirîn bo xwe û zarokên xwe û paqijkirina malê ...htd dibin. Êdî bi giştî xelk, jiyaneke nû bi boneya cejnê dest pê dikin. Li vê derheqê de xelk bi giştî mijûlê bazar, kîrîna cilikan û amadekirina xwarinên xweş in ji cejnê re. Romannivîs bas ji xweberhevkirina malên hejar bo cejnê dike, lewre ji zarê Ekber ve bas ji wan dexilkan dike ku bi armanca pere komkirinê, li mal de danîne û li ser û bendê cejnan de, kincên cejnê ji xwe pê bikrin û dibêje ((Bavê min, dema ku dizanî cejn nîzîk dibe.. Her yek ji me dexilk dibire ber guhê wî û dihejand, û me jêre digot: Hinde nemaye, tejtî dibe!! Kûpik yan dexilk, ya me bi xwe nebû, me tevan pere dikire nav de û bihevre cilkên cejnê bo yekê dikrî. Merca kirîne, pînaxwarina zêde ya ser cilkên me bû. Her kesê/a pîneyên zêdetir bi cilkên wî ve heban, wê cejnê cilik ji wî re dihatin kirîn. Şevê li nav ciyan de, li ser cilkirîne dibû hewar hewara me.

Riza digot:

- Zeman îsal dora min e ha...?

Zeman bi lawahî û rica ve digot:

Zeman dora min e... ha?

Digot: Ezîzê min, par jî her bo te kirîn.. Meger ji bîra te çûye.. Îsal dora min e...!! Ger dibêjî wusa nine, keremke were em pîneyên xwe bihejmêrin..Me dest bi pîne jimartinê dikir. Cilkên Zeman weke cergê Zulêxayê lê hatibû, ewqas kun kunî û pînekirî bûn. Lê Riza, nediselimand û ne jî dipejirand. Dibû şerê wan, dadê dihate berevaniya wan.. Bavê me jî her li ser lihêfê, hinek digihandine me...)(Kordere: 40-41).

Lêrede romannivîs bas ji malên hejar dike ku zarokên wan li rojên berî cejnê û amadekariyê roja cejnê de çiqas perîşan û di hesreta kirîna cilkên nû li ser hesaba dexilkan, xembar û bi êş û azar bûne. Xuya ye ku dexilk jî têra hemûyan nake û bûye bo dewreyî, kê pîneyên zêdetir bi cilikan ve hebin, dora kirîna bo wî ye. Dixwaze wê yekê nîşan bide ku cejn ji hejar û belengazan re, her xem û keser e, her bi nav cejn e, nexa ew jî, xem û azarek nû ye bi şêwazek din.

Di romana (Helkişan Berew Lûtke) ya (Ebdula Serac) de, romannivîs îşare bi cejna netewî ya Newrozê û rê û cihên wê kiriye, bi taybetî ku amaje bi hilkirina agirê vê cejnê di bajarê Kerkûkê de dike. Ew agirê mezin ku li taxan de dihatin teyîsandin. Di wê serdemê de, ew agir bi tekerên tirombêlan hil dikirin. Lewre bas ji (Newzad)ê karakter dike. Jiberku ew bi xwe pençerçî bûye, hertim di mala xwe de teker (taye) kom kirine ((Pêçkeya tirombêlekê li pêşiya derî ve, pal bi dîwar ve dabû, Newzad anîbû û dixwast hejmarek din ji wan pêçkeyan ji newroza dahatî re kom bike. Bi terzekê ku agirê wî, li taxa (Seyîd Serwer) de deng vede û herweha ji agirên (Ber Tekiye) û (Sey Muncux) û (Axir Husên) jî bilindtir û geştir bû)) (Helkişan Berew Lûtke: 37).

Piştî îşare bi heman merasîma Newrozê dike û şanaziyê bi ew agirê mezin dike ku li wê rojê de hilkiribû ((Newroza derbasbûyî, min çend tekerên tirombêlan şevitandin. Gurrî û peşqela agirê me, ji hemû agirên din geştir û zêdetir bû. Dûkela wê esman nixavtibû, hey newroz bû hey! Îsal agirê newrozê jî nebe, li ser wan gir û tepolagn be jî, dê her hil bikin)) (Helkişan Berew Lûtke).

3.4.Rengvedana Çanda Kurdî Di Nav Wêjeya Kurdî De

3.4.1. Rengvedana kultura kurdî li wêjeya nivîskî de

Piştî serhildana wêjeya nivîskî, xelkê û nivîskarên bi giştî dest dane nivîsîna janrên wêjeyê û li naveroka wêjeya xwe de, sûd ji fulkilor û kultura kurdî wergirtin. Ew kirin bi hêvîyê janrên wêjeyî, û nivîsên edebî pê dewlemend kirin. Roman jî yek ji wan janran e ku li serdemên cuda de girîngiyek zêde bi deb û edetên kurdî daye.

Li romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, bas ji yek ji wan deman dike ku bavê Ekber ji zarê wî bi xwe basa wê dike ku: Li şevan de bavê wî helbestên Baba Tahir Hemedanî xwendine. Çûnkî yek ji janrên wêjeya kurdî, helbest e. Herweha yek ji edebên nivîskî ên gelê kurd û di nava kurdan de jî, çarînên Baba Tahir in ku cihê pûyte û girîngîdanê ne. çûnkî, gelê kurd wan helbestan, bi destpêka nivîsîna wêjeya kurdî bi giştî û helbestan bi taybetî dizane. Naveroka helbestên wî bi piranî sofîgerî ne û bi zaraweya lorî hatine nivîsandin. Lor yek ji eşîrên kurd in. Ziman jî beşek girîng e ji kultur û çanda netewê. Lewre Ekber dibêje ((Babê min şevane şêrên Baba Tahirê Uryan dixwendin. Riza li ser Uryan ji bavê min dipirsî... Li rastî de babê min nedikarî jêre rohn bike û tê bigihijîne)).(Kordere: 44).

Baskirina Baba Tahirê Uryan di nav romanê de, weke wêjeyek nivîskî, helbestên wî biha û girîngiyek zêde hene û helbestên wî di nava civaka kurdî de hertim rolek girîng dîtine û cihê pûtepêdanê bûne. Xelkê li destpêkê de, ji wêjeya nivîskî re nasiyarî û şehrezayî di nivîsandina helbestê de peyda kirin.

Herweha romannivîs li cihek din de pişikdariyê bi wêjeya nivîskî dike, bi taybetî helbesta kilasîk, ku bas ji wê demê dike ku gelên Îraqê serhildana çardê Temûzê encam dan. Ekber jî ku karakterê serekî ê romanê ye, hingê li derveyê welat dibe û dibêje: Li xeyala xwe de, ew dêre helbesta Nalî gihaye hizra wî, ku dibêje:

Her çende ke rûtim bexwa maylî rûtim

Bê bergê ye îllet ke hetîw meylî hetawe

Bê faydeye menû min êsta ke le giryan

Meilûme ke agir sebebî coşîşî ave. (Kordere: 218).

Bi mînakwergirtina şêira Nalî ê helbestvan û pişikdarîkirina di romanê de, cihê pûyte û girîngîpêdanê ye û xelkê, girîngiyek zêde bi helbestê daye û di zaf deman de, bikar anîne û pişt bi naveroka helbestên kilasîk girêdaye.

3.4.2. Rengvedana kulturê di wêjeya fulkilorî kurdî de

Wêjeya fulkilorê rolek mezin di nava janrên romanê de heye û cihê pêzanîna romannivîsan bûye. Tevî peydabûna janra romanê, romannivîsan jî li vê biyavê de xemsarî nekirine û di nava romanên xwe de, bo zaf mereman, wêjeya fulkilorê bi kar anîne û sûdek zaf jê wergirtine.

Di romana (Malava Gulî Xem) ya (Hîmdad Hisên) li çend cihan de wêjeya fulkilorê bikar aniye û bo çend mereman, romana xwe pê dewlemend kiriye ((Ku gihîştîme sala çarê ya amadeyî, baxoş bibûm û weke jin dibêjin (simbêlên min gûgire bibûn), rojên îne qutabxane nebû, qutabiyên din bêhna xwe vedidan, diçûne derwe yan her çi nekiriban, hetmen çavek bi ser waneyên xwe de dixişikandin. Lê diviya ez berbanga sibê rabibam û riya meydana kedkaran bigirme ber xwe, heta ku hostayek li wê rojê de min weke berhosta bi xwe re bibe û karek dest min bikeve. Xanim jî ji reng, gulav û gulên cuwan dipirse!! Raste dibêjin: Zikê têr, hay ji zikê birsî nine))(Malava Gulî Xem: 22- 23).

Lêre de romannivîs penda kurdî bikar aniye daku zûtir armanca xwe bigihîjîne û zelaltir bike ku ciyawaziyên çîneyetî ên zaf li navbera kurik û keçikê de hene. Herweha ciyawazî li şewaz û çawaniya jiyankirina wan de heye. Keçik li ewperê jiyaxweşiyê û kurik jî li ewperê hejarî û xizaniyê de. Ew pend jî pitir bo rohnkirina mijarê ye ku kesên têr, hay ji kesên birsî ninin. Zaf carî li nav xelkê de jî ew gotin û pend tên bikarbirin ku merem, zelalkirina zêde û gihandina peyamê ye û xelk baştir baweriyê pê tînin û weke belgehînanê ye ji mebesta xwe re.

Herweha li cihek din ya romanê de, dibêje ((Heta odeya me jî ecêb bû, selîqeyên curbicur û bîr û hizrên cuda, weke wê ku dibêjin: Her yekê li aşekê lê dikir. Lê tevî wê jî, peywendiyên me li ser bingeha rêz û evîndariyê bûn. Em pir bi kêmî ji hevdu aciz

dibûn, ez ku her na, belkî piraniya caran, Dilşad û Dana li ser fikra xwe rêk nedikevtin û daniyên wan bi hev re nedikeliyan)) (Malava Gulî Xem: 34).

Bi heman awayî, bikaranîna wan pend û gotinan, ji bo gihandina merema xwe bi zelalî ye ku ji zarê Dilêr ve basa beşa navxweyî a xwe dike. Ew eşkere dike ku çawa û bi çi awayî li beşa navxweyî de bi hevalên xwe re derbas kirine. Kesatiyên çawa hebûne, kesên ciyawaz li wir hebûne ku bîr û hizrên cuda hebûne û her yekê bi terzekê hajotiye, yan daniyên wan bi hev re nekeliyane. Wate bi hev re teba û guncaw nebûne, lê jiyana li beşa navxweyî de, neçarî bûye.

Herweha di romanê de, Dilêr basa wê ger û sefera xweş dike ku bi Felestîniyan re çûne Mûsilê û gera wan pir xweş bûye û tu carî, ji bîr nake. Bi taybetî ku li wir jê xwastine ku heyranekê bibêje. Wî jî ev heyrane gotiye:

Ewce kur deygo...

Lezûrî, lezûrî (serbenê)

Tadar nîme, tatawim lê desnê

Her ke zeynê xom dedawe

Kewek ewa dexînî, bedem (Musrê)

Pişt le kawle Hewlêrê

Ewsar bewê buwarî, emin duayekî dekem

Ya (Sultan Ewlay Arebî)

Marê babê nazdar heyranê lewê barke

Bêtewe cîranê me bêxî

Ewca kîj deygo...

Lezûrî, lezûrî (serbenê)

Tadar nîme, tatawim lê desenê

Her ke zeynê xom dedawe

Ke wek ewa dexînî, bedem (Musrê)

Pişt le kawle Hewlêrê

Ewsar bewê buwarê, emin duayekî dekem

Ya (Sultan Ewla Arebî)

Marê babê nazdar heyranê lewê barke

Bêtewe cîranê mebêxê

Ewca kij deygo...

Xwa bîkirdiba ewsar bewê buwarê

Emin bibumaye goparekî darî darkinêr

Le destî korefîme heyranê xom

Hemûdanê sibeynan û danî êwaran

Pê bilewerandibayewe kar û bexê xoy

(Nawela) xwa bîkirdiba emin qurbanî

Gurînge tezbêhekey kure heyranê xom bim

Wekû hemû demê deygêrêtewe le destî xoy (Malava Gulî Xem: 61- 62).

Gotina heyranê ji aliyê kure Hewlêriyekê, merema romannivîs eşkere dike, ku heyran li deşta Hewlêrê zêde ye û morka wê deverê pêre diyar e. Herweha xelkek zaf hez ji vê terze strana fulkilorî dikin û li demên xweşî û dîwanxane û bezman de dibêjin. Hin caran li dema nexweşiyê de jî dibêjin û pitir wesfa nazdar heyranê dike. Lêre de ji zarê Dilêr ve ku kurek Hewlêrî ye, bas ji demên xwe ên xweş dike û gerr û geşta wî bo aliyê Mûsilê, jêre bûye bîreweriyek xweş. Herweha li naveroka heyrana xwe de bas ji hinek kar, pîşe û kultura kurdî dike weke şivanetî, berx, kopal, tizbî, mal veguhastin, sûndxwarin bi şêx û mişayixan û herweha nawanîna bajarê Mûsil û Hewlêrê di heyranê de, hemû beşek in ji kultura kurdî. Renge romannivîs ji ber wê ew bikaranîbin ku ji jinavçûnê rizgar bike û li nav janra romanê de, carek din dabirêjît, û xelk bi wê wêjeya fulkilorî re nasiyar bike, û pitir bibe cihê pûte û girînîdana xelkê.

Di romana (Nazê) ya (Îsmâîl Rojbeyanî) de, girîngiyek zêde bi aliyê fulkilorî hatiye dayîn û li zaf cihan de, bo gihandina merema xwe bi ronî û parastina hinek pendên kurdî, gotinên kurdî bikar anîne. Dema ku mamosta Azad tê zîndanîkirin û bavê Azad bi vê yekê dihesse, tevî jina wî diaxive û babê wî dibêje ((Ax Azad, sed caran min gote te kurê min, dest bigre bi kilawê xwe re, daku ba nebe. Xwedê pirtiyek nan daye, tu jî bizanî bixwey.. Ma çi karê te bi wan gend û gûyan ketiye, kuro ger tu jinxwaz bûyî, te bigota min)) (Nazê: 38).

Li anîna wê gotina kurdî de, armanca wî ew e ku pêştir çend caran şîreta Azad kiriye û jêre gotiye ku karê te bi kesî re neketibe. Herweha pirsgirêkan ji me re neafirîne, tenê haydarê xwe be, çima pirobleman ji xwe û ji me re pêk tînî. Ew pend û gotin li nav kurdan de zaf baw e, û bo zaf meremên din jî tê bikar tê. Wate li wan deman de, ew pend tê gotin ku kesek, tenê haydarê xwe be û zêde têkel bi pirsgirêkên xelkê nebe.

Herweha romannivîs dixwaze dîmena wê zibare, û kar û xebatên gund, bezmên kur û keçan, û stranên fulkilorî tomar bike û bûyerên wî karî bîne berçavan û weke filmekê nîşanî me bide. Dema ku Azad li cihê cîranê xwe ku nexweş e, li ser piştta guhdirêj, nan û ratibê ji wan kesan re dibe ku mijûlê dirûnê ne ((Pênc dirûnekarên mêr û sê jî, jin bûn. Yek ji jinan, keçek bû ku taze baxoşî dibû. Heta ku dil bixwaze, ciwan û nazdar bû. Sûmetên wê ewqas nazik û turt bûn ku te digot perê kaxezê ye û germiya rojê, şewitandibû û kevil dabû. Navê wî dirûnekarî (Heme Kerîm) bû. Xortek esmer ê navmilpan û tiranneker bû. Heta ku bibêjî, çeleng bû. Ji ber wê çelengiyê kiribûne serpaleyê xwe. Yekê jê pirsî: Ey Eze kanê, çima wî zarokî ratib aniye? Wî jî bersiv da: Nexweş e. serpale ji wan re got: Ev aliye, bekreyî ye, hemûyan rizameniya xwe nîşan dan û gotin: Başê. Min jî biryar da heta ku ew ji wî berî xilas nebin, venegerim malê. Serpale berê xwe nîşan kir û hemû bihevre daketinê û yalla stran:

Serpale:

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirîw tayekim gum kirdûwe

Kors:

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirêwe tayekim gum kirdûwe

Serpale:

Entîke û wurd û merde

Elêy Birnewî kurde

Bo maçî lêvî allî

Dilim pirî le derde

Kors:

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirrêwe tayekim gum kirdûwe

Li navbera kur û keçê de, dirûnekarek hebû, kurik xwast tiştek wusa bibêje heta ku keçik têbigihîje û ciyê xwe tevî kabira biguherîne.

Serpale:

Kiçê were em bemlawe

Cergim bo to sûtawe

Şanê bide le şanim

Ewsa ba derçê giyanim

Kors:

Çexmax lêde çirakem helnekirdûwe

Solim bo yar kirrêwe tayekim gum kirdûwe

Piştî xwe rast nekirin, heta ku berê xwe xilas kirin. Her yekê Dasika xwe girte destê xwe û ber bi xîwetê ve, ketine rê. Dîsan nan û doyek kêr xwarin, vêca dest bi tîjkirina dasikên xwe kirin. Jin jî li ber sîbera aliyê din ê çadirê (kon) mijûlî nan û do

xwarinê bûn. Dasikên xwe bi riya min re bo mêran şandin daku ji wan re tîj bikin. Her çav çavanêya kurik bû. Ger kesek jê diyar nebûya, kestegek digirte keçikê. Wê jî çavek jêre diniqand û bizyek tîna ser lêvên xwe. Ewqas nekêşa ku hemû rabûn ser xwe û rû ji genim kirin. Ez jî suwarê guhrêj bûm û vegeriyam))(Nazê: 104-105-106).

Romannivîs bas ji wan kar û jiyânê dike ku wê demê hebûye. Wate, berî peydabûna teknolojiya yan destneketina teknolojiya û hevkarîkirina xelkê ji karên giran, û ew bûyerên ku li wan terze karan de rû didin, xistiye ber bas. weke ew stranên fulkilorî ku li dema karkirî de digotin, bona wê ku tevî strangotin, hêzê bidine ber xwe û bizavên xwe bihevre rêk bixin. Herweha dilê keç û kuran xweş bikin, ku ew jî mijûlê bezmên xwe ne û evîndarî û eşqa xwe û azayetî û bivêriyê ji hevdu re nîşan didin. Herweha bûye sedema parastina ew strana fulkilorî ku li wê dema karkirî de dihate gotin. kultura hevkarî, terzê hejêkirinê û şeweya derbirîna dildariya wê demê, û bezma keç û kuran tomar dike û nahêle ku ji nav biçin, û weke erşîv parastine.

Di romana (Koçû Sûr) ya (Heme Kerîm Arif) de, romannivîs yek ji wan bûyeran ji me re vedigerîne, dema ku xelkê gund li dû karwan digerin û şev bi ser wan de tê, û wan sar dibe. Lewma ji bo vehesiyên û xwegermkirinê, dixwazin agirekê biteyîsînin. Her yek ji wan ber bi aliyekê ve diçe daku kolik, gunî û ardûyê kom bikin û agir hil bikin. Li dema hilkirina agir û kombûna wan li dewra agir de, bihevre ew strana fulkilorî gotine:

Agire girey xomane, naydeyn be kiçe bêgane

Agir mîwey zistane, sawar alîkê mêran e. (Koçû Sûr: 162).

Lêre de romannivîs vê yekê dide eyanê ku kurd ji her tiştî û ji her demê (xweşî û nexweşiyên de) stranên dibêje û bi ser her tiştê re dibêjin, bi taybet bo ramkirina derdora xwe. Her ji ber wê ye ku wê strana fulkilorî tîne ku di şikewtan de bo agir gotine û li dewra agir de kom bûne.

Di romana (Kordere) ya (Xusro Caf) de, çîrok û efsane yek ji berhemên herî kevnar ên wêjeya fulkilor in ku dem bi dem ji bab ve bo neviyan maye. Li wêjeya nivîskî de jî, girîngiyek zêde pê hatiye dayîn. Herweha li janra romanê de jî, bûye cihê

girîngîdanê. Lewma li romana Kordere ya Xusro Caf de, ji zarê Ekber ve bas ji dayka xwe dike ku çawa li şevan de, çîrok û efsaneyên xweş ji wan re vedigêrandine ku ji xwarin û sînemê jî xweştir û bitamtir bûn ((Dayîka we bimre, êdî kê çîrokên wusa bi tam û xweş bo me vegêre. Şevan ku çîrok ji me re vedigêrandin. Riza digot: Ey Xwedê, ew çîrokên dadê çiqas xweş û bi tam in.. Li cem min hezar qatî xweştir ji genmeşamî û kakile gûz û acîlên nava sînemê de xweştir in..Kuro bi Quran, ji sînemê bi xwe jî xweştir in. Dadê dastana kure keçel û Ejdeha ji me re vedigêrand ku çawa kure keçel, Ejdehayê dikuje û xelkek zaf rizgar dike.. Axir Ejdeha, pêşiya ava bajêr girtibû. Diviya her rojê, ciwanek jêre biriban û bikirana xorek û xwariba, Ejdeha jî wê demê, hinekê xwe dibiziwand û pêşiya avê, hinekê vedibû. Dayîka me, tam şekir e, xwedaya tu tama vê şekirê, tucar ji me nestîne)) (Kordere: 70).

Berê, xelkê bi giştî û bi taybetî malên hejar, ewqas şehrezayî û nasiyarî bi kahreb, televîzyon û radyonê re nebûn, lewre piraniya deman, bi taybet li şevên zivistanê de ku pir dirêj bûn, dayk û baban çîrokên fulkilorî û dastan ji zarokan re digotin heta ku xew ji wan diket. Helbet zarokan jî, ew dastan û çîrok pê xweş bûn û sûd jê dîtine û bûye bi beşek ji rewşenbîriya wan û li hiş û bîrdanka wan de maye. Herweha wê demê, piraniya xelkê, hinek çîrok û dastanên fulkilorî zanîne ku pişt bi pişt hatine û bi zar bo hevdu vegerandine, lewma wan jî ji zarokên xwe re vegêrandine û dilxweş kirine.

ENCAM

Em li dema lêkolîna xwe de gihîştin çend encaman ku bi kurtî, emê li çend xalan de bas bikin:

1. Kultur û civak li nav deqa romanê de, girîngiyek taybetî hene û baş û xirabiyên kulturê li nav deqa romanê de, rola xwe dibînin.

2. Romannivîs weke beşek ji civakê û desteyeke ji rewşenbîrên civakê ku nizîk in ji deb û edet û kulturê, heman çand û edetên ku ji riya nivîsînên xwe ve ji xelkê re bas dikin, aliyê baş û xirab ên wê zelal dikin, daku xelk baştir bibîne û jê têbigihîje.

3. Nivîskar bi giştî û romannivîs bi taybetî, weke kesatiyên neveqetiyayî ji civakê û haydar ji warên jiyana rojane ya xelkê, kultur û urf û edetên xelkê, di nava nivîs û romanên wan de cihê pûte û girîngîdanê ne û bi başî li nav de reng vedane.

4. Kultur û deb û edet li nava kurdan de, wusa reh û rîşalên xwe dakufîne ku nivîskar û romannivîs neçar in wan deb û nerîtan, bikin bi matiryala sereke ya nivîsînên xwe û bi girîngî û buha ve di nav deqên edebî de cih jêre vekin.

5. Di nava romanên de, hin ji kulturên kêrhatî û cuwan hatine baskirin û bûne bi beşek ji romanên, û ji wan re cihê pûte û girîngîdanê bûne, lewre rol pê hatiye dayîn, weke zibare (karê herewezi) û hevkarî, xizmatî, sedemên civakî, rêzgirtin û ...htd. Ewane tevde beşek in ji wê kultura cuwan, ku kurd pê tene naskirin. Romannivîs bi girîngî ve bas jê dikin, bi awayek ser û ber li romanê de nirx pê hatiye dayîn û cihê baldariya wêjevan û nivîskaran bûye û di nav romanê de parastine.

6. Hin ji kulturên xirab û namo di nav romanên de hatine baskirin û bi girîngî ve bas ji wan terze deb û edetên xirab hatiye kirin. Romannivîsan li hinek cihan de, weke rexne bas jê kirine û kirine bi beşek ji bûyerên nava romanê û weke kulturek xirab anîne berbas. Weke: jin bi jinî, mezin bi biçûkî, dujmindarî û ...htd ku ji aliyê civakî ve bandorek xirab li pey xwe bi cî dihêlin.

7. Di nava romanên de girîngiyek taybet bi aliyê olî hatiye dayîn. Ji ber ku gelê kurd, neteweyek misilman e, lê hinek karan dike ku renga ji ber nezanî û tenegehîştinê be ji ol, û hinek mîrên oldar jî, ayînê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Koma wan

haletan, bûye sedem ku hinek ji xelkê bi nezanî ji dîn bigihîjin. Herweha bûye sedem ku hin xelk, seyîd, şêx, mela, mezar, gor û îmaman biperistin û baweriyê pê bikin. Herweha bo êş û azar û nesaxiyan jî, pişt pê girê bidin. Hemû ew diyardeyan wusa kiriye ku romannivîs girîngiyek taybet bi ayînê bide û bas ji wan kulturên xirab bike.

8. Romannivîs di berhemên xwe de rola hinek mêrên ayînî, biramezinê gund, û axayan jî di nav xelkê de bi başî dibîne û bûne bi hevkar û hişyarkarê xelkê û pêşrewê wan bo karê baş.

9. Zêdeya karakterên nav romanên de, bijartiyên nav civaka kurdî û girêdayî urf û edet û nerîtên kurdî ne, û bûyerên wusa hene ku bi deb û edetan re diguncin.

10. Girîngiyek zêde bi karên fulkilorî hatiye dayîn û beşek ji berhemên fulkilorî li nav romanên de hizûr hene, ku eva jî vedigere ser girîngiya edeba fulkilorê. Çûnkî wusa xwe daye selimandin ku bibe sedem romannivîs carek din di nava romanên de tomar bikin û bibe sedema parastina edeba fulkilorê.

11. Hinek ji qonaxên dîrokî bûne bi pêkhînerê romanên û çawaniya jiyankirina xelkê, kultur û deb û edetên xelkê li qonaxên cuda cuda de tomar kirine û beşek ji wan dide xuya kirin.

12. Li nav deqa romanên de zelal dibe ku hinek diyardeyên kulturî û deb û edet hene ku hewce dike girîngiyê pê bidin û şanaziyê pê bikin, û herweha hin deb û edet jî hene ku hewce dike dev jê bê berdand û xelk xwe jê dûr bigrin, çûnkî bi civak û serdema nû re, li hev nahên.

ÇAVKANÎ

Biros Kuhîn, *seretayek bo komelnasî*, W: Hêmin Şerîf, xaney çap û bilawkirdinewey Çuwarçira. Silêmanî – Kurdistanî Îraq, 2010.

D. Ebdula Xefûr, *Ento dêmografîyay başûrî Kurdistan*, çapxaney wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2006.

D. Ehmed Ebû Zeyd, *be siyaset kirdinî kultur*, w. Tahir Usman, heftenamey Hizr û huner, jimare 36, Heynî 1.3.2013.

D. Elî Werdî, *Tuwêjîneweyek derbarey surûştî komelî îraq*, w: Xebat Mehmûd Fetah, çapî Tîşk.

D. Haşim Ehmedzade, *Roman û Nasname*, (ferheng) heftenamey ferhengî Hewlêr, jimare 3) Eylûlî 2009.

D. Hîmdad Hisên, *Malava Gulî Xem*, çapxane û ofêsî Sîma, çapî duhem, 2004.

D. Îdrîs Ebdula, *edebî millî û fulkilorî*, çapxaney hacî Haşim, çapî duhem, Hewlêr, 2014.

D. Îdrîs Ebdula, *Edebî millî û fulkilorî*, çapxaney Hacî Haşim, çapî sêyem, Hewlêr, 2014.

D. Îzedîn Mistefa Resûl, *edebî fulkilorî kurdî*, çapxaney dezgay Aras, çapî sêyem, Hewlêr, 2010.

D. Marif Xeznedar, *Mêjûy edebî kurdî*, çapxaney Aras, çapî duhem, bergî duhem, Hewlêr, 2010.

D. Menûçêhr Muhsin, *Derwazekanî komelnasî*, wergêranî: Rêbwar Sêweylî, Muslih Îrwanî, Murad Hekîm, Dara Subhan, Ebûbekir Elî, Dilşad heme, Tehsîn Teha, çapxaney wezaretî Perwerde, çapî yekem, Hewlêr 2002.

D. Mihemed Şuwanî, *derbarey çemkî kultur*, <https://shwany.blogspot.com> 2016

D. Mihemed Şuwanî, *Entiropolojiyay danîştûwan*, çapxaney Awêr, çapî yekem, 2013.

- D. Mihemed Şuwanî, *Sosyolojyay çîne komelayetiyekan*, çapxaney rojhelat, çapî yekem, Hewlêr, 2012.
- D. Rudan Esmer Meriû, *Tegbîqat fî elsîmiya û elêctimaî lîledeb, etehad elkitab elereb*, Selahedîn 2020.
- D. Şukriye Resûl, *rêgakanî karî meydanî fulkilorî kurdî*, çapî yekem, Hewlêr, 1997.
- D. Umer Êbrahîm Ezîz, *dab û nerîtî jin hênan le kurdewarîda*, çapxaney berêweberayetî çapxaney roşibîrî, çapî yekem, Hewlêr, 2004.
- Daryûş Aşûrî, *çemk û pênamey ferheng (kultur)*, W: Êbrahîm Hesenpûr, çapxaney Mukiriyan, çapî yekem, Hewlêr 2013.
- Dr. Marif Xeznedar, *mêjûy edebî kurdî*, çapxaney dezgay Aras, çapî duhem, bergî yekem, 2010.
- Dr. Resûl Rebanî, *komelnasî şar*, çapxaney rojhelat, çapî yekem, Hewlêr, 2013.
- Duktur Şukriye Resûl Êbrahîm, *edebî fulkilorî kurdî*, çapxaney berêweberayetî çapxaney zankoy selahedîn, beşî duhem, 1984.
- Ebdula Êbrahîmî, *Ferhengî Kawe*, (Farsî – Kurdî) dezgay Aras bo çap û bilawkirdinewe, Hewlêr 2012.
- Ebdula Rehman, *komelge le romanî kurdî da*, têzî duktura, kolêjî perwerde, zankoy Selahedîn 2020.
- Ebdula Serac, *Helkişab Berewe Lûtke*, çapxaney dar elhuriye liltabi'et, Bexdad, 1989.
- Ebdula Silêman Meşxel, *Kulturêkî Qetranî çawerwanman dekat* (çavpêkewtin), paşqoy (Hizr û huner)î rojnameya xebat, jimare (54), heynî 19.7.2013.
- Ebdulrehman Munîf, *Kultur û Mîdya*. W: Şasuwar Kemal Mehmûd, govarî (Aydiya Wala) jimare (29) Teşrînî yekemî 2011.
- Ebdulrezaq Mihemed Mistefa, *geşepêdanî komelayetî le gundekanî herêmî Kurdistan*, zankoy Selahedîn, Hewlêr, 2012.

Edalet Talebanî, *komelayetî û kêşekanî gelî Kurdistan*, çapxaney zankoy selahedîn, Hewlêr, 2002.

Eladîn Secadî, *Kurdewarî*, çapxaney Mearîf, Bexdad, 1974.

Eqliye Ruwandizî, *Rewend û koçerekan be giştî Ertoşiyekan be taybetî*, çapxaney Hacî Haşim, çapî yekem, Hewlêr, 2010.

Erxewan Mihemed Ubêyd, *diyarde kulturiyekan le Mem û Zîn î Ehmed Xanî da*, Fakeltî ziman û zaniste mirovayetiyeke, namey master, sikolî ziman, beşî kurdî, zankoy silêmanî, 2014.

Es'îd Edo, *Kelepûrî kurdewarî*, çapî yekem, Hewlêr 2015.

Ezîz Melay Reş, *Koyxa Sêwê*, çapxaney roşinbîrî û lawan, çapî yekem, Hewlêr, 1986.

Fuad Tahir Sadiq, *huşyarî komelayetî*, çapxaney Tîşk, çapî yekem, Silêmanî 2008.

Fuadî Tahir Sadiq, *roşinbîrîman*, çapî yekem, Silêmanî, 2004.

Hadî Reşîd Elçawuşlî, *Elheyat Elêctimaiyet fî Kurdistan*, metbe'iet Elcahiz, Bexdad, 1970.

Heme Kerîm Arif, *Koçî Sûr*, çapxaney şehîd Seyda Salih Yûsifi, çapî çarem, 2012.

Heme Kerîm Rimçan Hewramî, *govarî Hewlêr*, jimare yek, çapxaney şarevanî, Kerkûk, 1970.

Îbrahîm Ehmed, *Janî Gel*, dezgay çap û bilawkirdewey Aras, çapî pêncem, Hewlêr, 2010.

Îhsan Mihemed, Elhesen, *Enskilopîdyay komelnasî*, w: Dana Mela Hesên, çapxaney dezgay çap û pexşî serdem, çapî yekem, 2012.

Îsmâîl Rojbeyanî, *Nazê*, çapxaney Dar Elîraq lilteb'i û elneşr, Bexda, 1981.

Îsmâîl Tenya, *beserkirdewe*, çapxaney kiştukal, çapî yekem, Hewlêr, 2005.

Kemal Borkay, *Kurd û Kurdistan*, w: Elî Fethî, çapxaney Minare, çapî yekem, Hewlêr 2008.

Keyfî Ehmed Ebdulqadir- Kurdistan Salih Ezîz, *rengdanewey kulturî kurdî le romanî (Giyânî minHatiyewe) y (Belên Toftîq)da*, govarî Zanko bo zaniste Mirovayetiyeke, bergê 22, jimare (4).2018.

Mecdî Wehbe, *Mu'cim Elmustelehat Eledeb*, Încilîzî - Firensî – Erebî, Menşûrat Mektebe Lubnan, Bêyrût-Lubnan 1974.

Mecîd Mehmûd, *Şêir û Felsefe*, w: Fuad Mecîd Mîsrî, dezgay çap û pexşî Hemdî, Ç2, 2008.

Mela Mehmûd Bayezîzî, *Adat û Risûmatnamey Ekkradiye (Dab û nerîfî kurdî)*, w: Le Rûsiyewe, P.D. Şukiriye Resûl Îbrahîm, çapxaney Pencere, çapî duhem, Taran, 2015.

Mensûr Wusûqî, Elî Ekber Nîkxelq, *binemakanî komelnasî*, W: Sîrwan Mihemed Hacî, Çapxaney Mukiriyan, Çapî yekem, Hewlêr 2013.

Mesûd Xalid Gulî, Ferhenga *Gulî* (Farsî- Kurdî) çapa yekem, çapxaneya wezaretê perwerde. Hewlêr 2002.

Mihemed Cemal Tûtmeî, *Fulkilorî Xuşnawetî*, çapxaney roşinbîrî, çapî yekem, 2012.

Mihemed Mukrî, *Tole*, Çapxaney Pencere, çapî pêncem, 2015.

Mihemed Zekî El'şmawî, *Eledeb û qeyim elheyat elmeasire*, muesise elcaize Ebdulezîz Elbabgîn lilebda'i Elşe'irî, Elkuwêt, 2009.

Mîran Celal Mihemed, *Binyatî Rûdaw le romanî kurdîda*, çapxaney Renc, Silêmanî 2009.

Nadir Rostî, *gundî kurdî û goran le pîşeda*, çapxaney Aras, çapî yekem, Hewlêr 2007.

Nadiye Umer Kakesûr, *binema komelayetî û kulturiyekanî kesayetî kurdî*, namey duktura, duktora le komelnasî, zankoy selahedîn, Hewlêr 2012.

Nalî, *dîwanî nalî*. lêkolînewe û lêkdanewey mela Ebdulkerîm Muderis, fatih Ebdulkerîm, çapxaney korî zaniyarî kurd- Bexda, çapî sêyem, 1976.

Necm Xalid Necmedîn Elwenî, *bînay kat le sê nimûney romanî kurdîda*, dezgay çap û pexşî serdem, silêmanî-Kurdistanî Îraq, 2004.

Nîzam Feysel, *Jiyan û serbirdey mam Feysel Kêxwa Sadiq Siyan*, çapxaney Rojehelat , çapî yekem, Hewlêr 2019.

P. D.Zurar Sidîq Tofîq, *Komelgay kurdewarî le sedekanî Nawerast*, çapxaney rojhelat, Hewlêr, 2014.

P.D. Semîr Îbrahîm Hesên, *Kultur û komelga*, W: Ebdula Mehmûd Zengene, çapxaney şehîd Azad Hewramî, Kerkûk 2011.

P:Y:D. Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, *kurdolocî*, çapxaney Mardîn, çapî duhem, Hewlêr, 2011.

Pîtir Murdak, *Nisbiyetî kulturî*, W. Mulih Îrwanî, govarî (Tuwêjînewe, jimare 2, Hozeyranî 2005.

Qani', *Dîwan*, kokirdnewey Burhan Qani', çapxaney Dalaho, çapî duhem, 1385, Tehran.

Sasan Hikmet Elî, *şikirdneweyekî cuxraftî bo dabeşbûnî danîştuanî le parêzgay Hewlêr*, Duktora, kolêjî Adab, Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 2008.

Sebah Îsmâil, *çemk û îstatîkay Şuwên le edebda*, dezgay çap û bilawkirdinewey Aras, çapî yekem, Hewlêr- Kurdistanî Îraq, 2009.

Sedredîn Nûredîn, *berkutêkî metelî fulkilorî kurdî*, çapxaney wezaretî roşinbîrî, çapî yekem, Hewlêr, 2005.

Soma Rehmanî, *Pêwendî nêwan kultur û ayîn û girîngayetiyan bo nasînî komelgay kurdî*, zincîre bilawkirawekanî nawendî Kurdistan bo tiwêjînewe le mîlmilanê û qeyranekan, jimare (99, Silêmanî. 2020).

Şehle Kerîm Hisên, , *karîgerî edebî fulkilor le şêirekanî Medhed Bêxewda*, master. kolêjî ziman, zankoy Selahedîn, Hewlêr, 2015.

Şêx Mihemed Xal, *Ferhengî Xal*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, çapî duhem, Hewlêr 2005.

Şêx Mihemedî Xal, *Naley Derûn*, Çapxaney dezgay çap û bilavkirdinewey Aras, çapî yekem, 2007.

Şêx Reza Talebanî, dîwan, kokirdnewe û saxkirdnewey şêx Mihemedî xal, Umîd Aşna, dezgay çap û bilawkirdewey Aras, çapî yekem, Hewlêr 2003.

Umîd Aşna, Pîremêrd û pêdaçûneweyekî niwêy jiyan û berhemekanî, kokirdnewe û lêkolînewey, çapxaney Wezaretî Perwerde, çapî Yekem, bergi yekem, Hewlêr, 2001.

Xalid Hisên, dergehê bo fulkilorî kurdî, Bexda, 1985.

Xusro Caf, *Kordere*, Dezgay roşinbîrî û bilawkirdewey kurdî beşî roşinbîrî, 1989.

Yasîn Hesên Goran, *Kelepûrnamey Kurdewarî*, Çapxaney Wezaretî roşinbîrî, çapî yekem, Hewlêr, 2009.

Zaraway Edebî (Kurdî-Erebî- Îngilîzî) amadekirdinî lêjney edeb le korî zaniyarî Kurdistan, çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2006.